# Ayhan Kaya
# Rojnivîsa Mordem

Weşanên Komîteya Xebatên Şehîdan A PKK'ê

## Pêşekî:

Jiyana civakî li Kevana Zêrîn dest pê kiriye. Mezopatamya yan jî Kurdistan dikare bê gotin dilê Kevana Zêrîn bi xwe ye. Ji ber vê yekê di heman demê de dikare bê gotin ku yek ji agirgeh an jî ocaxa mirovahiyê Welatê Çiya Kurdistan e.

Ji ber wê sedemê kengî jiyana gelê Kurd bi xetereyan re rû bi rû maye xwe spartiye çiyan.

Li çiyayên ku her yek jê agirgeheyeke azadiyê ye, di her serdemê de jiyana civakî ji nû ve hatiye afirandin û li dijî dijminên jiyanê, jiyan hatiye parastin.

Vaye Çiyayê Zagros yek ji van ocaxên azadiyê ye; Hevalê Mordem jî yek ji şervanê azadiyê ku li vê Agirgehê têkoşîn meşandî û ji nû ve jiyan afirandî ye. Hevalê Mordem, ji tevlîbûna xwe ya nav refên gerîla heya bi şehîdbûna xwe, evîna xwe ya ji bo gerîla û Serokatî bi kelacaneke mezin jiyan dike. Heta dema ku ji beriya şehîd bibe, di birîndariya wî de heval jê re dibêjin, "tê şehîd bibî", ew dibêje "çi şehîdbûn e, min soz daye Serokatî. Hê pir tiştên ku ez bikim heye". Dsa evîn û eşqa wî ya ji bo birayên xwe yên beriya hevalê Mordem şehîd ketine, tenê ew bi xwe dikare bîne ziman. Çem û newalên Zagros û Xakûrkê bi dengê hevalê Mordem dikarin xweş biherikin...

Jiyan û têkoşîna şervanekî/ê, herî baş, ji aliyê wî/ê bi xwe tê ziman:

01.12.2017

Komîteya Xebatên Şehîdan A PKK'ê

Silav û Rêzên Şoreşgerî



Nasnav: Mordem
Nav û Paşnav: Ayhan KAYA
Cîh û Dîroka Jidayikbûnê:
Varto/ Muş, 1975
Dîrok û Cihê Tevlîbûnê:
1992-Xakûrkê
Dîrok û Cihê şehadetê: 26’ê Tebaxa
1995’an-Zagros/Mîros

**“Dema em şehîdên xwe wek qehremanan bi bîr tînin, destpêkê ya divê were fêmkirin çi ye? Ji bo li gorî van taybetmendiyên partiya me jiyana xwe bi dawî kirin û ji bo ev hêz dest nîşan kirin PKK’yiyên rastî ne, qehremanên rastî ne.”**

**Rêber Apo**

## Beşa yekemîn

# Destpêka Meşa Azadiyê

**Kêfxweşiya Destpêkê**

Payîza 1991'ê bû. Payîzên welatê me jî xweşik in. Rastiya bingehîn ku welatê me xweşik dike jî şervanên azadiyê bûn. Şervanên azadiyê her cihê çûnê, gelê me bi bandor kirine û di dilê gel de cihê xwe vedane. Her kesî dixwest weke wan be, ji wan hez dikir û rizgariya xwe di wan de didît. Yanî gerîla rizgarî bû, azadî bû, hêvî bû, întiqama bi hezar salan bû. Em jî ji gerîla bi bandor bibûn. Me dixwest em weke wan bin, weke wan çeka me li ser milê me be, bi awayekî azad li serê çiyan bigerin, şer bikin.

Min bi şevê ji beriya bikevim nav nivînê, xeyala wan dikir, di nav nivînê de li ser wan dihizirîm. Min jî dixwest keleşê bigirim, azad bim, xizmeta gelê me bikim. Ji bo vê jî tenê rêyek hebû. Bi gerîla re ketine têkiliyê û tevlî wan bûyîn...

Me, grubeke hevalên dibistanê biryar da ku pêwîst e êdî em tevlî gerîla bibin. Piştî wê min nedixwest biçim dibistanê, guhê xwe bidim dersan. Min, bi hizirîna li ser gerîla û çiyan hemû dema xwe derbas dikir. Di dawiyê de ez li gel hevalekî/e xwe çûm gundê wan. Wê şevê dê gerîla bihatana gundê wan û bi me re biaxifiyana. Li gund min

nedikariya di cihê xwe de bitebitim. Ji ber ku min ê cara destpêkê gerîla bidîta. Min coş û kelecan di zikhev de jiyan dikir. Ez ê li ser çi biaxifiyama, li pêşberê wan ez ê çawa bisekinîma, min ê çawa xîtabî wan bikira? Dema ez li ser van tiştan difikirîm, ji me re gotin ku gerîla banî me dikin. Em çûn mala ew li benda me bûn. Kêliya destpêkê ku min ew dîtin min nikarî ji kelecan û kêfxweşiyê biaxifim. Me silav da hev. Piştre ez aram kirim, di pey re me hev nas kir. Her pirsa di mêjiyê min re derbas dibû min ji wan pirsî. Wan jî bêyî ku qet ecz bibin bersiva min dan. Pir li ser min bandor kirin. Piştre min biryara me ji wan re got. Belê, min ji wan re got em dixwazin tevlî gerîla bibin. Wan jî bi awayekî erênî pêşwazî kirin. Piştî ku me cih û dem diyar kir, em ji hev cuda bûn. Qet min nedixwest ji wan cuda bibim. Lê ev cudabûn dê rojekê biajota. Em ê di pey re li ser esasê careke din neqetin bi gerîla re bibûna yek. Wê rojê dema em ji hev cuda bibûn hevalên gerîla jî ez jî kêfxweş bûm. Ez ji bo ku min ê dest bi jiyana ku min xeyala wê dikir bikira kêfxweş bûm, ew jî ji bo ku dê şervanên nû tevlî bikirana kêfxweş bûn. Wê rojê bextewarî ji bo me hemûyan mafê herî xwazayî bû.

Min dotira rojê hemû heval kom kirin. Em heft heval bûn. Du hevalên jin bûn. Em hemû hevalên hev ên heman sinifê bûn, bi hev re jî girêdayîbûn. Ji ber wê yekê em ê hemû bi hev re tevlî bûna. Hevalên gerîla dê bi rêya telefona xwe agahî bidana me; ji me re cihê hevdîtinê bigotana û em ê jî li gel milîsan biçûna vî cihî. Ew ê êvarê yan jî sibeyê li me bigerîna. Di saeta ku danê sibê dayibûn de li me negerîn. Li ser vê yekê, ji bo ku çima li me negerîne em ketin nav fikar û meraqan. Min hevalên milîs ji rewşê agahdar kirin. Di mêjiyê min de bi hezar awayî pirs hebûn; gelo tiştek qewimî, ketin şer û hwd... Milîs piştî ku hinekê hizirî wisa got; “em biçin gundê me û hûn li wê derê tevlî bibin”. Li ser vê yekê bêyî ku em li benda êvarê bisekinin em çûn gund. Em heft heval bûn, ewqas bi coş, bi meraq û kêfxweş bûn ku baweriya me hebû em di gerîlatiya xwe de bi ser

bikevin. Bi hêdî hêdî tarîbûnê re êdî me nedikarî em di cihê xwe de bitebitin. Hevalên qet gerîla nedîtibûn, te digo qey li cîhaneke cuda ne, min dikariya vê bibînim. Her ku dem diborî me nedixwest em bifikirin ku gerîla dê careke din neyên. Ji ber ku diviyabû îro bihatana. Me digot, îro neyên em ê çi bikin? Lê bi misogerî dê bên. Me ji milîs pirsî ku em çi bikin. Wî jî got, “em biçin çiyê, biçin nuxteyê hevalan, bi misogerî em ê wan bibînin”.

Û bi şevê me dest pê kir li ber tavaheyvê em ber bi çiyan ve bimeşin.

Me gerîla nedîtibûn, lê baweriya me hebû em wan bibînin. Di vê mijarê de hinekê jî baweriya me bi milîsê li gel me hebû. Heya bi sibeyê em meşiyan. Em hatin cihekî bi dar û daristan. Lê belê gerîla li wê derê jî tine bû. Her ku me ew nedidîtin em xemgîn dibûn. Ji sibeyê heya bi êvarê em li wan deran geriyan. Dinya jî ne xweş bibû, baranê lê dikir. Me digo, xwazika gerîla bên û me bigirin. Dema bi şev baranê lê kir em dubare zivirîn gund. Hemû gund welatparêz bû. Her kes bi me re eleqedar dibû. Moral didan me. Yên çûbûn navçeyê ji bo dîtina me hatin. Gotin, “malbatên we li her derê li we digerin. Eger polîs bizane hûn li gund in dê bên we bikujin. Ji ber wê yekê paşve bizivirin. Jixwe heval jî niha nayên”. Milîs û gundiyên welatparêz ên din jî wisa difikirîn. Me jî fêm kir ku ji bilî zivirînê ti rêyen me yên din tine û me biryar da em bizivirin.

Rewşeke çi ecêb bû. Morala me pir ne baş bû. Me pir şerm dikir. Me dê çawa li rûyê welatparêzan mêze bikirana, çi bikirana? Dîsa, eger polîsan ji me bipirsîna, me dê bersiveke çawa bidana? Piştî ku em hinekê hizirîn me diyar kir ku di rewşek ku polîs me bixe ber lêpirsînê em ê helwesteke şirîk a çawa nîşan bidin. Me hemûyan li hev mêze dikir lê me nedixwest em biaxifin. Ji ber ku nekarîbû em xwe bigihînin azadiyê. Ji ber ku em ê dubare bizivirîna wê jiyana tije bi têkiliyên koletiyê. Û em bi sibe zû zivirîn navçeyê. Her kes dê biçûya mala xwe û paşê jî biçûya dibistanê. Em ketin û neketin

navçeyê me dît ku her der bi alên KT'ê [Komara Tirk] hatiye xemilandin. Ji me re weke merasîmeke pêşwazîkirinê dihat. Wê rojê Cejna Komarê Ya 29'ê Cotmehê bû. Ez destpêkê çûm dukanê. Bavê min ez pêşwazî kirim. Dema ez dîtim pê bawer nekir, ji ber ku dihizirî em careke din nezivirin. Ez li gel wî diaxifîm ku heya wê demê hemû derûdorê dest pê kir di dukanê de kom bibe. Digotin ku hûn çûne ku derê, me çima wisa kiriye. Dibêjî qey her kesî li gorî xwe ez didarizandim. Min digot, em neçûna ti derê, tevî heval û hogirên xwe em çûne seyranê û ev jî mafê me ye.

Piştre ez çûm malê. Li malê jî ez bi heman helwestê re rû bi rû mam. Ji bo ku em zivirîbûn jî kêfxweş dibûn. Paşê ez çûm dibistanê. Hevalên din jî hatibûn. Em birin odeya midurê dibistanê. Li wê derê qomîserê polîsan hebû. Lêpirsîna me ya destpêkê dê bikira. Yek bi yek navê me hemûyan nivîsand. Û ji me re got, "ez dizanim hûn çûne ku derê. Ez ê ji we hesabê vê bipirsim. Niha, hûn ê her roj bên û biçin dibistanê". Wê kêliyê dixwest weke ku bi tirs û xof bûye xwe nîşanî me bide. Kesekî dengê wî stûr bû. Piştî ku gef li me xwar rabû û çû. Em jî çûn mal. Piştî wê rojê timî polîs li pey me bû. Êdî hevalên me yên berê jî nedihatin cem me. Heta em heft kes jî me nedikarî em werin gel hev. Ez pir xemgîn bû. Ma me tiştekî xerab kiribû, heval nedihatin cem me û ji me direviyan? Rast bû, me şaşitî kiribû, ji ber bi lez û bez tevgerîna me, bêsebriya me, me xwe li agahiya ku ji gerîla ji me re bihata ranegirtibû. Ji ber ku êvarê piştî em derketibûn li me gerîbûn, dema fêm kiribûn em ne li vê derê ne telefon qut kiribûn.

Heval ji ber ku ditirsîn, nediwêrîn bên gel me. Berevajî, em pir hewceyê moralê bûn. Dema ku wisa li me hat malbatên gelek hevalan ew rêkirin metropolan. Malbata min ji bo ewlekariya min û ji bo ez xwe komî ser hev bikim dê ez bişandama metropolan. Tiştekî çi ecêb e. Dema me dixwest em xwe bigihînin çiyayên me ku cih û warên azadiyê ne, em ji welatê xwe dibûn. Em rêdikirin surgînê. Ji vê

mezintir êş tine bû. Dibe ku me zêde şoreşgerî nedizanî. Lê bi rastî jî me ji welatê xwe hez dikir. Dema me gotibû bi dar û ber û teyr û tuyên welatê xwe re bibin yek, ji binî ve em ji welatê xwe dihatin qewitandin.

Ez ê cara destpêkê ji warê xwe cuda bûma û êdî biçûma xerîbiyê. Lê ferman hatibû nivîsîn. Jixwe ez li gorî wan weke kesekî tewanbar bûm. Ji ber vê yekê ji bilî çûyinê ti şense min a din jî tine bû. Gava diçûm Îzmîrê dibe ku min di jiyana xwe de êşa herî mezin dikişand. Her tiştê min li Kurdistanê bû. Li dêvla ku ji ber hesreta Kurdistanê her roj hinava min bişewite, kêliyekê ji beriya kêliyekê li wê derê li gel Partiyê ketin têkiliyê û vê carê bi misogerî zivîrîna çiyayên welêt şert bû.

Çûm Îzmîrê. Hevalên welatparêz ên ku min berê nas dikirin hebûn. Piştî demeke diyar li gel wan ketim têkiliyê. Wan jî rewşa min dizanîn. Alîkarî dan min. Ji bo ku ez xwe bi pêş bixim pirtûk dan min. Li gel min hesreta welêt parve kirin. Paşê em li gel Partiyê ketin têkiliyê. Piştî ku em li gel Partiyê ketin têkiliyê, demeke diyar em perwerde kirin. Û di pey re em tevlî Partiyê bûn. Dîsa em heft kes bûn. Li Îzmîrê demekê em li malên welatparêzan man. Ji ber ku cejna qurbanê bû. Otobûs nedixebitîn. Piştî ku cejn xelas bû em ketin tevgerê. Dema em li Îzmîrê çûn termînala otobûsan, min dît zaveyê min li gel erebeyan li benda min e. Bawer im li min digeriya. Heta li nava erebaya em di nav de ne jî mêze kir. Diviyabû ez nedîtama. Min xwe nîşanî wî neda. Piştî ku ew çû em li otobûsa Bazîdê siwar bûn.

Û me dest pê kir ber bi Kurdistanê ve bimeşin.

Pir bi kelecan bûm. Diviyabû vê carê ti astengî derneketa. Di erebeyê de timî dikeniyam. Heta xew bi çavê me nediket. Ferhad jî bi qasî min bi kelecan bû. Dotira rojê em gihaştin Bazîdê. Em birin mala welatparêzekî. Piştî ku em gihaştin mala welatparêz êdî min pê bawer kir ku em ê bigihîjin gerîla.

Piştî ku em li cem malbateke welatparêz rojekê li bendê sekinîn êvara dotira rojê em bi erebeyê ber bi çiyayê Agirî ketin tevgerê. Em li gundekî daketin. Ev gund ji sê-çar malan pêk dihat. Pir bi kelecan bûm. Kelecana Ferhad ji ya min jî zêdetir bû. Ji ber ku piştî kêliyekê hevalên gerîla bidîtana. Wî qet gerîla nedîtibû. Timî ji hin kesên din ew guhdar kiribûn. Timî li pirtûkan xwendibû, resmên wan dîtibû. Lê piştî bi kêliyekê wî dê gerîla bi awayekî zindî bidîta. Ji ber wê yekê, tiştekî asayî bû ku bi kelecan be. Me cixare li pey cixareyê dikişand da ku kelecana me ji ser me biçe. Em saetekê li bendê sekinîn gerîla nehatin. Dema gerîla nehat milîsê li gel me ji me re got ku ew ê biçe nuxteyeke din û hevalan bigire û bê. Em li wê derê tevî hevalê Pîr û Ferhad li hêviya hatina hevalan bûn lê di wê kêliyê de hevalekî din ê milîs hate cem me. Hevalekî birîndar anîbû. Em çûn cem erebeyê. Di nava bataniyeyan de hevalek hebû. Min xwe nêzîkî milîs kir û jê pirsî ku çi bi heval hatiye. Wî jî got ku heval birîndar e û pêwîst e em alîkariya wî bidin, heval ji erebeyê derxin. Ez fikirîbûm ku heval bi guleyê birîndar bûye. Lê dema me deriyê erebeyê vekir û bataniyeya ser wî rakir, min dît ku ez şaş bûme. Di wê kêliyê de dest û lingên min li hev gerîn. Ez mam şaş. Heman tişt ji bo hevalê Ferhad jî anîn ziman gengaz bû. Tenê hevalê Pîr xwînsar bû. Min cara destpêkê kesekî her du lingên wî qut bûna, her du destên wî weke komirê lê hatine dît. Min nekarî wê wêrekiyê nîşan bidim ku alîkariya wî bidim û heya bi malê wî hilgirim jî. Gundî, hevalê Pîr û milîs, heya bi malê anîn. Hevalê Ferhad û min jî bataniye û çente hilgirtin.

Piştî ku me li malê bi awayekî destdayî heval bi cih kir, me dest pê kir ji dûr ve bi şiklekî bêdeng li wî binêrin. Bawer im hê di kêliya destpêkê de jî hevalê birîndar fêm kiribû ku ez û hevalê Ferhad ditirsin, banî me kir. Em li rex wî rûniştin. Destpêkê bi me xwe da naskirin. Piştî ku me jî xwe da naskirin dest pê kir çîroka xwe bêje. Her ku wî vedigot, ji bo negirîm bi zehmetî min xwe digirt. Navê wî Heqî bû. Dijmin avêtibû ser qampa wan a zivistanê û dema heval

paşde kişiyabûn di berfê de lingê wî şewitîbûn. Lingekî xwe bi xwe jê kiribû, lingê wî yê din jî hevalekî/ê qut kiribû. Kesekî ewqas zindî û bi coş û moral bû, her ku vedigot morala me zêde dibû. Ji aliyê din ve jî heyranî berxwedana mezin ku li dar xistibû, dibûm. Min di dilê xwe de digo, ez çendî bişens im ku di tevlîbûna xwe ya gerîla de hê di destpêkê de bi hevalekî di vê astê de berxwedêr re hev nas dikim.

Min cara yekemîn mirovekî li ber xwe dide, evîndarê jiyanê bûye, ji bo bijî bi her awayî têkoşîn dimeşîne didît. Hevalê Heqî bi wê rewşa xwe cesaret dida me. Hin caran dema lingên wî yên îltihab girtî jan didan dinaliya. Dema diltenikiya me didît nedinaliya. Di cih de ji me re behsa Serokatiyê û gerîla dikir. Her ku wî behs dikir me bi baldariyeke mezin guh didayê. Dema ew disekinî vê carê em nedisekinîn. Me di bin tufana pirsan de dihişt. Wî jî bersiv dida. Demekê ji bo dermanên xwe bixwe, çenteyê xwe xwest. Dema min ji çenteyê wî derman derdixistin û didayê, bombeyek jî derket. Di cih de min bombe da wî. Wî jî piştî bombe qontrol kir dirêjî min kir û ji min re got ku wê li ber pencereyê daynim. Cara yekemîn min bombe didît. Min digo, dibe ku her kêliyê biteqe. Ji ber wê yekê min negirt û min ji hevalê Ferhad re got, bigire. Dema wî jî newêra bigire, hevalê Pîr girt û li ber pencereyê danî. Hevalê Heqî qederekê bi vê rewşa me keniya û got, “dibe ku hûn îro newêrin, lê piştî demekê bombe dê bibe parçeyek ji jiyana we ya rojane”. Em jî tevlî hevalê Heqî bûn û em bi rewşa xwe keniyan.

Di ser re demeke dirêj derbas bû, hevalên gerîla nehatin. Welatparêzan ji me re xwarin anîn. Me xwarina êvarê xwar. Di vê navbera de me ji bo rewşeke ne baş, nobed digirt. Li derve baranê jî lê dikir. Dema min li gel hevalê Heqî sohbet dikir ez di xew re çûbûm. Saet bibû sisêyê şevê. Li cihê razabûm hevalê Ferhad ez rakirim. Min bi çavê serê xwe bawer nedikir. Şeş-heft gerîla tev bi çekên xwe li pêşberê min bûn. Min di cih de xwe li wan aland. Hizirîm ku ti astengî nemane. Di wê kêliyê de li cîhanê kesê herî

bextewar ez bûm. Min li quntereyên çiyayê Agirî, di nava tariyê de di bin banekî de xwe gihandibû gerîlayên ku ev du sal in min nekarîbû xwe bigihînimê. Paşê me dest pê kir ji malê derkevin. Me hevalê Heqî xiste nava bataniyeyê. Her hevalekî/ê ji goşeyekî ve girt. Piştî ku em ji wê malê bi qasî nîv saet dûr ketin li ber xaniyekî hilweşiyayî, hatiye terkirin em sekinîn. Me dest pê kir em li wê malê li benda hevalan bisekinin. Piştî baranê tav derketibû. Hevalên bihatana hinekê dereng mabûn. Piştî nîvro hatin gel me. Tevî hevalên nû, taximeke gerîla jî hate gel me. Di nav vê taximê de gerîlayên jin jî hebûn.

Min berê dizanî gerîlayên jin jî hene. Lê min cara destpêkê hevalên jin ku weke hevalên xort çek û rext xistibûn ber xwe didîtin. Difikirîm ku li cîhanê jinek ku weke jina Kurd hatiye xistin, keda wê hatiye dagirkirin, hatiye kolekirin li cîhanê tine bû. Jina Kurd ku heya bi doh ji bo biçe cem mirovên xwe, biçe cem cîranên xwe ji zilam destûrê werdigire, bêyî destûra zilam li gel ti kesî neaxife, îro di şerê azadiyê de li herî pêş cihê xwe wergirtiye. Dema min ji dûr ve li gerîlayên jin dinêrî li ser van mijaran dihizirîm. Em ê bi rê biketana. Grûbek hevalên nû, hevalê Heqiyê birîndar û şeş hevalên gerîla ku bi me re bihatana me dest pê kir ber bi sînorê Îranê ve bimeşin. Me ji bo hevalê Heqî rakirinê darbestek çêkiribû. Her carê çar hevalan darbest radikir. Hevalê westiyabû cihê xwe ji hevalekî/e din re dihişt. Piştî ku em hinekê meşiyan qereqola li ser sînor a KT'ê xuya bû. Em ê di binê qereqolê re biborîna. Ji ber wê yekê diviyabû em bi awayekî pir bê deng û bihişyariyeke mezin derbas bin. Jixwe hevelên gerîla jî em hişyar kiribûn. Di tariya şevê de bi şiklekî bêdeng me sînor qut kir. Di encama rêwîtiyek dirêj ku tam şeş saet berdewam kiribû de em pir westîbûn. Herî zêde jî dema me hevalê Heqî hildigirt me zehmetî dikişand. Lê me hemûyan jî dema me ew hildigirt hewl dida wî nehejînin. Di saetên dereng ên şevê de me xwe gihand gundekî Makoyê. Sibeyê zû bi erebeyê em çûn Makoyê. Piştî ku me serê xwe

şûst û bêhna xwe veda, êvarê em çûn Urmiyeyê. Em nêzîkî heftiyekê li Urmiyeyê man û dûvre ji bo biçin qampê em ber bi Zagros ve ketin tevgerê.

Dema em li Urmiye bûn ji bo li hevalê Heqî binêre doxtor hat. Got ku dikare ling û destê protez jê re bê çêkirin. Em grûbek hevalên nû dema me ew ji sînor derbas kiribû me qederekê zehmetî kişandibû. Lê eger em ecz nebûyibin û me pes nekiribe, ji bo em wî rakin em ketibin dorê, em vê deyndarê hevalê Heqî bûn.

Bi rastî jî berxwedana li gel wî hê zêdetir ez bi jiyanê ve girêdabûm û dibêjî qey hê nû gihaştibûm wê zanebûnê ku ji bo vê jiyanê pêwîst e ez jî li ber xwe bidim. Baweriya min heye ku hevalê Heqî dê bi wê rewşa xwe jî ji bo şoreşê sûdmend be.

Em bi erebeyê heya biniya konên Zagrosê hatin. Piştre tevî quryeyê me, ber bi çiyayên  Zagros ên li pêşiya me em ketin tevgerê. Hemû heval kêfxweş bûn. Êdî me jî piraniya astengên li pêşiya gerîlabûnê derbas kiribûn. Jixwe dê me piştî kêliyekê cil û bergên gerîla ku li Urmiyeyê dabûn me bixistana ber xwe. Piştî ku em nêzîkî saetekê meşiyan em hatin Kon. Hevalan bi eleqedariyeke germ em pêşwazî kirin. Piştî ku me li vê derê hinekê bêhna xwe vekirana, me dê Zagros qut bikirana û em ê biçûna Xakûrkê. Di wê navberê de me di cih de cil û bergên sivîl ên li ser xwe derxistin, şal û şepik, êlek li xwe kir. Me şûtik da pişta xwe. Êdî em jî bibûn gerîla, tiştê ji me kêm çekek bû. Me çekên gerîlayên li wê derê stendin, fotoxraf da kêşandin. Ji ber kêfxweşiyê, me nedikariya di cihê xwe de bitebitin, hema bêje weke min bask dabû. Min ji hevalê Ferhad re digot, cilên te pir li te hatine, wî jî ji min re heman tişt digot. Em her du jî qet li erdê rûnediniştin. Em difikirîn dê cilên me qirêj bigirin. Azad bibûm. Êdî min dikarî hîs bikim. Dema dinya tarî bû em ber bi zirveyên Zagrosê ve bi meşa gerîla bi rê ketin. Em ber bi sêgoşeyê ve diçûn. Li pêşiya me berf hebû. Ruxmî ku havîn bû pir sar bû. Gava em li ser

berfê dimeşiyan me bi destê hev digirt û em wisa derbas dibûn. Paşê em hatin nuxteya sêgoşeyê.

Pir sar bû. Hemû hevalan xwe xistibûn bin bataniyeyan. Piştî ku em hinekê li gel hevalan axifîn, me ber bi Xakûrkê xwe berda jêr. Em hêdî hêdî diketin nav Xakurkê ku hevalan jê re digot, 'geliyê azadiyê'. Her ku em diketin hindurê Xakûrkê sebra me kêm dibû. Me her carê ji qurye dipirsî ku ji nuxteyê re çiqas maye. Her cara em dipirsîn jî hevalê qurye digot, "em ê piştî nîv saetê xwe bigihînin nuxteyê". Her ku wî digot "nîv saet maye", ji bo kêliyekê ji beriya kêliyekê xwe bigihînin nuxteyê em hê bilez dimeşîn. Rêya me ya nîv saet bû rojekê. Di nîviya şevê de me xwe gihand gel hevalan. Ev cih tabûreke perwerdeyê bû. Cihekî ku hevalên nû hatine, lê perwerde dibînin bû. Hevalê Rohat em pêşwazî kirin û li cihê mangayên amade bi cih kirin. Me li gel hevalên li wê derê hev nas kir. Eleqedariya hevalên li wê derê nîşanî me dabûn em hê jî kêfxweştir kiribûn. Êdî vê carê min xwe gihandibû cihê min dixwest. Êdî xwe gihandina jiyana azad, ji bo gel şer kirin, bûn milîtanekî baş, li ser hewldana min dima.

Tabûra perwerdeyê doleke kûr bû. Di dolê re av diherikî. Hevalê Rohat li ser jiyana li tabûra perwerdeyê hinek agahî dan. Got ku em ê li vê derê perwerde bibînin, em ê di demeke kurt de xwe bi hêz bikin û wisa derkevin pratîkê. Digot ku Kurdistan weke Wîetnamê lê hatiye, di demeke kurt a biqasî panzde rojan de em ê perwerdeyê bibînin û derkevin pratîkê. Lê me texmîn dikir ku em ê herî kêm sê hêyvan perwerdeyê bibînin. Me got, em perwerdeyeke dirêj bibînin baştir dibe. Hevalê Rohat ji me re rastî digotin, digot, "erka destpêkê ya şoreşgerekî/ê ew e; xwe bigihîne wê asta ku di demeke herî kurt de karibe bibe bersiva şoreşê". Me jî heq da gotinên wî û me got, em ê di demeke herî kurt de xwe we bînin wê asta ku em karibin ji bo pêdiviyên şorêşê bibin bersiv. Piştî ku em hefteyekê li bendê man bi hatine grûbeke hevalên nû re me dest bi perwerdeyê kir.

Me bi coş û moral dest bi perwerdeyê kir. Me xwe tevlî dersan dikir, zêde zêde nîqaş dikir û me dixwest em xwe bihêz bikin û kêliyekê ji beriya kêliyekê derkevin pratîkê. Piştî perwerdeya hefteyekê çek li ser me belav kirin. Dema me destpêkê çek girtin em pir zêde kêfxweş bûn. Ji ber ku Partiyê ev çek dabûn me diviyabû kêliyekê ji beriya kêliyekê me jî heqê vê bidana. Ji bo niha ji vê re bersiva herî baş ew bû ku em xwe bidin perwerdeyê û xwe bihêz bikin. Me hemûyan pir baş li çekên xwe mêzê dikir. Di her navberê de me paçek lê dida.

Piştre taxima me çû ji bo perwerdeyê gule berdanê. Ez pir bi kelecan bûm. Min ê di jiyana xwe de cara destpêke gule berdaba. Piştî ku hedef bihata diyarkirin me dê yek bi yek nîşan bigirta. Destpêkê me sê hevalan nîşan girt. Her yekî ji me nîşana wî cuda bû. Ji ber kelecanê direcifîm. Min keleş girt. Li hedefa hembara xwe rast kir. Hevalê Rohat talîmata "gule berdin" da. Me sê kesan bi hev re pêlî textikê kir. Ji kelecanê min nedizanî ku min çawa gule berdaye. Di vê navberê de min nedizanî ku çek bi awayekî otomatîk guleyê dide ber. Me careke din li ser hedefê nîşan girt. Dîsa, me her sê hevalan bi hev re gule berda. Ji ber ku me her sê hevalan bi hev re berda, ez ketim wê gumanê ku gelo çeka min teqiyaye yan na. Hizirîm ku nateqe, min ji hevalê Rohat re got çek nateqe. Ruxmî ku çekê gule berdabû, ji ber kelecanê min fêm nekiribû. Hevalê Rohat pirsî ku gelo ez pêlî textikê dikim yan na. Min jî çeka xwe li pêşiya xwe rast kir û dubare pêlî textikê kir, gule li ber lingê min teqiya. Di wê kêliyê de hê bêhtir kelecana min zêde bû. Ji ber kelecanê, min vê carê çek li hevalan rast kir, di wê kêliyê de her kesî bi min de qîr dikir û digotin "eman ha pêlî textikê neke". Di nava xwêdanê de mabûm. Panîk bibûm û min nedizanî ku çi bikim. Di wê kêliyê de hevalê Rohat hat û ji destê min çek girt. Piştre ji min re got, "tu hevalan bişopîne". Min xwe da rexekî û dest pê kir gule berdana hevalan temaşe bikim. Piraniya hevalan li hedefên xwe didan.

Êvarê em çûn cihê mangeyê. Pir bêdeng bûm. Ji ber ku li ser çekê hakimiyeta min tine bû xemgîn dibûm. Ya din jî eger min bi qezayê heval şehîd bixistana min ê çi bikira? Her li ser wê difikirîm. Ji hevalên kevin hevalê Şiyar rewşa min ferq kir, li cem min rûnişt, me sohbet kir. Hinekê hêvî da min. Got, “dema destpêkê xwendevanek pênûsê digire destê xwe, li ser pênûsê ne serwer e. Nivîsa wî/ê pir ne xweşik e. Paşê her roja derbas dibe nivîsa xwe xweşiktir dike. Li ser pênûsa xwe hakim dibe. Eger tu jî li ser bisekinî bi demê re, tê li ser çeka xwe hakimiyeta xwe çêbikî”. Hinekê morala min xweş kir. Min soz da xwe bi xwe ku ez ê di her mijarê de baldar tevbigerim.

Li gorî bernameya rojane perwerdeya me berdawam dikir. Di deh rojên destpêkê de piraniya hevalan bi nexwaşiya zikêşê ketin. Paşê dema heval fêrî xwarinên dihatin çêkirin bûn, nexweşiya heyî derbas kirin.

Ji roja destpêkê ku me dest bi perwerdeyê kiribû pê de her roj balafirên KT’ê di ser me re derbas dibûn. Gelek cih bombebaran dikirin. Di bombebaranên destpêkê de em hinekê tirsiyabûn. Paşê me ev tirs ji ser xwe avêt. Ji ber ku qet nedikarîn ti zererê bidin me. Armanca wan jî ew bû, perwerde û xebatên me yên binke çêkirinê asteng bikin yan jî dereng bixin. Dema balafir li ser me digeriyan, di cih de bersivên xwe ji doçqeyên me digirtin. Doçqeyan destûr nedidan ku balafir ji bo bombebaranê, xwe berdin ser li ser qampên me. Vê jî morala me pir xweştir dikir. Her roja derbas dibû em perwerdeyê dibûn. Piştî demeke diyar di ser re derbas bû em diçûn erk û wezîfeyan. Di perwerdeya leşkerî de êdî tatbîqat jî dihatin pêkanîn.

Her roja derbas dibû behsa pratîkê dihate kirin. Nîqaş dihate kirin ku em ê weke bolîk derkevin pratîkê.

Piştî perwerdeyeke mehekê em derketin platforma rexnedanê. Me bi axaftina li ser mane û girîngiya perwerdeyê ya fermandarê me yê biryargehê dest bi platforma xwe ya rexnedanê kir. Piştre ji jor ber bi

jêr hevalan rexnedana xwe dan. Ez jî ji bo ku rexnedana xwe bidim derketim pêşberê hevalan. Hevalan li ser min nirxandinên xwe kirin. Piştre rexnedana min ji aliyê pêkhateyê ve hate pejirandin. Di pey platforman re vesaziya hevalên bolîkê hate aşkere kirin. Hin çûn hindurê welêt, hin ji me jî li ser qada Xakûrkê hatin belav kirin. Ez jî di vesaziya destpêkê de çûm Lêlîkanê.

**Lêlîkan**

Em grûbek heval diçûn Lêlîkanê. Qet jî weke min nebibû. Min ji bo welêt xwe amade dikir. Dema min bihîst ez ê biçim Lêlîkanê mabûm heyirî, xeyalên min vala derketibûn. Wê derê cebheyê paş bû. Li gorî min ên nedikarîn şer bikin diçûn cebheyê paş. Gelo min jî nedikarî şer bikim? Timî xwe bi xwe dihizirîm. Her ku difikirîm min xwe digihand encamên şaş. Min digo, eger ez lewaz bim kêliyekê ji beriya kêliyekê xwe îsbat bikim û wisa derkevim pratîkê. Çawa em hatin Lêlîkanê em dan taxima doçqeyê. Mangayek li gel doçqeyê bi cih bû. Mangaya me jî li binê doçqeyê bi cih bû. Paşê fermandarê/a bolîka me ji me re civîn li dar xist. Li ser maneya Lêlîkanê sekinî. Got ku ev der ji bo tedbîra li beramberê hêzên noker tê bikaranîn û dibe ku her kêliyê şer derkeve, ji ber vê yekê xwest em hişyar bin. Bi taybetî piştî vê civînê ez dikarim bêjim min ji fikrên xwe yên şaş xwe rizgar kir. Paşê me li beramberê êrîşên hewayî ji xwe re stargeh (sığınak) çêkir. Dîsa, perwerdeya me didomiya. Me di navbera xwe de perwerde didît. Em hin caran derdiketin întişarê. Me mewziyên xwe çêkiribûn.

Sibeyekê dema fermandarê me yê taximê sê gule berdan em derketin întişarê. Saet çarê sibeyê bû. Her der tarî bû. Em ber bi mewziyên xwe ve dibezîn. Hemû mewziyên me berê hatibûn diyarkirin. Ez û hevalê Kemal di heman mewziyê de diman. Em her du jî ketin mewziya xwe. Piştî ku me hinekê derûdora xwe qontrol kir me her duyan jî di mewziyê de xwe dirêj kir. Me li azmanan mêze

dikir. Min di dilê xwe de stêrk dihejmartin. Wisa di xew re çûbûm. Hevalê Kemal jî gava bi stêrkan re mijûl dibû, razayibû. Piştî demeke diyar heval paşde kişiyabûn. Ji ber ku em razayibûn, me nekarîbû em biçin cihê paşde kişanê. Dema me nekarîbû biçin, fermandarê mangaya me hatibû mewziyê. Tebî me her duyan jî di mewziyê de xwe dirêj kiribû û em razayibûn. Em rakirin û em çûn cem hevalan. Rewşa me ji taximê re hate aşkerekirin. Perwerde be jî razayin sûc bû. Bi biryara hemû hevalan ji ber ku em ketibûn vê kêmasiyê ji bo me her duyan jî cezayê sê roj nekişandina cixareyê hate dayîn. Helbet armanca cezayê perwerde bû. Min qet nedikarî vê kêmasiya xwe daqurtînim. Min çawa kêmasiyeke wisa kiribû? Vê destnîşanî lewziya min dikir. Ji ber vê yekê diviyabû ez bi awayekî cidî li ser xwe bisekinîma. Xwe bi xwe difikirîm ku hewce dike ez ji kêmasiyên xwe, ji xwe re ders derxim û encax ez ê karibim bi vî şiklî bi ser bikevim. Roja destpêkê min bi vê dilşikestîbûnê jiyan kir, paşê ez dubare bi ser xwe ve hatim û min hewl da moral bidim hevalan. Ev cezayê sê rojan li ser min bandor kiribû. Êdî ez hê baldar û hişyar tevdigerîm. Her ku min girîngiya qadê fêm dikir, ez hê cidî nêzîkî jiyan, kar û xebatê dibûm.

Piştî ku em çûbûn Lêlîkanê, tabûra perwerdeyê, Balafirên xweş seredana me dikirin, demeke dirêj nehatin. Her ku nehatin hevalan digot ku ew ecz dibin. Hin hevalan digotin, “me bi xistinê balafirên KT’ê xelas kirin. KT’ê hê nekariye ji Emerîkayê balafirên dixwaze bikire. Ji ber wê yekê balafirên wê nayên seredana me”. Ji me re ev mijara balafiran jî dibû moral.

Ji bilî perwerde û amadekariyê, me hin caran fêkiyên li ser daran jî kom dikirin. Dîsa, di demên xwe yên vala de me analîzên Serokatiyê dixwend. Me hewl dida li gorî wê xwe sererast bikin.

Bi taybetî bi destpêkirina pêngava biharê re li ser dijmin êrîşên me zêde bibûn, piştî Pêngava 15’ê Tebaxê di tevahiya welêt de çalakiyên me, xwe gihandibûn asteke domdar. Hema bêje her roj di

nav nûçeyên radyoyê de yên ku li ser çalakiyên me bûn di destpêkê de cihê xwe digirtin. Bi taybetî eyaleta Amedê ji vî aliyî ve qederekê li pêş bû. Her ku me guh dida li ser nûçeyên çalakiyan coş û morala me hê zêde dibû. Me şiyar diqêriyan û govend digerand. Êvara 30'ê Tebaxê di nûçeyan de dîsa behsa çalakiyên me dikir. Hevalan girtibû ser qereqola Helenayê. Me encamên wê bi temamî nedizanî. Diyar bû çalakiyeke mezin bû. Piştî çend rojan encamên çalakiyê hatin. Hejde heval şehîd bibûn. Piraniya dijmin hatibû îmhakirin. Vê çalakiyê bêdengiya yekîneya me bingehîn şikênandibû. Ji vê re kêfa me dihat. Gelek hevalên em bi hev re tevlî bibûn di vê çalakiyê de cihê xwe girtibûn. Ez li ser navê wan kêfxweş bûm. Bi ketina çalakiyan dê hê zûtir fêrî şer bibûna, hê zûtir bibûna xwediyê tecrûbe.

Piştî bi demeke kurt ji vê çalakiyê amadekariyên çalakiyeke nû dihate kirin. Hêzên me yên hene dê ji nû ve bihatana vesazkirin. Hêzên me yên Lêlîkanê jî di nav vê çarçoveyê de bûn. Me hemûyan bi şiklekî bê sebir digo, di vesaziyê de navê me jî dê bê xwendin û em ê tevlî çalakiyê bibin. Tenê çend roj derbas bibûn, vesaziyê hatin kirin. Ji hevalên Lêlîkanê taximek dê biçûna çalakiyê. Ji taxima me jî sê heval diçûn. Em yên din jî dîsa li cihê xwe diman. Bi rastî jî min dixwest biçim, bikevim çalakiyê. Lê dîsa min ê nekarîba biçim. Dîsa min ê çalakî tenê ji radyoyê bibîhîsta. Lê li ser navê hevalên diçûn kêfxweş dibûm. Ew jî pir kêfxweş bûn. Bi taybetî min cara yekemîn hevalê Çiya bi coş û moral didît. Wê rojê weke zarokan bû. Jixwe kêfxweş bû. Bextewar bûn jî heqê wî bû.

Em li Lêlîkanê taximek diman. Di wan rojan de rewş cidî bû. Li derûdorê tevgereke diyar a hêzên îxanetkar hebû. Heta bi awayekî veşartî xebata kişfê dimeşandin. Ji ber wê yekê jî em hê baldar tevdigeriyan. Me tedbîrên xwe bi pêş dixist. Di vê navbera de di hindurê welêt de çalakî timî didomîn. Sibeyeke meha Îlonê bû. Me nûçeyên destpêkê yên rojê guhdar dikir. Di nûçeyan de digot ku hevalan êrîşê Tabûra Rûbarokê kiriye. Nûçe nû qediyabûn, di wê

kêliyê de hevalên ji bo dewriye çûbûn girê Lêlîkanê hatin, çalakî piştrast kirin. Xuya kirin ku ji dûr ve Rûbarok di nava agir de ye, Deşta Heyatê dişewite. Piştî bi kêliyekê dest pê kir di ser me re balafirên KT'ê bifirin. Lê dema doçqeyên me bersiv dan neçar man bizivirin. Bîst û heştê Îlonê bû. Hevalan li Tabûra Rûbarokê dayibûn. Misoger bû ku çalakî pir mezin e, ji ber ku li vê herêmê qereqola herî mezin bû.

Di du rojên destpêkê de me nikarî encamên zelal ên çalakiyê bistînin. Paşê bolîkek ku ji çalakiyê paşde kişiyabû hate gel me. Hemû pir westiyabûn. Morala wan têk çûbû. Xuya bû pir hincirîbûn. Hevalên ku em di tabûra perwerdeyê de li cem hev bûn jî hebûn. Piştî ku hevalan hinekê bêhna xwe vekir, me ji wan encamên çalakiyê pirsî. Gotin ku nêzîkî sê sed wendahiyên dijmin hene û di navbera çil-pênce de heval şehîd ketine. Hin hevalên di vê çalakiyê de şehîd bûne, hevalên ku em bi hev re hatî bûn. Hevalê Ferhad jî şehîd ketibû. Şehadeta hevalê Ferhad li ser min pir bandor kir. Di çalakiyê de birîndar bibû û di dema paşve kişînê de di encama êrîşa helîkopterê de şehîd ketibû. Hevalê Ferhad ji Kosorê (Kızıltepe) bû. Li Îzmîrê me li heman dibistanê dixwend. Dema du salî bû malbata wî koçî Îzmîrê kiribû, careke din nezivirîbû Kurdistanê. Ji malbateke welatparêz bû. Li malê bi Kurdî dihate axifîn. Hevalê Ferhad jî pir xweş bi Kurdî diaxifî. Ruxmî ku çûbûn metropolan, çanda xwe, zimanê xwe, adet û teqelîdên xwe ji bîr nekiribûn. Piştî ku heşt mehan em bi hev re çûbûn dibistanê, ez zêde fêrî wî bibûm. Gelek caran alîkarî dida min. Bi taybetî pir dixwest axaftina Rêbertiya Partiyê ya piştî şoreşê guhdar bike. Hevalê Ferhad zû şehîd ket. Di nav vê pêvajoyê de ruxmî ku nû bû, xwe pêş xist, karîbû tevlî pratîk û çalakiyan bibe. Tiştê pêwîst e ez bikim, diviyabû layiqê bîranîna wî bibim.

Min jî di nav bolîka Zerzanê ku hatibû pêkanîn de cihê xwe wergirt. Weke her kesî pir westîbûm û hincirîbûm. Ya min ji ber neçûna şer

bû. Lê dema min bihîst em ê biçin welat, min hemû westabûna şer ji ser xwe avêt. Dest pê kir hestên min pir cuda bin. Ez ê cara destpêkê weke gerîlayekî biçûma welat. Min ê gelê xwe bidîta. Gelo dê gel çawa em pêşwazî bikira û piştî vî şerî çawa nêzîkî me bûya. Li cihên em biçûnê amadekariyên me jî tine bûn. Qederek zehmetî li benda me bûn. Lê diviyabû rîska van zehmetiyan bihata girtin ber çavan. Ji ber ku di encama van zehmetiyan de min ê gel bidîta. Fermandarê me yê/a biryargehê ji me re civîneke dawî li dar xist. Encamên şer ji me re got. Bal kişand li ser zehmetiyên li cihê em ê biçinê li benda me bûn. Got ku divê em baldar tevbigerin û xwe biparêzin. Herî dawî got, “eger hevalên bixwazin biçin Zelê hebin bila bimînin”. Ji me ti kesî deng derneket. Ev dihate wê maneya ku em naxwazin bimînin, em dixwazin biçin welat. Kêfa fermandarê/a me yê/a biryargehê jî, ji vê re hatibû. Paşê me ji hevalên vê derê xatir xwest. Hêdî hêdî em ber bi welêt ve ketin tevgerê. Hemû heval kêfxweş bûn.

Dema em ber bi bolîka çaremîn ve diçûn baranê li me kir. Barana destpêkê lê kiribû. Lê me di rojên şer de wisa xwestibû baran bibare, tu dibêjî qey weke ji me re bi rik û înad be nedibarî. Li gorî me eger baranê lê bikira îxanetkar dê vekişiyana. Lê nebariya. Niha, wisa xweş lê dikir, em ji tayê serê xwe heya bi binê lingên xwe dibûn av. Em di binê baranê de hatin nuxteya dawî ku em ê amadekariyên rêwitiya xwe bikin. Em bibûn av. Di cih de me laylon veda. Ji ber barana heya bi sibeyê lê kiribû em narazayibûn. Sibeyê taveke zelal û paqij derket.

Bi sibeyê re me ji dest bi amadekariyên xwe kir. Her grûb bi tiştekî re mijûl dibû. Me ji aliyekî ve mirtoxe, ji aliyekî ve jî xwarina nokan (himis) çêdikir. Li vê derê fêkî zêde bûn. Her curê fêkiyan hebû. Me ji van jî dixwar. Me bi moraleke mezin amadekariyên xwe dikir. Piştî ku amadekariyên me xelas bûn em bi awayê du grûban bi rê ketin. Me dê Zagros qut bikirana û biçûna.

Her kes dizane çiyayên Zagros çiqas zehmet e, bêyî ku berdêlê bistîne rê nade ti kesî. Yên nizanin hebin jî, bihîstine. Li Zagros berf bariyabû. Ji ber wê yekê rêya me girtî bû. Grûba me ya destpêkê hê zêdetir ji hevalên bi hêz û ji berfêre re xurt in pêk dihat. Ew ê di pêşiyê de biçûna û ji bo hevalên din rê vekirana. Di pey re jî dê hevalên din biçûna. Ez di grûba duyemîn de bûm. Grûba me rojekê piştî grûba destpêkê bi rê ket.

Em hêdî hêdî êdî nêzîkî quntareyên Zagros dibûn. Her ku em nêzîkî Zagros dibûn di her gava me diavêt de min didît ku em ji Xakûrkê dûr dikevin. Hin caran li paş xwe dizivirîm û min li wan dolên kûr mêze dikir. Dibêjî qey ev cudabûn heta heta bû. Weke ku yek ji min re bêje, "baş lê binêre, tê careke din nikaribî Xakûrkê bibînî". Her ku em hildikiştin Zagros dibêjî qey berf nêzîk dibû. Me li cihekî navber da. Li vê derê me ji goniyên ter, çay çêkir. Ji beriya em bi rê bikevin, cara dawî me xwarina xwe xwar. Ji vê bi şûn de rêya me pir dirêj bû. Me dê vê carê di carekê de Zagros qut bikirana.

Ji bîra min qet naçe, ji beriya em bi rê bikevin ji fermandarên me yên taximê hevalê Azad got, "baş xwe amade bikin, em ê îşev ji sînorên sê dewletan bikevinê û derkevin. Destpêkê sînorê Iraqê, piştre yê Tirkiyeyê û paşê jî sînorê Îranê... Dibe ku li vê cîhanê kesên di vê şevê de sînorên sê dewletan qut bikin hebin, ew jî em ên ku grûbeke şervanên PKK'ê ne.

Û me hêdî hêdî dest bi tevgerê kir. Hemû grûbê bi hev re tevger dikir. Her ku em dimeşiyan bêrehmî û kûrahiya berfê zêde dibû. Berf zêde barî bû. Lê me nû dest bi meşê kiribû, diviyabû bêyî ku bisekinîna me berdewam bikira. Her ku em bi pêş ve diçûn grûb jî di nav xwe de dibû grûbên biçûk. Ez di nav grûba li pêş diçe de bûm. Ji bo ku li du nemînim min pir zêde hewl dida. Heya bi îro di şevên wisa yên dirêj ên zivistanê de, bi taybetî jî li cihekî weke Zagrosê, di şeveke bi berf de nemeşîbûm. Di berfê de diviyabû bêyî ku navber bide, timî bimeşe. Her ku em meşiyan min ferq dikir ku ez diwestim. Min digo, bila demeke zûtir ev berf biqede. Her ku ji ber westabûnê min zehmetî dikişand, min ferq jî dikir ku xewa min tê. Lê dema meşa di berfê de, xew dihate wateya mirinê. Min ev dizanî, pir

giraniya xwe dida ser xwe. Her cara nêzîkî hevalê Azad ku berpirsiyarê grûba me ye dibûm min pirs dikir; heval, çiqas rêya me maye? Wî jî digot, “sê saet maye”. Yanî dema ku maye rast digot û dixwest ku li gorî wê xwe amade bikin. Her ku wî ya rast digot, quryeyên me yên ku destpêkê anîbûn qampê dihatin bîra min û min digo, xwaziya hevalê Azad jî weke wan ji bo rê bigota “nîv saet maye”. Dema ez wisa difikirîm, sirtekî bilind derket pêşberê me. Em ber bi sirtê ve hilkiştin. Her ku em hildikiştin cihên bilind, ba hê zêde dihat. Dema em derketin ser sirtê, ba wisa bi şid dihat, min digo dê niha min bibe. Her ku em bi lez ji gir dihatin xarê şideta ba kêm dibû. Dema em hineke din meşiyan li jêra me reşahî xuya bûn. Dema min reşahî dît, ji nişka ve ez bi ser xwe ve hatim.

Grûba me hê nehatibû cihê em hatine. Ji ber rewşa wan fikarên me hebûn. Me dixwest ji beriya kêliyekê xwe berdin jêr. Lê hevalên din hê nehatibûn. Dema em di cihê xwe de disekinîn jî em diqerisîn û xewa me dihat. Piştî kêliyekê dema dengê guleyan hat em neçar man bisekinin. Me di cihê xwe de spor dikir û hilbazdida. Çend hevalên din gihaştin me. Piştî ku em hineke din lê hêviya hevalan sekinîn ber bi dolê ve bi awayekî xweş meşiyan. Her ku em dimeşîn min ferq kir ku germ dibim. Di dawî de em gihaştin reşahiyê. Êdî berf tine bû. Me Zagros qut kiribû. Me xwe gihand cem hevalên ku rojekê ji beriya me derketibûn. Hinek hevalên me hê nehatibûn. Em pir westiyayî bûn. Bi wê westabûnê, ji derveyê nobedaran em hemû di cih de ketin xeweke kûr.

Dema em şiyar bibûn her der ronî bibû. Her tişt pir xweşik bû. Lê nehatina du hevalan em dixistin nav fikaran. Çavê me her li rê bû. Ji grûba beriya me hatibû yek heval çûbû gund û ji bo me hin tişt anîbûn. Me taşteya xwe xwar. Eger her du hevalên me yên din jî bihatana çiqas baş dibû. Dema ew nehatin çend grûb ji bo li wan bigere derketin.

Lê her grûba derdiket vala dizivirî. Me dest pê kiribû fêm bikin çi hatiye serê hevalên me. Zagros dîsa berdêl stendibû. Ew timî wisa ye, bêyî ku berdêl bistîne rê nade ti kesî. Me êdî dizanî du hevalên me şehîd ketine. Dema zivistanê yek xwe li Zagros bide, ew neçar e Zagros derbas bike, nexwe tê wateya ku jê re bûyê nêçîr.

Me rêya xwe ya ji vê bi şûn de bi êşa wendakirina du hevalan dê bidomanda. Ji bo şervanekî/ê azadiyê mirina herî xerab bû. Dibe di şerê dijî xwezayê de jî bimirî. Lê her şervanê/a azadiyê tenê dixwaze di şerê dijî dijmin de şehîd bikeve. Hem jî dixwaze weke bombeyeke atomê bi dijmin de biteqe.

Em ê vê carê bi şiklê sê grûban bi rê biketana. Grûba herî dawî piştî ku erzaqê ji gund hatiye anîn veşartiye dê rêya xwe bidomanda. Grûba dawî heşt kes bûn. Ez ji bi vê grûbê re bûm. Piştî ku me erzaqê xwe veşart em bi rê ketin. Lê barê me pir giran bû. Di çantayê min de çaryek kîs şekir, du paket xurme, du paket çay û dîsa, bataniyeya ku min li gel xwe anîbû hebû. Barê hevalên din jî bi qasî yê min bû.

Dinya hêdî hêdî tarî dibû. Dema em destpêkê bi rê ketin ji ber ku barê min giran bû westiyam. Min bi zorê nefes distend. Her dimeşiyam hê rehet dimeşîm, lê quxikê pêsîra min bernedida. Timî dikuxiyam.

Em di nav sînorê Îranê de dimeşîn. Em ê piştî kêliyekê di binê paygahekê (qereqolên Îranê) re derbas bûna. Ji ber wê yekê pêwîst bû em pir bêdeng û baldar tevbigerîna. Lê hin caran kuxika min bêdengiya me xerab dikir. Dema em pir nêzîkî paygahê bûn fermandarê me yê bi navê Zerdeşt got, “eman nekuxe, xwe bigire, eger tê nikaribî, kefyeya xwe bide ber devê xwe”. Min jî got ez ê hê baldar bim. Me bi şiklekî bêdeng û baldar paygah derbas kir. Ruxmî ku kuxika min hat, min xwe girt, lê di nav xwêdanê de mabûm. Piştî ku hinekê ji paygahê dûr ketim, kuxîm û pir bêhna min hate ber min.

Êdî ti asteng nemabûn. Piştî vê me dikarî bi roj jî tevger bikin. Dema em di palên çiyan re derbas dibûn, şewqa gundên li deştê xuya dibûn dîmen pir xweşik dikir. Şewq temaşekirin û wisa meşîn qet mirov nediwestand. Me xwe gihand cihê zomekê. Dema em bi rê de hatibûn me gonî û dar jî li cem xwe kom kiribûn. Li gel zomê dar tine bûn. Bi goniyên ku kom kirine me çayek çêkir û vexwar. Ruxmî ku sar bû çaya ku me vexwaribû, nava me germ kiribû. Ya din jî, dema ku me bi ser de jî cixareyeke ji titûnê hatiye pêçandin kişand me hemû westîna xwe ji bîr kir.

Me şeva xwe li vê derê derbas kir û sibeyê em dubare bi rê ketin. Li pêşiya me du girên bilind hebûn. Me dê ew qut bikirana. Li van

giran jî berfê dida çongan. Lê hevalê ji beriya me çûbûn rê vekiribûn. Ji ber vê yekê me dê zêde zehmetî nekişanda. Piştî rêwitiyeke dûr û dirêj û em westandibûn me her du gir qut kirin. Em hatin dolekê. Êvar jî nêzîk dibû. Ji beriya bibe êvar me agirekî mezin pêxist û cilên xwe yên şilûpilo bûne zuwa kirin. Me xwarina xwe xwar. Her cara ku me xwarin dixwar her hevalî/ê digot, “heval, zêde bixwun”. Her kesî dixwest qaşo bi zêde dan xwarinê dê barê xwe sivik bike. Min jî digot, heval pir şekir bixin çaya xwe, zêde zêde xurma bixwun da ku hûn enerjî bistînin. Min hewl dida bi vî awayî barê xwe sivik bikim. Heval dikenîn.

Ji Urmiyeyê re kêm mabû. Em ê îşev jî bimeşîna û bigihîştana nuxteya xwe. Di nav gundên sînor ên Îranê re em ê derbas bûna. Me nedikarî em di rêya çiya re biçûna. Hem zêde berf barîbû, hem jî em pir westiyayî bûn. Di gundên Îranê re derbasbûn jî, xeter bû. Lê ti rêyên din tine bûn. Hê ji beriya du rojan me du şehîd dabûn çiyayê Zagros. Me nedekarî wê rîska şehîd dayîna Girikê Feyra, bidin ber çavên xwe. Ji dolê ber bi gund ve şivereyek hebû. Me ev rê şopand û em nêzîkî gund bûn. Me nedizanî li gund paygah heye yan na. Dengê ji gund dihatin yên kûçikan û bi taybet jî yê zarokan çiqas bi min ecêb dihat ewqas jî li kêfa min dihat. Du hevalên me çûn gund, hevalên din em li derveyê gund li benda hevalan man. Piştî bi nîv saetê tevî gundiyekî extiyar zivirîn.

Kurdiya ku zilamê extiyar pê diaxifî pir dişibiya Kurdiya herêma me. Hevalê Zerdeşt ji gundî re got, “ji me re bêje, em ê di ku derê re û di kîjan rêyê re biçin sînor”. Pir diyar bû ku zilamê extiyar ditirsiya. Got, “li gund pastar (leşkerên Îranê) hene û jixwe nizanim jî”. Piştî ku hevalê Zerdeşt got, “em Kurd in, bi me baweriya te hebe, tu rê dizanî”, zilam bi pêşiya me ket. Em di mergên jêra gund re derbas bûn. Paşê gundê li hemberê nîşan da. Got, “her kesê li vî gundî, rê dizane. Biçin wê derê, ew ê rê nîşanî we bidin. Û paşê cuda bû.

Em ber bi aliyê dengê kûçikan tê ve, aliyê ku gundî nîşan dayî ve çûn. Li aliyekî tarî yê malekê em sekinîn. Du hevalan li derî dan. Ciwanek derket derve. Li gel hevalan hinekê axifî. Û ji hevalan re got ku ew rê nizane. Lê em jê piştrast bûn ku rê dizane. Tiştekî me bikira nebû. Tam di wê kêliyê de xwediyê mala hema li keleka rê derket

pêşiya me. Kesekî extiyar bû. Got, “hûn westiyayî ne, çayekê vexwun û wisa bi rêya xwe de biçin”. Me hemûyan li hevalê Zerdeşt mêze dikir, me bi çavên xwe digot em bimînin. Wî jî di cih de dît. Nobedarê me li derve sekinî. Hevalên din ketin hindur. Dema ketim hindure malê pir bi kelecan bûm. Ev cara destpêkê bû ku weke şervanekî ARGK’ê diketim mala kesekî ji gel. Elektrîka li malê biqasî ku çavê mirov li ber venebin, ji min re xweşik dihat. Xwediyê malê mirovekî baş bû. Welatparêz bû. Fêm kiribû ku em endamên PKK’ê ne. Hin pirs pirsîn. Bi taybetî li ser Şerê Başûr. Li dijî Barzanî kîna wî jî hebû. Digot, “encax hûn dikarin hin tiştan bidin gelê Kurd”. Wî kesî hinekê em nas dikirin. Piştî ku me xwarina xwe xwar û çaya xwe vexwar, me got pêwîst e em biçin. Xwediyê malê got, “hûn westiyayî ne, cihê me heye, hûn dixwazin îşev li vê derê bimînin”. Lê me qebûl nekir. Diviyabû yekîneyeke gerîla ti car li gund û malan nemana. Ya din jî diviyabû demeke zûtirîn me xwe bigihanda hevalan. Xwediyê malê hinekê li cem me meşiya. Piştre em ber bi du gundên li ser rêya me bûn meşiyan. Zilamê extiyar û malbata wî pir baş bû. Bi rê de timî li ser wan hizirîm. Min go, ji bo van mirovan şer kirin çiqas tiştekî baş e. Kêfxweşiya hevalên din jî ji serçavên wan xuya bû.

Em li ser sirta biçûk a jora gund dimeşîn. Şev tarî û bêdeng bû. Lê her ku em nêzîkî gund dibûn ji aliyê kuçikan ve ev bêdengî dihate xerabkirin. Dema em nêzîkî gund bûn me hinekê li pêş agirek dît. Em ber bi agir ve çûn. Ev kes du şivan bûn, em pêşwazî kirin. Çaya wan jî amade bû. Em vexwendin û çay dan me. Me hewl da bi vê çaya me vexwariye westabûna xwe ji ser xwe biavêjin. Me şivan girte gel xwe û ev gundê dawî jî derbas kir. Me xwe li rêya diçe Urmiyeyê da. Piştî ku em hinekê ji gund dûr ketin me li cihekî bêhna xwe veda. Bi rastî jî em pir westî bûn. Êdî ti halê me nemabû em bimeşin. Îşev barê li pişta me jî qet kêm nebibû. Ji ber ku me xwarin li gund xwaribû. Ji sibeyê re jî kêm mabû. Me hewl da em heya bi sibe îstirehet bikin.

Ji dûr ve gundê U... xuya dibû. Êdî rêya me diqediya. Karwanên em didîtin digotin ku hevalan li gund kon vedane. Pir kêfa me hat. Ber bi êvarê em çûn cem hevalan. Bi coş û germahiyekê em pêşwazî kirin. Wan rêwîtiya xwe ji me re vegotin, me jî tiştên di ser me re

borî ne ji wan re got. Me dê vê êvarê bêhna xwe vekirana, ji sibeyê zû pê de jî dest bi karê xwe bikirana. Ji ber ku gelek kar û xebat li hêviya me bû.

Gundê C... Gundekî Kurd ê li ser sînor ê li goşeyekî herî dûr ê Îranê ye, di navbera Îran û Tirkiyeyê de ye. Demekê ji beriya vê ji aliyê Îranê ve hatibû vala kirin. Ji ber ku ev gund ji aliyê PDK'ya Îranê ve weke binke hatibû bikaranîn, dijmin ev gund dabû koçberkirin. Ev gund pir nêzîkî gundên sînor ên Şemzînanê bû. Dişibiya cihekî pir şêrîn. Destpêkê me di xaniyekî xirbe û hilweşiyayî de kon vedabû. Heya me cihê xwe çêbikira em ê demekê li vî konî bimana. Sibê zû em rabûn. Piştî ku me xwarina xwe xwar bi coşeke mezin dest bi kar û xebata qampê kir. Grûbek heval ji bo vedana konê mijûl dibûn. Hevalên din dar kom dikirin. Yekeyeke me ya biçûk jî ji bo gumrîkê çû nuxteya gumrîkê. Baskekî rêyên bazirganiyê yên mezin ên li Kurdistanê di vê derê re derbas dibû. Ji Tirkiyê karwanên mezin derbasî Îranê dibûn. Ruxmî ku berf dibarî hê jî karwan diçûn û dihatin. Ji ber vê yekê, diviyabû yekeya me ya gumrîkê ji van karwanan gumrîk bistendana. Dîsa me dê hin pêdiviyên xwe ji saya van de pêşwazî bikirana. Heya bi êvarê bi coş û moraleke mezin xebata me berdewam kir.

Êvarê rêveberiya bolîka me li hev civiya. Kar û xebata me dê bihata plankirin. Me jî îstirehet kir. Di îştimaya sibeyê de hin biryarên hatibûn wergirtin ji me re hatin gotin. Grûbeke me dê biziviriya Xakûrkê, grûbek ji bo ku erzaqên li S... bîne dê biçûya. Grûbeke me jî dê biçûna hindurê welat, biçûna gundên Şemzînanê. Navê min jî di nav grûba hevalên biçûna hindurê welat de hate xwendin. Hema bêje kêm mabû ji kêfxweşiyê dê baskên min derkatana. Diketim hindurê welat. Ez ê jî weke şervanekî azadiyê biketama nav gelê xwe. Dihizirîm ku divê di nav gel de bi baldarî tevbigerim, xweşik biaxifim, li ser wan bi bandor bim. Belê di nav gel de, ev tiştên girîng in. Divê min ev ti car ji bîr nekirana û timî bi baldarî tevbigerîma. Em ê piştî nîvro bi rê biketana. Bêsebir bûm, min nedikariya di cihê xwe bitebitim.

Paşê em ji gundê herî nêzîk ber bi gundê Şikêftanê ve bi rê ketin. Berf barîbû. Hawîrdor tev berf bû. Tenê rêya karwaniyan vekirî bû.

Em jî di rêya karwaniyan de çûn gund. Dema em ketin li ser vê rêyê, li cem karwaniyên ji aliyê Îranê ve tên yek jî karwaniyekî Bakurî hebû, me ew dît. Dema em dîtin pir kêfa wî hat. Xwe li me hemûyan aland. Piştî ku yek bi yek rewşa me hemûyan pirsî tevî me hat gund. Jixwe ji ber ku wî bi coş û moral em pêşwazî kiribûn em pir kêfxweş bibûn. Her ku em nêzîkî gund dibûn destpêkê dukela sobeyên pêketibûn bi ber çavên me diket. Dema em ketibûn gund pir zêde bi kelecan bûm. Biqasî xuya dibû zilamên gund diyar nedibûn. Hê gelekan ji gundiyan nedizanîn em ketine gund. Yên dîtine jî destpêkê nêzîkî me nebûn. Di her tevger û helwesta wan de diyar bû ku ditirsîn. Cara yekemîn grûbeke gerîla dikete gund. Ya din jî piştî Şerê Başur dibe ku gundî difikirîn em nemane, teslîm bûne. Jixwe armanca propagandaya dewletê hemû ev bû.

Em ê li gorî planlamayê biçûna Katûnaya jêr. Ev gund, gundê çeteyan bû. Ji ber wê yekê em çûn malekê. Me erebe xwest. Lê belê gundî got ku mifteyên erebeyê ne li mal in. Nedixwest mifteyan bide. Piştre hêdî hêdî hemû zilamên gund hatin gund. Em dîtin. Dema dîtin, destpêkê wan jî bawer nekirin. Lê kêfxweş bûn. Paşê xwestin em wê şevê li gund bimînin. Em bûn du grûb. Her grûb çû malekê. Em bi giştî yanzde kes bûn. Sedema herî girîng ku em wê şevê li gund mabûn, ji bo vegotina encamên Şerê Başûr bû.

Li mala ku em çûbûnê gundî dihatin cem me. Her pirs dipirsin. Me jî bersiva wan dida. Ji ber dîtina me pir kêfxweş bûn. Piştî şerê Başur ji Barzanî û Talabanî nefret kiribûn û ji bo wan digotin "îxanetkar". Eleqeya gundiyan pir ez kêfxweş dikirim. Min jî dixwest timî li gel wan biaxifim û hin tiştan ji wan re vebêjim. Lê pirsgirêka min a ziman hebû. Ji ber ku min Kurdî nedizanî min pir xem dikişand. Min qîma xwe tenê bi tiştên dihatin vegotin guhdarkirinê dianî. Em heya derengiya şevê bi gundiyan re axifîn. Ber bi sibeyê em çûn cihekî ji derveyê gund. Ji aliyê ewlekariyê ve wisa hê di cih de bû. Ji derve sar bû. Gundiyan bataniye û bi qasî heya bi êvarê têra me bike erzaq jî dan me. Heya bi êvarê li wê derê îstirehet kir. Em, êvarê ji bo ku biçin gundê Katûnaya Jêr bi rê ketin.

Ev gundekî çeteyan bû. Dê me çekên wan bigirtana û ew bêçek bikirana. Ji ber wê yekê em ê bi awayekî baldar biketana gund, du bi

du - sê bi sê li malan belav bûna û hemû çete bianîna mala mixtêr. Me hemû gundî li mala muxtêr kom kirin. Diyar bû, ji me ditirsiyan. Lê dizanîn em ê bikevin gund. Ji ber ku gundiyên Şikeftanê ji wan re hatina me gotibûn. Ode tije tije bû. Hemû gundî li wê derê bûn. Hevalê Azad dest bi civînê kir. Ji odeyê dengekî herî biçûk jî dernediket. Diyar dibû ku ew dengê gur û geş ê hevalê Azad di cih de li ser hemû gundiyan bandor dikir. Armanca civînê ew bû, şerê Başur, encamên vî şerî, berxwedana me ya mezin, binketina dijmin jiyan kiriye ji gundiyan re bê vegotin. Bi rastî jî axaftin pir bibandor bû. Diyar bû, gundî jî ji aliyê erênî ve bandor dibin. Mixtar Serokê çeteyan bû. Li gel hevalan axifî. Biryar dabûn çekên xwe berdin. Ji me re gotin ku ew ê di demeke herî kurt de çekên xwe li dijmin vegerînin. Vê jî em kêfxweş kirin; piştî ku me bi dilrehetîya di çalakiyekê de encamgirtiye, xwarina wan aniye xwar û em ber bi gundekî din bi rê ketin.

Em çûn gundê M... û wan jî em bi eleqedarî pêşwazî kirin. Di mehên zivistanê de ev cara destpêkê bû ku grûbeke me dikeve nava gel. Dîsa gelê me li propagandayên ku em di Şerê Başur de qediyane bawer kiribû, dema em dîtibûn pir kêfxweş bibûn. Hê zêdetir xwe di nava ewlehiyê de hîs kiribûn. Di her gundê ku em diçûnê de gundiyan bi eleqedariyeke mezin em pêşwazî dikirin. Heta hinekan jî digot ku ew dikarin di vê zivistanê de bi awayekî ewlehî me bixwedî bikin. Lê me qebûl nekir.

Di dawî de em çûn Katûnaya Jor. Ev gund hemû welatparêz bû. Dema em ketin gund, ji me re gotin ku pîrejinek miriye. Em çûn cihekî destdayî û me şeva xwe li wê derê borand. Em dotira wê rojê, hem ji bo sersaxiyê, hem jî ji bo xatirxwestinê cara dawî ketin gund. Destpêkê em çûn mala pîrejina miriye. Kurê wê bi heyranbûneke mezin ev tevgera me pêşwazî kir. Piştî wê em çûn cem milîsê xwe. Piraniya gundiyan li wê derê kom bûn. Hevalê Azad lîsteya hemû pêdiviyên me da gundiyan; ji wan re got ku bila di demeke kurt de pêdiviyên me pêşwazî bikin. Gundiyan jî got ku ew ê di demeke herî kurt de pêşwazî bikin. Hemû heval diaxifîn, bi gundiyan re sohbet dikirin. Min ji ber ku ziman nedizanî, ez zêde nediaxifîm. Lê min hemû fêm dikir. Neaxifîna min bala gundiyan kişandibû. Jina temen

mezin a malê ji hevalê Azad pirsî; “ev heval çima neaxife?”. Hevalê Azad û hevalên din li min mêze kirin û keniyan. Piştî ku gotin, “ev heval bi Kurdî nizane, ji ber ku Tirk e”, ji nişka ve ez bûm navenda balkêşiyê ya gundiyan. Min pir şerm kiribû. Hin gundiyên Tirkî dizanîn li gel min bi çend peyvên dizanîn Tirkî diaxifîn. Min jî, ji bo ku hevalan derewîn dernexim qebûl kir ku ez Tirk im. Bi taybetî kesên temen mezin ên li odeyê gunehê xwe bi min dianîn. Jina êxtiyar got; “ev Tirk di nav we de çi dike? Guneh e. Ma dikare li ber zehmetiyan xwe ragire? Eger bireve hûn ê çi bikin?”. Jixwe li gel hevalê Azad bi Kurdî diaxifî. Wê digo qey ez fêm nakim. Gotina ‘revînê’ qet li kêfa min nehatibû. Heya em ji mal derketin bi taybetî pir baş nêzîkî min dibûn. Sedema herî mezin a vê nêzîkbûnê baş, Tirkbûna min bû. Piştî ku me ji hemû gundiyan xatir xwest em ji gund derketin. Ji bo ku em dîtibûn û me jiyan dikir gundî pir kêfxweş bûn. Em jî ji ber ku bi awayekî germ û bi eleqedariyeke mezin hatibûn pêşwazîkirin kêfxweş bûn. Piştî ku em ji Katûnayê derketin em dîsa zivirîn gundê Şikêftanê. Ev gund cihê me yê dawî ku em ê rêya xwe pê bixin bû. Bi rê de baranê li me kiribû. Heya ku me xwe gihand gund her derê me şilopilo bibû. Em bûn du grûb. Her yek grûb çû malekê. Kebaniya malê piştî em girtin malê di cih de soba pêxist. Me hewl dida em xwe zuwa bikin. Malbateke pir welatparêz bû. Me ji aliyekî ve xwe zuwa dikir û ji aliyekî ve li ser mijara ku gundî çiqas guherîne nîqaş dikir. Hin caran hevalan li min mêze dikir û dikenîn. Dema min got, xweziya weke Tirk bim we ez nedama naskirin, weke ku dilê hemûyan bi min dişewitî, hevalan jî got, “ne girîng e, ew jî kêfxweş bûn, ya din jî ne ku dilê xwe bi te şewitandin, fikirîn ku dibe tu zehmetiyan bikişînî, ew qas. Bila li cem te weke bîranînekê bimîne”. Piştî ku me hinekê xwe zuwa kir me li derûdora sobayê hinekê xwe dirêj kir.

Êdî em ê bizivirîna qampa xwe. Em ê bi awayê du grûban bi rê biketana. Destpêkê dê grûba me bi rê biketana. Lê belê dinya pir ne xweş bû. Gundiyan gotin ku hewce dike em di vê rewşê de bi rê nekevin, neqeb pir xeter e, dema dinya wisa dibe wê neqebê pir berdêl stendine. Lê me digot, hewce dike em biçin. Em nêzîkî saet dehê bi rê ketin. Ji aliyekî ve pir sar bû, ji aliyê din ve bagerek rabibû.

Bager pir bi bandor bû. Li jora gund me bi karvaniyan re hev dît. Ew ji beriya me bi rê ketibûn. Lê ji ber bahozê dîsa zivirîbûn. Ji me re jî gotin “paşve bizivirin”. Lê me di cih de dît, em rêya xwe bidomînin. Her ku me xwe nêzîkî neqebê dikir, hê jî bahoz mezintir dibû. Ji ber ku zêde mij ketibû me nedikarî pêşiya xwe bibînin. Dema em derketin neqebê ji ber şideta bahozê berfê weke guleyan li ser çavên me dida. Me nedikarî ku em nefesê bistînin. Me dixwest em kêliyekê ji beriya kêliyekê xwe berdin dola li jêra neqebê. Lê ji ber mijê me nedizanî dol li kîjan alî ye. Ji ber ku dest pê kir her diçe rewş ber bi xetereyê ve biçe, me biryar da em bizivirin gund. Dema me ji neqebê xwe berdabû gund her derê me bibû qeşa. Her ku em nêzîkî gund dibûn qeşaya li ser me diheliya. Em şilopilo bibûn. Hevalê Azad tevî gundiyan em pêşwazî kirin. Biryara me bi awayekî erênî û dicih de dît.

Wê rojê em li gund man. Me ji zû ve serê xwe neşûstibû. Herî dawî min ji beriya çalakiya Rûbarokê serê xwe şûstibû. Rewşa hemû hevalan jî hema bêje weke min bû. Hemû cilên me di nav qirêj û gemariyê de mabûn, dîsa her derê me tije çete (sipeh) bûn. Dema em li gund bûn di nav gundiyan de ji bo em xwe nexurînin em bi baldarî tevdigerîn. Lê dema sobe pêdiket, hindur pir germ dibû çete jî diketin liv û tevgerê. Me ji kebaniya mala em lê bûn re got, em dixwazin serê xwe bişon. Wan jî di cih de dît. Piştî xwarina êvarê, gotin ku serşo amade ye. Dema çûm beşa serşoyê û min tenê çaydanek ava germ dît, şabûna min di dilê min de ma. Lê min ji şûstina serê xwe dest berneda. Min çaydanek ava germ tevlî bîdoneke ava sar kir û banyoya xwe kir. Jixwe em fêrî bi ava sar banyokirinê bibûn. Piştî serşoyê razam. Ji demeke dirêj e pêde bêyî ku xwe bixwurînim heya bi sibeyê razam.

Dema bibû sibe, li şûna berf û bahoza rojekê berê, dinyayeke vekirî û aram hebû. Me ji vê rewşê sûd wergirt û ji bo bizivirin qampa xwe em bi rê ketin. Ji gundiyan grûbek li cem me hat. Hem ji me re rê vekirin, hem ji cihên aşût bên em bi awayekî saxlem derbas kirin.

Em hêdî hêdî nêzîkî qampa xwe dibûn. Nêzîkî du hefteyan dibû ku em ji hevalan cuda bibûn. Me bêriya hemûyan kiribû. Her ku em

nêzîkî qampê dibûn kelecana min zêde dibû. Tiştê ku min ji hevalan re bigota ewqas zêde bû... Min digo, kêliyekê ji beriya kêliyekê xwe bigihînimê hemû tiştî ji wan re vebêjim. Me ji dûr ve heval didîtin. Dema wan jî em dîtin hemû ji konê nû çêkirine derketin. Bi germahiyeke mezin em pêşwazî kirin. Destpêkê me li gel hevalan hesreta xwe parve kir û me piştre yek bi yek pêşketin ji hevalan re gotin. Dubare dîtina hevalan pir tiştekî baş bû.

Jiyana me ya qampê hêdî hêdî sererast dibû. Lê pirsgirêka me ya erzaq hebû. Ji ber ku pir berf barîbû gundiyan nedikarîn erzaqê me bînin. Erzaqê di destê me de jî pir kêm bû. Piştî me grûbeke din jî çû hindurê welat [Bakur]. Em ên ku mayîbûn me aliyên kêm ên qampê temam dikirin. Her roja derbas dibû tinebûna erzaq xwe dida hîskirin. Ji ber vê yekê me erzaqê di destê xwe de bi îdare bi kar dianî. Hem Îranê, hem KT'ê bihîstibûn em li vê derê bi cih bûne. Heta di rojnameyên wan de bibû mijar jî. Ji ber berfê operasyoneke ji bejahiyê zehmet bû. Lê ji bo êrîşên hewayî derfetên wan hebû. Ji ber wê yekê me dest pê kiribû em stargehan ji xwe re çêbikin.

Li gorî agahiya dawî ku ji me re hatibû, dihate xwestin em derbasî Zagros bibin. Diviyabû em demekê ji beriya demekê derbasî Zagros bibin. Ji ber ku grûbeke me çûbû hindurê welat piştî ku me ji bo wan grûbek hişt, li ser esasê derbasî Zagros bûnê me dest bi amadekariyê kir.

**Li Zagrosê Jiyan Cuda Ye!**

Quryeyên me hatibûn. Em ê biçûna Zagros. Sermayeke zuwa hebû. Me hê nû li vê qampa xwe jiyan sererast kiribû, lê em ê niha biçûna Zagros. Me digo, xweziya derfet hebûna em li vê derê bimana. Lê hem ji ber ku erzaqê me tine bû, hem ji bo ewlekariyê em neçar bûn biçin.

Piştî rêwîtiyeke dûr û dirêj em hatin gundêkî li biniya Zagros. Piştî ku me li gund hinekê îstirehet kir em ber bi konan ve bi rê ketin. Ji hatina me agahiya hevalan hebû. Hemû ketibûn îştimayê. Em bi awayekî germ pêşwazî kirin. Li vê derê, berê amadekariya me kiribûn. Konê ku ji bo me çêkiribûn pir xweşik bû. Li gel hevalan me zêde zêde sohbet kir, me rewşa welat, rewş û morala gelê me ji bo hevalan vegot. Dema ev pêşketinên êrênî bihîstin pir kêfa wan jî hat. Paşê me bêhna xwe veda. Hevalan ji ber ku em westiyayîbûn dereng em şiyar kirin. Em baş ji xewê têr bibûn. Piştî taşteyê li gorî derfetên hene hevalan pêdiviyên me pêşwazî kirin. Hevalên derbasî welat bibûn jî hatin. Bi vî awayî bolîka me dîsa komî ser hev bû. Bolîka me li konê jor dima. Bolîka din jî nîv saet dûrî me li konên jêr dima.

Her roja derbas dibû em fêrî qampa xwe ya nû dibûn. Hin rojan bagerek pir mezin radibû. Dema dibû bager me nedikariya derkevin. Di ser hatina me re demeke kurt derbas bibû, bagerê mutfaxa me hilweşand. Piştî ku bager sekinî, me ji xwe re mitfeqekeke nû çêkir. Li vê derê zêde kar tine bû. Hemû jiyana me di nav konê de derbas dibû. Me li gorî derfetan perwerdeya xwe didît. Kar û xebata me tenê ew bû ku em berfa bagerê aniye, ji ser kona xwe biavêjin. Tebî her ku me diavêt jî, bagerê berfa me avêtiye dîsa dianî. Bagerê êdî berfa li ser girên bilind komî dolan dikir. Ji ber ku ava me qut bibû, me berf bi kar dianî. Dema ku konek têra me nekiribû me cihekî rêveberiyê û mitfeqê çêkir.

Sala nû hatibû. Ji bo me wateyeke sala nû hebû. Ji bo ku em bi şiklekî bihêz û xwediyê moral bikevin sala nû em amadekariyên xwe zêde dikin. Di her sala nû de em hewl didin bi awayekî bêrehm biçin ser hemû aliyên xwe yên neyînî û bihêz bikevin wê salê. Ji bo me dê wateya sala 1993'yan hê cuda bûya. Wê rojê me jî di navbera xwe de amadekariyên sala nû kir. Hin hevalan li mitfeqê tatlî çêkirin. Me bi

moraleke baş sala xwe ya nû pîroz kir. Piştî ku bernameya me ya sala nû qediya hemû heval razan. Ez, hevalê Bawer û Selîm, em çûn mitfeqê. Em weke mitfeqçî ketin sala nû. Li qampê, me nanê xwe bi şevê derdixist. Heya bi sibeyê me nan derxist. Me bi papûran li ser gazê kar dikirin nanê xwe dipêjand. Bi van nan pêjandin qet jî hêsan nedibû. Ya din jî hin caran ditemirîn. Ji nû ve pêxistin jî pirsgirêkeke cuda bû. Li vê qampa me karê herî zehmet nanpêjî û xwarinpêjî bû.

Me wê rojê bi awayekî bi serketî erka xwe ya mitfeqê temam kir. Êdî jiyana me hêdî hêdî bi rêkûpêk bibû. Xebata me ya perwerdeyê dest pê kiribû. Me dê li gorî çarçoveya plansaziya navendî ya Partiyê, bi komisyonên ku me ji nav xwe hilbijartine perwerdeya xwe bidomanda. Hema bêje hemû hevalan di komisyonan de cihê xwe distendin. Pirsgirêkên me yên lojîstîkê jî tine bûn. Hemû pêdiviyên me ji berê de hatibûn pêşwazîkirin, bi şiklekî xurt amadekariyên me hatibûn kirin. Hin caran pêdiviyên me, rojane ji aliyê gundiyan ve dihatin pêşwazîkirin. Li vê derê tengasiya herî mezin, rabûna bagerê û tinebûna gazê bû. Ti kesî ji me ji bagerê hez nedikir. Jiyana me ser û bin dikir. Hema bêje gazê mora xwe li hemû jiyana me dabû, sobayên me, papûrên me hemû li ser gazê bûn. Dûkela wê jî, bêhna wê jî pir ne xweş bû. Bi ser de jî dema rêya ava me jî ji aliyê berfê ve hatibû xerabkirin, em jî fêrî ava berfê nebibûn.

Ji Rojhilatê Kurdistanê hin caran rojname û kovar ji me re dihatin. Talîmatên Serokatiyê ji bo me bi rê dikirin. Rojekê dîsa ji me re kovar û rojname hatin. Hemû hevalan dixwend. Hejmara taybet a serxwebûnê jî hatibû. Di vê hejmarê de şehîdên 1992’yan cih girtibûn.

Dîrokê 7’ê Çileyê nîşan dida. Wê rojê di hindurê min de weke ku ecziyek hebû. Min nedizanî ku ka çavkaniya vê ecziyê çi ye. Piştî taştê, ji bo li kovarên hatine binêrim çûm rêveberiyê. Min digo, ez ê hinekê çav li kovaran bikim û eczbûnê ji ser xwe biavêjim. Min destpêkê li rojnameyan mêze kir. Tiştekî bala min bikişîne min peyda nekir. Li cihê rêveberiyê tenê hevalê Zerdeşt hebû. Hejmara taybet a Serxwebûnê da min, got, “li vê binêre, dibe ku tê de hevalên şehîd ên ku tu nas bikî hebin”. Min jî di cih de girt. Te digo qey yek ji min re dibeje, “zû veke”. Hêdî hêdî min rûpel qulupandin. Şehîdên Botanê

bûn. Hê hevalên nas derneketibûn. Dor hatibû şehîdên Bestayê. Dîsa min li fotoxrafan mêzê dikir. Piştî ku min yek-du rûpel qulupandin ji nişka ve weke bêje cemidîme di cihê xwe de req bûm. Fotoxrafê Cewahîr jî di nav de hebû. Hem jî li min mêze dikir. Di wê kêliyê de min nedizanî çi bikim. Min li wî temaşe dikir, wî li min temaşe dikir. Piştre min dest pê kir nivîsa li binê fotoxraf bixwînim. Tam par îro (7'ê Çileya 1992'yan) di encama êrîşa li ser Bestayê ya komara faşîst a Tirk de tevî çar hevalên xwe şehîd ketibû. Tam di ser şehadeta wî re salek derbas bibû. Piştî ku min nivîs xwendibû min di jiyana xwe de êşa herî mezin dikişand. Belê birayê min şehîd ketibû. Lê min xeyalên çiqas cuda dikirin. Rojekê me dê hev bidîtana û min ê bigota, "min jî daye ser şopa we û bûme hevalê we". Me dê bi çekên xwe wêne bikêşanda. Dema ez wisa dihizirîm rondikên min li ser rûpelên pirtûkê diketin. Paşê min yek bi yek rûpelên kovarê qulupandin. Dema min rûpel diqulupandin jiyana hevalê Cewahîr weke şerîdekî film di ber çavên min re derbas dibû.

Dor hatibû şehîdên Dêrsimê. Piştî ku min çend rûpel qulupandin serenivîseke bi şiklê 'Şehîdên Qereqoçanê Bêmirin in' bi ber çavê min ket. Weke ku yek ji min re bêje "baş li wêneyên van şehîdan binêre"... Min li fotoxrafan mêze kir. Tiştekî diviyabû min nedîta, pêkhatina wê ne gengaz e bû. Ji nişka ve wisa li min hat, rondikên min ên bi şiklekî bêdeng dihatin xarê, li ser rûyên hevalê Sertaç ku li pêşberê min bû diketin û rûye wî bi rondikan dihate şûstin. Dema min bi xwe nedikariya û rondik dirêjandin, wî li min dinêrî û di bin lêvên xwe re dibişirî. Hê ji beriya çend deqîqe yan min agahiya şehadeta hevalê Cewahîr wergirtibû. Niha jî min agahiya şehadeta hevalê Sertac werdigirt. Di wê kêliyê de weke ku hemû giraniya cîhanê hatibû ser milê min. Piştre min hinekê hewl da nivîsê bixwînim. Dema min dixwend lêvên min direcifîn. Tam meh û nîvekê piştî Cewahîr di 22'yê Sibatê de hevalê Sertac tevlî karwana şehîdan bibû. Li Qereqoçana ku zivistaneke giran jiyan dikir, kesekî îxanetkar dema ew ji bo demeke kurt li malekê diman wan îxbar dike. Şeş hevalên me bi hev re li dijî artêşa dagirker a Tirk nêzîkî du saetan şer dikin, piştre dijmin bi top û çekên giran êrîşê malê dike û şeş hevalan jî şehîd dixe.

Bêyî ku ti tiştî bêjim ji rêveberiyê derketim. Ji dûrî konê, çûm li serê kupikekî rûniştim. Û min dest pê kir li ser birayên xwe bifikirim. Ji bo min çiqas zehmet bû, nikarim bînim ziman. Diviyabû min di wê rewşê de çi bikira? Di deh deqîqeyan de fêr dibûm ku du birayên min şehîd ketine. Ji vê hê girantir êşek tine bû. Min qet nekarîbû bifikirim, dibe ku ew jî şehîd bikevin, timî min tiştên cuda difikirî. Min digo, em ê ji nişka ve hev bibînin, ez ê xwe li wan bialînim hemêz bikim û em ê ji hev têr bibin. Min dixwest bi vê bawer bikim. Êdî ez ê ti car wan nebînim, nikaribim têra xwe wan hemêz bikim. Lê diviyabû min qebûl bikira. Ew şehîd ketibûn. Min wêneyên wan dît. Diviyabû min bawer bikira. Gelo nedibû ku şaşitiyek qewimîbe? Ne mimkun bû. Ji ber ku wêneyên her duyan jî hebûn. Belê, neçar bûm qebûl bikim. Her du jî şehîd ketibûn. Êdî ala berxwedanê teslîmî min û hevalê Ercan bûyibû. Ya diket li ser milê me, al parastin û timî ew bilind ragirtin bû. Piştre ji cihê xwe rabûm. Çûm cihê konê, di cih de min xwe xiste nav bataniyeyekê. Min her timî ew difikirîn. Her ku dihizirîm jî min êş dikişand û li dijî dijmin kîna min mezin dibû. Hevalan fêm kiribûn ku tiştek heye. Hin hevalan dipirsî ku çi qewimiye. Min jî digot, ti tişt tine ye, tenê hinekê serê min diêşe û weke ku giraniyek ketibe ser milên min.

Demeke dirêj min nekarîbû bi ser xwe ve bêm. Êdî min hemû dema xwe bi hizirîna li ser wan derbas dikir. Hin caran diçûm Besta, hin caran diçûm Qereqoçanê. Hin caran bi wan re diaxifiyam. Êdî min bi xwe dayibû qebûlkirin, diviyabû bi awayekî rast nêzîkî şehadeta wan bibûma. Çawa dikarim bibim birayekî layiqê wan, çawa dikarim ji dijmin tola wan rakim, çawa dikarim di jiyanê de bi awayekî rast wan temsîl bikim? Ya pêwîst bû ez bikim, êdî ev pirs rast bersivandin bû. Min digo, bila kêliyekê ji beriya kêliyekê bihar bê. Bila bihar bê da ku şerê me gur û geş bibe, çalakiyên me zêde bibin, ez jî tevlî van çalakiyan bibim û tola xwe bistînim. Belê, diviyabû min sebr bikira, dê bihar bê, şerê me mezin bibe. Nexwe diviyabû demekê ji beriya demekê min xwe amade bikira. Her roj dibûn mêvanê xewna min. Ew çavkaniyên jiyana min in, çîçekên min ên biharê ne. Divê ez ji vê bi şûnde ji her tiştî wan biparêzim, ji

îxanetê, ji elçaxan, ji dijmin. Wê demê dibe ku ez karibim bibim layiqê wan.

Piraniya hevalan rewşa min fêr bibûn. Wan jî ji kovarê xwendibûn. Di demên dawî de noqî nav bêdengiyê bibûm, êdî min piraniya dema xwe bi fikirînê derbas dikir, mayîna bi tena serê xwe ji bo min rehetir dihat.

Perwerde didomiya. Lê min nedikariya zêde tevlî perwerdeyê bibim. Ji aliyekî ve min hewl dida xwe komî ser hev bikim, ji aliyê din ve jî li hêviyê bûm ku bihar bê.

**26'ê Çileya 1993'yan**

Sibeyê em bi dengê hevalê nobedar ku dibêje "îştima, îştima" rabûn. Mijara rakirina me ji aliyê hevalê nobedar ve pirsgirêkek e. Weke her roj, piştî ku ji ser her hevalî du-sê caran bataniye rakir, me karîbû encax rabin. Bagera ku ev sê roj in didomiya hê jî girantir bibû. Di rewşên wisa de me nedikariya li derve îştimayê bikin. Me di hindûrê konê de îştimaya xwe kir. Piştî taşteyê taxima din jî hate konê me. Konê me di heman demê de bi rola dibistanê jî radibû. Di saet heştê sibeyê de me dest bi perwerdeyê kir. Di nîvinga dersê destpêkê de hevalek kete hindur. Ji komisyonê destûr girt û got, "hevalê Zerdeşt dixwaze bi lezgînî du heval bên". Du heval çûn. Ji kelecan û lezûbeza heval xuya bû ku tiştek heye. Kêm mabû ku beşa danê sibeyê ya perwerdeya me biqede, her du hevalên çûne zivirîn. Ji ber bagerê, her derê wan qeşa girtibû. Porê wan ji berfê sipî bibû. Ji bo mirov fêm bike ku bager çendî mezin û giran e li rewşa wan mêzekirin bes bû. Yek ji hevalan nêzîkî komîsyonê bû, di ber guhê wî re hin tişt gotin, piştre çû li goşeyekî rûnişt. Dema perwerde qediya hevalê ji komîsyonê berpirsiyar got, "hevalê Sebriyê li bolîka jêr ji ber nexweşiyê vê sibeyê şehîd bûye. Piştî nîvro dê merasîm bê lidarxistin. Niha em ê ji bo bîranîna şehîdên xwe deqîqeyekê rêz bigirin". Di kêliya rêz girtina ji bo şêhîdan de timî li ser şehîdên me fikirîm. Ji nişka ve wêneyên hevalê Cewahîr û Sertac hatin ber çavên min. Min dixwest ti car neqede, ez timî di rêzgirtinê de bisekinim. Lê dê biqedîya. Jixwe xelas bibû. Ya girîng şehîd dan jiyîn bû.

Piştî nîvro em hemû amade bûn. Em ê ji bo merasîmê biçûna bolîka jêr. Bagerê ji giraniya xwe ti tişt kêm nekiribû. Bi meşa yek rêzê me xwe berda cihê bolîka jêr. Dema em nêzîkî konan bûn hevalê Batal ala ARGK'ê bi serê qernasa xwe ve kir. Ji ber bayê al pir xweş dihêjiya. Bi şiyarên 'Şehîd Namirin' em derbasî cihê merasîmê bûn û ketin îştimayê. Hevalan, bi xweşikî hevalê şehîd di nav baranî de pêçandibûn. Piştî ku ser şehîd bi ala ARGK'ê hate nixumandin bi talîmata hevalê Zerdeşt, ji bo hevalê şehîd me deqîqeyekê rêz girt. Paşê li ser jiyan û şehadeta şehîdê me, axaftineke kurt hate pêşkeş kirin. Piştre me şehîdê xwe veşart. Em dubare vegerîn konên xwe. Heval di cih de kom bûn. Li ser wateya jiyan, têkoşîn û girîngiya şehadeta heval axaftin hatin kirin. Heval ji berê de nexweş bûye, lê nexweşiya xwe ji hevalan re negotiye, hiziriye ku nexweşiya wî ji bo hevalan dibe asteng. Di du rojên dawî de nexweşiya wî giran bibû. Lê bagera ku sê roj in nehiştiye em derkevin, fersend nedaye ku em hevalê xwe bibin nexweşxaneyê û heval şehîd ketibû. Erka herî mezin ku li ser milê me diket, têkoşîn ji cihê şehîdan hiştiye dewr girtin û mezin kirin bû. Ji bilî vê em nikarin girêdana xwe ya bi şêhîdan re bînin cih. Tenê yek rêya girêdana bi wan re heye, ew jî mezinkirina têkoşînê ye.

Êvarê dîsa dora nan pêjandinê ya min bû. Ez, hevalê Mehsûm û Zinar, em nanpêj bûn. Dîsa papûr nedixebitîn. Tenê yekê kar dikir. Hevalê Zinar hewl dida berfê bîne û bike av. Hevalê Mehsûm zendên xwe heya bi enîşkê hilmaliştibû, bi wan destên xwe yên çors hevîr dikir, min jî papûrên xerab bûyî tamîr dikir. Ji ber ku naylona me yê ser mitfeqa me qetiyabû, piraniya berfa ku bayê dianî diket hindur. Me karibû ji çar papûrên di destê me de tenê duyan bi kar bînin. Yek jî timî pêdiket û ditemirî. Dema bi papûrê mijûl bibûm her derê min bibû tenî. Dumana papûrê mirov dixeniqand. Hemû hevalan ji vê dukelê nefret dikir. Ji ber wê yekê ti kesî nedixwest bibe nanpêj yan jî xwarinpêj. Yekane rêya ji van rizgarbûnê kêliyekê ji beriya kêliyekê hatina biharê bû.

Me heya bi derengiya şevê nan pêjand. Heya me qedand jî em wêremî bûn. Ji aliyekî ve berfa diket hindur, ji aliyekî ve jî papûrên pêdiketin û ditemirîn... Lê tevî van tiştan me karê xwe qedand.

Hevalê Zinar di cih de çû û raza. Ez û Mehsûm, me dê av germ bikirana û serê xwe bişûstana. Me çaydan tije berf kir, em li bendê man da ku bihele. Dema hêdî hêdî av germ dibû, me her carê derve qontrol dikir. Bayê ji hêza xwe tiştek kêm nekiribû. Min ji Mehsûm re got, em serê xwe neşon, em tenê serçav û destên xwe bişon bes e. Ew jî kenî û got, "ez jî heman tiştî difikirîm. Di vê sermayê de kî dê serê xwe bişo!". Piştî ku ava me germ bû, me bi lezûbez dest û serçavên xwe şûstin. Em bi lezûbezeke mezin çûn konê. Me li ber sobaya pêketiye hinekê xwe germ kir. Piştî ku min cixareyek kişand, min li derûdora sobayê xwe dirêj kir. Li ser şehîdan hizirîm. Min di ber xwe re got, êdî bêdengî tine ye, qîrkirin heye. Hem jî weke ku çiyan ji binî ve bihejîne.

**30'ê Çileya 1993'yan**

Ji ber ku bataniyên me kêm bûn min li cem sobayê xwe dirêj kir. Aliyê min ê sobayê bi têhna sobeyê pir germ dibû, aliyê min ê derî jî bi bayê ji derê tê qederekê diqerisî. Du roj in îştimaya me ku me li hindur dikir me îro ji derve kir. Dema em li îştimayê bûn destên min ewqas diqerisîn min go, dê qut bibin. Libên berfê bi hêza ji bayê digirtin weke derzî di dest û serçavên min re diçûn. Çawa ku îştima qediya hema bêje weke êrîş bike, me xwe gihand kon. Sobaya me ya di hindûr de qederekê hindur germ dikir. Hema derbasî wî aliyê sobayê bûm û rûniştim. Di demên dawiyê de timî cihê min ew der bû. Jixwe hevalan digotin ku ew der li ser min tapo kiriye. Bi piranî ti kes li wê derê rûnedinişt. Çend roj bûn, dema dibû navbera dersan li gel hevalan timî bi Kurdî diaxifîm. Biryara min temam e di vê pêvajoya zivistanê de Kurdî bi temamî fêr bibim. Hevalan jî alîkarî dida. Fêrbûna Kurdî ji bo me pêdiviyek e. Dema em diketin nav gelê me, Kurdî weke pêdiveyeke mezin derdiket pêş. Dema em destpêkê ketin Şemzînan gava hemû heval bi Kurdî diaxifîn, ez bêdeng dibûm. Vê jî ez xemgîn dikirim. Li dêvla di nav gel de qîr bidim bêdeng dibûm. Ji bo ku di nav gel de biaxifim, ji bo bikaribim hest û hizirên xwe vebêjim ez ê di demeke herî kurt de bi alîkariya hevalan jî bi Kurdî fêr bim. Dema beşa danê sibê yê perwerdeya me qediya, me danekî navber da perwerdeya xwe. Êvarê morala bolîkê hebû. Yanî şeva me

ya çandê. Em panzde rojan carekê şevên wisa li dar dixin. Her deqîqeya me, her roja me hemû moral e. Her hevalê me bi serê xwe, moralek e. Her heval li gorî qebîliyeta xwe ji bo vê şeva çandê hin tiştan amade dike û tevlî şevê dibe. Ji ber vê yekê şeva me ya çandê qederekê dewlemend derbas dibe.

Piştî xwarina nîvro, ji bo em gazê bînin me xwe berda bolîka jêr. Îro tav derketibû. Lê dîsa ba dihat. Bayê dihat li ber têhna tavê dibû asteng. Hevalan hêdî hêdî ji bo moralê xwe amade dikir. Hevalê Rênas jî yek ji wan hevalên ku ji bo moralê xwe amade dike bû. Skêçek amade dikir. Ji bo vê skêcê li êşkencekerekî digerî. Bi nazenînî nêzîkî min bû û got, "hevalê Mordem ji bo skêca me êşkencekerek pêwîst e. Hinekê tîpê te ji bo vê destdayî ye". Min jî bi ken bersiva wî da; heval, heya bi îro çend moral hatine çêkirin, we yan rola ajanan, yan rola xayînan û yan jî rola subayan daye min. Ez ê êdî di van rolan de neleyîzim. Bi rastî jî rolên wisa min ditirsînin. Di encam de min daxwaza wî qebûl nekir. Li ser vê yekê, ji ken zikopişto bû. Heman daxwaz ji hevalê Amed jî kir. Wî ji ber heman sedeman qebûl nekir. Jixwe min û Amed bi hev re biryar girtibû. Me got, eger tu rola sereke bidî me em ê bileyîzin.

Piştî xwarina êvarê me dest bi morala xwe kir. Bi axaftina hevalê Azad a li ser girîngî û wateya şevê dest pê kir. Bi stranên di moralê de hatine gotin em li hemû Kurdistanê geriyan. Dîsa stranên bi Erebî, Almanî û Tirkî hatine gotin jî, şeva me rengîntir kirin. Enternasyonalîzmê di şeva me de de jî xwe da der. Hin hevalan bi skêcên kurt morala me dewlemend kirin. Me wêne kêşandin. Dîsa luksa ku ji konê din hatibû anîn weke şewqa tavê be, kon ronî dikir. Me di konê xwe de lampe bi kar dianî. Şewqa wê ewqas kêm bû, me nedikarî serçavên hevalên li goşeyan rûdinîn bibînin. Lê luks her der ronî kiribû. Piştî ku me şeveke pir xweş derbas kir, taxima jor bi komî çûn konê xwe. Ya herî bi tendirustî bi hev re çûyîn bû. Konê wan ji me sed metro dûr bû. Lê di rojên bi ba û bager ên wisa de mirov li Zagrosê, di deh metroyan de jî dibe ku wenda bibûya. Dema bi hev re çûyîn pêk dihat pêşî li vê dihate girtin.

Ez dikarim bêjim di rojên dawî de hinekê bi ser xwe ve hatim. Heval jî qederekê alîkarî û destek didin min. Êdî min dest pê kiriye

ku derxim zanebûnê, pêwîst e li ser esasekî rast nêzîkî şehadetan bibim û li gorî wê helwest bi pêş bixim. Hevalê Sertac û Cewahîr timî dibin mêvanên xewnên min. Hêviya min ew e, ez ê îşev jî di xewna xwe de wan bibînim. Di xewnê de ew dîtin tiştekî pir xweş e. Berê timî ji min re bûn pişt û alîkarî dan min. Niha jî heman hêz û alîkariyê didin. Êdî ji wan cesaretê distînim, dibin çavkaniya min a hêzê.

Her bijî şehîdên me ku ji bo Kurdistaneke azad û serbixwe xwe feda kirine!

**9'ê Sibata 1993'yan**

Çend rojên dawî bager cihê xwe hin caran ji berfê re, hin caran jî ji tavê re dihêle. Dema tav derdikeve, em hemû ji kon derdikevin, xwe didin ber tavê. Hin caran jî em bi berfê dilêyizin. Heta em hin caran guleş digirin. Di nav berfê de guleş girtin kêfxweşiyeke cuda dide mirov. Êdî xuya dibe jiyana bi konekî biçûk sînordar e hemû hevalan ecz dike. Ji bo ku kêm be jî vê ji ser xwe biavêjin serî li leyîstokên wisa didin.

Eger li Zagros hinekê dinya germ be divê tu jê sûd werbigirî. Êdî em hewl didin bi şiklekî herî baş ji vê sûd wergirin. Ji ber ku ne diyar e ka tav ê kingê cihê xwe ji bagereke bi xof û xeter re bihêle. Her kêlî dibe ku dinya têkbiçe. Dema dibe ba û bager, li cem xwe berfê jî komî dolan dike. Dema tu ji konê derdikeve, her kêlî fikra te ew e ku tê bixenikî. Bi zehmetî mirov bêhn dide û distîne. Dîsa, her ku ba lê zêde dike, dengên konê me derdixe qet jî li kêfa mirov naçe. Tu dibêjî qey kon parçe parçe dibe. Tevî her tiştî jiyana me bi kêfxweşî û moral dibore. Mirov ji sohbetên me yên şevê têr nabe. Sohbetên şevê li dijî sermaya Zagrosê dermanê herî baş e. Em her şevê van sohbetên xwe bi pêş dixin.

Ji ber tinebûna av û gazê ne em dikarin xwe bişon, nê jî cil û bergên xwe. Cilên li ser me ji ber qirêj û gemarê, rengên wan nediyar bûye. Ji ber teniya papûrê reş bûne. Dîsa, pir jî req bûne. Hin hevalan digot; "dijmin li operasyonan cil û bergên gule derbas nakin li xwe dike, em jî bi saya qirêjî û gemariyê bûn xwediyê cil û bergên gule derbas nakin". Hevalêkî me nekarîbû xwe ragire û cilên xwe yên gule

derbas nakin şûst. Piştî zuwa kir û li xwe kir, bala hemû hevalan dikişand ser xwe. Me her duyan xwe da tenişta hev. Min carekê li xwe, carekê li wî mêze kir. Ew diteyisî. Ez jî weke karkerekî di kana madenê de dixebitiya bûm. Her ku min li cil û bergên wî mêze dikir, min hê baştir didît ku cilê min çiqas zêde qirêj bûne. Lê dema min li hevalên pêşberê xwe mêze dikir, cil û bergên wan jî weke yên min, cilên tev biqirêj û gule derbas nakin bûn. Ev rewşa hevalan ji min re wisa xwezayî dihat, te digo qey hemû cil û berg li sûkê wisa tên kirîn û firotin.

Em li derdora fanusê me yê ku bi qasî mûmekî derûdora xwe ronî dike kom bûne û nîqaş dikin. Cama fanusa me bibû du qet, jorê wê ji ber teniyê reş bibû, jêra wê jî derûdora xwe bi qasî mumê ronî dikir. Dema hevalên cixare dikişandin çaxmaxa xwe pêdixistin, şewqa wê derûdor baştir ronî dikir. Dibû sedem ku em hevalê di tariyê de nabînin bibînin. Ruxmî vê, li ber şewqa mûmê, heval ji nivîsandina hin tiştan li ser deftera xwe paşde jî nediman.

Em hin caran nikarin dengê hevalên diaxifin fêm bikin. Ji ber ku bi şideta bagerê laylona konê me ku radibû û rûdinişt dengekî wisa nebaş derdixist, em nikarin ji ber vî dengî, dengê hevalan bibihîzin. Ji me ti kes ji vê bagerê hez nake. Weke dijmin e. Lê nikare çavên me bişkîne. Di dawiyê de, yê têkdiçe timî dibe bager. Bi taybetî dema em bi şevê diketin nav bataniyeyan, her hevalî bataniye bi xwe ve dijdand û li şûna balgîfê, çenteyê xwe bi kar dianî. Her çendî bêdengiya şevê ji aliyê ba û laylon ve dihate xerakirin jî, di şevên wisa de dema diketim nav betaniyê de min ev deng weke dengê çûkên ku di biharê de, li daristanan, serê sibeyan awazên Rodrîgo Bethoven dijenin, weke ava ku dike xuşaxuş û diherike, hewl didim bi vî awayî razêm. Qederekê jî sûda wê dibû. Hin caran jî qet xew bi çavên min nediket. Tu dibêjî qey ji bo ku ez nerazem, nerehet bibim, biwestim ev deng derdiket. Wê demê min weke dengê balafirên ku her roj tên Xakûrkê bombebaran dikin yan jî hewanên PDK'ê yên ku weke guhên mirov ker bikin bi dengekî mezin diteqin be, bi wî dengî dihizirî, jê re kîn digirt û jê neftet dikir. Lê ji aliyê din ve jî, em ji ber ku li dijî wê bêyî ku çavên xwe bişkînin jiyan dikin û jiyanê digihînin zîrveyên Zagros, kêfxweş dibim. Li beramberê zehmetiyan bêyî ku xwe bitewîne, jiyîn, jiyana herî xweşik e.

**15'ê Sibata 1993'yan**

Dîsa, çûbûm cihê xwe yê her roj, pênûsa xwe xistibû destê xwe, min ê rûpelên spî yên lênûsa xwe binivîsanda; ez ê îro li ser rûpelên sipî yên lênûsa xwe, hest û bendewariyên min ên ku min bi axaftinê nekariye vebêjim, hezkirinên min ên hesretên min parve dike, razên min ên veşartî dizane, dilê min hênik dike, bi kurtasî li gel min jiyana min parve dike, girêdana xwe ya bi biharê re binivîsim.

Heya bi doh jî me li ber ronahiya fanusa me ku bi qasî mumekê derûdora xwe ronî dike şevên xwe diborandin, lampaya me ku îro nû hatiye hê zêde derûdora xwe ronî dike. Bi saya şewqa lampayê ez îro hevalên li goşeyan jî baş dibînim. Hin heval di nav bataniyeyê de dest bi sohbetê kirine, hin heval ji mêj ve ketine xeweke kûr, çend hevalan jî li cem min li derûdora lampayê li hev kom bibûn, pirtûkek ku curên mayînan û awayê çêkirina wan vedibêje dixwend. Pirtûk bi Erebî bû. Hevalê Sîpan dixwend, piştre ji hevalên din re vedigot.

Ji bo ku mirov bikeve konê me pêwîst e ji du deriyan bibore. Navbera deriyê destpêkê û deriyê duyemîn em ji bo lojîstîkê bi kar tînin. Ji beriya em bikevin hindur em pêlavên xwe li vê derê derdixin û dikevin hindur. Dîsa, derûdora deriyê duyemîn bi laylonê hatiye girtin. Em bi vê beşê derketina derve ya têhnê asteng dikin. Qederekê jî sûda wê dibe. Lê ji ber ku laylon di cihê digihêje dîwêr de qetiyaye, hewaya sar a ji derve tê ji vê derê dikeve hindur. Û dibe sedem ku ew alî sar be. Dema aliyekî laşê me bi têhna sobayê germ dibe, hewaya sar ku ji aliyê laylonê qetiyayî tê aliyê min ê din dicemidîne, bi avêtine bataniyeyan bi ser xwe de hewl didim ji sermayê xwe biparêzim.

Bihar evîn e. Ez jî wisa bi hesreta vê evînê me, nikarim vebêjim. Niha min hemû hebûna xwe daye ser milên sebirê û wisa li bendê me ku bihar bê. Bila bihar bê da ku kîna kom bûyî, êşên hatine kişandin, hesreta ji bo gel, evîna ji bo zîrveya çiyan, evîna ji bo xwezayê, hesreta ji bo qurtek av biqede. Her roja derbas dibe kîna min a ji bo dijmin, nefreta min, hêrsa min a tolstendinê zêde dibe. Her roj soz didim hevalê Sertac, hevalê Cewahîr û hemû hevalên şehîd; ez ê rêya we bişopînim, tola we bistînim, tenê bila bihar bê. Dizanim bihar dê bê, hem jî di demeke nêzîk de. Min cara destpêkê hemû zivistan li

çiyayên Kurdistanê, dibe ku ji xwezaya Kurdistanê ya herî bêrehm be yanî li Zagros ku bi gotina Kurdên Îranê heya bi niha ti mirovan li wê derê jiyan kirin neceribandiye, yanî li Dalamper derbas kir. Li Zagros zivistan cuda ye. Dîsa jî nekariye çavên me bişkîne. Kîna me hê zêde kiriye, em kirine evîndarê jiyanê. Hesreta me ya ji bo biharê zêde kiriye.

Û ez ê cara yekemîn e bi hemû xweşikiya wê, biharê li çiyayên Kurdistanê biborînim. Li Kurdistanê demsalên havîn, payîz û zivistanê pir xweşik in, jê her yek xwediyê xweşikbûneke cuda ye. Ya din jî ji bo gerîlayekî bihar hê bi wate ye. Helbet dê ji bo min wateya wê pir cuda be. Ava berfê ku dihelê dê di newalan de bi cih nebe, bifore, ez ê jî vê yekê li zîrveyên çiyan bişopînim. Bawer im ev kêfxweşiyeke pir zêde mezin e. Ez ê hin caran wan avan qut bikim û derbas bim. Ya din jî em ê ji helandina berfê û ava wê vexwarinê rizgar bin. Ez ê wan avên sar ku lêvên mirov diterikînin vexwum û kîn û hêrsa dilê xwe hênik bikim. Ez ê laşê xwe ku min nekariye ji sê mehan vir de bişom, bi wan avan bişom û qirêjî û gemariya sê mehan ji ser xwe biavêjim. Û ya herî girîng jî em ê bi biharê re derbeyên bihêz li dijmin bidin.

Bihar dê bibe destpêka pêngava me ya xurt, bihar dê me bigihîne gelê me. Ez ê gelê me ku li rûyên wan hesret mayî me bibînim. Wisa bi hesreta dengê zarokên biçûk im, wan hemêz bikim, ji wan hez bikim û wan maç bikim. Ji bo ku ji wan re pêşerojeke azad bê afirandin divê em şer bikin.

Divê ew li welatekî azad bijîn. Divê welatekî Hêlîn, Memo, Evîndar, Sîdar jî hebe. Evîna min a ji bo lûtkeyên van çiyan bibû deh qatî. Li qampekî bi sê konan sînordar mayîn, ji dûr ve ew şopandin, xwe negihandina wan êş dida. Li lûtkeyan li geliyan temaşekirin, li kesên tên û diçin ji dûr ve temaşekirin, şewqa bajaran temaşekirin, dema bayekî hênik dihat bi şevê agirekî mezin ê gerîla kirin û çay çêkirin û hinava xwe pê germkirin, dema li derûdora agir mirov xwe dirêj dike stêrkên li azmanan jimartin dibe ku karê cîhanê yê herî kêfxweşî dide mirov be. Tenê bila bihar bê bes e. Bi hêza ku em ji van xweşikiyan distînin em ê li dijminê ku van xweşikiyan talan dike, tine dike, li me dike jahr derbeyên wisa lê bidin, ew ê firsendê nebîne

ku bireve. Jixwe li Kurdistanê xweşikiya biharê di asta bêrehmiya zivistana wê de diyar dibe. Gerîla jiyan bi xwe ye. Gerîlayê herî mezin, Serok Apo ye ku gerîlayên li Kurdistanê afirandiye.

**18'ê Sibata 1993'yan**

Pêwîstiya gerîla jî bi moral, eleqedarî, hezkirin û dostaniyê heye. Herî zêde jî pêwîstiya hevalan bi hezkirin û eleqedariya hev heye. Her gerîla ji bo hevalên xwe dibe çavkaniya moralê. Hezkirin û dostaniya xwe li cem hevalên xwe parve dike. Ya ku me li cem hev radigire, girêdana di navbera me de, hezkirina di navbera me de û rêza di navbera me de ye. Hunera gerîla dibe sedem ku gerîla piralî be. Gerîla rêxistinkarê herî baş e, leşker, pêşeng û rêberê/a herî baş e.

Dema ku têkoşîna me derket holê, destpêkê rêberên me di nava şert û mercên herî bêderfet de têkoşîn meşandin. Ji tineyiyê derfet û firsendên îro afirandin. Tenê bi tabanceyekê gelek çalakî li dar xistin. Bi rojan birçî man, nerazan û ji bo me ev roj afirandin. Ji ber wê yekê jiyana gerîla ya li Kurdistanê jiyana herî pîroz e. Ji bo ku vê jiyanê biafirînin çendîn lehengan xwe feda kirin. Parastin, pêşxistin û hilgirtina vê mîrasê ji bo nifşên pêşerojê jî dikeve erka li ser milê me.

Bi rêya li pirtûkan xwendinê, di filman de temaşekirinê, ji kesên cuda cuda bihîstinê gerîla û gerîlatî naskirin ne mimkun e. Tenê mirov dikare bi jiyînê gerîla û gerîlatiyê nas bike, jê kêfxweş bibe. Ya din jî eger hewl bidî bibî gerîlayekî/e baş, tê fêm bikî tu hatiye nav jiyana herî baş û bi vê jiyanê bikevî nav refa nemiran. Di gerîlatiyê de kesek –ji ber pêdiviyên jiyanê- neçar e hemû qebiliyetên xwe pêşkeş bike. Her mirov xwediyê qebiliyet e, lê dibe ku hin qebiliyetên mirov sînordar be. Di gerîla de jî di asta herî jor de mirov dibe xwediyê qebiliyet. Kesek dikare di her mijarê de bibe xwediyê agahî, di gelek mijaran de bibe pispor. Dibe ku gerîla mirovên herî xwediyê qebiliyet be. Eger kesek di jiyana xwe ya borî de timî bi keda malbatê, bi keda derûdorê debara xwe kiribe, timî fêrî ya amade ye bûyî be, destpêkê di nav jiyana gerîla de dê zehmetî bikişîne. Lê bi alîkariya hevalan, ji ber xwe ferzkirina zehmetiyên jiyanê, di demeke kurt de dê li gorî şert û mercên jiyana heyî bimeşe.

Demên destpêkê di gelek mijaran de min zehmetî kişand. Ji aliyê pêçandina cixareyê ve, xwarin çêkirinê ve, agirê gerîla pêxistinê ve û hwd... min dî jiyana xwe de qet titûn nekişandibû, timî paket kişandibû. Dema hatibûm qampê titûn hebû. Me cixaraya xwe bi xwe dipêçand û dikişand. Min qet nedikariya bipêçînim. Lê hevalê Ferhad di demeke kurt de fêrî pêçandina cixareyê bû. Min bi piranî cixareyên xwe bi hevalê Ferhad dida pêçandin. Dema min ew nedidît, min li derûdora pênûs pêlê cixarê dialand, piştre nav wê pelê tije titûn dikir û bi vî awayî cixareyek çêdikir. Dema min diceriband ku bipêçînim timî min diqetand. Heta demekê ez fikirîm dest jê berdim. Lê gerîlayek bêçay û bêcixare nabe. Piştî ku ez fêrî vê bûm min biryar da fêrî pêçandina cixareyê bibim. Min pêçand û xera kir, pêçand û xera kir û di dawî de fêrî pêçandinê bûm.

Cara destpêkê li Lêlîkanê bûm xwarinpêj. Berê min dîtibû ku hevalên xort nan dipêjînin. Ji min re pir ecêb dihat. Timî dihizirîm ku pêjandina nan xweserê jinê ye. Lê PKK ku li Kurdistanê çarenûsa jinê guhertibû, fêrî her milîtana/ê xwe kiribû ku li pêşberê zehmetiyên jiyanê, pêdiviyên jiyanê li ser lingan bimîne. Ji rewşek ku bi xwe re nedidît ji bo agir bike ji xwe re dar kom bike, difikirî ku ev karê jinê ye, îro me bi saya Partiya xwe ev tabû şikênandine. Gava em nan dipêjînin em hin caran dişewitînin, hin caran hevîr derdixin û hin caran jî bi qasî nanê dayikên xwe baş dipêjînin.

Dema min xwarina destpêkê çêkiribû, min go ez şorbeya birincê çêbikim bû birinca zuwa. Min nekarîbû pîvana birinc û avê sererast bikim. Tebî min binê birincê jî şewitandibû. Bi demê re ez fêrî çêkirina hemû xwarinên di gerîla de tên xwarin bûm. Destpêkê dema xwarinên çêdikî baş nebû mirov xemgîn dibe. Lê dema mirov xwarinek ku heval diecibînin çêdike, kêfxweş dibe. Mirov difikire ku baş xizmetê hevalan bike. Xizmetê hevalan kirin tiştekî baş e.

Çalakî, çavkaniya bingehîn a jiyana gerîla ye. Tiştê ruh dide gerîla, dide jiyankirin, wêrekî dide gerîla û di rêya ber bi azadiyê ve diçe de, motora gerîla ya esasî ye. Dema diçe çalakiyê gerîla asteke bilind a kelecanê dijî. Bi çalakvaniya her timî gerîla weke zêr diteyise û zeng nagire. Bêçalakî mayîn dijminê gerîla ye. Çalakî tirs û xofê dixe dilê dijmin, dibe sedem ku ew zingarî bigire. Gerîlayên di ferqa

vê de ne ji bo çalakiyên dijwar xwe amade dikin. Ti gerîlayên dixwazin şer bikin ji jiyana qampê hez nakin. Ji ber ku qamp tevgera gerîla asteng dike, jiyana qampê weke dojehê ye. Lê dema ku di demsala zivistanê de ji neçarî dikeve qampê jî, bi awayekî herî baş ji biharê re xwe amade dike. Giranî dide perwerdeyê. Xwe xurt dike.

Dibe ku bi şev li ber baranê meşîn zehmet be. Lê eger tu şervana/ê azadiyê bibî, baweriya te bi serkeftinê hebe, ji gelê xwe hez bikî, tê bawer bikî ku bi her awayê zehmetiyê bi bin bixî. Dema van zehmetiyan têkbibî jî tê fêm bikî ku te xwe gihandiye serkeftinê, xwe gihandina serkeftinê çendî xweş e.

Û çiyayên me bi gerîla bedew in, bi gerîla serbilind in. Dibêjin "ya ku mirov dide jiyîn av e, hewa ye; ya ku dibe sedem xweşik û bedew hebe, hebûna kirêt e. Lê ya ku dibe sedema hebûna Kurdistanê, gelê Kurd diafirîne, jiyanê dide wî, Kurdistanê dike welatê şehîdan gerîla ye; mifteyê jiyan û azadiyê ye, navê gerîla ye.

**23'yê Sibata 1993'yan**

Doh salvegera yekem a şehadeta hevalê Sertac bû. Ji fermandarên me yên biryargehê ku du-sê roj in hatiye gel me, hevalê Mahîr li gel min axifî. Li ser şehadeta hevalê Sertac û Cewahîr min jê re got bila agahî bide malbatê. Wî jî got ku ev erkek e û dê di demeke herî kurt de ragihîne malbatê. Pir kêfa min jê re hat. Her çendî zehmet be jî, ev rastî fêr bûn heqê wan ê herî xwezayî ye. Li şûna ku ji hin kesên din bibihîzin, ev rastî ji Partî fêr bûn hê rastir e û baş dibe. Bi êş jî bibe ew ê vê qebûl bikin.

Bila agahî bidin dostan: Sertac, Cewahîr û hemû şehîdên mê bi xwîna xwe welatê me av dan. Bila agahî bidin çûkên Sertac ku awazên Rodrîgo û Bethoven lê didin. Bila agahî bidin çîçekên zer ên Cewahîr ên li bexçeyê me. Hûn ey çûkno, we her sibe li pencereya me datanî, awazên Rodrîgo û Bethoven dida. Sertac ji ser nivîna xwe radibû nan dida we. Piştre we li ber muzîka wî lê dida, dixwend. Di her 22'yê Sibatê de seredana gora wî bikin. Bêjin ku serkeftin misoger e, têkoşîn mezin dibe, me al nexistiye xarê. Wê demê dê hevalê Sertac di binê axê de bike qîr, kêfxweş bibe. Dema agahiyê bistîne dibe ku bigirî jî. Dê ji çavên dibiriqin ên dayika Kezban,

rondik werin xarê. Kezeba dayikan tenik e. Asayî ye ku bigîrî, rondikan birêjîne û bike qîr û hawar. Lê divê ev rondik bibin îfadeya kêfxweşiyê; bibin rondikên mezinkirina zarokên serbilind û egîd. Divê bibin rondikên hesta serbilindiya bûn dayika du şehîdan. Bavê Elî dê maltepeyekê bixe navbera lêvên xwe, bi êşa dikişîne tev li gel dumana cixareyê bi ser wan cîgerên xwe yên westiyayî de bike û ji çavên xwe yên xemgîn rondikan berde xarê. Dibe ku dayika Kezban bi qîr û hawar bike girî. Lê bavê Elî bi vê nawêre. Ti car bi qîr û hawar negiriyaye. Ti car li zilamtiyê daneniye. Çawa ku timî dayika Kezban jê re bûya pişta herî mezin, wê dîsa jê re bibe pişta herî mezin. Ew ê niha jê re bibe can, jê re bibe heval. Ew ê ji bavê Elî re bêje ku pêwîst e ew pê serbilind bin wan zarokên serbilind ên ji bo welatê xwe şer kirine û şehîd ketine mezin kirine. Jixwe ya ku li we tê jî ev e.

Di rojeke wisa de tiştê ez bikim yê herî rast ew e ku ez xwe bi hêz bikim, ji bo şer amade bikim. Bi qasî ku karibim bersivê bidim bîranîna wan, ez ê bikaribim bibim layiqê wan, bîranîna wan bidim jiyîn. Ez di zanebûna erk û berpirsiyariya xwe de me jî. Ez di wê ferqê de me, ji bo ku ez erka xwe ya li pêşberê wan bînim cih jî, pêwîst e ez pir zêde bixebitim û hewl bidim.

Şehîdên me çavkaniyên me yên jiyanê ne. Me bi wan jiyan kir, ala me bi wan bilind bû. Em ê bi wan biçin serkeftinê. Û di her salvegera şehadeta wan de em ê wan bi evînên xwe bi bîr bînin, rêya xwe bi bîranînên wan ronî bikin. Soz didim we hevalê Sertac, ez ê bibim bira û hevalekî layiqê we, heya dilopa xwîna xwe ya dawî rêya we bişopînim. Rojên 22 Sibatê, 7'ê Çileyê dê ji bo min timî bibin ronahî. Di vê pêvajoya em ber bi serketinê ve diçin de, ji bo min ew roj dê bibin navê serhildana li dijî dijmin, bibin navê berxwedan û tolstendinê.

**6'ê Adara 1993'yan**

Zivistanên Zagros, pir dijwar, bêrehm û zêde zêde sar e. Di demsala havînê de jî ti kes lê nasekine. Di zivistanên wê yên wisa bi nav û deng de ji me re bûye cih û war. Hesreta ji bo biharê, hesreta ji bo zîrveyên çiyayê Kîpkûl, li Zagros hê zêdetir xwe dide der. Li her

derê jiyana me bi berxwedanê gengaz [mümkün] e. Li pêşberê berxwedana me, Zagros jî neçar dimîne bejna xwe bitewîne.

Min xwe xistiye paş sobeyê, berê xwe daye luksê, ku di rojên dawî de hatiye û weke tavê her derê ronî dike, hewl didim hin tiştan binivîsim. Ji aliyê din ve jî, ji ber ku gaza me xelas bûye û em nikarin sobeyê pêxin, li luksê temaşe dikim û hewl didim bi şewqa wê xwe germ bikim. Weke ku dema xelasbûna gazê be. Pirsgirêka gazê jî ji bo me bibû derdekî cuda.

Bagera ku piştî barîna her berfê, weke ku neçar be rabe, bi awayekî ku mirov ji sir û seqamê bikuje, derketina ji derve bike pirsgirêkekê, wê jiyana me ya teng, tevlihev bike, îro jî dibe ku bi awayê xwe yê herî giran xwe dide hîskirin.

Konê me yê ku dema destpêkê hatiye çêkirin dişibiya avahiyeke du qatî, ji ber zêde barîna berfê, ji cihên bilind anîna berfê ji aliyê bagerê ve, niha dişibe stargeheke binerd ku li beramberê êrîşên balafiran hatiye çêkirin. Deriyê konê me weke ku tenê rovî karibin bikevinê lê hatiye. Ji ber ku bayê tê li hev digere û li derûdora vê kunê dizivire, dîmeneke dişibe Sêgoşeya Şeytan A Bermûdayê. Dema ji vê kunê ku dişibe tunelê dikeve hindur weke ku mirov difikire di tunela zeman re derbasa dibe û diçe dinyayeke cuda. Bi rastî jî tunela zeman mirov dibe dinyayeke cuda, dibe dinyaya berxwedanê ya PKK'ê. Hevalên dixwestin devê vê tunelê ruxmî bagerê paqij bikin, dema ji berfa li vê derê yek-du bêr avêtin dihizirîn ku hemû berf avêtine û dema diketin hindur, herî kêm sê qatê berfa avêtine bi xwe re dianîn hindur. Dema mirov ji tunelê dikeve hindur destpêkê tê bêşa pêlavan. Gava ji deriyê bataniye mirov dikeve hindur, tiştê destpêkê ku bi ber çavê çavdêrekî/ê baş bikeve, coka avê ku ji ber kunbûna konê me ji rex ve av nekeve hindurê konê û li nava hemû kon belav nebe û bataniyeyan şil neke hatiye çêkirin bû. Li goşeyê destpêkê yê konê me satila xwarinê ya sor ku çembilê wê, roja han ji aliyê hevalê Rênas ve bi hewldaneke taybet karibûye were şewitandin, hema li ser dîwaran kevçî û lalîkên me, qadehên me yên çayê yên plastîk, melkesa me ya ku hema yek-du gavan li wî aliyê satila me ya sor e, çekên BKC; B-7, qilêş û qernas tiştên destpêkê bi ber çavên mirov dikevin. Bi taybetî jî tiştekî din ku balê dikişîne

ruxmî sir û seqamê, ti heval li derûdora sobeyê kom nebûye. Her kes li ber luksa weke elektirîkê ye ku nû hatiye kom bûye. Ruxmî wê sir û seqamê her kes sohbetên germ bi pêş dixe, hem pê xwe germ dike û hem jî em hewl didin nedin derve ku em diqerisin. Sohbetên me yên germ, weke her tim bûye li beramberê bagerê serkeftin bi dest ve tîne. Yek-du heval xwe dixin nav bataniyeyan da ku xwe germ bikin. Bataniyeyan wisa xweş li xwe dialînin û bi vî awayî rûdinîn.

Hevalê Mehsûm û Ahmet hewl didin bi dukela cixareyên dikişînin xwe germ bikin. Hevalê Delîl bi Tirkiya xwe ya nîvçe, nivîsek ku ji bo bîranîna hevalekî/ê şehîd hatiye nivîsîn ji bo hevalê Dîlawer dixwîne. Hevalê Rênas bi radyoya antêna wê şikestiye, cama wê jê ketiye radyoya Artêşê guhdar dike. Yên ku sohbeta xwe herî germ kirine hevalê Rojhat, Ezîz, Zinar û Gabar, weke ku qet naqerisin. Weke ku di rojeke asayî de bin nîqaşên xwe didomînin. Niha ji taxima jor ku em jêre dibêjin Mareşal, yanî hevalê Ferîk dikeve hindur. Dema ew bi xwe dikeve hindur weke ku sir û sermaya ji derve li cem xwe tîne. Hevalê Çeleng ku erka xwe ya li derve berfavêtinê diqedîne jî dikeve hindur, ji bo ku destên xwe germ bike nêzîkî luksê dike. Hin heval ji hevalên ji derve tên rewşa hewayê dipirsin, hin heval jî hesreta xwe ya ji bo Xakûrkê tînin ziman. Dibêjin, "eger em niha li Xakûrkê bûna me dê ji darên dirêj û mezin agirekî gerîla yê mezin hilbikirana û li derûdorê xwe germ bikirana". Ruxmî her tiştî bi hemû xweşikiyên xwe û hem jî li dijî xwezayî bi têkoşîneke mezin jiyana me didome.

**9'ê Adara 1993'yan**

Me, hema bêje ji hemû şevên din, bi awayekî cuda, doh şev derbas kir. Hevalên qerisîne zû ketin nav bataniyeyên xwe. Hevalên ku her şevê ji bo razanê li her devera konê belav dibûn, îşev ji bo ku hev germ bikin di nav hev de razan. Bi şev bager wisa bi awayekî xurt dihat, ruxmî ku her hevalê nobedar tam saetekê berfa li derve diavêt, bagerê weke ku li dijî me helwest stendibe hê jî xwe dijdand, hê zêde berf dianî. Têbi di vê navberê de berfa li ser konê me jî zêde bibû. Bi vê berfa zêde re darên konê me ber bi hindur ve xwar bibûn, wisa lê hatibûn dibe ku her kêliyê bişkestana. Lê baweriya me bi

konê me hebû. Ne dema şikestinê bû. Diviyabû hineke din li ber xwe bidana. Eger di vê hewayê de kon jî ji destê me derketa me dê çibikira! Ji ber wê yekê diviyabû hineke din li ber xwe bida.

Bibû sibe, xuya bû ku hemû heval heya bi sibeyê qerisîne. Dema li ser vê qerisîna sibeyê jî zêde bû, dubare ketina nav bataniyeyan dibû neçariyek. Hevalên derketine ji derve ji bo dubare bikevin hindur hewl didan. Hevalên ji derve diketin hindur dişibiyan qalikên ji berfê. Paşê xetereya hilweşîna kon bi awayekî cidî xwe da hîskirin. Daran dikir xirtexirt. Ji ber wê yekê diviyabû me kon vala bikirana. Hemû heval ji nav bataniyeyan derketin. Me tiştê xwe yê di nav konê de kom kir û hemû li mitfaqê bi cih kir.

Li derve bagereke pir xurt hebû. Heval yek bi yek rasterast çûn devê tunela me. Em yek bi yek jê derketin. Heya me xwe gihandibû mitfaqa deh metroyan ji devê tunelê dûr, her derê me bibû qeşa. Dema çûbûm girê dused metro dûr, hema kêm mabû rêya xwe wenda bikim. Piştî ku ez li mitfaqê derbas bibûm, min nedikariya pêşiya xwe bibînim, dihizirîm ku min rêya xwe wenda kiriye. Di kêliyên bi vî awayî de rêya xwe wendakirin pir bi xetere bû. Ez piştre ber bi gir ve meşiyam. Di vê navê de min bi dengê bilind banî hevalan dikir. Dema hinekê çûm hatim rex konê rêveberiyê. Sed metro mayîbû. Diviyabû heya ku min xwe bigihanda konê din min xwe ragirta. Di wê navberê de hevalê Hemze li pêşiya min peyda bû. Min ew şopand û ber bi kon ve meşiyam. Timî di nav berfê de diketim û radibûm. Qederekê qerisîbûm. Piştre hevalê Demhat jî hate alîkariya min. Lê belê çek û çenteyê min li milê min qerisîbûn. Ji milê min venedibûn. Dawî de hatim kon. Di vê navê de dema ez di nav berfê de diketim û radibûm, pêlavên min ên lastîk ji lingê min derketibûn û encax dema hatibûm konê min ev ferq kiribû. Kêliya ku ketim hindur hemû heval ji kenan zikopişto bibûn. Ji ber ku her aliyê min bibû qeşa. Wê kêliyê ecz bûm. Soba pênediket. Du roj in gaz tinebû. Di cih de ketim nav bataniyeyê. Hinekê germ bûm. Lê belê dema qeşa heliya hemû cilên min bibûn av. Paşê, hemû hevalên hatibûn, weke min li wan hatibû.

Li konê jêr tenê dikarîbû panzde heval bi cih bibin. Ruxmî bagerê nîviya hevalên taxima me çûn konên jêr. Nîvî jî hatibûn konê jor. Bi vî awayî me dikarîbû germ bibin. Em hemû li ser hev kom bibûn,

ketibûn ser hev. Ji me hin hevalan serê xwe dida ser singa hevalê xwe yên din, hin hevalan didan ser çongên hevalên din, hin hevalan jî pişta xwe dida hev radizan, yan jî me sohbet dikir. Lê belê hevalên radizan nedikarîn lingê xwe dirêj bikin. Demekê ez jî razam. Min pişta xwe da pişta hevalekî. Hevalekî serê xwe spartibû çongê min. Bi şilî razan pir baş bû. Ji ber ku diqerisîm xew pir xweş dihat. Di kêliyên wisa de mirov qet naxwaze rabe. Ya din jî bi taybetî dema yek bi hanekî yan jî ne bi zanebûn bataniyeyê ji ser te rake, dibêjî qey di wê kêliyê de mirov diqerise, mirov dubare bataniyeyê dikişîne ser xwe. Paşê hevalan bi gaza ku ji bo rojên reş veşartine çayek çêkirin û anîn. Li Zagrosên ku gaz xelas bibû, bagerê weke ku bixeniqîne li me kiribû, qadehek çay vexwarin hinava me germ kiribû û bibû derman. Paşê hevalekî ji ber rojeke wisa ku me derbas kiriye pêşniyar kir ku em moralekê li dar bixin. Got "bager dixwaze me bixeniqîne, jiyana me li me bike jahr. Divê em jî bi moraleke baş bersiva vê bidin". Pêşniyareke di cih de bû. Ruxmî ku amadekariyên me nebûn jî, hevalên di vê mijarê de xwediyê qebiliyet zêde bûn. Me ji ber wê yekê qebûl kir. Di wê konê me yê pir teng de morala me pir xweş derbas bû.

Me îro jî li beramberê xwezaya bê rehm a Zagros ezmûneke serkeftî derbas kiribû. Vê jî morala me zêde zêde dikir. Ruxmî wê sermayê di kêliya moralê de hemû heval ji nav bataniyeyan derketin. Germahiya moralê em hemû pir germ kiribûn.

**20'ê Adara 1993'yan**

Wê rojê bê navber du rojan bagerê berdewam kiribû. Piştre tav derket, dinya xweş bû. Ba jî tine bû. Li her alî girgokên ji berfê ku ji aliyê bagerê ve hatine anîn tije bû. Bi derketina tavê re hemû heval ji bo em konê xwe dubare ava bikin em seferber bûn. Me berfa rex û jorê konê avêt. Berfa li rex kom bibû te digo qey çiyayekî ji berfê ye.

Dema em bi kon re mijûl dibûn hin hevalan jî xwe berdabûn gund û gaz anîbûn. Ruxmî ewqas sermayê, çiqas xweş bû ku em diketin kona xwe û dubare me sobaya xwe pêdixist, xwe germ dikir. Ez çiqas kêfxweş bibûm! Dubare konê xwe ava kirin ji me re weke serkeftinê dihat.

Bolîka me, rojên piştre ji bo gazê bîne çû gund. Li gel hemû hevalan xwesteka çûne erk, pir mezin bû. Em ji konê me heya bi gund bi gotina stranan çûn. Her ku em nêzîkî gund dibûn hatina biharê xwe dida hîskirin. Di tarî û bêdengiya şevê de, li ber ronahiya stêrkan, hin caran jî li cihên berf tine em meşiyan û me xwe gihand nuxteyê. Em li gel berekî sekinîn. Hema li rex me, li binê berfê dengê avê ku bi xuşunî diherikî pir xweş bû. Dema em çûbûn gund gava ku xwediyê malê derî vekiribû, dengê ji derî dihat bi min pir xweş hatibû û eleqeya min kişandibû. Berê ez ji bo vî dengî pir ecz dibûm. Me ji gund gaza xwe girt û bi heman coşê em zivirîn hêlîna xwe.

Agahî hatibû diviyabû em dubare biçûna Xakûrkê. Êdî em ê ji papûran, ji teniya wan, ji dukelê wan xelas dibûn, jixwe kêm mabû em zivistanê jî derbas bikin. Dema me Zagros qut bikirana û xwe bigihandana Xakûrkê, dihate maneya ku me ev zivistan xelas kiriye. Hemû hevalan amadekarî dikir. Hevalên çenteyên xwe tamîr dikirin, sermilk çêdikirin, rextên xwe çêdikirin, çekên xwe paqij dikirin, hevalên ku ji bo hevalên li Xakûrkê hesreta xwe tînin ziman û amadekariyên ji bo pratîkê bi hemû lez û beza xwe berdewam dikir. Ji ber ku hema bêje di destê hemû hevalan de ta û derzî hebû, konê me weke terzîxaneyê lê hatibû. Min jî ji xwe re sermilk çêkir. Dîsa, min ji xwe re ji baraniyê çenteyek jî çêkir. Hevalên li pêş bimeşin neqeb û rê qontrol kirin. Dema hevalên me yên ji bo kişf û qontrolê çûbûn vegerîn û gotin “rê destdayî ye û li gorî rewşa dinyayê em ê karibin biçin”. Me jî amadekariyên xwe bi lez kiribûn. Dibe ku em her kêliyê bi rê biketana. Lê belê ji ber dinya dîsa tevlîhev bû em neçar man bisekinin. Bagera dîn û har bûyî, bi hemû leza xwe berdewam dikir. Di roja me ya neteweyî de, di roja me ya azadiyê de, ne bager û sir û seqam, ti tiştî nedikarî me di nava vê konê de ragire.

Me îro Newroz pîroz kir. Morala me hemûyan pir bilind e, em bi coş û kelecan in. Li aliyekî guhekî me li ser pêşketinên li welêt bû, ji aliyê din ve hemû heval ji dil ve tevlî cejna me ya neteweyî bûn û hewl dan roja me xweşik bikin. Me şeveke pir bi tevger derbas kir. Bi temamî şeveke Newrozê bû.

Em her tim bi şehîdên xwe dijîn; bi hêza em ji wan distînin xurt dibin û gav bi gav xwe digihînin serkeftinê. Me bi rêzgirtina ji bo şehîdên xwe dest bi pîrozbahiyê kir. Di her rêzgirtina ji bo şehîdan de

em şehîdan tînin bîra xwe. Bagera li derve dihat weke bêje “agirê xwe yê Newrozê pêxin, ez jî bigirim bibim her derê” bû. Me di cih de bersiv dayê. Ji ber ku tiştekî me nebû em pêxin, me hemû pêlavên xwe yên qîr, kel û pelên xwe yên kevin dan hev, matarayek gaz pêde kir û agirê xwe yê Newrozê pêxist. Her ku me gaz pêde dikir, agir û pêt gur û geştir dibû. Ba û bagerê dihat weke ku dixwest agirê me belavela bike. Me yek carê agirê xwe yê Newrozê pêxistibû; êdî ti tiştî nedikarî bitemirîne. Em li derûdora agir kom bûn, hem li beramberê bayê tê bûn asteng, hem jî me govend girt. Me ji aliyekî ve govend dikişand, ji aliyê din ve hevalên hatibûn diyarkirin bi gule avêtinê ji agirê me yê Newrozê re ku tariya giran a şevê diqetandî hevaltî dikir, ruxmî sar û sermaya zêde şev xweşiktir dikir. Min bi makîneya wênekêş a destê xwe hewl dida wan dîmenên xweşik bigirim û vê şeva dîrokî bêmirin bikim. Her ku diçe bager girantir dibû. Weke em ji bagerê re bêjin, agirê me yê azadiyê bibe her derê, em ji ber agirê xwe veqetîn. Li ser esasê ku em di konê xwe de bidomînin em ketin hindur. Me bi stranên xwe yên neteweyî, bi gelek zimanên din (Erebî, Almanî) Newroza xwe xemiland. Ya din jî hatina gel hev a hevalên Botanî û xwendina awazên Botanê, şeva me rengîntir kir. Bi temamî çandeke şer bû, van awazan mirov dibir meydana şer. Me piştre li ser hevalê Ferhat Kurtay yanî hevalên ‘Şeva Çaran’ skeç çêkir. Em îro gaveke din nêzîkî serkeftinê bûn.

Bijî Hemû Şehîdên Newrozê.
Bijî Kawayê Hemdem Mezlûm Doğan!
Bijî Roja Rizgariya Gelê Me û Cejna Me Ya Neteweyî Newroz!

**28’ê Adara 1993’yan**

Eger her der bibe bihar, li her derê gul û çîçek vebin, li her aliyî av bike xuşaxuş û biherike, li Zagros dîsa berf, dîsa bager û dîsa sir û seqama zêde her didome. Eger tu li Zagros bî, tê nikaribî gul û çîçekên vedibin, giya û şînatiyên nû dibişkivin, avên diherikin, berfa dihele bibînî.

Sibeya 22’ê Adarê ji bo em biçin Xakûrkê me amadekariyên xwe temam kirin. Barê em rabikin zêde zêde bû. Hevalan qasiyeke diyar a bar da her kesî. Hemû hevalan piştî ku çenteyên xwe amade kirin, hin hevalan lingê xwe bi laylon pêçandin. Piraniya hevalan du gorayên

rês xistin lingên xwe. Ji ber ku rê dirêj bû û berfeke bê eman li benda me bû. Diviyabû me lingên xwe neşewitandana. Pêwîst bû em zû razana. Em ê di çarê sibeyê de bi rê biketana. Lê ji me ti kesî xew bi çavan nediket. Ji aliyekî ve kêfxweşiya dîtina ava Xakûrkê, ji aliyê din ve jî kêfxweşiya xelasbûna ji papûr û dukelê, nedihişit ku xew bi çavên me bikeve. Gelek heval bi awayekî hişyar ketin saet çarê sibeyê. Ji ber ku em ê bi rê biketana ji bo cara dawî me şorbeyeke germ û çayek ku li ser papûrê keliyaye vexwar.

Li ber ronahiya sterkên ku bi şevê diteyisîn em ketin rêza xwe ya meşê. Weke em xatirê xwe ji konê xwe yê ku her aliyê wî bi berfê hatiye nuxumandin, ji papûran, ji dûkelê bixwazin bi rê ketin. Ji beriya tav derkeve em nêzîkî neqebê bûn û dema tav derket me neqeb qut kir. Berf zêde zêde bû. Me weke dozerekê berf diqelaşt û em derbas dibûn. Temaşekirina li hevalên bi çek û çenteyên li milê wan ber bi lûtkeyê çiyê ve dimeşin, hem pir xweşik bû û hem jî kêfxweşî dida mirov. Her ku mirov dimeşî, hê zêdetir tavê mirov dişewitand. Vê jî em diwestandin. Piştî ku me li Sêgoşeyê navber da û xwarin xwar, dubare em bi rê ketin. Dema em hatin sirta ku li ser wê Xakûrkê xuya dikir, me hemû westabûna xwe, têhnbûna xwe ji bîr kiribû, ji bo ku em xwe bigihînin palên reşbelek, pelçîmên daran ku ji dûr ve mizgîniya biharê dida me, em hê zêdetir bi lez dimeşîn.

Em bi rê de bê av mayîbûn û me hewl dida ku bi berfê têhna xwe bişkînin. Hin hevalan digot, “me îro bi xwarinê berfa Zagros xelas kir”. Me moral dida hev. Hevalê fermandar digot “ha gerîlano, ha Apoçîno bimeşin, kêm maye”. Her ku wî wisa digot em bi gavên hê mezintir dimeşîn. Piştre em hatin ser sirta qampa Şehîd Bêrîtan. Me çend gule berdan lê me nekarîbû bersivê bistînin. Gir, zêde zêde arwaz bû. Me ji gir xwe berda jêr. Piraniya hevalan xwe dişemitandin. Hevalên xwe ji jor berdidan, mesafeyekî dirêj diçûn. Hin hevalên nedizanîn xwe bişemitînin jî, piraniya xwe bi gindirînê dadiketin jêr. Hemû heval ji berfê sipî bibûn. Me karîbû bi ketin û rabûnê di dolê re xwe berdin. Di vê navberê de hevalên qampa Şehîd Bêrîtan jî hatin cem me. Çenteyên hevalên westiyabûn ji wan stendin. Her ku em nêzîkî qampê dibûn, dengê ava ku di dolê re diherikî ez dîn dikirim. Min dixwest kêliyekê ji beriya kêliyekê xwe bigihînim

avê. Herî dawî dema min xwe gihand avê bi êşa ku çar mehan bi xweşikî nedîtina avê, min ew hemêz kir, serê xwe xist nava wê ava weke qeşa. Piştre min têra xwe vexwar. Piştî meşeke donzde saetan a Zagrosê me xwe gihandibû Şehîd Bêrîtan ku qampa destpêkê ya Xakûrkê bû. Heya me xwe gihandibû qampê di me de hal nemayîbû. Ez gihaştim konê û negihaştimê dest pê kir çavên min jan bidin. Her ku diçû vê êşê lê zêde dikir. Hevalên din jî di heman rewşê de bûn. Hevalê/a erkdarê tendirustiyê derman xiste çavên me. Ruxmî vê jî di çavên me de rondik nedisekinîn. Qoxûşa me dişibî nexweşxaneyekê, hevalên bi me re mijûl dibûn jî dişibîn kesên li nexweşan dinêrin. Heya bi sibeyê nalîn û hawara hevalan zêde bû. Dema bû sibe, gelek hevalan nedikarîn ku çavên xwe ji hev vekin. Yê min jî, çavê min ê çepê hatibû girtin û yê rastê jî dikir ku bê girtin. Dema min dixwest çavên xwe vekim êşa heyî dibû du sê qat. Bêyî ku bisekine rondik ji çavên min dihat. Piştî nîvro ji me çend hevalên rewşên wan baş bûn, çûn biryargehê. Dîsa, li ber tavê serçavên me şewitîbûn, lêvên me terikîbûn.

Zagros heya bi îro timî lingên hevalan dişewitand. Vê carê li şûna lingên me çav û serçavên me şewitandibû. Piştî ku êşa çavên me bi temamî diyar bû û çavên me bi temamî hatin girtin, dotira rojê doxtorê biryargehê hat. Derman xiste çavên me û çavên me pêçand. Bi çavên pêçandî, dest û lingên me li hev geriyan. Min bi rewşa kesên kor difikirî. Di cîhana wan de jiyîn bawer im qet ne hêsan e. Min dixwest kêliyekê ji beriya kêliyekê ji vê cîhanê rizgar bim. Çend hevalan di jiyana xwe ya siviltiyê de bîranînên xwe yên ku li gel koran borandin vedigotin. Hevalan cixarêyên me dipêçand, xwarina me bi me didan xwarin û bi destên me digirtin em dibirin ji derve. Bi wê rewşa me wêneyên me yên hemûyan kêşandin. Dotira rojê me çavên xwe vekirin, hinekê sererastbûn hebû. Em timî dermanên bi awayê dilop bi kar tînin, dikarin pir bi zehmetî hinekê bibînin.

Her ku diçû em ji cîhana koran rizgar dibûn. Lê dema şewq li çavê me diket êşên berê dest pê dikirin. Baş bû dema em diçûn ser avê û av li çav û serçavên xwe yên şewitîne dikir, hem serçavên me yên dişewitî û hem jî çavên me yên dişewitîn pir rehet dibûn. Dema çavên hemû hevalan vebûn di saetên zû yên sibeyê de em ber bi

biryargehê ve bi rê ketin. Bi vî awayî em piştî hatina xwe ya vê derê ber bi hindurê Xakûrkê bi pêş ve diçûn. Her der reş bibû, berf tenê li sirt û serê giran hebû. Dîsa, ji dol û çeman av zelal diherikî. Ji her ava me qut dikir, min qurtek vedixwar û hinava xwe hênik dikir. Dubare di şivereyên bê berf de meş, pir xweş bû. Kelecana vesaziyê em girtibûn. Ji bo vesaziyê em diçûn biryargehê. Heya em gihîştinê, me gelek heval dîtin. Me bîra hemûyan kiribû. Fermandarê/a me yê/a H... Em pêşwazî kirin. Weke hemû hevalan ew jî bi hatina me pir kêfxweş bû. Piştî ku me hinekê bêhna xwe vekir em derbasî qada vesaziyê bûn. Piştî ku li ser vesaziyê bi awayekî kurt agahî hate dayîn vesaziya giştî hate xwendin. Bolîka me hate belavkirin. Hevalên me li her herêmê cihê xwe digirtin. Di vê vesaziya demî ya destpêkê ku hatibû kirin de min di taximên Xakûrkê de cihê xwe girt.

Îro salvegera 7. a şehadeta fermandarê me yê mezin hevalê Mehsûm Korkmaz (Egîd) e. Di rojeke wisa de ew bi bîr anîn, bûn layiqê bîranîna wî erka her mirovê/a Kurd e. Em milîtanên PKK'ê di her kêliya jiyana xwe de bi mînak girtina hevalê Egîd, bi çûna ser dijmin bi awayekî xwediyê biryar û wêrek, bi avakirina artêşbûna ku ev pêvajo û dîrok weke erk datîne li pêşberê me, em dikarin layiqê Wî bin û bersiva herî watedar a hemû şehîdên xwe bidin. Bûn layiqê hevalê Egîd ku îfadeya wêrekî, zanebûn û lehengiyê ye her kêliya jiyana hevalê Egîd mînak girtin erka me hemûyan e. Gelê Kurd ji ber ku xwediyê fermandarekî wisa ye, PKK jî ji ber ku fermandarekî wisa afirandiye divê serbilind be.

Bijî sembola lehengiyê, fermandarê mezin hevalê Egîd!

Em ê di pêvajoya pêş me de bi awayekî bêeman biçin ser erka xwe ya artêşbûnê û bi pêşxistina artêşbûnê, bersiva herî baş bidin bîranîna şehîdan!

Bijî artêşa me ARGK!

**2'yê Nîsana 1993'yan**

Piştî vesaziyê, em li qampa Şehîd Hüseyin bi cih bûn. Piştî ku taxim bi cih bûn me dest bi perwerdeyê kir. Hevalên ji Zagros hatibûn dê perwerdeyeke zêde girankirî bidîtana. Em perwerdeya xwe li binê daran dibînin, çi xweş e, çi baş e. Li gorî konên Zagrosê,

perwerdeya li ber sîberên daran hê xweşiktir e, bi mirov balkêştir tê. Em hêdî hêdî fêrî sîstema vê derê dibin. Li konên Zagros derbaskirina me ya zivistanekê em cangiran kiribûn. Ji bo erk çûn û hatin hem dibe sedem ku mirov pê rehet be, hem jî mirov vedibe. Agirên mezin hilkirin û li derûdorê xwe germkirin, li erdê razan xweş bû; dema em li ser erdê radizan her çendî di tenişt û laşê me re jî diçûn, kevirên laşê me diêşand in pir xweş bûn.

Li Zagros firsenda agirekî gur kirinê ti car tine ye. Ji ber ku dar tine. Em li vê derê bi awayekî herî baş vê firsendê bi kar tînin. Me li konên Zagros bi dengê qerebelix ê bagerê xew dikir, li vê derê em li ber dengê ava ku dike xuşexuş û diherike, radizên û hişyar dibin. Derfetên lojîstikê yên li vê derê ne weke Zagros in. Li vê derê dema mirov dixwaze dest û serçavên xwe bişo, tenê di berdêla gelek tiştên Zagros de ye. Di nav hemû xweşikiyên wê de çaya tehl vexwarin jî bi mirov xweşik tê. Ji ber ku şekirê me tine, em çaya tehl vedaixwun. Hevalan îro ji darê hingiv derxistin, ji ber ku şekirê me tine, em çayê bi hingiv vedixwun. Taybetmendiyeke me jî ew e, em li gel xwezayê bûne yek. Em hewl didin ji hemû nîmetên xwezayê sûd werbigirin. Li Xakûrkê vê zivistanê hevalan qederek hingiv derxistibûn. Em encax ji beşeke diyar a vî hingivê sûd distînin, ji ber ku hemû hingivê di daran de derxistibûn û xwaribûn. Di xwezayê de bi hatina biharê re gelek tişt digihîjin. Bi qasî em li dijî xwezayê şer dikin, em hewl didin jê sûd jî bistînin. Ji ber wê yekê li Kurdistanê bûn gerîla cuda ye, tiştekî xweşik e û gerîla sembola xwezaya Kurdistanê ye.

**6’ê Nîsana 1993’yan**

Motora gerîla lingê wî/ê ne. Rêya bi mehan, rojan, saetan bi lingên xwe dimeşe. Çiya û baniyan, deşt û newalan qut dike. Çawa dema ku motora erebeyekê xera dibe naxebite, dema lingên gerîla jî birîndar dibe, gerîla nikare bi rola xwe rabe. Gava ku em hatibûn Xakûrkê berfa di dolan de heliyabû, newal bi berfa dihele forî bûn, dest pê kiribû her der şîn were, çîçekan vekiribûn û bişgokên daran teqiyabûn. Li Zagros em bi hesretê tavê bûn, li vê derê ji ber têhna tavê em xwe diavêjin sîberê daran. Di jiyana nêzîkî çar mehan a Zagros de ji ber qirêjî û dûkela papûran laşê min westiyabû. Dema ku

em ji bo serşûstinê çûbûn ser avê, me dixwest kêliyekê ji beriya kêliyekê ava xwe germ bikin û serê xwe bişon. Li aliyekî ava me germ dibû, li aliyê din me cilên xwe dişûstin. Bi ava germ cil şûstin xweş bû. Ruxmî ewqas qirêjî û gemariyê, ji ber dermanê çeteyan (speh) di seranserê zivistanê de çete neketibûn laşê me. Lê li vê derê çete hebûn. Me bi vê dizanî. Ji ber wê yekê me ji Zagros li gel xwe derman anîbû. Roja serşûstinê me ji vî dermanî zêde zêde di hemû cilên xwe da. Ji bo serşûstinê av germ bibû, êdî dem hatibû ku em qirêjî û gemariya çar mehan ji ser xwe biavêjin. Min ava xwe girt û çûm cihekî dest dayî. Tavê li ezmanan şewq dida. Te digo qey ji bo ku laşê min germ bike derketibû. Min ferq dikir ku heya bi hestiyên min germ dibin. Gava ku min destpêkê ava germ bi ser xwe de kir, recifîm. Bawer im sedem ew bû, em demeke dirêj ji ava germ dûr mayîbûn. Piştre min canê xwe sabûn kir. Dema ez bi temamî pê qeneh bûm ku li ser min qirêj nemaye ji serşoyê derketim. Min cilên xwe yên derman kirî xistin ber xwe. Weke ku nû ji dayik bibûm. Ji nişka ve canê min sivik bibû. Dema diçûm siyê min hîs dikir ku diqerisim. Bawer im dema gemariya ku laşê min dorpêç kiribû rabibû ji nişka ve diqerisîm. Qederekê rehet bibûm û hemû gemarî, westabûna û cangiraniya ku di seranserê zivistanê de nerehet dikirim û bi min re peyda bibû, min avêtibû. Serê xwe şûstin tiştekî çiqas xweş bû, pê bêhna mirov fireh dibû!...

Ji bo anîna erzaq em çûn qampa Zedaî. Dema me newalên ji ber ava berfê forîne qut dikir, hevalan alîkarî dida hev. Dîtina girê Zêdaî û her çendî ji dûr ve be jî dîtina Lêlîkanê ez hestiyar kirim. Girê Lêlîkanê ku di wan pênc rojan de ji bo me bibû kela me ya berxwedanê... Di cih de min hevalên ku di wê berxwedana mezin de şehîd bibûn anîn bîra xwe. Ber bi êvarê ve em gihaştin pirê. Me agirekî mezin hilkir û li derûdorê sohbet kir û xwarin xwar. Piştre em li hawîrdora wî agirî razan. Dubare li derve razan kêfxweşî dida mirov. Dotira rojê, bi berbangê re me xwe gihand qampa xwe. Ji ber ku ev demeke dirêj e ez wisa zêde nemeşîbûm pir westîbûm. Ji ber ku gava me serê xwe şûstibû, min zêde derman bi cilên xwe da kiribû û di zivirîna erkdariya xwe de zêde min xwêdan dayibû, laşê min şewitibû. Di du rojên dawî de di laşê min de gelek birîn derketin. Bi

taybetî lingê min pir zêde şewitibûn. Min nekaribû bimeşim û min êşeke mezin dikişand. Ji ber vê yekê min nedikarî ku tevlî perwerdeyê jî bibim. Dîsa mehkumî konê bibûm. Dema heval diçûn perwerdeyê ez di konê de bi tena serê xwe dimam. Min hin caran pirtûk dixwend û hin caran jî mişk dişopandin.

Tiştekî balkêş ku li vê derê bi ber çavên min diket jî, kêmbûna derfetên li vê derê û li beramberê vê ji aliyê hevalan ve bi awayekî pir baş bikaranîna derfetên li vê derê bû. Ji qazaxên kevn û qetiyayî ji xwe re gora û lepik çêkiribûn. Lê ruxmî zivistana zehmet a Zagros derfetên me hê zêdetir bûn. Me gorayên ku li cem xwe anîbûn li ser hevalan belav kirin. Li Zagros ji ber rewşa hewayê, me nobeda xwe di hindur de li ber sobeyê digirt. Niha dubare em nobedê ji derve digirin. Ev, ji bo mane û girîngiya nobedê qederekê girîng e. Mirov li vê derê her roj dibe şahidê xweşikbûnên nû. Di demek ku em tam fêrî çaya tehl bibûn de şekirê me jî hatibû. Dubare em çaya şêrîn vedixwun. Ji derve, di hênikahiyê de, li ber ava diherike xwarin xwarin, li gel hevalan sohbet kirin, cixare vexwarin pir xweş e.

Ya din jî tiştê ku Xakûrkê xweşik dike şehîdên me ne. Xakûrkê xwediyê roleke mezin ku şerê me yê azadiyê girtiye ser xwe ye. Bi temamî xweşikbûneke xwezayê ye. Bi fêkiyên xwe, bi kaniyên xwe, bi giya û şînatiyên xwe dişibe bihuştekê.

Ji beriya ku bêm nav Partiyê kesayetiya dijmin dixwaze li gel Kurdan bi pêş bixe, bi gelek aliyên xwe ve li cem min jî bi pêş ketibû. Li beramberê gelê Kurd hezkirina min nemayîbû, hestên min ên welatparêziyê biqasî were gotin tine ye kêm bibûn. Ez di wê rewşê de bûm, dema ji min re digotin “tu Kurd î” min zêde bertek nîşan dida. Her çendî hevalê Sertac û Cewahîr bi min re mijûl bûn jî, hewl dan min ber bi rastiyê ve bikişînin jî, min nedikarî ku ez bersîva pêwîst dike bidim van hewldanên wan bidim. Heya ku weke surgîn çûm Îzmîrê. Di pêvajoya ku ez dûrî gelê xwe jiyîme de, hesreta min a ji bo gelê me, çiyayên me, çem û kaniyên me, gul û çîçekên me dest pê kir. Min jî ji bo ku ez bersiveke rast bidim daxwazên hevalên Sertac û Cewahîr dest bi nîşandana hewldaneke diyar kir. Dema ez ji Îzmîrê ber bi çiyayên me bi rê ketim di hindurê erebeyê de xew bi çavên min nediket. Her ku ez nêzîkî sînorê Kurdistanê bûm kelecana

min derdiket asta xwe ya herî bilind. Gava em diketin Kurdistanê min li cem hevalê Ferhad di cama erebeyê de li cihên em tê re derbas dibûn temaşe dikir û me digot, em ê heya bi mirinê careke din ji welatê xwe dûr nekevin. Dema li Erzînganê ji bo xwarinê navber hate dayîn her kesî li loqantayê xwarin dixwar lê me bi biskuwîtên me ji dukanê kiribûn di navbera wan giya û şînatiyên xweşik de, li ber wê hewaya xweşik a ku mirov rehet dike, li ber tava diteyisî dixwar, me hewl dida em ji xweşikbûna xwezayê, ji welatê xwe têr bibin.

Di nav Partiyê de ji kesayetiya ku dijmin mezin kiriye ya ketî xwe rizgarkirin, xwe gihandin kesayetiya şoreşger, guhertin pêkanîn ne hêsan e. Jixwe eger hêsan bûya, hemû pirsgirêkên me çareser dibûn û niha şoreş pêk hatibû. Dijmin bi afirandina vê kesayetiyê, temenê xwe yê li Kurdistanê zêde dikir. Tîpê mirovên nû ku Partiya me li Kurdistanê afirandiye her roj derbeyên bê eman li dijimin dide û wî dîn û har dike. Bi qasî ku Rêbertiya Partiyê didê, li cihanê ti kesî, ti partiyan, ti rêberan girîngî nedaye analîz û tehlîlên li ser kesayetiyê. Ti kesî bi qasî Wî ked nedaye. Li Kurdistanê şoreş li darxistin, bi afirandina mirovê nû gengaz e. Bi afirandina vê kesayetiyê, Rêbertiya Partiyê serkeftineke pir mezin bi dest xistiye. Zehmetî û êşên di têkoşîna me de zehmetî û êşên qet nehatine kişandin in. Lê hevalên me li beramberê van zehmetiyan şer dikin, di her mijarê de jiyanê bi wate dikin. Jiyana me jiyana herî azad e. Têkiliyên me têkiliyên herî jidil in. Hevalên me bi qasî di oxira hev de bimirin bi hev ve girêdayî ne. Em, dê, bav û xwîşk û birayên hev in. Hesretên me, daxwazên me, hestên me, fikrên me yek in. Hemû ev, girêdana di navbera me de xurtir dikin. Îradeya li cem hevalan îradeyeke ji pola ye. Her hevalekî/ê me Mezlûmek e, Bêrîtanek ku guleya dawî bi xwe de diteqînin e, Muratê ku bombeya dawî bi xwe de teqandî ye. Belê, êşên me pir in. Ev êş ji bo me dibin hêza berxwedanê. Zehmetiyên me pir in. Li cem me li pêşberê van zehmetiyan binkeftin tine. Timî êş û zehmetî bi binxistin heye.

Dema em li tabûra perwerdeyê bûn, balafirên şer ên dewleta Tirk qampên me, çiyayên me bombebaran dikirin. Ji tiliyeke hevalekî me xwîn jî nehatibû. Her ku ew çiyayên me yên xweşik dihatin bombebarankirin, her ku ew giyayên me yên zer û kesk dişewitîn,

min êşên mezin dikişand, li hemberê dijmin kîna min zêde dibû. Çi dixwest dijmin ji wan çiyayên me yên bedew, ji kevirên me, ji gul û çîçekên me. Ev çiyayên wisa ne, ji bo mirovahiyê jiyanên nû diafirînin. Bawer im dema em derbeyekê li dijmin didin herî zêde jî çiyayên me kêfxweş dibin. Kê gotiye çiyayên me neaxifin. Bayê bedew, ku piştî her çalakiyê li lûtkeyên çiyayên me tê, zimanê çiyayên me ye. Bi wê hatina xwe ya bedew kêfxweşiya xwe îfade dike. Dîsa ew hewaya paqij a çiyan mirov bi ser xwe ve tîne, zindîtir dike. Ji aliyê din ve ew çem û kaniyên me yên zelal, ava sar ku lêvên me diterikîne, newal... Li ti cihên din hewayeke wisa ya paqij û zelal tine. Qurtek av ji binî ve têhna mirov dişkîne. Qedehek çaya ku ji wê avê hatiye çêkirin hemû westabûna me dibe.

Divê em hemû çiyayên xwe, xwezaya xwe, avên xwe, dar û berên xwe, teyr û tûyên xwe, gul û çîçekên xwe li dijî hemû êrîşên dijminê elçax biparêzin. Yekane rêya vê jî ew e ku em ji Kurdistanê dijmin derxin.

**15'ê Nîsana 1993**

Hemû dema me ya ji derveyê çalakiyan bi perewerdeyê derbas dibe. Perwerde me xurt dike, ji bo pêvajoyê amade dike. Pêvajoya em tê de ne pir nazik e. Ji ber vê yekê perwerdeyên me pir dagirtî derbas dibin. Partî di van rojên dawî de Partî pir bi hevalên Zagros ve eleqedar dibe. Bi taybetî ji ber ku em ji pêvajoyê dûr mayîne zêde li ser me disekine. Di perwerdeya giran ku em tê re derbas bûne de me kêmasiyên xwe dîtin. Me hineke din xwe xurt kir.

Hêdî hêdî vesazî şiklê xwe yê dawî digirin. Bi piranî di asteke bilind de diyar bû ku kî dê biçe kîjan herêmê. Eger guhertinek çênebe ez ê di pêvajoya pratîkê de di nava kar û xebata li eyaleta Behdînanê herêma 3. mintiqeya 2. de cihê xwe bistînim. Em ê li Çiyayê Pîranê, li Deşta Heyatê xebat bimeşînin. Xebat û amadekariyên me dê li ser şer bin, hedefa me ya esasî ew e ku em li Başûr bingehên şerê gerîla ava bikin, gel qezenc bikin û qadên binke ji bo gerîla biafirînin. Me li ser qadê dest bi nîqaşan kiriye. Piştî ku em pêvajoya plansziyê bi dawî dikin em ê berê xwe bidin qada xwe. Ji aliyekî ve ez bi awayekî herî baş hewl didim ji bo pratîkê, berpirsiyariyê amade bikim û ji bo

vê jî hewl didim ji perwerdeya dawî sûdê bistînim, ji aliyê din ve hewl didim Xakûrkêya ku mirov li xwezaya wê têr nabe, ji wan çiyayên wê yên bi heybet, şînatiyên wê, deştên wê, çem û kaniyên wê temaşe bikim, jê têr bibim. Ji ber ku demên dawî balafir vê derê bombebaran nakin balinde dubare dizivirin hêlînên xwe. Em li her alî dengê çûkên ku mûzîkên Rodrîgo, Bêthoven lê didin dibihîzin. Ev deng hin caran ji serê çiyan min dibe cem hevalê Sertac û Cewahîr û hin caran jî min dibe cem gelê me. Bayê hênik ê ji serê çiyan tê mirov rehet dibe.

Li ber dengê balindeyan li gel berekî mezin xwe dirêjkirin, dema dirêj dibe, bi tîrêjên xweşik ên tavê xwe germkirin, dema azmanan dişopîne xwe ji bîrkirin, li cem xwezayê bûn yek, bi gel re bûn yek. Dema tu dizanî di nav dilê gel de dijî, dixwazî ji bo gel, ji bo welatê xwe hê jî şer bikî, derbe li dijmin bidî. Dema min ji dûr ve bi dûrbînê li Lêlîkanê temaşe dikir, di navberê de hevalên me yên şehîd ketine û berxwedana pênc rojan a bi heybet hat ber çavên min. Paşve kişîna di bin gulebaranê de em êşandibûn.

Li cihê ku ez lê bûm bi dûrbîna destê xwe min tabûra me ya perwerdeyê dişopand. Cihê me yê perwerdeyê, cihê agirên mezin ku me bi şevê pêxistine, cihên me yên manga, întişar û nobedê bi awayekî pir zelal xuyaye. Me li wê derê rojên pir xweş û pir bi êş borandin. Lê tiştê herî bi êş li wê derê niha nebûna hevalên me ye. Her ku diçe kîn û hêrsa min zêde dibe.

Her roja ku diçe xweşikbûna xwezayê hê zêde xwe dide hîskirin. Ji bo min karên herî xweşik, karên herî bi kêfxweşî ew in ku mirov ji avên sar vexwe û întiqama di hindurê xwe de di asteke mezin de bi temamî şîn bike, ava ku bi xuşexuşeke mezin ji lûtkeyên çiyan diherike temaşe bike, pancar û giyayên cur bi cur ên herî xweşik bixwe. Min berê qet ev xweşikî û bedewî nedizanîn. Dema tevlî bibûm min meşa xwe ya destpêkê ya dirêj bi qutkirina Zagrosê û bi xwe gihandina tabûra perwerdeyê li dar xistibû. Ji ber ku ev meş hem bi şev pêk hatibû û hem jî dirêj bû zêde westiyabûm. Dema em hatibûn geliyê azadiyê me yek bi yek girên dawî lê nayên qut dikirin. Gava me tepeyek derbas dikir, yekî ji wî hê arwaztir û hê zor û zehmetir derdiket li pêşberê me. Demekê ez hizirîm ku ez ê nikaribim

gerîlatî bikim û bimeşim. Ez ji ber vê yekê xemgîn dibûm. Bi demê re fêrî meşan bûm. Hin caran bêyî ku em bisekinin bi rojan bi saetan em dimeşîn. Li van çiyayên bedew, dîsa dema di şivereyan re mirov dimeşe, dide ser pişta sirtên zêde arwaz kêliyekê zûtir derdikeve lûtkeyê çiyan qederekê mirov kêfxweş dike. Ji bo min êdî meş azwêriyeke dest jê nabe ye.

**22'ê Nîsana 1993'yan**

Dinya ewr e, ezman tarî ye, bayekî hênik tê. Wisa xuya dike dê baran bibare. Dema baran dibare, konê ku bi awayekî pratîkî çêkiribû, hema dikir ku hilweşe. Dilopên baranê ji laylonê kun ê konê, dikevin hindur. Her ku baran xweş dike, dilopên dikevin hindûr jî zêde dibin. Em hewl didin bi agirê ku me li cihekî destdayî yê konê xwe hilkiriye, xwe germ bikin, xwe zuwa bikin. Dilopên dikevin li ser agirê me, dibêjî qey hewl didin agir bitemirînin. Lê em darên zuwa ku me berê kom kirine diavêjin ser agir û hê jî mezin dikin. Li derûdora agirê ku xweş dibe, em bi dorê xwe zuwa dikin.

Plana me ber bi dawiyê ve diçe. Me ji bo qadê grûba xwe ya kişfê bi rê kir. Ji beriya mirov bikeve qadê, kişfkirina qadê helwesta herî rast e. Dema ez sibeyê rabibûm, direcifîm. Min dixwest agirê li pêşberê xwe hemêz bikim û xwe zuwa bikim. Bi şevê pir qerisîbûm. Ji bo xwe germ bikim min lingê xwe nêzîkî agir dikir. Dema sibeyê rabûm, bêyî ku pê bihesim min goreyên xwe şewitandibû.

Barana bariyabû her der şîn kiribû. Mêwên tirî yên li pêşberê me, darên guzan dest pê kiribûn şîn bin jî. Em bi xwe di nav dolê de li pêşberê neqebê bi cih bûne. Hawîrdor şipûşîn e. Çîçekên cur bi cur hene, yên zer, sor, xemr û helesorî ruh didin mirov, mirov dibin cîhaneke pir cuda. Dema bi rê de dimeşim hewl didim van çîçekên pir xweşik, van çîmen û giyayên mezin dibin neperçiqînim. Ma jixwe dijminê zalim ji bo ku li çiyayên me ev çîçekên pir xweşik venedin, çîmenên me şîn neyên, darên me mezin nebin her roj bombebaran nakin? Em neçar in van xweşikiyan ji dijmin biparêzin. Mirov li van xweşikiyên çiyayên me bedew dikin mêze dike, bêhna xwe vedike û îstirehet dike. Ji ber wê yekê dema dimeşim ji bo pêlî wan nekim hewl didim li cihên çîçek, giya, çîmen tine bimeşim. Dîsa, dema tav

derdikeve di nav giya, çîçek û çîmena şîn de rûniştin, xwe dirêjkirin, cixare pêçandin û kişandin û dema li gel hevalan sohbet dike, guh dan ser dengê çûkên ku dixwînin hem bêhna mirov vedike, hem jî me heyranê xwe dike. Em di nav van dîmenan de hemû westabûna xwe ji ser xwe diavêjin. Her çendî, pêşî, vê rewşa me bihesûdin û bixwazin me ecz bikin jî em guh jî nadin wan.

Hêdî hêdî bi her awayê giha tê rewşa were xwarin. Em ji xwe re ji van giyayan didin hev xwarin çêdikin. Em herî zêde jî giyayên weke kîvark, kereng, tûzik, guhreşik û hwd. Kom dikin. Piştî ku em van xwarinên xweşik dixwun birincê ji bîr dikin. Ji ber her tim xwarina birincê, li beramberê birincê li gel me hemûyan alarjiyek çêbûye. Ev giya ji me re weke derman tên. Dîsa, dema erkek derdikeve dixwazim biçim. Dema diçim erk û wezîfeyan hem vedibim, hem jî dikarim gelek xweşikî û bedewiyan bibînim. Ya din jî dema navber bidî, xwêdana ji eniya te tê xwarê paqij bikî, piştî ku bi wê ava sar serçavên xwe bişoyî têra xwe avê vexwî... Kî dizane xweşikî, bedewî û dewlemendiyên cuda cuda yên her çiyayê Kurdistanê. Niha sedemên ku dijmin naxwaze ji welatê me derkeve û tiştên pêwîst e em bikin hê baştir fêm dikim. Divê em berdêla her bihosta axa xwe ji vî dijminê bistînin.

**3’ê Gulana 1993’yan**

Li lûtkeyên çiyayên me roj wisa zû derbas dibin, tu nizanî çawa derbas dibin. Me 1’ê Gulanê bi awayekî azad li lûtkeyên çiyayên me bi coş û kêfxweşiyeke mezin pîroz kir. Yek’ê Gulanê ji bo me xwediyê mane û girîngiyeke cuda ye. Em li lûtkeyên çiyayên xwe, di destê me de bi qilêşa xwe, tevî hevalên xwe bi marşên karkeran ku em dixwînin û bi têkoşîna xwe, têkoşîna wan a herî baş a proletarên ku di vê rojê de dibin yek, di vê rojê de mil didin milê hev dimeşînin.

Her roja derbas dibe çiyayên me wisa bedew dibin, tu nizanî li vê derê roj, hefte, meh çawa derbas dibin pê jî nahesî. Dema min li lûtkeyên çiyan ji aliyekî ve geliyên kûr, darên weke çîçekekê xweşik ên di nava geliyan de temaşe dikir, ji aliyê din ve jî dihizirîm ku min ji bo vê pêvajoyê pir nazik çiqas xwe amade kiriye. Ji ber ku ji bo em ji her aliyê ve xwe amade bikin, Partiyê bi her awayê derfet dane me.

Agirbesa ku Partiyê daye destpêkirin wisa dijmin tengav kiriye, dest û lingên wî girêdaye, kiriye wê rewşê ku nizane çi bike. Ev agirbes, ji bo yên ku ji Partiya me re dibêjin “terorîst e”, ji bilî çekê ji ti tiştê din fêm nake”, bersiveke herî baş e. Hemû rastiya dijmin derket holê. Yê ku ji bilî têkoşîna çekdarî ti rêyên din ji me re nas nake dijmin e. Em ji bo çareseriya bi her awayê amade ne û em bi xwe bawer in. Di Newrozê de li gorî vê agirbesê tevgerîna gelê me nîşan dide ku ew bi Partiya xwe re bi Serokê xwe re çiqas bûye yek.

Bi sûd wergirtina ji pêvajoya agirbesê, me gelek kêmasiyên xwe temam kirin. Me perwerde û rêxistinbûna xwe hê bi tendirustî pêk anî. Vesaziyên me bi awayekî hê rasteqînîtir hatin kirin. Şiklên wan ên dawî hatin dayîn wan. Hema bêje hemû grûbên me berê xwe dan herêm-qadên xwe. Eger agirbes xelas be, ji bo ku bi ruhê êrîşê berê xwe bidin dijmin hatin rewşa amade. Di pêvajoya vê agirbesê de sê caran vesaziya min hate çêkirin. Herî dawî di taxima Xakûrkê de min weke fermandarê taximê erk stend. Ev pêvajo pir girîng û nazik e, ya din jî dema em dikevin vê pêvajoyê erkdarbûna min berpirsiyariya min hê jî zêde kir. Lê ya girîng ew e, mirov heqê erkê girtiye ser milê xwe bide û pêwîstiyên pêvajoyê bîne cih. Bi xelasbûna agirbesê re hem dê bi pêngavên xurt pêvajoyeke nû were destpêkirin, hem jî dê dijmin derbeyên wisa bixwe ku ew bi xwe jî fêm neke çi dike.

Dema em berê xwe didin kêmasiyên xwe hem em bi hêz dibin, hem jî em lewaziyên xwe ji holê radikin. Hin caran dema mirov kêmasiyên xwe nabîne, eger hevalek wê kêmasiyê ji we re diyar bike û ji bo ku tu vê kêmasiyê ji holê rakî alîkarî bide te, mirov qederekê bextewar dike. Bi vî awayî tu kêmasiyeke xwe ya nû dibînî. Ya din jî tu ji bo ku vê kêmasiyê ji holê rakî, ji hevalê/a xwe alîkariyeke pir mezin distînî. Bi vî awayî dema tu ji aliyekî ve hêzê distînî ji aliyê din ve jî, hê baştir jidilbûn û duristiya têkiliyên di navbera hevalan de fêm dikî. Jixwe li cem me heval ew kes e ku kêmasiya hevalên xwe ji holê radike, hêzê dide wan. Her ku em wisa alîkariyê didin hev, girêdana me ya bi hev, rêza me ya ji bo hev hê jî zêde dibe. Her ku em berê xwe didin kêmasiyên xwe û wan ji holê radikin serkeftin a me ye.

Li ber baranê meşîn, dema mirov dimeşe xwezaya bi baranê hê jî xweşiktir dibe şopandin, her ku dilopên baranê dikeve li ser giya û şînatiyan, bêhna wan giya û çîçekên ku hezar qatî ji wan bêhnên li febrîqayan tê çêkirin xweşiktir in mirov dixe tevgerê. Ev bêhna ji bo me dibe dopîng, dibû sedem ku em hemû westabûna xwe ji ser xwe biavêjin.

Xwezaya Kurdistanê jiyan e. Ji bo jiyana nû xwezaya herî îdeal e. Sembola vê xwezayê, yên ku li ser xweşikbûna wê zêde dike, yên ku dixwazin wê ji dijmin biparêzin hevalên me ne. Em her giyayê ku li xwezaya me şîn tê kom dikin û dixwun. Em dikarin bi van mîmetan bi rojan bi hefteyan, heta bi mehan bêyî ku ti tişt hebe bijîn. Ruxmî ku erzaqê me zêde ye, em bi giyayên ji xwezayê kom dikin, dijîn. Her cara ku em xwarin dixwun ji van giyayan yek yan jî çendek, ser sofreyên me dixemilînin. Di vê mehê de dema çay, şekir, ard û rûnê gerîla hebe, li her derê xwarinên herî xweş dikare çêbike û bixwe. Pêwîstî bi erzaqên cuda nabîne. Dikare demeke qederekê dirêj bi giyayên heyî jiyana xwe bidomîne.

Ji ber ku dijmin vê zivistanê êrîşê Geliyê Azadiyê nekiribû, bombe nekiribû di encamê de ev xweza wisa xweşik bibû. Ev xweşikbûn, di mirov de hestên azadiyê hê jî mezintir dike. Her ku diçe zêdebûna zindiyan, sivoriyên ji daran xwe diavêjin ser dareke din, zêdebûna çûkên ku serê sibê zû xweş dixwînin, hestên mirovan ên jiyînê xurtir dike, jiyanê balkêş dike. Em di vê xwezaya xweşik de ji bo ku gelê me azad bijî di demeke zûtirîn de êrîşê dijmin bikin û pêwîst e dawiya wî bînin. Dema ku em ji bo rizgarî û azadiya gelê xwe li dijî vî dijminê bêbext şer dikin, ji aliyê din ve ji bo ku gelê me demekê ji beriya demekê bi xweşikbûnên Kurdistanê re, bi van xweşikiyan bi azadî hemêz bike em ê bi awayekî dijwartir êrîşê dijmin bikin. Pêwîst e em li ser vê bingehê xwe amade bikin. Di nav van hemû xweşikbûnan de bi hevalan re li derûdora vî agirê mezin li ser pirsgirêkên me yên şer nîqaş kirin, jiyana me hê jî bimane dike. Sohbetên tên kirin, dilê me rehet dike û morala me xweş dikin. Em dem bi dem bi hevalan re derheqê xwezaya hemû Kurdistanê de nîqaş dikin, her yek ji me xweşikbûn û bedewbûnên em dizanin vedibêjin. Ji sohbetên vala, em xwe didin aliyekî.

Jiyana me çiqas xweşik e, çiqas kêfxweş im, bi gotinan nikarim bînim ziman. Rojek dê bê ez ê van hestên xwe bi awayekî herî baş bînim ziman, bi awayekî herî baş îfade bikim. Dixwazim van xweşikbûn û bedewiyan bi awayê helbest bînim ziman. Lê nikarim binivîsim. Eger min karibûya bi awayê helbest hêstên xwe bianiya ziman, dibe ku hê kêfxweştir bûma.

**25'ê Gulana 1993'yan**

Di qada me de amadekariyên me yên şer pir bilez didomin. Me li piraniya qada xwe amadekariyên xwe yên bicihbûnê temam kirin. Hevalên grûb bi grûb hatine birêxistinkirin li qadê xebata bicihbûnê pêk anîn. Em hema bêje li her girê stratejîk hem erzaq û hem jî cebilxane bi cih dikin. Eger em amadekariyên xwe li ser vê bingehê temam bikin, di şerekî îhtimal heye li qadê pêk bê de em dikarin pir bi hêsanî derbasî gerîla bibin. Eger em şerê gerîla rast bimeşînin, hem dê dijmin derbeyên mezin bixwe, hem jî dê nikare li ber xwe bide û bi paşde bikişe. Em timî di tevgerê de bûn. Me hewl da em erkên li pêşiya xwe pêk bînin. Timî di tevgerê de bûn çiqas xweş e. Bêtevger bûn ji mirov re weke mirinê tê. Min ecz dike, dixwazim timî di tevgerê de bim, li her derê bigerim, her derê nas bikim û ji bo her derê şer bikim. Her ku diçe operasyonên dijmin zêde dibin. Di serî de li Amedê dijmin li ser gerîla û gelê me êrîşên xwe zêde kirine. Ruxmî ku me agirbesa yek alî ragihandiye, dijmin ji aliyekî ve ti gavên êrênî neavêtiye û ji aliyê din ve jî êrîşên xwe yên li dijî me û gelê Kurd zêde kirine. Eger ev êrîşên dijmin bi vî awayî bidomin, weke Serokatiya Partiyê jî diyar kiriye, em ê bi misogerî mafê xwe yê parastinê bi kar bînin. Em ê vê carê bersiveke wisa bidinê, di Kurdistanê de wî bixeniqînin.

Hemû hêza me bi awayekî amede li benda talîmata Serok e. Hemû qederekê bi hêz bûn. Hêza me ti carê di vê astê de xwe amade nekiribûn. Ji vê bi şûnde berdewam kirina agirbesa bi yek alî zêde ne watedar e. Agirbes bi rola xwe ku jê dihate hêvîkirin rabû. Bi vê agirbesê qebiliyeta manewrayê ya Serokatiya Partiyê derdikeve holê, nîşan dide ku dijmin bi awayekî çiqas xefilanê xistiye xefikê. Di Kurdistanê de û di qada navneteweyî de raseriya siyasî ya dijmin

ketiye destê me. Di qada siyasî de fersenda êrîşê ketiye destê me. Partiya me dê van derfetên derketine holê bi awayekî herî baş bi kar bîne. Dijminê ku di çareseriya leşkerî de bi israr bû, bi bersiv nedana agirbestê, careke din jî şaşiteyeke dîrokî kir. Ji aliyê leşkerî ve jî em pir xurt bûn. Me gelek lewaziyên xwe derbas kirin. Li gelek cihan me amadekariyên xwe yên şer temam kirin. Bi çalakiyên xwe yên leşkerî ku em ê ji vê bi şûnde bi pêş bixin, em ê ji binî de li Kurdistanê dijmin ji holê rakin. Pêvajoya agirbesê derfet da me ku em bi her awayê amadekarî bikin. Eger em di pratîkê de ji van derfetan baş sûd wergirin, misoger e ku em sala 1993'yan bi serkeftinê biqedînin.

**6'ê Hezîrana 1993'yan**

Ji bo min maneyeke cuda ya Hezîranan heye. Min di duyê Hezîranê de pêlî du saliya xwe kir. Roja min a jidayikbûnê ye. Par di vê rojê de tevlî Partiyê bûm. Nêzîkbûna gel di pêvajoya li Îzmîrê li malên welatparêzan mayîme de, qîmeta wan dida me, hê ji beriya em bên çiya hêza moralê dabû me û li cem min ji bo gelê me bi ruhekî hê biryardar û xwediyê azwerî şerkirinê afirandibû. Min dîtibû ew dapîra Mêrdînî ku em du rojên destpêkê, li mala wê mayîbûn a di temenê xwe yê heftêyî de bi hesreta welatê xwe dişewite. Dema ew dapîra me bi me re diaxifiya bendewariyên xwe dianîn ziman, Kurdistan û zehmetiyên kişandibûn vedigot. Her ku wê greva birçîbûnê ya ketibûyê ji min re vedigot, her ku şerê xwe yê li gel polîsan vedigot, her ku min hesreta welat a li gel wê didît, min dixwest demekê ji beriya demekê bikevim şer û ji bo daxwazên gelê me bibim bersiv. Her ku min ev malbatên welatparêz didît, min ji xwe re digo, ez ê layiqê van mirovan bim.

Di nav gelê welatparêz ê Merdînê de deh roj mam. Biryardariya têkoşînê ya bi wan re, welatparêziya wan, girêdana wan a bi Partiyê re, baweriya wan ez hestiyar dikirim. Salek bû ji wan qetiyame. Baweriya min heye ew her roja derbas dibe hê çalaktir tevlî têkoşînê dibin. Ez jî ji bo bibim layiqê gel, welatparêzan û dapîra me ya êxtiyar hê zêde hewl didim.

Di demên dawî de em bi awayê manga bi manga tevger dikin. Hin caran diçin cihên cuda, hema bêje em li hemû qadê digerin. Li

Xakûrkê hemû tişt bi hemû xweşikiya xwe didome. Piştî meşekê ji bo îstirehetkirinê cihekî lê mayînê peyda kirin û dar kom kirin, çayeke tarî çêkirin û vexwerin...

Li vê derê her tişt pir baş e. Tenê yek tiştê ne xweşik heye, her der tije pêşî ye. Firsendê nadin me, em îstirehet bikin. Timî me ecz dikin. Em hewl didin tedbîran bistînin. Em li pey hev cixare dikişînin ku wan bi dûkelê dûr bixin. Em kefyeyên xwe baş li serê xwe dialînin. Em agir dikin û dûkel derdixin, lê yek jê feyde nake, pêşî bi me ve didin. Ji her derê me xwîn tînin. Dema meşê, dema di nava xwêdanê de arwazê girekî derdikevim hin caran sê-çar pêşî dikevin qirika min. Sîstema min a siniran têk diçe, dîn dibim. Ez dibêjim, xwaziya ev pêşî zindiyên mezin bûna da ku min karibûya bi wan re şer bikira, min ji wan tola xwe ya ketina qirika xwe bistenda.

Ji ber ku dinya germ û vekiriye, derfet peyda dibe ku em serê xwe bişon. Piştî meşeke dûr û dirêj dema hê xwêdan li ser mirov e, tevî cilên li ser xwe mirov noqî nav avê bûyin û serê xwe şûstin, hem zêde pratîk e û hem jî pir kêfxweşî dide mirov. Dijmin di van rojan de operasyonên xwe didomîne. Heval jî ji bersivdayînê xwe nadin aliyekî. Li qada me jî em hêdî hêdî bersivê didin dijmin. Ev jî moralê didê mirov.

Ji nû ve ji dayikbûn, di nava hemu xweşikiyan de saleke din jî mezin bûn û di nava van xweşikiyan de mezin bûn pir baş e.

Her bijî Rêberê me yê neteweyî Apo ku em ji xewa mirinê şiyar kirine, ji nû ve şensa jiyanê dide me, me bi jiyanê dide qezenckirin!

### 7'ê Hezîrana 1993'yan

Agirbesa bi yek alî ku di nav raya giştî ya cîhanê de raseriya [üstünlük] siyasî xistiye destê me, deşîfre kiriye ku hêza esasî ya li ser gelê me terorê pêk tîne, bi daxuyaniya ku Rêbertiya Partiya me di nehê vê mehê de kiriye dawî lê hat. Li beramberê KT'ê şerê topyekûn hate îlankirin. Agirbes bi rola xwe rabibû. Li gorî min jî tam dema wê bû. Bi dawî lêhatina agirbesê re li beşeke mezin a welêt êrîşên gerîla zêde bûn. Gelê me jî êdî dê ji her aliyî ve tevlî vî şerî bibe, bersivê bide bangawaziyên seferberiyê, di vê pêvajoya ku di qada siyasî de derfeta êrîşan dide me de bi derbeyên xurt ên ku em ê lê bidin li gelek qadan em ê îqtîdara bi du alî ava bikin. Di qada leşkerî de jî, dê derfet derkeve holê ku em êrîş bikin û li Kurdistanê her roja derbas dibe

hineke din dijmin xelas bibe. Em ê jî bi Rêbertiya xwe ya bihêz bi ser bikevin û biçin serkeftinê.

Çi xweş e, li çiyayên me jiyîn, ji bo azadiya gelê me şer kirin. Weke ku Serok Apo jî dibêje, li Kurdistanê şer kirin jiyîn e. Jiyana me, azadiya me, serbilindiya me, hemû bi lûleyê çekê ye. Em van hemû destkeftên xwe deyndarê guleya di devê tifingê de, deyndarê hewanê, topê, yanî deyndarê têkoşîna çekdarî ne. Destkeftên me yên ji vê bi şûnde jî dê bi têkoşîna çekdarî bibin. Di têkoşîna çekdarî de bûn milîtanên Partî, li dijî dijmin şerkirin, bi armanca tolstendinê jiyîn û ji bo stendina tola koletiya sed salî ketin nav şerê germ û careke din jê derneketin, coş; hemû ev îfadeya girêdana bi jiyan û şer ve ne.

Dema em li cih û rewşa herêma me dinêrin di yekirina şoreşa Bakur û Başur de bi rola pirekê radibe. Ji ber peymana bi hêzên îxanetkar re hatiye girêdan vê gavê li qada me ji bo niha şerê germ tine ye. Lê ez dikarim bêjim amadekariya me jî temam e. Pir dixwazim di her çalakiyê de cihê xwe bistînim. Dixwazim biçim qad û herêma ku bi awayekî herî giran şer lê tê jiyîn. Kêm be jî divê ez hêrs û kîna di hindurê xwe de vala bikim. Divê ez heyfa birayên xwe û hevalên xwe rakim. Lê erka Partiyê pîroz e. Îradeya me ji bo Partî ye. Eger Partî li ku derê, çi erk bide, em ê hewl bidin li wê derê bi awayekî herî baş wê erkê bi cih bînin. Em ji bo her tim, ji her erkê re amade ne. Vê gavê erka li ser milê min dikeve jî, ji bo her kêliyê, xwe û hevalên xwe anîn rewşeke amade ye.

Di konferansa eyaletê ku hatiye lidarxistin de biryarek ku hatiye wergirtin jî ew bû, divê her herêm 45 rojan carekê civîna xwe li dar bixe. Herêma me jî di vê pêvajoyê de civîna xwe çêkir. Civîn du rojan berdewam kir. Cih û rewşa eyaleta me, rola herêma me, ji hedefên me xistibûn pêşiya xwe, çiqas ji wan pêk aniye, kêmasî û nebesiyên di nav pêvajoyê de li cem me bi pêşketine çi ne, me hemû ev hê zêde derxistin zanebûnê. Ji bo ku herêma me were xurtkirin û amadekariyê me yên şer û bicihbûnê, tam werin kirin me planên hê zelal û safî xistin danîn pêşiya xwe. Di hindurê taximan de guherînên biçûk hatin çêkirin. Beşa rexne û rexnedanê ku di civînê de hatiye bipêşxistin, bû sedem ku em encamên hê erênî derxin. Eger em bi

wêrekî û zanebûn biçin ser nebesiyan, ev nebesiyên me tên derbaskirin, li şûna wê aliyên me yên hê saxlem û me bixin tevgerê derdikevin holê.

**29'ê Hezîrana 1993'yan**

Piştî ku encamên civîna herêmê weke rapor hate sererastkirin, mangaya me li ser esasê ku van raporan bigihîne rêveberiya jor ber bi Şehîdan ve bi rê ket. Me bi şev amadekariyên xwe temam kirin. Moral û kêfa me di cih de bû. Ji bo demeke kurt be jî em diçûn welêt. Bi taybetî hevalê Kemal ku ev sal û nîvek e ji Xakûrkê derneketiye û hevalê Mehmûd ku cara destpêkê ye dê biçûya Zerzanê, qederekê bi kelecan bûn. Kêfxweşiya wan di çavên wan de xuya dibû. Hê ji beriya ku tav derkeve me xwarina xwe xwar û em bi rê ketin. Bi rê de ji ber ku dê biketina welêt kêfxweşiya xwe dianîn ziman.

Me xwe gihand Dola Xedarê. Li pêşiya me av hebû. Diviyabû em avê qut bikin. Me li avê mêze kir û me got em dikarin avê qut bikin. Li Kurdisatanê çêm û rûbar pir dîn û har in. Divê mirov lê mêze neke û xwe nexapîne. Lê min xwe xapand. Min nikarî bi zehmetiya avê bifikirim. Destpêkê hevalê Ferîk li avê da. Heya bi nîvî çû, piştre dema fêm kir dê nikaribe qut bike paşde vegerî. Dema ew zivirî ez hizirîm, eger ez biçim heval dê li min mêze bikin û werin. Min pêlav û gorayên xwe ji lingê xwe derxistin, şalê xwe heya bi ser çongên xwe hilmalişt, gora xistin hindurê pêlavan, çeka xwe da milê xwe. Bi awayê çente li milê min, pêlav di destê min de hêdî hêdî bi pêş ve meşîm. Berên tûj ên di binê avê de lingê min dibirîn. Min êş dikişand. Her ku min gava xwe diavêt herikîna avê xurtir dibû. Her ku herikîn xurt dibû, min digo ez ê li ber xwe bidim. Heya bi nîvî çûm. Lingê mim westiyabûn. Êdî min nedikarî li ber xurtbûna avê xwe ragirim. Kêm mabû xelas be, lê cihê herî xurt ê avê bû. Avê dida singa min. Carekê min li herikîna avê mêze kir. Di wê navberê de ez gêj bûm. Bi gejbûnê re ketim nav avê. Di wê navberê de min nedizanî çibikim. Min melevanî jî nedizanî. Eger min bizanîba jî li cihên wisa ti sûda wê nabe. Yek-du caran bi bin avê ketim û derketim. Bila li aliyekî bimîne ku ez bi avê re mijûl dibûm, berên di binê avê de derfeta tevgerê de nedidan. Li aliyekî bi avê re mijûl dibûm û li aliyê

din jî bi hezar zehmetiyê rabûm ser piyan. Di wê navberê de hevalekî qûndaxa çeka xwe dirêjî min kir. Piştî ku li dijî avê hinekê li ber xwe da min qûndax girt. Û ji avê derketim. Bi ketina min a destpêkê re avê pêlavên min bir. Heya bi serê xwe bibûm av. Min di cih de notên di nav çenteyê xwe de derxistin. Ji ber ku not baş hatibûn pêçandin tiştek bi wan nehatibû. Radyoyê min û tiştê li ser min şil û pilo bibû. Me dotira rojê hemû li ber tavê raxistin. Dema ketim avê ji bo nekeve, min çeka xwe bi xwe ve şidandibû. Piştî ku ji avê derketim, min dît keviran lingê min ê çepê ji sê cihan ve birîbûn. Xwîn jê dihat. Min ji şutikê qetek qut kir û pê pêçend. Ruxmî tava sincirî hema direcifîm. Hevalan agir kirin. Min hewl dida xwe zuwa bikim. Lê pir diqerisiyam. Ji ber wê yekê min qedehek çay vexwar. Hinekê germ bûm. Diviyabû demekê ji beriya demekê em bi rê biketana lê ji bo meşê pêlava min tine bû. Hinekê li wî aliyê me zomeke nû hatî hebû.

Ev, Kurdên ji Îranê bûn. Min ji hevalan re got, biçin zomê cotek pêlav bînin. Du heval çûn. Min jî tiştên xwe kom kirin. Piştî kêliyekê hevalekî pêlaveke laylon a kevin, qetiyayî anî. Pir biçûk bû. Tenê dikarî tiliyên lingên min bikevinê. Lê ez neçar bûm heya bi konên Zagros bi vê îdare bikim. Jixwe gundiyan nexwestibûn wê jî bidin. Me li cihekî li nêzîkî zomê heman av dîsa qut kir. Dema av qutkirinê tirsa avê ket dilê min. Min bi tirs av qut kir.

Ti carê ji mirinê natirsim. Pir baş dizanim, divê şoreşgerek, şervanekî/ê azadiyê, hem ji bo jiyanê û hem jî ji bo mirinê her kêliyê xwe amade ragire. Ya ku ez qebûl nakim tenê şehadetên ji rêzê ne. Ez dixwazim, dema ez bi dijmin re şer dikim weke bombeyeke biteqim û şehîd bikevim. Eger di vê avê de şehîd biketama, dê şehadeta min weke baloneke temirandî bibûya, wê demê pir ji vê pir êş bikişanda.

Piştî ku me av qut kir, em ber bi Çadir ve bi rê ketin. Heya em gihaştin wê derê gonî hebûn. Ji aliyekî ve lingê min ê keviran birîbû jan dida, ji aliyê din ve jî hemû goniyên di lingê min re diçûn nedihiştin bimeşim. Hevalan hin caran rewşa min dipirsîn. Min jî digot, pir baş im. Ji destpêkê heya bi dawî bi rê de me jin û zarok, gelek mirov dîtin. Hemû diçûn zomên xwe. Heya em gihaştin konê em qederekê westiyan. Me ew şev li Çadır de derbas kir. Neçar mam, ji xwe re pêlaveke nû bikirim.

Em difikirîn sibeyê zû bi rê bikevin. Lê sibe cebilxane hate Çadır. Pêwîst bû cebilxane bilezgînî bigihîje hevalên li Zerzanê. Hevalên rêveberiya Çadirê bi min re axifîn. Gotin ku em cebilxaneyê li gel xwe bibin. Xuya bû amadekariyên çalakiyê tê kirin. Me ji konê hevalekî ku ji bar barkirinê fêm dike jî girte cem xwe û em bi rê ketin. Mîqtarê cebilxaneyê ne kêm bû. Tevî bîsiwîng, bombe, BKC, qilêş û guleyan me hewana 57 mm jî dibir. Pêwîst bû di seranserê rê de me bi berpirsiyariyeke mezin tevger kiribana. Ji ber ku pêwîst bû bi awayekî saxlem cebilxane bigihîşta cihê xwe.

Li cihekî nêzîkî paygahê ji bo ku dinya tarî be em li bendê sekinîn. Piştî ku bi temamî dinya tarî bû em bi rê ketin. Ez û hevalê Zafer em li pêş dimeşin. Her heval li gel hestirekê bi mesafe dimeşe. Dema meşê jî em timî pêşiya xwe kişf dikin. Piştî ku em gihaştin gir, em hêdî hêdî xwe ber didin dola ku paygah lê ye. Şewqa paygehê her der ronî dikir. Me bi mesafe û li ber sîbera sirtan bi awayekî bê deng paygeh derbas kir. Piştre em li cihekî destdayî sekinîn û navber dayê. Dotira rojê em çûn Sergerê. Heval ne li cihê xwe bûn. Me, şev li vê derê borand em sibeyê zû rabûn û ber bi Şehidan ve bi rê ketin.

Ji ber ku me cebilxane saxlem gihandibû hevalê, dilê me rehet bibû. Destpêkê hevalan ji me re pêşketin vegotin. Di vê navberê de ji Şemzînanê tevlîbûnên nû hebûn. Donzde kes tevlî bibûn. Hatin cem me. Milîsekî me jî bi malbatî tevlî bibû. Deşîfre bibû. Çar zarokên wî hebûn. Hemû heval bi zarokên biçûk mijûl bûn. Kêfa min jî pir ji wan re hat. Kêm be jî min hewl da hesreta xwe ya bi zarokan derbas bikim.

Min xwest, li vê derê diranê xwe yê diêşe bikişînim. Doxtor Dijwar li wê derê bû. Lê ez pir ditirsiyam. Navê ‘Dijwar’ çavê mirov ditirsand. Di nav me de doxtorê herî zalim, herî bêrehm bû. Hevalan jê re digotin, “Qesab Dijwar”. Ji ber ku êşa diranê min zêde bû min biryar da bidim kişandin. Lê belê sehma wî çêkiribû, heya bi kêliya dawî ez bi şûnde didam. Min digot, hê zêde bitewizîne bila nêeşe. Du derziyên tevizandinê li diranê min da. Min ferq dikir ku diranê min teviziyayê. Dema doxtor got, ma diranê te tevizî”, min digot na, netevizî heval. Piştî ku Qesab yek- du caran tewizand, pense xiste destê xwe û yek-du caran çep û rast kir, kişand. Destpêkê ji ber

bandora dermanê tevizandinê ez bi êşê nehesîm. Lê dema dest pê kir dermanê tewizandinê bandora xwe wenda bike, erzinga min pir zêde diêşiya. Bi rastî jî mafê hevalan hebû. Hevalê doxtor weke qesaban bû. Min got, ez ê careke din diranên xwe pê nedim kişandin.

Piştî ku em du rojan li Şehîdan man, me şervanên nû jî girtin gel xwe û dubare ber bi Xakûrkê bi rê ketin. Şervanên nû ji bo me bibûn moral. Ruxmî ku nû bûn bawer im taybetmendiyeke Botaniyan e, pir bihêz bûn. Tu dibêjî qey ji mêj de gerîla bûn. Tevlîbûna van hevalan dê li Şemzînanê bandoreke erênî bikira.

Rêwîtiya me bi coş û moraleke mezin derbas bû. Li nuxteya me ya ku em lê mayîbûn a dawî me qezayek derbas kir. Em li şûna zomekê bûn. Em li şûna konekî kevn rûniştibûn û me çaya xwe vedixwar. Ez şipiyabûm. Min ji hevalê Ferîk qedeh xwest. Ew li erdê rûniştibû. Ji bo girtina qedeh, min xwe tewand. Ji nişka ve gule hatin reşandin. Di ser serê min re tiştekî weke porê min ji kok ve qut bike bi şidet derbas bû. Me hemûyan xwe avêt erdê. Di wê navberê de li çeka xwe geriyam. Hevalê nobedar got ku dengê guleyan ji hindur hatiye. Min heval aram kirin. Hevalê Mezlûm bi çekê leyistibû. Di lûleyê çekê de gule hebû. Hevalê Mezlûmê ku nû tevlî bibû bêyî ku bizane, pêlî textikê kiribû. Lê şensa me hebû, ti heval birîndar nebûn. Kêmasiya me bû. Diviyabû em li cem hevalên nû rûdiniştin me gule ji ber çekê derxistana. Piştî ku me ji hevalan re got ku pêwîst e em ji kêmasiyên xwe ders derxin me rêya xwe domand. Hevalên nû ji bo perwerdeyê ji Konê çûn Xakûrkê. Em jî dubarê bi awayê ku me erka xwe bi cih aniye vegerîn Xakûrkê.

Di rêwita vê erkê de min du xetere derbas kirin. Jiyan bê xetere nabe. Her kêliya jiyana me, xetere ye. Lê eger baldarî hebe, dibe ku ev xetere pir were kêmkirin. Pêwîst e ji vê bi şûnde hê baldar, hişyar û heses bim.

**9'ê Tîrmeha 1993'yan**

Di siseyê vê mehê de me li dijî dijminê ku li tepeyê Gelişîmê mewzî girtibû çalakiyek li dar xist. Me li nuxteya Sêgoşeya Zagrosê amadekariyên xwe yên çalakiyê kirin. Mangaya me ji Xakûrkê ji bo çalakiyê cebilxanê anî. Keşfa çalakiyê, planê çalakiyê amade bû. Di

mangayê de tenê ez tevlî çalakiyê bûm. Sibeya roja ku çalakî bihata lidarxistin grûbên çalakiyê hatin xwendin. Grûba me hem grûba parastinê û hem jî grûba tacîzê bû. Diviyabû piştî vê, çalakiyên berfireh bihatana kirin. Eger me di terza xwe ya heyî ya çalakiyan de berdewam bikira, eşkere ye em ê jiderveyê tektîkîbûnê bijîn. Pêwîst bû em ji hedefên navîn dest pê bikin û berê xwe bidin pêşxistina çalakiyên li ser hedefên mezin bên lidarxistin.

Tepeyê Gelişîmê ku hedefa me bû, hedefeke di rewşa navîn de bû. Ev girê ku me êrîşê wî bikirana, dê mewziyên pêş yên vê hedefê bihatana îmhakirin. Plansaziya me li ser vî esasî pêk hat. Plansazî hate xistin dengdana hevalan û hate pejirandin. Me parolaya xwe ya di çalakiyê de jî diyar kir. Parolaya êrîşê, teqîna destpêkê ya B-7'ê ku ji aliyê grûba êrîşê bihata kirin bû. Parolaya hawar 'şer' bû, parolaya şehîd 'egîd' û parolaya birîndar hene jî 'mezlûm', ya paşde kişanê jî 'ezîz' bû. Saeta destpêkirina çalakiyê, herî zû 22:30, herî dereng 23:30 bû.

Ev çalakî dê bibûna çalakiya min a destpêkê ya li dijî KT'ê. Ji ber wê yekê pir bi kelecan bûm. Her çendî min di grûba parastin û tacîzê de cih digirt jî, ji bo min dê bibûna destpêka valakirina kîn, întiqam û hêrsa li beramberê dijmin. Ber bi êvarê ve em bi rê ketin. Dema em bi rê ketibûn hevalên tevlî çalakiyê nedibûn, bibûn rêzekê û em oxir kiribûn û her hevalî/ê gotibû "serkeftin". Vê helwesta hevalan ruh dida me. Weke ku ev deng li çiyan olan dida. Hemû grûban bi coş ber bi cihê xwe ve bi rê ketin. Em di tariya şevê de gihaştin cihê xwe. Tepeyê dijmin li pêşberê me bû. Me di cih de mewziyên xwe çêkirin. Di mewziyê de libendê mayîneke bi kelecan dest pê kir. Me dixwest di cih de çalakî dest pê bike.

Eger tiştek nebûya, pêwîst bû herî zû di saet 22:30'an de çalakî dest pê bikira. Her ku dem nêzîk dibû çavên li mewziyên dijmin, guhê min li ser dengê B-7'a ku biteqe bû. Lê belê di wê saetê de B-7 neteqiya. Ez fikirîm min go, ew ê di 23:00'yan de bibe û min dest pê kir, dubare li bendê bisekinim. Dinya qederekê sar bû. Di mewziyê de em pir diqerisîn. Lê em dihizirîn ku dibe di her kêliyê de B-7 biteqe û ji ber vê yekê em amade sekinî bûn. Saet bû 23:00 dîsa deng tine ye. Ez bi temamî ketim nav xem û fikaran. Ji xwe re dibêjim, gelo tiştek

bi hevalên grûba êrîşê hat. Saet di 23:30'an de li şûna B-7'ê ku biteqiya carekê dengê reşandina guleyan hat. Di heman demê de B-7'ên me ketin dewreyê. Hemû grûbên me dest pê kirin biavêjin cihên hatine diyarkirin. Di mewziya ku kêliyekê ji beriya vê em tê de diqerisîn her der ji germahiyê dikeliya. Me jî dest pê kir gule bireşînin ser hedefa ku hatiye diyarkirin. Wan jî bersiv dan me. Li tepeyê li hembera me li dijî me A-4 dixebitî. Bîksiyên me û ji dûr ve jî doçqeyên me dixebitîn. Çalakî êdî weke pevçûnê lê hatibû. Ev pevçûn nêzîkî panzde deqîqe domandibû. Paşê hevalên li pişta me gotin "ezîz, ezîz" û em paşde kişiyan. Dema em paşde dikişiyan dijmin bi awayekî serasera her der dida ber topan. Em heya bi sibe meşiyan. Ber bi sibeyê me xwe gihand nuxteya paşve kişînê ku berê hatibû diyarkirin. Me li vê nuxteyê heya bi êvarê îstirehet kir. Paşê me li ser çalakiyê nîqaş û nirxandin kir.

Mewziyên ku grûba êrîşê, êrîşê wan bikira vala derketibûn. Em li ser kêmasiyên me yên di çalakiyê de derketibûn holê sekinîn. Ji aliyê hemû hevalan ve hate diyarkirin ku ev çalakî ji armancê xwe dûr ketiye û weke pevçûnekê lê hatiye. Hin hevalan li cihê çalakiyê hin tiştên xwe ji bîr kiribûn. Ev helwesta hevalan jî weke kêmasiya herî mezin ku di çalakiyê de bi pêş ketiye hate nirxandin. Dîsa, hate nîqaşkirin ku ev heval bi vê helwesta xwe ketine rewşa sûc û ji ber wê yekê biryar hate girtin ku pêwîst e ev heval demekê diyar ji derveyê şer bimînin.

Çalakî weke min jê hêvî dikir pêk nehatibû. Eger mewzî vala derneketana, bi misogerî çalakî dê cuda bûya. Nebû çalakiyeke encamgir. Lê çalakiya herî li gorî pêvajoyê, çalakiya encamgir e. Ya herî girîng jî di çalakiyên wisa de li cihê çalakiyê ji birkirina malzemeyên xwe yên leşkerî ji aliyê hin hevalan ve sûc e. Dijmin ji bo ku kefyeyeke me, çaydanê me, mencela me bi dest bixe bi rojan li nuxteyên me digerî. Di vê çalakiya de jî hê jî progandaya van malzemeyên bi dest xistiye dikir; ji ber ku hevalan jarjorên vala, dûrbîn ji bîr kiribûn firsend ketibû destê dijmin. Divê careke din di çalakiyan de helwestên wisa neyên pêşxistin. Her çendî weke ez dixwazim bi pêş neketibe jî, vê çalakiyê bi min da fêmkirin ku êdî ez hêdî hêdî dikevim nav jiyana şer û pewîst e li gorî vê tevbigerim.

Piştî çalakiyê vesaziyeke nû hate çêkirin. Bi vê vesaziyê li taxima bi tevger a Zerzanê bi erka fermandarê mangeyê hatim erkdarkirin. Êdî ji bo min pêvajoyeke nû dest pê dike: pêvajoya pratîkê, pêvajoyek ku ez ê li dijî dijmin di nav şerê germ de cihê xwe bigirim... Di nav taxima bi tevger de cih girtina min ji bo min kêfxweşiyeke cuda bû. Dema ez berê xwe didim pratîkê zêde azmûn û tecrubeya min tine ye. Tenê pratîka min a Şerê Başûr heye. Ya din jî berpirsiyariyeke min jî heye. Di nav rêveberiya taximê de cihê xwe distînim. Lê xwediyê îdîa me. Ez ê di nav şer de tecrubeya pêwîst qezenc bikim, fêrî şer bibim û ez ê hewl bidim da ku erkên hatin dayîne min bi awayekî herî baş pêk bînim.

Pêwîst e ji bo min ev pêvajo bibe pêvajoya fêrî gerîlatiyê bûnê, xwe îsbatkirinê û bihêzbûnê. Ez ê di nav şerê germ de wê şensê bi dest bixim ku fêrî zagonên şer bim, fêrî rastiya gelê me bim. Bi taybetî jî hebûna hevalên xwediyê tecrube li cem me, derfeta ji van hevalan sûd wergirtinê hêz dida min. Divê ez ji xwe re esas bigirim ji tecrubeyên hevalan sûd wergirim û ji tecrubeyên wan fêr bibim. Dikarim bi vî awayî hê zûtir bi pêş bikevim.

di dawî de derdikevim pratîka ku min timî ew dixwest. Êdî ez ê ne ji gelê me dûr bim, berevajî ez ê tam di nav de bim. Em ê gelek çalakiyan li dar bixin û li dijmin bidin; jê tola bi hezaran sal bistînin. Dema her ku derbe lê bidim ez ê qîr bidim û bêjim, ha ji te re ev ji bo tiştê te bi serê gelê me aniye, ji bo welatê me ku te talan kiriye, ji bo ku te em bê ziman hiştine, ji bo ku te em bê nasname kirine, ha ji te re ev derbe ji bo Cewahîr, ji bo Sertac. Çawa binîm ziman nizanim. Tenê tiştekî dizanim, ew jî ew e ku ez pir tije diçim pratîkê. Îdîaya min, hêrs û kîna min tam di cihê wê de ye. Ax! Ya din jî, xweziya tecrubeya min hebûya, hê baştir û çêtir dibû. Lê ez ê di demeke herî kurt de vê lewaziya xwe derbas bikim. Ez ê welatê xwe baştir nas bikim, bi gelê xwe re bibim yek û ji wan têr bibim. Dîsa, ez ê her tim alîkarî û destekê bidim hevalan, bi awayekî herî baş erka xwe pêk bînim. Ez ê timî bi ser bixim û biserxistinê bingeh bigirim. Belê, ji niha de coş û kelecana pratîkê ez xistime nav lepê xwe. Ez vê coş û kelecanê, vê girêdan û îradeyê heya bi dawî nîşan bidim. Ez ê jî di

nava vî şerî de bi awayekî serketî cihê xwe wergirim. Bi vê Baweriya min heye.

Rojekê piştî vesaziyê taxima me ber bi Gostê bi rê ket. Hemû hevalê tevlî çalakiyê bibûn ketibûn rêzê. Me yek bi yek xatir ji hemûyan xwest. Bi şiyarên “serkeftin”, “bijî Serok Apo” hevalan em bi rê kirin pratîkê. Em li Nuxteya Sêgoşe li bendê man ku dinya tarî be. Li vê derê dê mangeyeke me bisekiniya, hem hevalek dê bihata, hem jî ji bo me cebilxaneyêayedek bigirta û piştre biçûya Gostê. Em bi êvarê re bi rê ketin, di binê girê dijminê ku me lê daye, bi awayekî bêdendg derbas bû. Heya bi sibeyê em meşiyan. Ber bi sibeyê ve em hatin nuxteya berê hatiye diyarkirin û me dest bi îstirehetê kir. Piştî ku me nobedar derxist em hemû ketin xewê.

Li cem me hevalên jin jî hebûn. Nobedarên saet heştê ew bûn. Di wê saetê de em ji xewê şiyar kirin. Gotin ku sirtên jor ji aliyê dijmin ve hatine girtin. Ji aliyekî ve înisiyatîf di destê dijmin de bû, ji aliyê din ve jî heval dê piştî rojekê bihatana vê nuxteyê. Em ji dolê derbasî sirtên din bûn. Kela kela germê bû. Di wê kelagermê de, di sirta pir arwaz meşîn hem mirov diwestand û hem jî tehn dikir.

Ber bi êvarê em derbasî cihekî destdayî bûn. Hemû heval çûn ser avê. Tu dibêjî qey bi rojan e av venexwaribûn. Paşê dema me firsend peyda kir çaya ku me nekarîbû çêkin me çêkir, vexwar û westabûna li ser xwe avêt. Li cem me ji nanê hişk pê ve ti tiştê din tine bû. Nanê ku ev du roj in di çenteyên me de weke kevir lê hatibû, piştî me bi avê hinekê nerm dikir, me dixwar. Vê carê jî me nanê xwe yê req û hişk bibû di çayê de dikir û wisa dixwar.

Em êvarê li vê nuxteyê man. Bi şev di saet 03:00 de em hemû rabûn. Diviyabû em biçûna nuxteya ku me heval bidîtana, ew pêşwazî bikirana. Nuxteya me ya hevdîtinê, hema biniya sirtên beriya rojekê leşkeran girtiye bû. Leşker ber bi êvarê ji wî sirtê paşve kişiyabûn. Sibeyê zû me li nuxteyê dûkela hevalan dît. Em çûn cem wan. Pir westiyabûn, pêwîst bû bêhna xwe vekin. Em weke manga derketin tepe. Girê ku em çûbûnê, tepeyê ji beriya rojekê dijmin girtî bû. Mewziyên dijmin hebûn. Em di wan mewziyan de bi cih bûn. Dijmin hema li girê pêş me mewzî girtibûn. Ev, li vê herêmê tepeyê herî stratejîk bû û tam li ser serê Şemzînanê bû.

Me ji sibeyê heya bi êvarê tevgera dijmin şopand. Ji xwe re mewziyên nû çêdikirin. Li her aliyê tepe mewziyên xwe çêkiribûn. Ruxmî ku wan pir eşkere tevger dikir, me pir veşartî tevger dikir û timî tevgera wan dişopand. Ev cara yekemîn bû ku min di tepeçîtiya xwe de evqas veşartî û bi baldarî tevger dikir. Dema em li Xakûrkê dibûn tepeçî, ji derveyê tepeçiyan dişibiyan her tiştî. Li wê derê tinebûna dijmin, dibû sedem ku em aşkere tevger bikin. Lê vê carê li hemberê me dijmin hebû. Em neçar bûn veşartî û baldar tevbigerin. Pêwist bû em rêya biçinê kişf bikin. Dibe ku sedem dijminê li pêşberê me bû, cara destpêkê li tepe ez wisa li gorî rêgezan tevdigerim.

Êvarê em ji gir daketin û bi tarîbûna dinyayê re em bi rê ketin. Ji girê pir arwaz ê li pêşberê dijmin me xwe berdida dolê. Gir, girekî pir arwaz bû. Ya din jî ji ber ku axa wê pir req bû, em timî dişemitîn. Hin caran hevalên dişemitîn li gel xwe kevir ger dikirin xwarê. Hevalên li pişta wan çaydan, mencel hene dema dişemitîn dengê çaydan û mencelê di dolê de olan dida. Em bi tirs ji gir dadiketin. Eger em bi hişyarî nemeşin hêr kêliyê dibe ku em ji kendal werbin. Weke ku hemû hevalan kiriye, min jî beşeke mezin a tepe bi meşa li ser çongên xwe derbas kir. Dema em li dibistanê mamosteyê me bi me meşeke wisa dida kirin. Wê demê me jê re digot "meşa qazan". Qet kêfa min ji vê meşê re nedihat. Me dikarî tenê bi vê meşê ji vî girî bên xwarê.

Me karîbû bi temamî di sê saet û nîvan de xwe berdin dolê. Em hêdî hêdî ber bi gundekî ve diçûn. Her ku çû em nêzîkî gund bûn. Min ji hevalan navê gund pirsî, gotin "Masîro ye". Qederekê westiyabûm. Lê ji ber ku ez ê biçûma gund bi kelecan bûm. Şewqên gund diteyisîn. Em dema li pişta gund di nav giyayê hatiye çinîn re derbas dibûn, bêhneke pir xweş ji wan dihat.

Em di donzdeyê şevê de ketin gund. Li gund milîsên me jî hebûn. Dema em ketin gund hemû gelê gund şiyar bû. Me grûba xwe ya rê qutkirinê derxist û bi awayê grûban li ser malan belav bûn. Ronahiya di odeyê de pê ketibû çavê min tarî dikir. Dema min lê dinêrî çavên min diêşiyan. Hema bêje hemû gundî dostên me bûn. Xwediyê malê jî welatparêz bû û kesekî gelek tiştan dizane bû. Ji bo me baweriya xwe ya bi şerê gerîla vedigot. Kebaniya malê jî ji bo me hin tişt

amade dikirin. Zarokê malê yê bi navê Hesen jî pir şêrîn bû û tiştên ku dayikê amade dikir dianî li ser sofreyê. Me mast û reçel xwar û zikê xwar têr kir. Di van sê rojên dawî de me her nanê zuwa xwaribû. Dema me mast û reçel dixwar ew gotina hevalê Heqiyê me di tevlîbûna xwe ya Partiyê de bi rê de nas kiribû û di birîndariya wî de ew rakiribû ku digot “gerîla hin caran bi qetek nan îdare dike û hin caran jî li ser sofraya xwe bi her awayê xwarinê dibîne” hate bîra min. Ez pê hizirîm ku ew gotin çiqas rast bûye.

Ciwanên li gund ji bo me erzaq kom kiribûn. Me piştî ku erzaqê ji bo me hatiye komkirin di çenteyên xwe de bi cih kir, em ji gund derketin. Eleqe û sempatiya ciwanên gund em hemû kêfxweş dikirin. Hevalên ku berê ketibûn van gundan nedikarîn li vê guherînê bawer bikin. Di her firsendê de matmayîna xwe dianîn ziman. Piştî ku em ji gund derketin em li doleke têr dar sekinîn. Bi çavên xwe ji van guherînên di gel de bibûm şahid. Wisa kêfxweş bûm, ji şabûnan xew bi çavên min nediket û weke hemû hevalan bi dilrehetî û bi awayekî ji xwe bawer îstirehet kir.

**10’ê Tîrmehê 1993’yan**

Ketina me ya gundan didome. Em îro ketin Şewataya gundê şêrîn ê Şemzînanê. Milîsê me ye li vî gundî ji beriya niha ji me re notek şandibû û diyar kiribû ku li vî gundî ciwanên dixwazin tevlî me bibin hene. Li ser vê yekê, me jî ji bo em endamên şervanên nû derbixin çûn gund. Ji ber ku mangaya me, mangaya rê qutkirinê bû em neketin gund. Me li ser pira di ketina gund de ye kemîn danî. Dema hevalên din çûn gund min heval di mewziyên wan de bi cih kirin. Em di mewziyên xwe de li bendê sekinîn. Dema dijmin bihata destpêkê me dê derbe lê bida. Şev tarî bû, cihê me lê mewzî girtibû ti kesî nedikarî me bibîne. Hinekê dem derbas bibû, hevalên çûbûn gund çar şervanên nû anîn gel me. Ji van şervanan yek jin bû. Me dest pê kir em bi wan re eleqedar bin.

Dem weke avê derbas dibû. Ji nişka ve cihê me yê kemînê weke cihê serhildanê lê hat. Malbatên şervanên nû ku hatibûn gel me dihatin wan bibînin. Dixwestin wan îqna bikin û dubare wan bibin. Bi taybetî birayê mezin ê hevalê Rêjiyar ku şervanê nû ye, ji bo ku wî/ê

îqna bike û bizivirîne pir hewl dida. Şervanê/a nû jî digot, “ez ji bo welatê xwe, ji bo şerefa xwe tevlî gerîla dibim”. Birayê wî/ê yê mezin dema fêm kir dê nikaribe îqna bike, ji berîka xwe hinek pere derxistin û dayê û jê re got, “eger diçî bila, di çûyinê de biryara te temam be rêya te ya oxire be, lê dema tu biçî li şerefa me xwedî derkeve, ti car bi revê nefikire, neçe gel dijmin, serê me bilind bike û şerefa me biparêze” û jê xatir xwest. Berê xwe da me û piştî ku got, “hûn jî xwîşk û birayên min in, ez wî/ê teslîmî we dikim”, ji me xatir xwest. Piştre me gundî ji wê derê dûr xistin. Hevalên li gund jî piştî ku karê xwe temam kirin hatin cem me, em bi rê ketin.

Me dixwest em zû ji gund derkevin. Dema em bi rê ketin ji gundiyek nêzîkî fermandarê me yê grûbê bû û got “her tişt di carekê de nabe, hêdî hêdî dibe. Di despêkê de Serok Apo bi tena serê xwe bû. Niha li pey wî bi milyonan kes hene. Ji gundê me jî van ciwanan destpêkek kirin. Hêdî hêdî ji me dê tevlîbûn pêk bê. Îro çar ciwan, sibê deh, roja din em hemû”. Dema min ev gotin bihîstin min fêm kir ku gundî ne biyaniyên Partiyê ne, Partî nas dikin. Dema em bi rê ketin, ciwanên gund bûn yek rêz. Bi gotinên ‘serkeftinê” em bi rê kirin. Ji me re gotin, “dîsa werin gund”.

Pir kêfxweş im. Êdî em dikevin her derê herî dûr ê Şemzînan, ji nav lepê dijmin şervanan derdixin. Heya bi îro tiştên cuda ez kêfxweş kiribûm. Ez qet pê nefikirîbûm ku derxistina şervanên nû dê karibe gerîlayekî/ê evqas kêfxweş bike. Niha ez mirovê herî kêfxweş ê dinyayê me. Şervanên nû qederekê bi coş, bi tevger û xwîngerm in. Dema mirov şervan derdixe, mirov mezintî û misogeriya serkeftinê dibîne. Her bijî Serok Apo ku bi tena serê xwe dest pi têkoşînê kiriye, bêyî ku jê ecz be, bi xîreteke mezin, bi biryardarî, bi îrade û wêrekî li dijî dijmin şer dike, serkeftinê diafirîne û ji bo gelê me rêbertî dike.

**14'ê Tîrmeha 1993'yan**

Îro roja me ya serbilindiyê ye. Roja destpêkirina rojiya mirinê ya mezin e. Em li Şehîdan li cem hevalan in. Li palên çiyayê mezin ê Şehîdan li ber kelakela germahiya tavê, em rojeke mezin dijîn. Roja ku ji rêberên me hevalê M. Xêyrî Durmuş, Kemal Pîr, Akîf Yilmaz, Ali Çîçek ala ji hevalê Mezlûm Doğan wergirtine li bircên Amedê çikandine, meydan ji mirinê re xwendine û dest bi rojiya mirinê kirin e.

Roja me ya serbilindiya neteweyî ku ji aliyê Partiya me ve hatiye qebûlkirin bila li hemû gelê me û li me pîroz be!

Berxwedêrên zindanê, bi pêşengiya Mezlûm, Xêyrî, Kemal û Ferhad Kurtay û hevalên din, li gorî wê pêvajoyê ji Partî re bûn ruh û can. Di zindanê de Partî gihandin serkeftinê. Binkeftina herî mezin di dîroka KT'ya dagirker de pê dan jiyankirin. Girêdana bi ruhê 14'ê Tîrmehê re, ew ruha jiyankirin, bi wî ruhî şer kirin erka me ya herî mezin e. Bi her deqîqeya xwe dayîna Partiyê, bi awayekî bêeman ji bo welatê xwe şer kirinê, bi afirandina serkeftinê û di vê oxirê de bi nîşandana her awayê wêrekî û fedakariyê bêyî ku ti berjewendiya şexsî bifikire, bi xizmetkirina gelê me em dikarin bibin layiqê hevalê Xêyrî ku gotiye “li ser kêla gora min binivîsin, ev kes deyndarê welatê xwe ye” û Kemal Pîr ku gotiye “ji ber ku min di xeta PKK'ê de serkeftin dîtiye tevlî PKK'ê bûm” û wê demê em ê talîmatên wan pêk bînin.

Em dikarin her roj bi bilind kirina têkoşîna neteweyî, ji her alî ve bi mezin kirina têkoşînê, her ku em her roj serkeftinê bixin bin ewlehiyê û her ku her roj derbeyên tolstendinê li dijmin bidin em ê bibin layiqê wan û em ê karibin bibin şopdarên wan ên ji rêya wan şaş nabin. Ew li pêşberê dijmin hatin coşê û weke şêran gurmijîn. Şehadetên wan weke çiyayê Şehîdan mezin û weke Dîcle û Firat zelal e. Ji bo dijmin bombeyeke atomê ye. Wan b hemû dilê xwe, hêza xwe, mêjiyê xwe, xwe fedayê şoreşê kirin. Her tiştê li cem wan dan Partiyê û gel. Girêdana wan a bi Rêbertî re û bi gel re girêdaneke pir mezin e. Divê ev ruhê bi wan re ji me re bibe hêz, bi me şer bide kirin. Divê em jî zanibin weke wan werin coşê û bigurmijin. Divê em her tiştê xwe bidin Partiyê, bidin gel, zanibin bêyî ji mirinê bitirsin ji

mirinê re meydanê bixwînin, timî wî ruhê mezin ê hevalê Kemal Pîr ê enternasyonalîst bijin, timî vê têkoşînê mezin bikin.

Berxwedêrên 14’ê Tîrmehê sembolên, serkeftin, aştî, xwîşk û biratî, enternasyonalîzm û azadiyê ne. Em bi wan hatin van rojan, em ê bi wan biçin serkeftinê. Gelê me îro bi wan serbilind e û bi wan ber bi azadiyê ve diçe. Berxwedêrê14’ê Tîrmehê dê li gel mirovahiyê heta heta bijîn.

Şev bi awayekî bêdeng derbas bû. Li ezmanan stêrk diteyisîn. Çiyayên li pêşberê me weke ku di navbera stêrkên diteyisîn de serê wan digihîşt azmanan. Gundê Tisê ku di nav dolê de şewqa wê pêdiket bedew bû, lê stuxwar bû. Îşev her tişt xweşik bû. Yekane tiştê nexweşik dijminê li serê gir mewzî girtî bû. Di nav vê xweşikiyê de dijmin weke striyekî bû. Pêwîst bû ev strî ji kokê ve bihata hilkirin. Jixwe piştî kêliyekê dê hevalên me vî striyê kirêt ji kokê ve hilkin û biavêjin, wê demê Tisêya stuxwar jî dê serbilind bibe. Tepe dê bedew be û êdî li wê derê gul û çîçek bên çandin.

Pir bê sebir bûm. Şev qet xelas nedibû, weke ku înad dikir. Me hemû bala xwe dabû ser tepe û em li bendê bûn. Dibe ku her kêliyê B-7 biteqiyana. Saet 12’yên şevê bûn. Hê deng tine bû. Min ji cîhaza destê xwe timî li dijmin guhdar dikir. Dijmin bi şîfre diaxifî. Dizanî em li wan guhdar dikin. Fermandarê dijmin ê gir, her panzde-bîst deqîqe carekê tekmîl dida navenda xwe. Nedikarî texmîn bike ku dê îşev hin tişt çêbin. Ji axaftinên wî aramiya roja xwe qedandinê xuya dibû. Lê xwe dixapand. Min dest pê kir rewşa wan a piştî kêliyekê ku bombe û çek diteqin meraq bikim.

Saet 12:30 bû. Dijminê li ser gir du caran şiltaqa ronîkirinê avêt. Dinya dibû weke roj. Gelo heval dîtine, yan jî ji hin tiştan guman kirine. Misoger bû ku li ti tiştî neketibûn şik û gumanê, eger rewşeke wisa hebûya, min ê ji cîhazê fêm bikira. Bawer im ji bo tedbîra xwe ev şiltaq avêtibûn. Kuçikê şivanan bêyî bisekine dikire hewtehewt, te digo qey har bûye. Her ku hewtîna kuçik zêde bû, min dest pê kir bifikirim ku heval bêyî çalakiyê li dar bixin paşde dikişin. Lê diviyabû heval çalakiyê teqez li dar bixin, wî striyî ji wê derê rakin biavêjin.

Dema şiltaqên dijmin temirîn dengê B-7'an ku her der tevlihev dikir hat. Û çalakî dest pê kir. Ji kelecanê min nedikarî di cihê xwe de bitebitim. Hevalan mewziyên dijmin dabûn ber gulebaraneke giran. Dijminê ku bi dengê destpêkê yê B-7'ê ketibû nav kelecanê, di cîhazê de dikire qîreqîr û her hawar dixwest. Vê şevê dê nekarîba alîkarî bihata. Navêndê hewl dida wî aram bike. Ma mimkûn e ku aram be! Hêdî hêdî mirin pêlî qirika zilam dike. Ji ber vê yekê her diçû dîn û har dibû û her ku di mewziyan de dengê bombeyan zêde dibû ew hê jî rebenokî dibû û ji bilî dujin kirinê nedikarî tiştekî din bike.

Ji her aliyê dengê bombe û çekan dihat. Dijmin timî şiltaq diavêtin. Ji dengê zêde yê bombeyan dihate fêmkirin heval ketine mewziyên dijmin. Lê grûba me ya parastinê nedikarî xweş gule biavêje, bandora li ser mewziyên dijmin têrê nedikir. Biksî di asta dihate xwestin de nedixebitî. Çalakiyê biqasî bîst deqîqe yan berdewam kir. Piştre heval paşde kişiyan. Dema heval paşde kişiyan li serê din ê sirtê di mewziyên herî bilind de dijmin hê gule diavêt. Dihate fêmkirin ku ev mewzî neketiye. Heya bi sibeyê dijmin nesekinîbû, gule avêtibû. Timî top diavêtin dolan. Paşê heval jî bi bombeyan ketibûn êrîşê. Gelo wendahî û birîndarên me hebûn? Min nedizanî. Dema di çalakiyê de hevalan xwêdan dirêjand, dibe ku bi mirinê re rû bi rû diman, min bi tenê temaşe dikir. Ti alîkariya min ji bo hevalan nebibû. Grûba me ya parastinê ber bi sibeyê ve paşde kişîn û hatin cem me.

Me nekarîbû ji hevalên din agahî bigirin. Sibeyê zû qobre û skorskiyan dest pê kirin li ser qadê bifirin. Piştî ku çend caran zivirîn û yek-du cih bombebaran kirin paşde kişîn. Li neqeba em lê bûn min heval xistin mewziyan. Eger leşker daxistina, me dê lê bidana. Ya din jî timî hewan diavêtin girê bi kevir ê di ser gund re.

Dema em di mewziyên xwe de li bendê bûn, ji cem hevalên çûbûn çalakiyê hevalê Volqan hat. Ji rewşê dihate fêm kirin ku pir westiyayî ye. Hem jî cil û bergên wî bibûn xwîn. Gelo xwîna kê bû? Xwîna hevalan bû; misoger e hevalên birîndar hilgirtibûn. Lê gelo ev heval kî bû? Gelo hevalek şehîd hebû? Di cih de çûm cem hevalên birîndar. Ji beriya her tiştî min pirsa rewşa hevalan kir. Hevalan got; "dema çalakî dest pê kir, hevalê Îhsan birîndar bû. Hevalê Welat jî

dema êrîşê mewziyê kir ji zendê xwe birîndar bû. Hevalê Egîd (Şemzînan) jî wenda ye. Me piştî çalakiyê, hevalên birîndar anîn nuxteya destpêkê ku me li wê derê paşde kişan pêk aniye. Sibeyê derûdora saet 06:00’an hevalê Îhsan şehîd bû”.

Em hemû matayî mabûn û me li hev mêze dikir. Min nedikarî bawer bikim, hê beriya heşt saetan hevalê İhsan li gel me bû. Min nedixwest pê bawer bikim. Piştî bi kêliyekê ji hatina Volqan hevalê Behzad jî hat. Ji zendê xwe bi sivikî birîndar bibû. Me got bila bi hevalê/a erkdarê/a tendirustiyê re biçe gel hevalan; hinek erzaq û du heval jî me şand gel hevalê/a doxtor. Li ser min bêxewbûna şevê hebû. Êdî nedikariya xew bi çavên min bikeve. Hevalan ji mewziyên dijmin hewaneke 57 mm., dûrbînek, jarjorek, gule, çente û hwd. rakiribûn. Ji ber ku hevalên birîndar hebûn malzemeyên din neanîbûn û piraniya wan bi bombeyê îmha kiribûn.

Ber bi êvarê hevala/ê erkdara/ê tendirustiyê û du hevalên din, tevî malzemeyên di çalakiyê de hatibûn rakirin zivirîn cem me. Gotin ku hevalê Welat ji ber zêde çûna xwînê şehîd bûye, hevalê/a erkdarê/a tendirustiyê negihîştiye ser û her du heval jî li rex hev hatine veşartin. Diyar kirin ku bi îhtimaleke mezin dibe ku hevalê Egîd jî şehîd bûye. Hevalan du mewziyên destpêkê bi dest xistine. Ji ber ku hevalê İhsan birîndar bûye pê re mijûl dibin û nikarin êrîşê mewziyên din bikin. Kuştiyên dijmin ên ku hevalan bi çavên xwe dîtibûn jî 7 bûn. Ji helîqopterên vê sibeyê du caran hatine tepe û cenazeyên xwe birine, dihate fêmkirin ku kuştiyên wan hê zêdetir in. Ber bi nîvro ji gundê Tisê gundiyek hat. Em pê re axifîn, gundî got; “helîkopterê du caran li serê gir danî û mirî û kuştiyên xwe rakirin”. Dîsa got ku dema hevalan êvarê lê dayibû leşkerên xelas bibûn bi piranî xwe berdabûn gund, şeva xwe li gund derbas kirine.

Ji beriya ku bibe êvar hemû heval hatin cem me. Cil û bergên piraniyan di nav xwînê de mayîbû. Ev xwîna hevalê İhsan û Welat bû. Hevalê Egîd hat nehat cem me, hema dest pê kir kêmasiyên di çalakiyê de bi pêş ketine bîne ziman. Çalakiyeke baş hatibû lidarxistin. Lê wendahiyên me hebûn. Ya herî bi êş jî ji ber kêmasiyên me wendahiyên me pêk hatibûn. Hevalê İhsan bi guleyên me birîndar bibû. Dîsa, hevalê Welat dema bombeya destê xwe

avêtibû, parçeyekî bombeyê li zendê wî ketibû û ji zêde çûna xwînê şehîd ketibû.

Doh van saetan pir bi coş û moral bû. Hevalekî pir xwîn germ bû, çavkaniya me ya moralê bû. Dema hevalê İhsan sohbet dikir mirov jê têr nedibû. Cixaraya ku doh pêçandibû û vexwaribû ewqas stûr bû, weke ku dê careke din nikariba cixare bikişanda dikişand. Rûkeniya wî moral dida mirov, her tiştî wî wêrekî dida. Gule li hestiyê piştê ketibû. Dema heval hewl didin wî hilgirin hevalê İhsan dibêje “ez dizanim ez ê şehîd bibim. Min nexin nav lepên dijmin, di dûv xwe re bixirikandinê bibin”.

Hevalê İhsan!

Tu çiqasî xwediyê îrade bûyî, çiqasî bixwegir bû. Dijmin nikarîbû li te bide. Lê belê guleyeke kor a me hat û bedena te ya ciwan dît û me bi destên xwe tiştê dijmin nekarîbû bike, kir. Di sala 1991’an de tevlî gerîla bibû. Di gelek çalakiyan de kîn û rika xwe li dijmin dabû der. Berê jî birîndar bibû. Hevalekî ji Îdirê bû. Bi vesaziya dawî bibû fermandarê mangaya me ya yekemîn. Hevalan heya bi nuxteyê hilgirtibûn, lê li nuxteyê gihiştibû şehadetê û bi gel û welatê me re bibû yek.

Hevalê Welat ji Melazgirê bû. Hevalekî kêrhatî ku ev demeke dirêj e di nav refên têkoşînê de bû. Birastî ew ê tevlî çalakiyê nebibûya. Dema zêde israr kir, hevalan, hevalê Welat xistin nav grûba yêdek. Heya bi nuxteyê ew bi xwe dimeşe û te. Hevalê Welat jî ji çûna xwîna zêde şehîd bibû.

Eger ne ji van wendahiyên me bûya, me dê çalakî weke serkeftî ye bihesibanda. Ya girîng ew e em ji kêmasiyên xwe ders derxin berê xwe bidin pratîka ji vê bi şûnde. Hê dê çend İhsan, çend Welat şehîd bikevin. Em ê bi derxistina dijmin ji Şemzînanê û bi azadkirina Şemzînanê bersiva pêwîst bidin bîranîna wan.

Bîranînên şehîdên me meşaleyên rêya me ronî dikine!

### 30’ê Tîrmeha 1993’yan

Me termên hevalê İhsan û Welat ji dola Tisê anî û tam li rastikek ku tam li nîvinga Şehîdan bû veşart. Niha li ser serê Şehîdan razane. Dê timî li Şemzînanê binêrin. Di berfê de, zivistanê, biharê, havînê, li

ser serê Şemzînanê, her roj sibeyê zû bi tîrêjên destpêkê yên tavê re dê ji hemû cîhanê re bêjin merhaba. Li ser gola ku hema li ber serê wan e dê hin şevan sohbet bikin. Cihê lê razane ewqas xweşik in, dibe ku demên pêş bibin cihê seredana gel

Hevalê Egîdê ku wenda bibû jî şehîd bibû. Piştî ku hevalê İhsan birîndar bibû dema hemû grûb bi wî re mijûl dibe, hevalê Egîd jî bi tena serê xwe êrîşî dijmin dike. Du mewziyan îmha dike û piştre êrîşî mewziyên herî stratejîk dike. Dijmin di wê kêliyê de li ling û serê hevalê Egîd dide û wî şehîd dixe. Zêde zêde wêrek bû. Pêşengekî pir baş bû. Herêm pir baş nas dikir. Hinekê hevalek ku ji tevgera bi tena serê xwe re kêfa wî tê bû. Jixwe di çalakiyê de jî bi tena serê xwe êrîş dike. Dijmin termê wî yê bi dest xistibû piştî nîşanî gundiyan dabû avêtibû çalekê. Hemû gundiyan hevalê Egîd nas dikir. Ew bi xwe jî ji gundên derûdorê yê bi navê Katûna bû. Me ji gundiyan re got, termê heval bistînin û ji me re bînin. Me dê ew jî li gel hevalê İhsan û Welat veşartaya. Hevalekî pir xwîngerm bû. Digot, “heya ku ez ji Şemzînanê vî dijminî neqewtînim û van çeteyan tasfiye nekim rehet nabim”.

Di pratîkê de mirov dibe şahidî her tiştî. Bi dijmin re di nav hev de yî. Hin caran mirov dikeve kemînê, hin caran manewra dike, hin caran mirov li dijmin dide. Rastiyek heye ew jî, mirov di nav şer de fêrî şer dibe. Mirov herî baş di nav şer de xwe nas dike. Her roja derbas dibe aliyên xwe yên lewaz, aliyên xwe yên bi hêz hê baştir nas dikî.

Em her şev dimeşin û timî erzaqê me li pişta me ye. Tiştên weke çaydan, mencel, qedeh û kevçî jî em bi xwe re radikin. Heval hin caran ji hilgirtinê ecz dibin, lê ji bilî rakirina bi xwe re ti şensa me jî tine ye. Her ku diçe fêrî pratîkê dibim. Ruxmî ku zehmetiyên wê hene jiyana pratîkî ji bo şervanekî/e azadiyê tiştê herî baş e. Her roja derbas dibe bi gavên hê saxlam em ber bi serkeftinê ve dimeşin. Dijmin van rojan li her derê zêde zêde tedbîr distîne. Her dever tije leşker e. Ji ber ku 15’ê Tebaxê nêzîk dibe. Panzdeyê Tebaxê dijmin dilnerehet dike û li ser ferz dike ku zêde zêde tedbîr bistîne.

Em ber bi herêma Zerzanê, mintiqaya Xumaro diçin. Dijmin, hema bêje hemû cihên çoltere vala kiriye, cihên hatine valakirin di

bin qontrola me de ye. Dijmin tenê li hin girên diyar bi cih bûye. Li ser wan giran êrîş pêkanîn pir zehmet e, hem jî pir bi rîsk e. Dijmin bi helîkopterê erzaq dibe van giran. Li Zerzanê dijmin bi temamî desteka gel wenda kiriye. Hemû gundên berê çete, çek berdane. Hema bêje hemû gund ji bo me vekirî ne. Dema em bixwazin dikevin gundan. Ji ber ku gundan çek berdane, dijmin pir ecz bûye û zilmê li ser gundiyan dike. Ji gundan gelek ciwan tevlî gerîla dibin. Beşeke mezin a Zerzanê ketiye bin qontrola me.

Em bi awayê bolîk tevdigerin. Tevgera bi awayê bolîk, dibe sedem ku em hinekê hêdî tevger bikin. Bi piranî em bi şev dimeşin. Sirtên li vê herêmê pir zehmet in, her sirtek weke çiyayekî mezin e û asê ye. Timî em di van sirtan re hildikişin û dadikevin. Em dema di tariya şevê de dimeşin pê nahesin ku me çawa ew sirt qut kirine. Bi taybetî wê roja han dema me xwe gihand nuxteya em lê bisekinin piştî ku min manga bi cih kir, bi awayê çente li pişta min li cihê lê di xewê re çûbûm. Wisa li xwe kirin sibe xweşikî û bedewiyeke cuda ye. Bi wê westabûnê razan baş bû. Ji ber ku me hemû şev bi meşê derbas kiribû, me xwe gihand negihand cihê nuxteya em lê bimînin em di cih de derbasî rewşa îstirehetkirinê dibin. Û em pê nahesin ku roj çawa derbas bûye.

Li Zerzanê pir zêde şev sar in. Em baraniyê wisa li xwe dipêçin, dîsa jî sûda wê nabe. Di bin baranî de em direcifin. Mirov dibêje, bila kêliyekê ji beriya kêliyekê bibe sibe ku hinekê germ bin. Bi roj jî wisa germ e, tav me pir ecz dike. Ne mimkûn e em di wê germê de îstirehet bikin. Em li sîberekê digerin lê ev der Zerzan e. Ma li Zerzanê çi karê sîberê heye? Baraniyê ku bi şevê li dijî sermayê me diparêze, vê carê ji bo em xwe ji tavê biparêzin bi rola sîberê radibe. Em hewl didin bi sîbera ku me bi baraniyan çêkiriye îdare bikin.

Em dikevin qonaxa duyemîn a pêvajoyê. Misoger e ku dê di giştiyê welêt de şer hê jî bi pêş bikeve. Talîmata Rêbertiya Partiyê ku doh hatibû jî li ser bingeha hê zêde pêşxistina şer bû. Me doh weke bolîk talîmata hatibû xwend û li ser nîqaş kir. Ji bo talîmat pir baş bê fêmkirin zêde nîqaş li ser hate kirin. Herî dawî piştî ku hevalê Arî yê fermandarê bolîka me bû, cewhera talîmatê vegot, hê baştir talîmat hate fêmkirin. Em li ser her talîmata ku ji Rêbertiya Partiyê tê, nîqaş

dikin. Di pratîkê de hin caran demên me yên ku vala dimîne em perwerde dibînin. Lê em nikarin perwerdeyê domdar bikin. Perwerdeyên em dem bi dem dibînin pêşiya me vedikin.

Her ku em talîmatên ji Rêbertiya Partiyê tên li ser bingeheke rast fêm bikin, tiştên me fêm kirine li ser binheheke rast pratîze bikin dê têkoşîna me bi lez ber bi serkeftinê ve biçe

**1'ê Tabaxa 1993'yan**

Li ser çiyayên me roj çiqas zû derbas dibin. Em ketin meha Tebaxê ya serîhildanê jî. Em dikevin meha ku di vê salê de şer herî giran derbas be. Divê her derbeya ku em di vê mehê bi heybet de li dijmin bidin encamgir be, li gorî ruhê 15'ê Tebaxê be. Em derbasî Herkî ku di herêma Xumaro de qada me ya bingehîn e dibin. Me biryar da dema em diçin li ser rêya xwe, li ser tabûra Durê û Gulankê ya ku gundekî çete ye çalakiya tacîzê li dar bixin. Tabûra Durê dikeve mintiqaya Xumaro. Pir nêzîkî navenda bajêr ya Şemzînanê ye jî. Ya din jî parastineke wê ya xurt jî heye. Gundê Gulankê, gundekî hema li rex tabûrê ye. Vî gundî çeka dijmin rakiriye, gundê birayê Hakî Toreyê ku reîstiya çeteyan dike ye. Berê xwe dayîn û êrîşê gundên çeteyan kirin di rêza destpêkê ya hedefên me de ye. Ruxmî ku me ji vî gundî re gelek caran gotiye, çekên xwe bernadin. Me doh bi şev hem li ser gund û hem jî li ser tabûrê çalakiya tacîzê li dar xist. Dîsa, me li ser rêya navendê jî mayîn çand. Piştî ku em paşde kişiyan dijmin dest pê kir top biavêje araziyê. Di çalakiyê de em gihaştin armanca xwe. Piştî çalakiyê em bi herêma Herkî ve paşde kişiyan û çûn çiyayê Bêgoz. Bi rê de baranê li me kir. Ruxmî ku demeke pir kurt bariya, barana hûr hûr dibarî dema li ser axê diket ji axê bêhneke mirov mest dike belav dibû.

Li Kurdistanê her gir, her çiya, her dar û ber, her gund xwediyê xweşikbûn û bedewiyeke taybet e. Bi rastî jî Kurdistan welatekî ku dişibe buhuştê ye. Lê dijmin weke cenemê lê kiriye. Li gundiyan êşkence dike, gundan, daristanan dişewitîne, çiyayên me bombe dike. Em ê vî welatê xwe yê weke buhuştê ji bin destê dijmin xelas bikin. Qasî ku dixwazin bila balafirên wan, helîqopterên wan li ser serê me bifirin, qasî ku dixwazin bila çiyayên me bombebaran bikin, em ê

dîsa bi ser bikevin. Em ê vê buhuştê ji dest wan bistînin. Êdî dê gundên me neşewitin, çiyayên me neyên bombebarankirin. Darên me dê êdî bi azadî pelên xwe bidin ber bayê hênik ê çiyan, bi her alî de mezin bibin û her deverê bixwemilînin. Gelê me dê di vê buhuştê de xizmeta mirovahiyê bike. Careke din welatê xwe dê nede ti kesî, axên xwe yên bi xwînê hatine qezenckirin heta heta biparêze.

Çiyayê Bêgoz di dîtina destpêkê de jî bedew e, li pêşberê Çarçela ye. Weke du evîndaran, li hev mêze dikin. Palên Bêgoz daristan e, her ku mirov bi jor dikeve daristan kêm dibe. Tu dibêjî qey bihar nû hatiye dolan. Berfînên nû nû derdikevin û çîçekên rengîn jê re dibin xemla bûkaniyê. Her ku mirov bi jor dikeve ba dijwar dibe, sermaya zuwa zêde dibe. Binê tehtên li cihên wê yên bilind weke stargehan in, serma lê kar nake.

Li lûtkeyên Bêgoz hê berf heye. Ji dûr ve xuyabûna wê pir xweşik e. Avên wê weke qeşayê ne, li ser wan çêm û aniyan tenê rojek derbas kirin jî dibe sedem ku mirov pir hestiyar be. Misoger e ku em ji vê bi şûnde pir bên vî çiyayî, ji ber ku li qada ku em lê bi cih bûne. Gundiyên li binê wê çeka dijmin girtine. Ew gundî hemû li pêşberî vî çiyayî fedîkar û şermezar in. Berê li vî çiyayî derdiketine zozanan, lê niha nikarin. Me li cihê konên wan mêze kir, bêxwedî û bêkes in. Gundî nawêrin derkevin zozanan. Ji ber ku êdî ev çiyayên bedew bi me re li ber xwe didin. Çiya jî vê îxanetê qebûl nakin.

Rizgariya welatê me Kurdistana ku dişibe buhuştê nêzîk e. Em her roj çiyayên xwe ji bo dijmin dikin dojeh [cehenem]. Dijmin dê bi can û xwîna xwe berdêla van êşên bi me daye kişandin bide.

**9’ê Tebaxa 1993’yan**

Em timî di tevgerê de ne û her roj diçin cihên cuda, dikevin gundên cuda û heya bi sibeyê dimeşin. Cihên em bi şev tê re derbas dibin ewqas asê û tev bi xetere ne, em bi roj di wan deran re ne dikarin dakevin û ne jî hilkişin. Hin caran em ji sirtekî pir asê dadikevin. Hin heval dişemitîn, hin heval li erdê diketin, hin heval hema ji ketinê, ji şemitînê xelas dibûn. Bêdengiya şevê ji aliyê çaydan û lalîkên me ve tê xerabkirin. Dema em tên nuxteyê û dest pê

dikin bêhna xwe vekin, di cih de xuya dibe kî hê zêtir ketiye. Hevalên derziyê digirin û ji destên xwe striyan derdixin xwe deşîfre dikin.

Ji demeke dirêj e vir de heval neketine gundên em vê dawiyê ketinê. Gundiyan çekên dijmin girtine. Dema em dikevin van gundan pir ditirsin. Piştre dema em diaxifin dibêjin ku ew ê çek berdin. Li gundê çeteyan ku em dawî ketinê me çar gundî bi xwe re anîn. Dema ku çeteyên gund çek berdana me dê ev gundî serbest berdana. Di çek girtina gundiyan de rola kêmasiyên me jî hebû. Ji ber ku li ve herêmê xebateke baş nehatibû kirin, gundiyan weke firsend ji vê sûd wergirtibûn, hema di cih de çek girtibûn. Çekên ku girtine li dijî me bi kar naynin. Jixwe wan çek binerd kirine, veşartine. Bi vî awayî maaşên xwe jî digirin. Bêyî ku ti karî bikin, li ser pişta me, bi xwîna me jiyaneke rehet didomînin. Bandora ketina me ya dawî ya van gundan çêbû. Me ev rewş ji wan re vegot. Her çendî çekên xwe bixin bin erdê jî teqez dijmin dê rojekê bixwaze wan li diji me bide bikaranîn. Her ku me ev rewş bi gundiyan da fêmkirin, dibêjin ku ew ê çek berdin. Eger em hineke din xebateke xwediyê bandor bimeşînin em ê hemû herêma Herkî ji bo gerîla vekin.

Di nîvenga Herkî de, Çiyayê Çarçela ku serê wî digihîje ezmanan ji dûr ve mirov vediciniqîne. Di encamê de em derketin çiyayê Çarçela ku min pir dixwest ez derkevimê. Hilkişe, hilkişe, bi hilkiştinê xelas nabe. Xwediyê araziyeke pir dijwar e. Mirov dixapîne. Dolên li jor tije berf in. Di meha Tebaxê de berf dibare, dema di pey re tav derdikeve, Çarçela dibiriqe. Bi şevê ji sermayê diranê me li hev diketin. Em xwe dixin ber teht û keviran lê dîsa nikarin ji sermayê xelas bin. Em li dola ku vê zivistanê heft heval lê bi qerisînê şehîd bûne bi cih bûn. Grûba me ya ku ji beriya me derketibû Çarçela, termên van hevalan dîtibû. Li zomekê, li rex hev veşartibûn. Piştî ku min Çarçela dît min mezinahiya berxwedana ku wan pêşkeş kiriye hê baştir fêm kir.

Piştî ku em rojekê li vî çiyayê mezin man, ji ber erkekê dubare daketin. Daketina ji Çarçelayê ji hilkiştinê zehmetir e. hem ji bo daketinê û hem jî ji bo hilkiştinê hin rêyên tên zanîn hene. Ji ber ku em van rêyan zêde bi kar naynin bi şiklekî rasthatinî em dadikevin. Ji cihên weke dîwarekî asê ne û kendalan em daketin. Heya em daketin

şemitîn û li erdê ketin her berdewam bû. Bi taybetî eger di lingên mirov de pêlavên qetiyayî hebin, ji bo daketinê hê zêde hewl didî. Di demeke nêzîkî sê saetan de encax me karîbû dakevin dolê. Ji ber ku binê pêlavê min qetiyabû, timî strî û kevir tê re diçû. Pir diêşiya. Piştre me bi hezar zor û zehmetiyê xwe gihand herêma Kirêkor ku di navbera Herkî û Gewerê de ye.

Kirêkor bi sirtekî dirêj bi Çarçela ve tê girêdan. Cihekî pir bilind e. Girên biçûk, hemû jî tije kevir û mewziyên xwezayî hene. Li quntareya wî, gund hene. Li aliyê bakur gundên Geverê û li aliyê başur jî gunden Şemzînanê hene. Ji Kirêkorê deşta Geverê weke buhuştê xuya dibe. Dişibe deryayeke kesk. Ji binê Çîlo dest pê dike, heya bi Spîrîzê û Krekorê diçe. Gundên Geverê pir welatparêz in. Heval pir diçin û tên. Beşeke hêza me li vê derê kom bûye. Em amadekariya Pêngava 15'yê Tebaxê dikin.

Her çendî zehmetî jî bikişînim, li pişta min bi barekî giran bi saetan bimeşim jî, bê xew jî bimînim pir ji pratîkê hez dikim. Ez her roj cihên nû dibînim, nas dikim. Hildikişin hemû çiyayên li herêmê. Em kesên cuda cuda dibînin. Taybetmendiyên van kesan, bedewiyên van deran dibînim, nas dikim. Di nava van hemûyan de qet mirov ferq nake ku westiyaye.

**21'ê Tebaxa 1993'yan**

Li Kurdisatanê berxwedan jiyîn e. Ji aliyê hevalên me ve ev li her derê hatiye îsbat kirin. Ji bo me berxwedan şer e, şerê me ji bo aştiyê ye. Nexwe divê em ji bo aştiyê, ji bo biratiyê berxwedana herî mezin li dar bixin.

Em li Kirêkor amadekariyên 15'ê Tebaxê dikin. Weke erk bêçekirina du gundên çete hatibû dayîn bolîka me. Me di donzehê mehê de berê xwe da hedefa xwe. Ber bi çiyayê Bêgoz em bi rê ketin. Me ji Kirêkor xwe berda geliyê Bembo. Dema em hatin nêzîkî gundê Bembo ronahiyên gund di nav daristanê de weke mûm pêdiketin. Vê rewşa gund, gundê şêrîn ên di romanên zarokan de dianîn bîra mirov. Her ku me xwe nêzîkî gund kir dengê zarokan ê ku bi coş û kêfxweşî raserê gund diket, ez girtim û birim zaroktiya min. Dema em biçûk bûn me heya bi derengiya şevê dikir qîr û necisî dikir. Gava ku em

ketin gund dinya ker bû. Ji nişka ve dengê zarokan ê kêliyekê berê dihat qut bû. Lê dengê wan çiqas jî bedew bû, dengê wan ev gundê çîrokan ê bedew hê bedewtir dikir. Hesreta me ya ji bo zarokan tenê em dizanin. Diviyabû yên ku dizanîbûn çiqas em ji zarokan hez dikin û dizanibûn ji bo ku em ji zarokan re pêşerojeke azad biafirînin şer dikin, wisa bi awayekî bêrehm zarokên xwe ji me veneşartana. Ev xerabiya herî mezin ku li me bê kirin e. Ji ber ku em bi şevê dikevin gundan em nikarin zarokên biçûk bibînin. Yan dirazên yan jî malbatên wan destûrê nadin ku bên cem me.

Piştî ku me ji gund erzaqê xwe girt û li cem gundiyan civîna xwe li dar xist, em çûn çiyayê Bêgoz û li ser ava Bêrok bi cih bûn. Ev av di biniya nuxteya me ya beriya vê re diherikî. Dema li nuxteyê me dest bi îstirehetê kir, ez timî li ser zarokên gund ku zarokatiya min anî bîra min fikirîm. Ma em ewqas hov in, ma qe em ji zarokan hez nakin? Na, hem mirovên hemdem û hestiyar in. Çawa ku em ji van hemû mirovan hez dikin, em herî zêde jî ji zarokan hez dikin. Jixwe ma şerê me jî ne ji bo wê ye ku em ji bo wan pêşerojên azad biafirînin?

Gundiyên li vê derê li gropagandayên dijmin bawer kirine. Ji ber wê yekê ditirsin. Piştî ku tepeçiyên me çûn tepe me îstirehet kir. Sibeyê bi tîrêjên destpêkê yên tavê em jî şiyar bûn. Me çaya xwe amade kir û li ser wê ava xweşik taşteyeke xweşik xwar. Em ê ji bo cihê biçine bi şevê bireketana. Ji ber wê yekê me dê bi îstirehetkirinê roja xwe derbas bikirana. Tav hêdî hêdî disincirî. Her ku tav disincirî heval jî direvîn sîberên berqafan. Min jî xwe xiste ber sîberekê. Weke di vê germê de ji sîberê sûd bistînim min xwe dirêj kir. Ji nişka ve hevalê/a nobedar got, “dijmin ber bi nuxteya me ve tê”. Çawa ku nobedar ev gotin kir çek teqiyan.

Hêdî hêdî dest pê kir ji binê mewziya min deng werin. Min ji ber keviran ti tişt nedidît. Min dikarîbû tenê dengan bibihîzim. Gava ku min ji hevalê Merwan pirsî, dengê kê ye tê, wî jî got “dijmin nêzîkî te dibe, bila heya te ji te hebe”. Her ku diçe deng zelaltir bûn. Dema gotin, “terorîst li vê derê ye, terorîst li vê derê ye”, min fêm kir ku behsa min dikin. Min deng li Merwan kir. Ji wî deng derneket. Leşkeran digot, “teslîm be, teslîm be”. Pir zelal ev gotin hatin guhê

min. Tam dema tolstendinê bû. Min gule û bombeyên xwe ji bo vê kêliyê hilgirtibûn. Gule û bombe, li pey hev diteqiyan. Hevalê Merwan got, “rewşa te çawa ye, ez ê niha parastina te bikim, zûka ji wê derê derkeve”. Hevalê Merwan li pişta berê hema li rexê min parastina min dikir. Ji navbera du keviran bi parastina Merwan derketim. Dema li gel hevalê Merwan, em derbasî pişta kevirê din dibûn gava ku ez li paş xwe zivirîm û mêze kir, leşkerekî çeka xwe li me her duyan rast dikir û hema dikir li me bide. Dema ku me her duyan bi hev re lê mêze kir, leşker cemidî û sekinî. Nikaribû li me bide. Hevalê Merwan çeka xwe li wî rast kir lê gule neteqî. Li ser vê yekê leşkerê ku qutufîbû, encax karîbû xwe bivêje pişta berekî. Me hema li wê derê mewzî girt. Diviyabû em tepe bernedin. Derketina tepe ji destê me, dihate maneya ku grûb bi îmhabûnê re rû bi rû bimîne. Cihê me baş bû. Dijmin bi hêsanî nedikarîbû bê. Me dê li vê derê heya êvarê li ber xwe bidana. Dijmin jî dixwest grûbê îmha bike. Li şûna ku min û hevalê Merwan vala kiribû de leşker bi cih bibûn. Pevçûn di nav hev de berdewam dikirin. Paşê qobra û skorsky hatin. Em pir rehet bûn, hem cihê me pir baş bû, hem jî em wisa ketibûn nav hev, dijmin nedikarî cihê me tam tesbît bike. Qobre piştî ku di ser me re çend caran zivirîn, bi şûnde çûn.

Me di demeke kurt de liv û tevgera leşkeran da sekinandin. Leşkerên di dolê de di binê qontrola me de bûn. Nedikarîn tevger bikin. Kêliya ku diketin tevgerê bi êrîşa me re rû bi rû diman. Çend leşkerên di dolê de derb girtibûn. Hin jê ji mêjve ketibûn xeweke bêdawî. Hin jî ji ber ku birîndar bûn qîrqîra wan bû.

Her ku pevçûn berdewam dikir û înisiyatîf diket destê me, şer kêfxweşî dida mirov. Leşkerên li pişta berên bîst metro li pêşiya me xwe veşartibûn, hin caran serasera gule berdidan. Leşkerên li pişta keviran timî qîr dikirin: “Teslîm bin, şensa we ya xelasbûnê nema. Hûn di dorpêçê de ne. Yekî din digot, “ma ne heyfa we ye, hûn tî û birçî li van çiyan jiyan dikin. Hûn ê hemû bimirin, xwe biavêjin ber bextê edaleta me”. Van gotinan nîşan dida ku dijmin çendî bêçare ye. Hevalê Merwanê ku li cem min bû digot, “ez nikarim li mirtoxeyê îxanet bikim”. Heqê wî hebû, diviyabû me heqê mirtoxeya ku dixwar, bida.

Ji vê pêvçûnê re pir kêfa min hatibû. Ji ber dengê guleyan weke ku guhê min ker bibûn. Dema bêhna barûtê û bêhna cixareyê dibû yek mirov ji cixareyê têr nedibû. Ji têhnan qirka min zuwa bibû, lêva min terikîbû. Leşkerê li pişta kevir ji her deh deqîqeyan carekê, gule berdida hewa. Dema hevalan bersiva wî didan, nedikarîn rambotî bikin. Ramboçîtiyê li me û çiyayên me kar nedikir. Heman leşkerî carekê jî şapqayê xwe bi serê çeka xwe de kir û ji pişta kevir derxist. Hevalan çend gule avêtinê. Dema min got, heval gule neavêjin, vala vala guleyên xwe xerc nekin, ew nawêre serê xwe derxe û ji bêr wê yekê weke Kemal Sunal şabantî dike, heval kenîn.

Heya bi tariyê şer di înisiyatîfa me de berdewam kir. Dema bû tarî, em paşde kişiyan. Ji palên zêde zêde arwaz ên Bêgoz bi ketin û rabûnê, me xwe berda dolê. Me di dolê de hemû heval qontrol kirin. Em hemû temam û saxlem bûn. Tenê guleyê zendê hevalekî/e nobedar şermixandibû. Em dubare zivirîn Kirêkor. Em pir westiyabûn. Pevçûn bi temamî deh saet berdewam kiribû. Dema sibeyê em gihaştibûn nuxteyê em hemû westîbûn. Hemû hevalan dest bi îstirehetê kirin. Mangaya me tepeçî bû. Em derketin gir, pêwîst bû em pir hişyar bûna. Misoger bû ku dê operasyon rabe. Ev du roj bûn dijmin ji me derbe dixwar. Fermandarê navenda wan talîmat dida û digot, “ji bo her leşkerê ku wan lê daye, serê pênc Apoçiyan dixwazim”. Ji bo ku di operasyonê de bi şiklekî xafilane em nebûna nêçîr diviyabû em baldar bûna. Heval pir westîbûn. Me bi dorveger bêhna xwe vedikir. Heya bi nîvro dinya ker bû.

Dema tavê hêdî hêdî cihê xwe ji hewaya hênik re dihişt, dijmin ji Kirêkor dest bi xuyabûnê kir. Min di cih de agahi da hevalan. Wan jî dîtibû. Hema di wê kêliyê de ketin tevgerê. Ber bi cihê ku em lê bûn bi rê ketin. Em ê îro neketana pevçûnê. Hem em pir westiyabûn, hem jî em neçar bûn cebilxaneya xwe bi hesab bi kar bînin. Me ji Kirêkor ber bi Çarçela ve dest bi meşê kir. Dijmin jî bi me re li Kirêkor neket şer. Eger bixwesta dikarîbû bi me re bikeve şer. Bawer im wan jî dixwest me li cihekî teng, tengav bikin û îmha bikin.

Piştî ku em heya bi sibeyê meşîn me karîbû werin Çarçela. Bi rastî jî em pêrîşan bibûn. Dema me ji sirtê zêde zêde arwaz ê di ser gundê Bayê re ye xwe berdabû, me gelek xetere girtibûn ber çavan.

Her der kendal bû. Dijmin cuda ji vê kendalê, ji me re rêyeke din nehiştibû. Kemîn danîbû ser hemû rêyan. Me karîbû bêyî ku zerereke herî biçûk jî em bibînin, di kendalê re dakevin û sibeyê xwe bigihînin cihê zomekê. Ji aliyekî ve westabûn, ji aliyê din ve birçîbûn em ji hev xistibûn. Nêzîkî du roj bûn me xwarin nexwaribû. Ji bo em hatibûn Çarçelayê hinekê bêhna ve vebibû. Dijmin nedikaribû li Çarçelayê zêde me tengav bike. Me makarnayên li cem me bûn çêkirin. Lê bêrûn bûn. Dîsa jî kêfa me hemûyan jê re hat. Bi şekirê me yê heyî jî me çayek çêkir û vexwar.

Ji beriya em firsendê bibînin, dijmin bi balafir û helîqopteran dest pê kir qada em lê ne bombebaran bikin. Di cih de me dest pê kir em ber bi sirtan bibezin. Balafiran çep û rasta me bombe dikirin. Dema bombeyên balafiran xelas dibûn vê carê jî qobrayan herêm bombe dikirin. Me xwe diavêt erdê, eger hebe dixist pişta keviran. Dema hinekê bombebaran disekinî em di cih de dibezîn sirtan. Ji ber ku vê carê dijmin di bejahiyê de jî bi ser me de dihat. Pevçûn giran bibûn jî. Ji bilî bolîka me bolîkeke me ya din li Çarçela bû. Wan jî li cihên cuda yên Çarçela li dijî dijmin şer dikirin.

Êrîşên hewayî qebiliyeta me ya tevgerê sînordar dikir lê derfeta tevgerê dida dijmin. Heya bi êvarê şer û êrîşên giran ên hewayî berdewam kirin. Min cara destpêkê didît ku KT’ê wisa bi awayekî bênavber êrîşên xwe yên hewayî didomîne. Sibeye ji saet dehan, êvarê heya bi saet heştan, heşt balafir û çar qobrayan cihê em lê bombe kirin.

Çarçelayê jî li gel me li dijî dijmin berxwedaneke mezin dikir. Ruxmî ku bi kîloyan bombe hatibû avêtinê, hê jî li ser piyan bû. Hem jî hemû şervanên azadiyê diparast. Eger ne ji stargehên xwezayî yên Çarçela bûya, ti kes ji me xelas nedibû. Piraniya hevalan li girên cuda yên Çarçela belav bibûn. Hemû hevalên li qadê, li Çarçela kom bibûn. Me şeva xwe bi neh hevalan re di şikêrekê de derbas kir. Ruxmî ku sar bû ji demeke dirêj pê de me nekarîbû îstirehet bikin, razên. Em pir jî birçî bibun. Lê tiştekî xwarinê tine bû. Di vê rewşê de tiştê herî baş ku me bikirana, razan bû, dema mirov radiza mirov her tişt ji bîr dikir. Em sibeyê bi dengê çekan şiyar bûn. Hema li sirtê pêşberê me grûbek hevalan mewzî girtibûn. Me jî di cih de li şûna

xwe mewzî girt. Hevalek ji wê grûbê hate cem me. Ji me re got ku hevalên din jî li şikêra di biniya me re ne. Hemû rojê aliyê me bêdeng derbas bû. Ji birçîna êş ketibû zikê me. Êdî xewa me jî nedihat. Titûn jî kêm mayîbû. Diviyabû me îdare bikirana. Wê şevê hemû heval li cihekî kom bûn. Hemû heval dîtin em pir kêfxweş kirin. Vê yekê em deydarê Çarçela bûn. Em hemû parastibûn. Lê hemû heval pir westîbûn. Dîsa jî rûyê wan dikeniya. Dijmin, ruxmî wê teknîka xwe, wê hêza xwe, dîsa jî nekarîbû zerereke herî biçûk jî bide me. Li cihê ku em kom bibûn hevalê A. Ji me re axaftineke kurt kir: "divê em îro Çarçela berdin. We berxwedaneke mezin nîşan da, hûn westiyayî ne dizanim. Lê divê hûn îro ruhê Apoçitiyê nîşan bidin." ev gotin ji me re weke derman bûn, ruh bi me ve hat. Me dikarî encax di rojên wisa de nîşan bida ku em Apoçî ne. Ti rewşa me ya neçûyinê tine bû. Lê diviyabû em bimeşiyana, ev neçariyek bû. Em hêdî hêdî ketin tevgerê. Me ji dola kûr ku diçû gundê Bezena, xwe berda jêr. Dol tije berf bû. Em demekê li ser berfê meşîn. Li vê derê daristanên têrdar hebûn. Dol jî doleke kûr bû. Me dê îro jî li vê derê derbas bikira. Lê teqata me nemabû. Êdî em bi îradeyê dimeşîn. Titûna me xelas bibû. Ya din jî germahiyê qira me radikir. Ji ber westabûnê, hevalan bi xwe re hêz peyda nedikirin ku dakevin avê.

Ber bi êvarê me li nuxteya xwe, xwe dirêj kiribû û sekinîbun. Ji bolîka din du heval hatin cem me. Ji kîsê dest xwe nan û cixara derxistin. Çavên me zîq bûn. Her yekî ji me hinek nan li parê ket. Nîv paket cixare dan. Nanê min xwaribû, bi nanê gerîla nanek û nîv bû. Hemû hevalan bi qasî hev nan û cixare girtin. Me bi xwê xwar. Ji bo ku em tansiyona me ya ketiye, rakin me zêde xwê xwar. Piştre me nan xwar, dema me cixareyek jî vexwar em bi ser xwe ve hatin û êdî me dikariya biçin avê. Ji ber ku me zêde xwê xwaribû em qederekê têhn bibûn. Piştî nanê me xwariye û cixareya kişandiye min digo, dikarim bêyî ku qet zehmetî bikişînim rêya deh saetan bimeşim.

Weke ku me hêza êvarê wenda kiribû ji nû ve kom kiriye, em bi rê ketin. Em hineke xweştir û bilez dimeşin. Piştî ku em nîv saet meşiyan, grûba me ya pêşeng ku ji beriya me bi rê ketibûn paşde zivirî û diyar kirin ku li ser rêya em pê de biçin, dijmin kemîn daniye. Ji ber vê yekê em di cih de li daristana em lê bûn bi cih bûn. Tiştê ez

herî pê xemgîn dibûm xwarina min xwariye dê vala biçûya! Lê min dikarî bi hêza min ji wî nanî girtiye, bêyî ku zehmetî bikişînim bimeşim. Dotira rojê em dubare bi rê ketin. Dijminê ku ji beriya rojekê kemîn danîbû ser rêya me, îşev ew der berdabû.

Hemû gundên li herêmê çete bûn. Bi taybetî jî ji van gundan Bezena û Nûgayla, gundên dîn û har ên çeteyan bûn. Ji ber wê yekê diviyabû em pir bi hişyarî tevbigeriyana. Dema em hatibûn biniya gundê Bêtkor êdî ji bo sibeyê kêm mabû. Êdî em nedikarîn bimeşin. Bostanên gund hema li pêşiya me bûn. Hin hevalan got “em biçin bostanan û ji xwe re sebze bînin”. Fermandarê me yê bolîkê destûr neda. Eger em biketana bostanan û me sebze bianiyana, gundiyan dê fêm bikirana ku em li vê derê ne û agahî bidana dijmin. Ev gund jî çete bû. Em derketin gir Bêtkor ê hema li pişta gund. Gir li ber çavên me wisa mezin bibû, em difikirîn ku em ê nikaribin qut bikin. Her ku pênc gav diavêtin me navberek dida. Qereqola Bêzelê tam li pêşberê me bû. Şewqa wê her der ronî dikir. Serê sibê encax me karîbû xwe biavêjin daristana li ser girê Bêtkor.

Westabûn zêde zêde bû. Ji birçîna xewa me jî nedihat. Birçîbûn bila li aliyekî bimîne, têhnbûnê em dikuştin. Li cihê em sekinîbûn av tine bû. Hin heval ketibûn nav sohbetê. Hevalê Behzad ku bi rê de timî behsa xwarinên dayika xwe kiribû, qet nedisekî û diaxifiya.

Hevalê Merwanê ku êdî nekarîbû xwe bigire, got “bes e hevalê Behzad, êdî ji me re xwarinên dayika te çêdikirin nebêje”. Li ser vê yêkê hevalê Behzad careke din behsa xwarinan nekir.

Cara destpêkê dihatim van deran. Hevalên herêm nas dikirin digotin ku em ê piştî meşa îşev xetereyê derbas bikin û bigihîjin nuxteya em ê biçinê. Ji ber vê yekê me digot, em ê zora xwe bidin ser xwe û rêya îşev jî bimeşin. Êvarê em bi rê ketin. Me ji gir, me xwe berda şiverêyekê. Piştî em hinekê meşiyan em hatin ser kaniyekê. Em wisa têhnî bibûn, qirika me zuwa bibû. Lê me karibû qedehek av vexwun.

Paşê em dubare bi rê ketin. Bimeş, bimeş rê nediqediya. Yan rê pir dirêj bû, yan jî em nedimeşîn. Ya rast em nedimeşîn. Em deh deqîqe dimeşîn û bîst deqîqe yan navber dida. Encax me karî sibe xwe bigihînin cem ava Basya. Êdî me xetere derbas kiribû. Du sê saet

rê mabû ku em xwe bigihîn cihê biçûnê. Grûba lojistîkê li vê qadê ku dizanî em ê biçine wê derê, dikir ku amadekariyan xelas bike. Lê diviyabû em heya êvarê li vê derê bisekinîna. Du sê hevalên ku hê di lingên wan de hêz maye û bi xwe bawer dikin, xwestin bombe biavêjin Basya û masî bigirin. Fermandarê me yê bolîkê jî ev di cih de dît. Piştî demeke kurt ji bombe avêtinê, masiyan dest pê kirin bi ser avê bikevin. Lê di hevalan de hêz nema bû ku masiyan bigirin. Di encama têkoşîna mezin a du-sê hevalan de encax karîbûn biqasî ku du sê masî bikeve para her taximê masî bigirin. Her taximê di cih de para xwe li ser agir sor kir û her kesî parçeyek jê xwar. Parçeyek goşt têrê dikir û zêde jî dihat ku em pê sê saetan bimeşin.

Piştî nîvro em bi rê ketin. Em hinekê din bi ser xwe ve hatibûn, me dikarî gavên mezintir biavêjin. Dema dinya tarî bû em hatin cihê jê re Dola Çinarê dihate gotin. Hevalan li derûdora agirên gur û geş em pêşwazî kirin. Ji nû ve dîtina agir çiqas xweş bû û bawerî dida mirov. Aliyê herî balkêş ew bû, dema em dihatin nuxteyê ji ber erzaqê li ser rêya me em hemû mabûn heyirî. Her heval dema di ber re derbas dibû destê xwe lê dida, ji hevalê/a di pey re dimeşe re digot ku erzaq zêde ye. Li nuxteyê piştî ku her taxim hate bicihkirin, me xwarina hatiye xwar. Lê piştî ku çend kevçî dixwar her heval paşde dikişî. Mîdeyên me xwarin qebûl nedikir. Bi vexwarina çaya şêrîn re em hinekê bi ser xwe ve hatin. Piştî xeweke kûr û giran me hemû westabûn ji ser xwe avêt.

Dijmin ji berê de plana vê operasyonê kiribû. Li Colemergê, Şemzînan û Geverê cara destpêkê operasyoneke wisa mezin û berfireh dikir. Me bi berxwedaneke mezin operasyon vala derxist. Di seranserê têkoşîna me ya çekdarî ya neh salan de gerîla cara destpêkê li vê herêmê evqas hakim e û cara destpêkê gerîla hinekê li ser hev bû. Ev rewş dijmin dudilî dikir û ditirsand. Ji ber vê yekê dijmin pêwîstî pê dîtibû ku wisa operasyoneke mezin bike. Di operasyonê de li şûna ku derbe li me bide, derbe xwaribû. Di seranserê operasyonê de ti wendahiyên me bi pêş neketin. Tenê du heval ji grubên xwe qut bibûn. Li gorî agahiya gihiştiye me, hevalê Bawer piştî ji gruba xwe qut dibe dikeve çembera dijmin û bi tena serê xwe çember qut dike û derdikeve. Dikare ji ser leşkerên dikuje du çek û dûrbînekê rake û xwe

bigihîne hevalan. Hevalê/a din jî ji bin qontrola dijmin derdikeve û paşê xwe digihîne bolîka Geverê. Em hêdî hêdî li ser herêmê hakim dibin. Kêmasiya me ya herî mezin li qadê, rojane gerîla nejiyîn bû. Me nekarî vê derbas bikin, ji ber vê yekê, ji ber ku me nekaribû di her aliyê de amadekariyên xwe bi awayekî xurt bikin jî me nekarîbû di vê operasyonê de derbeyên mezin li dijmin bidin.

Dijmin dixwest bi vê operasyonê me li Çarçela tengav bike û li wê derê îmha bike. Karîbû hemû hêza me ya li herêmê li wê derê kom bike. Ev, di seranserê operasyonê de yekane serkeftina wî bû. Eger me karibûya xebatên xwe yên bicihbûnê bi tendirustî bikira, dijmin nedikarî bigihîje vê armanca xwe jî. Em neçar man di operasyonê de manewra bikin. Sedema vê jî ew bû ku me nekarîbû xebata xwe ya bicihbûnê bibin serî. Ya din jî dijmin dixwest me bikişîne pevçûnê. Em neketin vê leyistoka dijmin. Ji bo dema em bixwazin derbeyên hê xurt lê bidin me manewra kir. Dema manewrayê hemû hevalan îradeyeke pir mezin nîşan dan. Birçîbûnê, têhnîbûnê û westîbûnê nedikarî çavê me bişkîne. Hin caran di navbera hevalan de nîqaş dibûn. Lê divê mirov di dem û mercên wisa de weke asayî bin nêzîkê tiştên wisa bibe. Ruxmî hemû zehmetiyan morala me di cih de bû. Timî me moral dida hev.

Min di vê pêvajoyê de jiyan û dijmin baştir nas kir. Ya herî girîng jî min xwe nas kir. Min lewaziyên xwe, aliyên xwe yên bihêz, ku ez ê karibim çiqasî şer bikim, kapasîteya xwe dît.

Şer bi mirov, mirov bi xwe, jiyanê, dijmin dide naskirin. Baweriya min heye, ez ê gelek encaman derxim, tecrubeya pêwîst bigirim. Divê ji bo min û hemû hevalên min ev pratîk bibe eynik. Her kes karibe biçe ber eynikê, xwe tê de bibîne û karibe kirêtiyên xwe derbas bike, li ser vê bingehê xwe bigihîne serkeftinê. Baweriya min heye hemû heval dê ders û encamên pêwîst derxin.

Dijmin di vê operasyonê de bi deh hezaran leşker xwe hat ser me. Ji wir bezî vir. Lê nekarî ti encam bistîne. Neçar ma dest vala û patika xwe bixurîne û bi şûn de bizivire. Eger em li herêmê gerîla bi temamî bidin rûnişkandin, bi temamî bi cih bibin, rizgariya herêmê, tasfiyeya dijmin nêzîk e. Ev jî tê maneya serkeftin bi dest ve anînê, gav bi gav ber bi rizgariya welat ve çûnê. Em ê ji vê bi şûnde li ser vî esasî nêzîkî qadê bibin û em ê bi hemû cidiyetê amadekariyên şer pêk

bînin. Me heya bi dawî îradeya xwe bi kar anî. Em di her mercê de li ser îradeya xwe hakim in. Li dijî hêza dijmin û teknîka dijmin me bi îradeya xwe li ber xwe da û ew vala derxist. Bijî îradeya PKK'ê ya ji pola ku li pêşberê ti zehmetiyê paşde gav neavêje!

**25'ê Tebaxa 1993'yan**

Piştî manewraya zor û zehmet derbas bûye, li Dola Çinaran ku li qiraxa Ava Basya ye me îstirehet kir. Piştre jî me di Ava Basyayê de serê xwe şûst û hemû westabûna xwe ji ser xwe avêt. Em têra xwe di avê de man. Ev qad dikeve mintiqaya Herkî. Mintiqaya Herkî pir cihekî stratejîk e. Piraniya gundên li vê derê çete ne. Piştî ketina me ya dawî, piraniya gundan çekên xwe berdan. Tenê yên har man. Wan jî, em ê berê xwe bidinê û bêçek bikin. Li qadê du tabûrên mezin ên dijimin hene: Bêzelê û Bêdawê. Bezelê hema li ser sînor bi sîstemeke bihêz a parastinê tê parastin. Bi taybetî piştî êrîşa hevalan ku ber bi sala 1992'yan pêk anîne tedbîrên ewlehiyê yên pir mezin girtine. Ev tabûra di heman dêmê de parastina tabûra Bêdawê jî dike. Şewqa wê ku bi şevê pêketiye, hemû qadê ronî dike. Gundên Bêzene û Nûgayla yên li qadê, gundên çeteyên har ên dijminahî dikin in. Ev gund hema li derûdora tabûrê ne û di heman demê de parastina qereqolê jî dikin. Gundên din ruxmî ku çek rakiribûn şer nedikirin. Tenê ji bo mûçe [maaş) çek rakiribûn. Yekane sedema ku dijmin li qadê dimîne û xwe xwe radigire, çetetiya li qadê ye. Eger çetetî ji hev bikeve, dijminê li qadê nikare xwe ragire. Dijmin ji ber ku ev dizanî berê xwe dida gel. Eger em li qadê bi temamî bi cih bibin, rakirin û avêtina dijmin dê hê hêsantir biba.

Her aliyê Herkî ji bo bicihbûnê dest dayî ye. Em dikarin li dola biniya qereqola Bêzelê jî bimînin. Piraniya beşeke mezin daristan e. Aveke boş a tê ser ava Basya û serkaniya xwe ji Çarçela distîne di nav dolê de diherike. Hewaya vê derê pir germ e û dema mirov bi şevê radize pêwîstî pê nabîne ku baranî biavêje ser xwe. Lê çiyayên wê yên bilind pir sar in. Hê zêdetir di dolan de û li sirtên ji aliyê daristanan ve hatine dorpêçkirin ev germahî heye. Dema em di nav daristanê de dimeşîn, me ji germê xwêdan didan û têhnî dibûn. Li gelek cihan av tine ye encax em dikarin dengê avê ku di nav dolê de

olan dide bibihîzin. Ev jî mirov dîn û har dike, dema xwe berdidî ser avê û têra xwe jê vedixwî û dilê mirov hênik dibe.

Hemû gund pir bedew in. Di nava gundên ji aliyê daristanê ve hatine dorpeçkirin xuşaxuşa avê ye diherike. Li her alî bexçe û bostan hene. Ev gund wisa balkêş in, ez dihizirim, gundiyên li van deran dijîn qîmeta van gundên bedew nizanin, ji ber vê yekê pêwîst e mirov van gundan ji wan bistinê. Mirovên ku têkiliyên wan tenê bi gundên wan ve sînordar in û hê jî derneketine ji derveyê gundê xwe hene. Helbet dema wisa bin pêş nakevin û li dijî me şer dikin. Tê zanîn mirovên seretayî û nepêşketî jî çawa şer dikin. Piştî ku me li Dola Çinarê têra xwe bêhna xwe veda ji bo ku em dubare bizivirin qadê em bi rê ketin. Eger dijmin bi sedan operasyon li dar bixe jî, em ê qadê terk nekin. Eger em terka qadê bidin em ê xwesteka dijmin pêk bînin. Em ê rastiya bi gelê xwe bidin fêm kirin, wan bikîşînin nav têkoşînê, derbeyên hê bihêz li dijmin bidin û li qadê, wî felc bikin.

Ji beriya ku em bi rê bikevin li ser bingeha talîmata hatiye ya Rêbertiya Partiyê me hevalên temenên wan biçûk û lewaz şandin qampê. Hevalên temenên wan biçûk nedixwestin biçin. Lê diviyabû li gorî talîmatê tevberigerîna. Em di nav refan de ji hevalên temen biçûk re dibêjin 'portatîf'. Bi rastî piraniya wan bihêz bûn û di şer de jî çavsor bûn. Bêyî çavên xwe bişkînin êrîşê her mewziyê dikin. Di jiyanê de jî zêde pirsgirêkên wan tine ye. Lê ji aliyê temen ve hevalên pir ciwan in. Ketina van a şer ne rast e. Ew ji bo pêşerojê hêviyên xurt didin. Dibe ku di pêşerojê de mohra xwe li serkeftinên mezin bidin, ji ber ku ji destpêkê heya bi dawiyê bi exlaqa Partiyê mezin dibin. Gelekan ji wan qet bandorên dijmin jiyan nekirine. Dema em ji wan veqetîn em jî xemgîn bûn. Misoger e ku em ê ji vê bi şûn de bêriya hevalên portatîf bikin.

Dema me dubare berê xwe dida qadê em girîngiya lojîstîk û cebilxane derdixin zanebûnê û wisa berê xwe didinê. Pirgirêka lojîstîkê, me qederekê mijûl dike. Erzaqê ku me ji gundiyan peydakiriye, em bi rojan li ser pişta xwe digerînin. Vê jî hem em diwestandin, hem dihincirandin. Em ê hewl bidin erzaq û cebilxane li hemû nûxteyên xwe bi cih bikin, em ê liv û tevgera xwe hê bilez bikin.

Dema em bi rê ketin me ji hevalan re got, moral û coşa me pir mezin e û em ji bo hedefên hê mezin berê xwe didin qadê. Em ji xwe bawer û xwediyê îdîa bûn.

**14'yê Îlona 1993'yan**

Di rojên dawî de me di terza xwe ya tevgerê de guherînên mezin kirin. Terza me ya ji beriya vê ji aliyê dijmin ve dihate zanîn û ji ber vê yekê timî em dişopandin. Heta dijmin li qadê çend yekîneyên bi tevger bi cih kiribû, dixwest bi wan derbe li me bide. Eger me di terza tevgera xwe ya kevin de israr bikira, dibe ku me derbe bixwara. Me bolîka xwe kir du beş. Taximek heval çûn başûrê Herkiyê, me du taximan jî dê gundên çeteyan ên li Gerdiya jor û li bakurê Herkî bêçek bikirana. Me ji beriya operasyonê ji gundê Bintur çar kes girtibûn gel xwe. Heya operasyon bi dawî bû li cem me bûn. Me hemû jî parastin. Em dema bi qiraxa Ava Basya ve paşde kişiyabûn me ew serbest berdan. Bi taybetî van çar kesan, gava zivirîbûn gundê xwe rewşa me ya di operasyonê de, me çawa şer kiriye, me çawa ew parastine, çawa li ber xwe daye, ji gelê herêmê re gotibûn. Gundî jî ji van gotinan qederekê bandor dibin û hin çeteyan ji ber xwe çek berdabûn. Gundî çawa ji cem me çûbûn rasterast çûbûn gundê xwe û he mû gundê Binturê çek berdabûn.

Me di dehê mehê de rêya Gerdî-Şemzînanê qut kir, dest danî ser erzaqê diçe çeteyên Gerdî. Gerdiyan erzaqên xwe ên zivistanê dibirin, me biryar girtibû em erzaq nexin Gerdiya. Me ji erzaq beşek ji xwe re girt. Beşek jî me da gundê Gelîton ku ji beriya vê alîkariya me kiribû û çekên xwe danîbûn. Ev gund ji çar malan pêk dihat. Bi destpêka ketina me ya qadê re malên xwe ji me re vekirin. Me bi durustbûna gundiyên vî gundî bawer dikir. Paşê me tevî erebeyan erzaqê Gerdiyan şewitand.

Em di yanzdeyê mehê de ketin gundê Bêgoz ku me plankiribû em hema di pey vê çalakiyê re bikevinê. Temamê gund çete bûn, me nedizanî ku li dijî me şer dikin yan na. Ji ber wê yekê me plansaziya xwe çêkir û wisa em ketin gund. Gund ji sê taxan pêk dihat û her grûb ket taxekê. Grûba min ket taxa nîvengê. Heya bi biniyê malan ti kesî em nedîtin. Em ê du bi du biketana malan, me berê xwe da

hedefên xwe. Her der pir bêdeng bû, dema em ji deriyê malê ketin hindurê malê, jinên em dîtibûn destpêkê tirsiyan. Kî bûna dê bitirsîna, ji ber ku ji nişka ve derketin li pêşbere wan. Piştî ku me jinên tirsîne aram kiriye, zilamên gund di cih hatin malên xwe. Ji me netirsîna gund li kêfa me çûbû. Qe nebûya me dikariya li gel hev du bi rehetî li hev bikin.

Bi giştî 24 çekên gund hebûn. Hevalên jin li cem jinên ku li gund bûn, me jî ji zilaman re civîn çêkir. Piştî civînê biryar girtin ku çekên xwe daynin. Dîsa, şeş çek jî dan me. Çekên mayî jî dê di du rojan de danîna. Gelê gund li pêşberê me qederekê germ tevdigerî. Eleqedariyeke jidil nîşan didan. Li vê qadê cara destpêkê gundekî evqas germ nêzîkî me dibû. Vê jî kêfxweşiya me zêdetir dikir. Ji beriya ku em ji gund derkevin hemû gundî, zarok, êxtiyar, jin û zilam li nîvenga gund kom bûn. Piştî ku ji me soza dubare hatinê stendin em bi rê kirin.

Ji ber ku nuxteya me dûr û barê me giran bû, em li isûziya li gund bû siwar bûn û li cihekî nêzîkî nuxteya me daketin. Di nuxtyên me de jî guherîn pêk hatibû. Vê jî dijmin qederekê dixapand. Em li cihên ku dijmin qet texmîn nake disekinin. Yan li dolên di ser gund re ne û yan jî di dolên navbera du gundan de, yan jî li daristanên ser rêyan em disekinin. Ji ber ku dijmin dihizire, em li cihên bilind disekinin timî cihên bilind bombebaran dike û li ser wan deran operasyon dikir.

Doh me di sêgoşeya Herkî, Gerdî û Bembo de rê qut kir, gelek erebe dan sekinandin. Zêde gel kom bû, piştî ku me proganda kir me alîkarî kom kir. Me dest danî ser erzaqê gundê Bezene yê çeteyên har, ji vî gundî kesek girte cem xwe. Em li erebeyek ku me bi şev sekinand siwar bun, çûn gundê Deryaya ku ew jî çete bu. Ruxmî ku ji me re berê gotibûn ku ew ê çek berdin hê jî bernedabûn. Me hemû gundî kom kirin. Ji me sê roj dem xwestin ku çekên xwe berdin. Me jî ji bo dawî ev dem da wan û derengiya şevê ji gund derketin.

Em hêdî hêdî xwe digihînin hedefa ku me ji bo xwe diyar kiriye. Piraniya gundên çeteyên li qadê yan çek berdane yan jî di demeke herî kurt de dê berdin. Ji bo dijmin girîngiyeke pir mezin a van çeteyan heye. Ew, çav, guh û zimanê dijmin ên li herêmê ne. Dijmin ji ber ku xwe dispêre van li vê qadê xwe radigire. Eger çetetî li vê

derê ji hev bikeve, ji herêmê qewitandina dijmin hê hêsantir dibe. Gundên çek berdidin êdî nêzîkî me dibin, her roja derbas dibe bi sempatî li me dinêrin. Bi taybetî di qutkirina rêyan de piştî ku em çete û merivên çeteyan serbest berdidin, ji me û jiyana me pir bi bandor dibin. Propagandaya me dikin û dibin dostên me. Çekên gundên çete, hemû, çekên Almanyaya Rojhilata kevn e. Almanan ev çek dane KT'ê, wan jî ev çek li ser çeteyan belav kirine û li diji me bi kar tînin.

Di demên dawî de em du sê caran bi erebayan çûn cihên cuda. Helbet xeter e grubeke gerîla li erebeyê siwar be. Ji bo ku dijmin bixapînin û ji cihê me çalakî li dar xistiye dûr bikevin em li erebeyê siwar bûn. Di rojên dawî de ez li pey hemû hevalan dimeşim. Bi hêjên dirêj timî li pey grûbê dimeşim û dewsa lingên me qamufle dikim. Bi taybetî dema em dimeşin her tim ji bo rê baş qamufle bikim ji pêş talîmat tê. Hin caran dema talîmat şaş tê ragihandin, ecz dibim. Li ser vê yekê heval hê zêde hanekên xwe dikin. Dibêjin "bila hevalê li pey grûbê tê, şopan baş xerab bike". Paşê dikenim. Dema em li erebeyê siwar dibin hanekên me yên li ser mijara 'şop xerabkirinê' her dewam dikin.

Doh ez û hevalê Şiyar em li bagaja ser erebeyê siwar bûn. Bi awayê çekên me li milê me, di tariya şevê de li ser erebeyê li lûtkeyên çiyan temaşe kirin pir romantîk bû. Ez kenîm û min got, heval, niha ez pêşengê we me, hûn careke din pêşengekî weke min nikarin peyda bikin. Rêya me pir dirêj e, dua bikin pêşengekî we yê weke min heye. Ez ê di vê rêyê dirêj de di demeke kurt de bigihînim cihê we û bila ji pêş hêjmar bê. Hevalan jî bêyî ku talox bikin bersivên xwe di cih de dan: "Bila hevalê li pey grûbê dimeşe dewsan baş xerab bike, rêya me pir xeter e, divê ti dews dernekevin".

Curê çalakiyan çi dibe bila bibe, çalakvaniya timî morala gerîla bilind dike. Timî gerîla zindî û li ser xwe radigire. Em hewl didin di demên dawî de qet vala nemînin. Bi taybetî ji bo erzaq neçe gundên çeteyan em rêyan pir zêde dixin bin qontrolê. Em rê qut dikin û gundên çeteyan qet rehet bernadin, timî dikevinê. Em ê ji vê bi şûnde hê bi şîdeteke zêde berê xwe bidin gundên naxwazin çekên xwe daynin û yên dixwazin me mijûl bikin. Li gel vê ya din jî em berê

xwe bidin hedefên leşkerî baştir dibe. Û pratîka me encamgir dibe. Jixwe em vê dawiyê kişfa hedefên leşkerî jî dikin. Em ê di demeke herî kurt de berê xwe bidin van hedefan moral û hêza xwe mezintir bikin.

Heval li nuxteyan dîsa vala nasekinin. Ji ber ku em timî dimeşin binê lingên gelek hevalan zirav bûye, goştê sor derketiye. Ji ber vê yekê bi zehmetî dimeşin. Hevalên binê lingên wan zirav bûne, hineyê li lingê xwe didin. Hin heval jî qaşilên guzan lê didin û hewl didin lingên xwe sax bikin. Qederekê jî sûda wê çêdibe. Lingên wan zuwa dibin, qaşil digirin. Di demeke kurt de baş dibe. Hema bêje li her derê em disekinin darên fêkî hene. Tirî, guz, sêv, mişmiş û hwd. fêkî tam çêbûne. Hevalên karê wan tine ye ji bîr nakin ku bi van re mijûl bibin. Hin caran em pir didin hev û li ser hemû bolîkê belav dikin. Bi şevê dema em di nava gundan re derbas dibin, heval li derveyê gund li bendê disekinin. Çend heval li ser esasê ku zererê nedinê û texrîb nekin, diçin, ji me re xeyar, bacansor, îsot û hwd. tînin. Hêdî hêdî ketina bin qontrola me ya qadê û ji gerîla re vebûna wê, me hemûyan kêfxweş dike. Demên destpêkê me li qadê pir zehmetî kişand. Lê ji vê bi şûnde em ê berdêla zehmetiyên xwe bigirin. Jixwe bê zehmetî kişandinê jixweber ti tişt nabe, eger tu ji bo çi xwêdan birêjînî, ew kar saxlemtir dibe. Misoger e ku êdî em ê li qadê weke berê zehmetî nekişînin.

**19'ê Îlona 1995'an**

Me doh li Kirêkor civîna taximê ya panzde rojan li dar xist. Civînên me domdar in, dema wexta wê bê tên lidarxistin. Di pratîkê de civîn di dema wê de nayên lidarxistin. Sedem ew e, şert û merc ne di cih de ne. Ji aliyê derxistina holê ya kêmasiyên me û ew derbaskirina wan, diyarkirina hedefên me yên di pêşerojê de, pêşxistina pêşniyaran û pêşxistina rexneyan ve civînên me pir girîng in.

Dema ku civîna me bi dawî bû manyaya me ya yekemîn û sêyemîn, ji bo bi gundê Bezeno ve hev dîtin çêbikin û çek bi wan bidin berdan çûn Çarçelayê. Em jî li gel hêza din a bolîkê ber bi geliyê Bembo bi rê ketin. Niha em tam li di dola li pêşberê gundê

Sîrûnûs de ne. Ji ber ku em ber bi sibêyê gihaştine nuxteyê, hin heval ketine xewa kûr, hevalê erkdar jî bi çay û xwarinê re mijûl dibin. Hevalên dukel derdixin di cih de tên hişyarkirin. Tê gotin “bila dûkel dernekeve, ev der ne cihekî bi ewle ye. Eger hûn naxwazin me bi dijmin re bînin beramberê hev, hişyariya dûkela xwe bikin”. Heval jî di00 cih de tiştê te gotin pêk tînin.

Mijarên rojevê yên di civîna me ya doh de, bi vî awayî bûn; nirxandina kar û xebatê, jiyana rojane, terza me ya tevgerê, rexne û rexnedan, pêşniyar û biryar. Me di çarçoveya van mijarên rojevê de dest bi civîna xwe kir. Destpêkê tevlîbûna civînê qederekê lewaz bû, piştre her hevalî di civînê de dîtinên xwe anîn ziman û wisa tevlîbûnek pêk anîn. Min jî di civînê de fikra xwe anî ziman, diyar kir ku helwesta me ya li pêşberê çeteyan rast û di cihê wê de bûye, lê divê em bi vê berdilê xwe xweş nekin, pêwîst e em berê xwe bidin dijmin û hemleya dawî bi plansazî, bername, bihêz û encamgir be; di demên dawiyê de terza me ya tevgerê rast bûye, pêwîst e ev terz berdewam be û rêgezên gerîla hê jî bên rûnişkandin. Dîsa, min pêşniyareke bi vî awayî pêş xist pêwîst e em dubare biçin gundên çek berdane û ev ketina me ya gundan dê bawerî bide wan. Weke taxim me ev pêşniyar qebûl kir, pêşkeşê rêveberiya jor kir. Hevalê Egîd û Cemîl ku di hemû civînê de hatibûn rexnekirin min jî rexne kirin. Min got, hevalê Egîd di demên dawiyê de ji bo her tiştî îtiraz dike, xwe li ser jiyanê ferz dike, ev nayê qebûlkirin. Min rast nedît ku heval bi dirustî nêzîkê xwe nabe û her tiştî bi nexweşbûna xwe ve girêdide. Min diyar kir ku divê heval kêliyekê ji beriya kêliyekê rast berê xwe bide xwe, ji hevalan jî destek û alîkarî bixwaze. Dîsa, min ev mijar rexne kirin, rêveberiyê xebateke kolektîf nemeşandiye, ji ber vê yekê li ser pêkhateyê nekariye bi temamî qontrolekê bi pêş bixe, nekariye alîkarî bide pêkhateyê. Di vê mijare de min anî ziman ku bi awayekî kolektîf nexebitîna min çavkaniya xwe ji min jî digire û ji ber ku nayêm xebata kolektîf, min rexnedana xwe da pêkhateyê. Dîsa, her hevalê di civînê de mafê axaftinê girtiye bi şiklê rexnedanê nêzîkî xwe bû. Û soz dan ku dê careke din nekevin kêmasiyên derketine. Ji vî aliyê ve civîna me qederekê erênî derbas bû.

Ji bo me maneya civînê pir zêde girîng e. Heya bi asta dawiyê demokrasî tê jiyandin û dîsa qederekê her dikare hizrên xwe bîne ziman. Hedefa me ya bingehîn ew e em di civînan de timî encam bigirin. Û di gelek mijaran de jî em encam digirin. Em bi îradeya xwe biryaran derdixin. Em hemû li gorî van biryarên em derdixin tevdigerin û em neçar in wisa tevbigerin. Doh jî me derheqê taximê de hin biryar derxistin. Û em ê di pêvajoya pêş me de van biryaran pratîze bikin. Ji beriya civîn bê lidarxistin, ji beriya rojekê agahî tê dan her hevalî/ê. Heval ji bo civînê xwe amade dikin. Ji ber ku heval bi amadekarî tevlî civînê dibin her kes hewl dide hin tiştan tevlî civînê bike. Di civînan de têkarî kirin, fikir bipêşxistin û pêşniyarên nûjen bipêşxistin erka her milîtanî/ê ye.

**25'ê Îlona 1993'yan**

Di van çar rojên dawî de timî em dikevin gundan; hem yên çek berdane û hem jî yên bernedane. Ketina me ya gundan bandorên erênî dike. Bi taybetî dema em dikevin gundên çek berdane, em dibînin ku bêhna wan vebûye, hinekê hêz û cesaret wergirtine. Di bîstê mehê de em ketin gundê Deryan ku nû çek berdabû. Mangayek heval ket gund. Hevalên din ji derveyê gund sekinîn.

Hevalên li gund encax karîn di derengiya şevê de ji gund derkevin. Me bi hatina van hevalan re ji bo birêketinê dest bi amadekariyê kir. Tam di wê kêliyê de dijmin derûdora gund topbaran kir. Em jî bilez û bez bi rê ketin. Me dest bi meşê kir û em hê nû bi rêketibûn ku hewanek li ber hevalên grûba pêş ket. Em hemû di nav tozê de man, lê ti tişt bi hevalan nehat. Em bi lez û bez ji qadê dûrketin. Tesadufî, hewan li nav neketibû. Eger em deqîqeyekê zû bi rê biketana, hewan tam li nav me diket. Bi vî awayî dibe ku wendahiyên me pêk bihatana. Her çendî van gundan çek berdabûn jî, tora ajanan hê jî di asteke bilind de xwe dide jiyîn. Bi dizîka li cem dijmin giliya me dikirin, terza tevgera me radigihandin dijmin.

Em ji gund hatin nuxteya reçelê. Li wê derê mangaya me weke tepeçî derket, girê qonserveyê. Em cara çaremîn tên vê nuxteyê. Nuxte, di binê Kirêkor de, di navbera gundê Reşîda û Bembo de, cihekî daristan e. Di her carê de jî mangaya me tepeçî bû. Dema ku

em cara destpêkê hatin û derketin gir, me mewziyên dijmin çêkirine qontrol kirin. Û me di mewziyan de qonserve dît. Piştî wê me ji gir re got, tepeyê qonserve. Dema me wisa nav li tepe kiribû, hevalan jî ji ber ku li jêr li nuxteyê ji fêkiyan reçel çêkiribûn navê nuxteyê lê kiribûn nuxteya reçel. Mangaya me li nuxteyê nema, timî bû tepeçî.

Dijmin bi avêtina hewanan dixwaze gundên çek berdane bitirsîne, çavê wan bişkîne. Gel jî ditirse, dikeve panikê. Her gundê em diçinê em dibêjin, ji xwe re sixinaq (stargeh) çêkin. Pêwist e çawa tevbigerin em ji wan re dibêjin. Em çûn gundên li geliyê Basya. Ev gund qederekê nêzîkî Şemzînan in. Guherînên di gel de bi çav dîtin gengaz e. Piraniya gel li benda me ye, qederekê germ pêşwazî dikin. Ji ber ku gundiyên li vê qadê ji demeke dirêj e vir de cara destpêkê ye me dibînin, em qederekê heses nêzîkî tevgerên xwe, axaftinên xwe, rêkûpêkiya xwe dikin, girîngî didinê. Ji ber ku ew pir bi baldarî guhdar dikin. Eger em jiyana xwe, bi axaftina xwe, bi reftariya xwe li ser wan bandor nekin, bawerî nedin em nikarin wan qezenc bikin.

Di bîst û sisêyê mehê de em li geliyê Basya çûn gundê Bêgirtê. Wan jî gotin ku ew ê di demeke herî kurt de çekên xwe daynin. Em li vî gundî bi awayê grûb li ser malan belav bûn. Destpêkê, pîrika malê ya mala ku em çûbûnê pir ditirsiya. Piştî ku bi me re axifiya hinekê tirsa xwe ji ser xwe avêt. Her gundê em diçinê yan em bi xwe fotoxrafên Serok Apo û şehîdan belav dikin yan jî ew dixwazin. Min fotoxrafê hevala Bêrîtan da jinên li malê. Me berxwedana hevala Bêrîtan ji wan re got. Pir pê bandor bûn. Fotoxrafên heval girtin û veşartin.

Em dotira şevê jî ketin gundê Bêşems û Nehrî. Girîngiyeke dîrokî ya van gundan heye. Navenda serhildana Şêx Ûbeydulah, gundê Nehrî ye. Me mala ku Şêx Ubeydulah lê maye dît. Bi rastî pêwîst e ev mal bê xistin bin ewlehiyê. Lê ji aliyê zarokên biçûk ên gund ve ev mal hatiye texrîbkirin.

Van gundan çek negirtine. Li vî gundî mangaya me grûba rê qutkirinê bû. Ji demeke dirêj e vir de me cara destpêkê li van gundan xwarina germ xwar. Li hemû gundên ku em diçinê em jajî dixwun. Hin caran li cem jajiyê mast jî tînin. Ji ber vê yekê vê gotinê her dubare dikin; “ev gundî danê sibeyê jajî û nan, danê nîvro, nan û jajî,

êvarê jî her duyan bi hev re dixwun”. Her ku dawî li pratîkê tê û her ku dinya sar dibe, li cem hin hevalan nîşaneyên westînê xwe nîşan didan. Rast e ku em westîne lê li pêşiya me hê gelek erkên bên pêkanîn hene.

**25’ê ‘İlona 1993’yan**

Min di nav pêvajoyê vê mehê de bîranînên pir xweşik ên ji bîra mirov ti car dernekevin jiyan kir. Di vê pêvajoyê de bi gelek hevalan re mêyla westînê û di encama vê de jî zû girtina sezonê bi pêş ketibû. Herî dawî di 28’ê Îlonê de em weke bolîk hatin Kirêkor. Dema em li wê derê bûn ji bo derbasî Başur bin talîmata fermandariya biryargeh gihaşt me. Li ser vê yekê em ber bi Başur ve bi rê ketin.

Em ji Kirêkor derbasî Çarçela bûn. Bi şev li Çarçela sekinîn zehmet bû, pir sar bû. Li cihê em lê disekinîn ji difna me av diherikî. Ji ber ku dar nebûn me nedikarî agir bikin. Ruxmî sir û seqama wê ya ku mirov pê req dibû, pir kêfa min jêre dihat. Hin heval naxwazin derkevin Çarçela. Lê timî dixwazim derkevim. Dema mirov derdikeve Çarçela, tu dibêjî qey cîhan li ber lingê te ye. Baweriya te bi te tê ku tê karibî li beramberê hemû cîhanê şer bikî. Bi qasî ji me can distîne, me diwestîne, hemêza xwe jî ji bo me vedikir û li berambrê dijmin em diparastin.

Êdî navê Çarçela her li ser zimanê me ye. Yên naxwazin derkevin ser wê jî jê hez dikin, pir pê bawer dikin. Dema em tengav dibûn hevalên nedixwestin derkevin Çarçela jî digotin “em derkevin Çarçela”, ji bo derketina ser Çarçela pêwîstî bi hewldaneke mezin heye. Lê dema derdikevî jî pişta te nayê erdê. Di operasyonê de eger ne ji mezinbûna Çarçela bûya, hemû heval bi îmhabûnê re rû bi rû dihatin. Deriyê, Deriyê Kera pir zêde asê ye. Bayê ecêb ku li ser Derî tê weke ku mirov bifirîne, dike vîzinî. Mirov ji cihekî weke dîwaran xwe berdide, eger mirov bikeve parçeyên mirov peydakirin zehmet e. Dîsa, gola ku li dola beriya mirov bigihîje Deriyê Kera, cihekî pir xweş e. Li aliyekî golê keskahî, çîçekên nû dibişkivin, ji aliyê din ve berf û av, dîmeneke keska kesk a pir zêde xweşik derdikeve holê. Hin caran em dibêjin piştî ku Kurdistan rizgar bû em ê vê derê bikin cihê tûrîzmê. Me ji Deriyê Kera xwe berda dola jorê gundê Bêdaw. Vî

gundî jî çêk girtine. Em ber bi êvarê ve daketin gund. Me dest danî ser hemû mihê gund û şivanên wê girtin cem xwe. Kêliya em ketin gund, hemû çete reviyan, xwe nedan ber axaftinê jî. Me li ser vê yekê mihên wan girt û em derbasî aliyê Erdewelê bûn.

Li Bakur hêdî hêdî zivistanê xwe nîşan dida, lê aliyên Başur hê germahiya havînê dijîn. Me mih li gel xwe anîn Dola Bizina. Biryargeh li wê derê bû, hema di biniya me re Ava Basya derbas dibe. Her der kesk a kesk e. Cara destpêkê têm van deran, rêveberiya biryargehê bi bolîka me re zêde civîn pêş xistin. Bi taybetî ji ber ku em li ser esasê şidetê nêzîkî çeteyan nebibûn hemû çete nehatibûn tasfiyekirin. Ev jî ji aliyê biryargehê ve hate rexnekirin. Piştî ku hin heval ji erkên hatin girtin vesaziyên nû çêbûn. Û erkê tasfiye kirina gundên çete yên mayî weke erk ji me re hate diyarkirin.

Me dubare berê xwe da qadê. Ji aliyê biryargehê ve bal hate kişandin ku di piraniya bolîka me de feraseta rastger a xwe parastinê pêş ketiye, hate diyarkirin ku pêwîst e ji vê bi şûnde divê bi misogerî ev bê mehkumkirin. Civînên hatin lidarxistin bandoreke erênî kir. Ruh bi me hemûyan ve hatibû. Me hemûyan dixwest hê zêdetir pratîka xwe rast bikin. Hê bi xwediyê îdîa, me berê xwe da gundên çeteyan. Vê carê me dê bi misogerî şideta şoreşgerî ferz bikira û ew tasfiye bikirana.

Em ji biryargehê derketin. Hatin Dola Xanimê ya li Erdwelê. Me bi şevê agirê xwe kiribû, li ber agir me bêhna xwe vedikir. Jinişka ve dengekî bi kelecan û lerzok got, “agirên xwe bitemirîn, agirê xwe bitemirîn” û du kes ketin nav me. Em di cih de li derûdora wan kom bûn. Me ji wan pirsî ku çi qewimiye. Gotin ku operasyon heye, dijmin bi hêzeke mezin berê xwe daye Başur û dibe ku her kêliyê xwe bigihîne van deran. Li ser vê yekê me bolîk kir sê parçe. Em neçar bûn tedbîrên xwe bistînin. Li cihên cuda me kemîn danî, taxima me li ser rêya ji Erdewelê tê kemîneke dişibe tîpa ‘V’ danî. Heya bi sibeyê em di kêminê de li bendê bûn. Danê sibeye me terka mewziyên xwe neda. Piştî nîvro dijmin bi rê ketibû dihat. Me xwe gihand çekên xwe û em li bendê man da ku ew bikevin tam biniya me. Hemû hevalan heman hest parve dikirin. Dijimin bi şiklekî ji xwe bawer, hêdî hêdî ket biniya me. Grûba wan a li pêş dimeşiya grûbeke

panzde kes bû. Li cem wan çete jî hebûn. Tam di wê demê de me bi B-7 û BKC'yan li wan da. Ji aliye din ve me bi çekên sivik gule reşand. Leşkerên li pey wan jî ji aliyê hevalekî/ê BKC bi kar dianî ve dihate tacîzkirin. Grûba li pêş dimeşî hemû ketin erdê. Hevalê B-7 bi kar dianî roket tam li nav wan da. Hemû leşkeran xwe avêtin erdê, kemîna me biqasî pênc deqîqeyan berdewam kir. Piştre em bilez vekişiyan, me xwe gihand hêvalên din.

Bi dorê taximên me yên din jî kemîn danîn. Piştî vê kemînê liv û tevgera dijmin a li vî çengî sekinî. Dijmin di heman demê de di pênc-şeş çengan de bi hev re tevdigere. Çengek ji aliyê ku me lêdayibû ve dihat, çengek ji Govendê, çengek ji Bircelayê, çengek ji Avaşîn dihat û dixwest hemû hevalan îmha bike. Di roja destpêkê de hevalên li vê qadê di kemînan de derbe li wan dan. Ji ber ku li qadê zêde heval tine bûn, dijmin nedikarî me zêde tengav bike. Ji ber ku qad pir fireh bû. Daxwaza dijmin ew bû, eger karibe, derbeyên mezin li me bide û dîsa xebatên me yên bicihbûnê asteng bike, bi vî awayî me tengav bike. Balafir û helîqopteran jî li ser qadê zêde zêde bombebaran dikirin. Em di roja duyemîn a operasynê de derbasî qada Mîrosê bûn, bi vî awayî em deveyê herêmê operasyonê man. Dijmin piştî ku sê rojan li tepeyan ma dema ku nekarî tiştekî bi destê xwe ve bîne, westiya, hincirî û bi rebenokî paşde kişiya.

Em derbasî Dola Çinarê bûn. Destpêkê em çûn gundê ku çete bû û me cara dawî hişyarî da wan. Paşê em ketin gundê Betkor ku çek berda bû. Me hewl da em bawerî bidin wan, piştre ji bo ku em lê bidin em çûn dola li pişta gundê Bezeno ku aşkere li dijî me dijmintiya xwe ragihandibû.

Rojekê piştî ku me kişfa xwe û plana xwe çêkir, me ji du çengan êrîşê gund kir. Me bombe avêtin gelek malan, piştî ku zêreke mezin da gund em paşde kişîn. Çeteyan tevî malbatên xwe terka gund dan. Me fersend neda wan ku bersiva me bidin. Di pey re dubare em derketin Çarçela. Derketina me dê bibûna derketina dawî ya îsal.

Sir û seqama vî çiyayê mezin, mirov diqerisand. Piştî ku me li vê derê şevek hişyar derbas kir, em hatin deriyê Deriyê Kera. Li gorî gundî dibejîn, ji ber ku kerekê ev derî dîtiye ev nav hatiye lêkirin. Me ji vî deriyî xwe berda dola li raserê Bêdaw ku gundekî çeteyan bû.

Me ji beriya vê dest danî bû ser hezar pezê vî gundî. Dîsa jî, ji çekan dest bernedidan. Em qademeya fermandariyê li hev kom bûn. Dema ev biketana gund eger dubare gundî birevîna me dê malên gund bişewitandana. Dema dinya bû tarî me xwe berda gund. Vê carê jî hemû gundî revîn. Li ser vê yekê me malên çeteyên li gund qontrol kirin. Di encamê de heşt çek, qedereke guleyên van çekan, şarjor û palaskayên leşkerî bi dest xistin. Piştre em bi Erdewelê ve paşde kişiyan.

Di pratîka me ya vê mehê dawî de helbet pêşketinên erênî hene. Di derketina holê ya vê encamê de bandoreke pir mezin a civînên hatine lidarxistin heye. Dîsa li cem hemû hevalan hewldanên xwe îsbatkirinê, pratîka xwe rastkirin û anîn warekî hê encamgir hene. Misoger e ku ev çalakiyên hatine lidarxistin dê li ser çeteyên li herêmê bandoreke mezin bike. Em divê di pêvajoya pêş me de li beramberê gundên çeteyên din jî bi bilindkirinê asta şîdeta şoreşgerî wan tasfiye bikin. Pêwîst e em ji vê bi şûnde, ji kêmasiyên ji pratîka xwe ders derxin, hê xurt berê xwe bidin pratîkê û şerê me hê mezin bikin.

**3'ê Mijdara 1993'yan**

Piştî ku me li ser gundê Bêdaw çalakî li dar xist, em li nuxteya xwe ya Erdewel bi cih bûn. Timî baran dibariya û bi rojan berdewam dikir. Ji ber wê yekê her mangayê li cem xwe naylonek radikir. Em li her derê diçinê konên pratîkî ava dikin hewl didin ji baranê xwe biparêzin. Dema em derketin vê nuxteya em lê dimînin gava me dît li Çarçelayê berf ketiye û weke xemla bûkaniyê ya spî her der dorpêç kiriye xemgîn bûm. Misoger dibû ku êdî em ê nikaribin biçin Çarçela.

Hedefa me ya vê carê gundê Herkî ye. Gundê Herkî ku hema di dola li binê Bêdaw de ye jî çete ye. Ruxmî ku me gelek caran ji bo ku çek berdin ev gund hişyar kiriye çawa ku em guhdar nekirine, di pêvajoya agirbesê de bi PDK'ê re li ber grûbeke me kemîn danîbûn.

Me plana xwe çêkir. Me dê ji sê çengan ve êrîşê gund bikirana. Eger gund li dijî me şer nekira, me dê bêçek bikira û êrîşê malan nekirana. Çengê yekemîn dê êrîşê taxa jor a gund, çengê duyemîn

êrîşê taxa jêr a gund bikira. Çengê sêyemîn jî dê êrîşê meqereya PDK'ê ku li her du aliyên avê ye û li başurê gund e bikira. Min di çengê jêr de cihê xwe werdigirt. Lê eger ev meqereya PDK'ê gule neavêje hevalan, me dê dest neda wan.

Dema dinya bû tarî me xwe nêzîkî gund kir. Dema bi temamî tarî bû, her grûbê berê xwe da hedefa xwe. Em her du heval çûn malekê. Heya em ketin nav malan ti kesî em nedîtin. Jixwe dema ketî nav malê, êdî çek nateqin. Dema mirov êrîşê gundê çeteyên herî har jî dike, piştî mirov bikeve nav malê, çete neçar dimînin teslîm bin. Ji ber ku ji zarokên xwe, ji malbata ditirsiyan. Ew ji me hê baştir dizanin dema gule biteqe dê di hindur de bibe qiyamet.

Dema em li pêşberê xwe dîtin tirsiyan. Me hemû mal qontrol kirin, zilamên gund me li cihekî kom kirin û me ji wan re got çekên xwe bînin. Wan dixwest me mijûl bikin. Û ji me dem xwestin lê dema fêm kirin em cidî ne heşt çeteyan tevî rextên xwe çekên xwe ji me re anîn. Heşt çeteyên mane jî, me girte gel xwe û em paşde kişiyan. PDK'ê dizanî em ketine gund. Lê ditirsiyan ku êrîşê me bikin. KT'ê erk dabû wan. Dê em nexistibana gund. Dîsa me dê li ber çavên wan ji gund heşt çete û heşt çekên dijmin bigirta, bi rehetî biçûna. Baş e, gelo dê sibê KT'ê nepirsiya? PDK'yiyên ev rewşa baş fikiriye, di cih de hatin gel hevalan. Ji me re rewş gotin, gotin ku piştî em paşde bikişin ew dê çend B-7 û guleyên BKC'yê biavêjin derûdorê.

Li ser vê yekê destpêkê hevalan ji wan re, bi awayekî baş ev îxaneta dijîn dan rûyên wan, gotin ku

piştî em diçin hûn dikarin qowboyçitî jî bileyizin. Piştî ku me paşde kişan pêk anî, bi rastî jî van xayinan çend roket avêtin dolê û hinekê li derûdora xwe reşandin. Mirov dikeve lê evqas na, evqas xwe naxe. Di mirov de hinek serbilindî, heysiyet, şeref, namûs dibe. Lê li cem van ti tişt nemaye, li ti derê cîhanê ti rêxistin wisa bi xwe re ajantî bi pêş naxe, wisa xizmeta dijminê xwe nake.

Dotira rojê çeteyên Herkî ku me girtibûn cem xwe, me şandine girtîgeha biryargehê. Dema ku çeteyên mayî çekên xwe danîna me dê ew berdana. Her ku me li beramberê çeteyan encam digirt, me nedikariya di cihê xwe de bisekinin. Me dixwest berê xwe bidin

gundê din ên çeteyan. Me bi vî awayî erkên li pêşiya xwe jî hêdî hêdî bi cih dianî û bi baweriya ku vê daye me, kelecana berê xwe dan hedefên din dijî.

**10'ê Mijdara 1993'yan**

Piştî ku me çeteyê gundê Herkî şandin biryargehê ji bo em berê xwe bidin gundê din ê çeteyan yê bi navê Gulka û gund bê çek bikin em çûn dola Çinarê. Ez û du hevalên din ji bo kişfa gund bikin em rojekê berê bi rê ketin. Me ji daristana têr a ku li palên girê Ketar ê hema li pêşberê gund bû û gund bi awayekî zelal didît, gund kişif kir. Dîsa, me qad û tabûra Bêzelê jî kişif kir. Li qadê ti liv û tevger û ji bo neketina gund rewşeke neyinî tine bû. Min rewşa heyî bi cihazê ji fermandarê bolîkê re got. Em êvarê li pira pêşiya gund gihiştin hev, me grûba xwe ya parastinê derxist tam raserê gund û ji du çengan ve ketin gund. Me dîsa hemû gundî di malan de girtin. Vê carê şensa me hebû. Me hemû li ser nan qefilandin. Zêde netirsîn. Ji beriya vê ji ber ku em çend caran ketibûn gund, li gorî wan bû ku dê ew ê dîsa me bixapînin û paşde bi rê bikin, em dane rûnîşkandin. Em jî bi xwe bawer in û ew jî...

Piştî ku me hemû zilamên gund li malekê kom kirin, me civîn li dar xist. Me diyar kir ku di hatina xwe ya din de me ew ji bo cara dawî hişyar kirine. Lê wan dixwestin me mijûl bikin û dîsa dem xwestin. Lê nêta me tine bû êdî em bixapên. Me ji hemû çeteyan xwest ku çekên xwe teslîmî me bikin. Wan fêm kirin ku em cidî ne. Vê carê li ber me geriyan. Li cihanê ti kesî weke Kurdan di îxanetê de israr dike tine ye. Ji bo em destûra wan bidin ku ew îxanet bikin li ber me digeriyan. Lê mafê wan tine bû ku ew îxanet bikin. Me ji wan re got divê bi misogerî hûn çekên xwe teslîmî me bikin. Eger na dê ji bo wan ne baş bibûya. Gundiyên ku ev fêm kirine û tirsîne ketin nav panîkê.

Em dubare hatin Dola Çinarê. Kêfa me hemûyan di cih de ye. Çekên me ji gundê çeteyan anîne me rûn kirin û xistin depoyê. Weke bolîk tiştê pêwîst bû di destpêka pratîka xwe de em bikin me karîbû encax di dawiya pratîkê de bi cih bînin. Ji ber ve yekê jî me nekarîbû zêde bi ser dijmin de biçin, em tenê bi tasfiyeya çeteyan re mijûl bûn.

Eger me karîbûya li ser bingeha şîdetê di destpêkê de bi ser van gundên çeteyan de biçûna, van çeteyan pir zû çek berdidan. Wê demê jî me dikarîbû hê bihêz bi ser dijmin de biçin.

Baran di rojên dawî de bêyî ku bisekine bi rojan dibare. Dema mirov li ber baranê bimeşe, bi mirov re tayekî zuwa namîne. Bi hatina baranê re me jî dest bi xebata xwe ya avakirina qampê kir. Li sirtên bilind berf bariye, li dolan li şûna berfê baran dibare. Ji bo niha zehmet e dolên li geliyê Basya û Herkî berf bigirin.

**20'ê Mijdara 1993'yan**

Piştî ku me gundê Gulka bêçek kir me dest bi amadekariyên qampê kir û dest bi jiyana qampê kir. Çeteyên li Gundên Herkî û Gulkayê mabûn jî çekên xwe bi şûnde dabûn dijmin. Kêfa me jê rê hat. Dilê me dixwest bêyî ku em zorê bidin ser wan, bi xwe çekên xwe daynin. Lê gotinek heye dibêje, "heya ku Kurd serê xwe li dar û beran nede..." dema me hinekê dozaja şîdetê zêde kir di cih de çekên xwe berdan. Her wiha li qadê ji dereveyê du gundan, ti gundên din ên çeteyan neman. Ev, gundê Bezelê û Nûgoyla ye. Ji ber ku her du gund hema li rexê tabûrê ne bi hêsanî em nikarin bi ser wan de biçin. Tenê her sê, yanî tabûr û her du gund kirin hedef, bi vî awayî bi ser van de çûyîn gengaz e.

Em ê qampa xwe ya îsal li herêma Herkî ava bikin. Em, tevî amadekariyên xwe dem bi dem bi grûbên xwe diçûn û dihatin gundên çek berdane jî. Nêzîkbûna gundiyan qederekê erênî bû. Wan jî dizanîn ku neçar in baweriya xwe bi me bînin. Her carê dianîn ziman ku pêwîst e em li wan xwedî derkevin. Ev ji aliyê wan ve tiştekî erênî bû. Em ê di dîroka Partiyê de cara destpêkê ye li vê herêmê bi cih bûna. Bi vê kêfxweşiyê, her heval bi coş xwe dide xebatên heyî.

Her taximê li cihê ku jê re hatiye diyarkirin kon veda. Qampa me ji bo her kêliyê ji xizmeta me re amade bû. Qampa me di navbera du navend-hêzan de dima. Li Bakur qereqola Bezelê ku du saet ji me dûr bû û li Başur li qiraxa Basya, meqereya PDK'ê ku saetekê ji me dûr bû hebû. PDK'ya ku hema li pişt me bû ji bo me xeter bû. Bi taybetî dema me dixwest em derbasî Başur bin ji me re astengî derdixist. Dîsa, di navbera du hêzan de mayîn jî pir bi xetere bû. Eger di

navbera me û KT'ê de şerek derketa, misoger bû ku ew ê jî rêya sînor bigirin. Ji ber vê yekê diviyabû em pişta xwe saxlem bikin. Di rojên dawî de PDK'ê xwestibû li Metîna û Xakûrkê êrîşê hevalan bike. Jixwe ji bo ku em bi ser wan de biçin me talîmat wergirtibû. Li ser vê yekê me hem ji bo ku em pişta xwe saxlem bikin, hem jî em bersîva pêwîst bidin wan û wan ji sînor biqewitînin biryar girt, êrîşê meqereya Basya bikin. Me kişfa vê derê berê kiribû. Jixwe cihê hemûyan dizanî. Me plana xwe çêkir. Hedef ew bû ku em bi temamî meqereyê îmha bikin, cebilxaneya di nav de bistînin. Êvara 18'ê Mijdarê me xwe li gorî çalakiyê rêxûpêk kir û berê xwe da hedefa xwe. Me dê ber bi sibeyê bi ser meqereyê de bigirtana.

Hêzên PDK'ê ji çalakiyên bi serdegirtinê pir ditirsiyan. Di Şerê Başur de dema bi şevê çalakiyên bi serdegirtinê li dardixistin hemû direviyan. Dibû qîreqîre wan û digotin, "eger hûn zilam bin bi roj bê, wê demê em ê bizanin kî zilam e, hûn Kurdên şevê ne". Pir hov in û bi tektîkê şer kirinê nizanin.

Ber bi sibeyê ve hemû grûbên me cihê xwe girtibûn, li benda destpêkirina çalakiyê mabûn. Grûbên me yên şevê heya bi biniya wan sizme (sızma) kiribûn.

Dema ku grûbên êrîşê bi awayekî hemwext roketên xwe avêtin çalakiyê dest pê kir. Berê hemû guleyan li meqereyê bû. Pêşmergeyên PDK'ê yên di xewa giran de hatibûn qefilandin şaşomaşo bibûn. Di deh deqîqeyan de meqere û hemû mewziyên li pêş wê ketin.

Heval ketin nav meqereyê. Heşt miribûn. Heft jî dîl hatin girtin. Sê-çar pêşmergeyan jî karîbûn bi qatê derpe birevin.

Di çalakiyê de hevalê Semîr hevalê B-7 bi kar dianî, şehîd bû. Şehîdbûna wî bi temamî ji ber ecemitiya wî bû. Erka wî ya di çalakiyê de ew bû ku roketên xwe bi şiklekî xweş li hedefa xwe bide. Piştî ku bi vê erka xwe rabûya dê paşde bikişiya, hevalên din biketana dewreyê. Erka xwe biserkeftî bi cih anî bû. Hemû roketên xwe lê dabûn. Lê hevalê Semîr bi vê qîma xwe neanîbû. Ji hevalê cem xwe bombeya wî/ê girtibû û xwestibû êrîş bike. Di kêliya ku pîmê bombeyê kişandibû û biavêje dijmin de bombe pêve teqiyabû. Û hevalê Semîr bibû qurbanê ecemîtiya xwe. Sibeyê meqere di destê

me de bû. Cebilxaneya di nav de bi piranî şewitîbû. Piştî ku me cebilxaneya neşewitî û çekên pêşmergeyan rakir, bi aliyê Dirre ve em paşde kişiyan.

Bi vê çalakiyê re me biryar stend em biçin ser qereqolên din ên li ser sînor jî. Lê piştî ku me li vê meqereyê da PDK'yiyên li ser sînor dotira rojê reviyan. Meqereyên PDK'ê yên li Dêsatê, Hergûş û Herkî terka herêmê dan û revîn hê Başur. Bi vî awayî temamê herêmê ket bin qontrola me. Me jî weke bolîk ji bo xwe hem qadeke fireh vekir û hem jî pişta xwe saxlem kir. Me dikarîbû êdî li qampa xwe bi dilrehetî bimînin

Çalakiya me ji aliyê biryargehê ve weke çalakiyeke serketî hate dîtin. Ev meqereyên li ser sînor bi rola qereqolekî KT'ê radibûn. Liv û tevgera me ya li herêmê sînordar dikirin. Me dê ev bi erênî û bêdengî pêşwazî nekirana. Em neçar bûn qada xwe ya liv û tevgerê berfirehtir bikin.

Di hemû daxuyaniyên KT'ê heya bi îro daye de digot, “terorîst ji başûr tên û êrîşê qereqolên me dikin”. Vê carê em ji Bakur çûn û me qereqolên nokeran îmha kir. Jixwe Barzanî û Talabanî digotin ku em ji Bakur hatine û me li wan daye. Ji ber vê yekê hêzên noker KT sûcdar kirin. Dijminê ku 4 sed hezar leşker li ser sînor kom kiribû û nikaribû pê sînor biparêze, dixwest hêza PDK ku 4 hezar bû sînor biparêze. Ev tiştekî pêkanok bû. Ruxmî ku PDK dizane ji bo pereyan vê dike. Ji bo ku me nehêle ser erda me, dixwaze li pêşiya me bibe kelem.

Ji ber ku pratîka sezonê erênî bi encam bû, morala hemû hevalan qederekê bilind bû. Hemû heval bi ser xwe ve hatin. Hê bi liv û tevger, hê germ, hê bi coş bûn. Ruxmî ku bi şiklekî fîlî jiyana qampê dest pê kir, me dîsa jî hin hedef danîn pêşiya xwe. Em hizirîn ku di vê pêvajoya zivistanê de tenê xwe bi jiyana qampê sînordar kirin rast nabe, me diyar kir ku em ê di pêvajoya ji vê bi şûnde de bi livûtevgerbûna xwe bidomînin.

**12'yê Kanûna 1993'yan**

Û em li qampa xwe bi cih bûn. Piştî çalakiya li ser PDK'ê em li aliyê Dirre hinekê man û dubare hatin qampa xwe. Êdî di navbera

qampa me û hêzên me yên Başur de ti asteng tine ye. Em dikarin li herêmê bi roj jî tevger bikin. Cihê qampa me pir xweş e. Em li cihekî têr dar in. Ava Basya hema li biniya me diherike. Sînor nîv saet li pêş me ye. Her çendî em li qampê bi cih bûne jî jiyana me bi qampê sînordar namîne. Em timî diçin û tên gundên li derûdora xwe. Ew jî ji van hatin û çûnên me kêfxweş dibûn. Em zû zû diçin gundê Herkî, Gulka, Bêgaltê, em hewl didin wan bi tenê nehêlin. Ji ber ku zivistanê dinya pir sar e, dijmin dixwaze gel dorpêç bike, dubare çek bide gundên çek berdane. Hema bêje hemû gundên çek berdane mêyildarê dubare wergirtina çêkan in. Jixwe ji destpêkê pê de ev çek ne ji bo ku pê li dijî me şer bikin lê ji bo mûçeyê wergirtibûn. Lê çeka dijmin e, eger timî di destê yekî de be ew ê neçar bimîne rojekê wê çekê bi kar bîne. Dijmin, gava ku dema wê hat ev yek li ser wan ferz kir û gelek kes li dijî me dan şerkirin. Em, bi çûn û hatina hemû gundên li herêmê, dixwazin bi wan hebûna xwe bidin hîskirin. Em dizanin dema bizanibin em li herêmê ne, dê xwe nedin ber wergirtina çekan. Di salên derbas bûne de dema dibû payîz hêzên me derbasî herêmên Başur dibûn û encax dikarîn di mehên havînê de biçin nav gel. Ji ber vê yekê jî di nav gel de nedikariya qontrol bê pêkanîn. Lê îsal di mehên herî sar de jî em bi germahiyeke mezin dikevin nav gel.

Li dola ku em bi cih bûne hê berf nebarî. Lê belê qet baran nasekine. Pirsgirêka avê pirgirêka herî mezin a qampê ye. Di nav qampê de av tine ye. Em ava xwe ji Ava Basya digirin. Çûn û hatina me ya avê çil deqîqeyên me digire. Sirtên jora qampa me tije berf bûne. Her ku mirov ji sirtan dadiket dolan xuya dibe berf tine ye. Piştî demeke kurt me li qampê dest bi xebatên xwe yên perwerdeyê kir. Em bernameya xwe ya perwerdeyê li gorî bernameya navendî ya Partiyê dimeşînin. Îsal dê perwerde li gel pratîkê di zikhev de bimeşe. Em ê bi vî awayî hem dijmin rehet nehêlin û hem jî ji perwerdeyê hêzeke mezin bistînin. Li welat ji aliyê perwerde û pratîk di zikhev de meşandinê ve Rêbertiya Partiyê talîmateke giştî şand. Dê ev pêvajoya zivistanê, germ derbas be û em ê sala 1994'an weke sala şerekî mezin lê bikin.

**15'ê Kanûna 1993'yan**

Xebatên me yên perwerdeyê berdewam dikin. Her çendî berf barîbe jî, xebata me ya kişfê berdewam dike, em bi ti astengiyan re rû bi rû namînin.

Dîsa berfa zêde firsenda çalakî lidarxistinê dide me. Gava grûbên kişfê xebata kişfê dimeşînin, hevalên din jî bi xebatên perwerdeyê re mijûl dibin. Di du rojên dawî de biryargehê ji bo ku perwerdeya me hê bi tendirustî û hê berhemdar derbas be, hin analîzên Rêbertiyê ji me re şandine. Li gel analîzan çendek Serxwebûn jî hatine. Em analîzan di perwerdeyê de dixwînin û nîqaş li ser dikin. Pirtûkên din jî, em di demên xebatên takekesî de bi hev re dixwînin.

Min yek ji Serxwebûnên hatine, girte destê xwe û dest pê kir ez bixwînim. Nivîsê li ser provokasyona Terzî Cemal û qetlîama hevde hevalên me hebû. Di nav hevalên şehîd ketine de hevalê Dewrîm Tural (Şoreş) jî hebû. Dema çavê min bi navê wî ket ji aliyekî ve kêfxweş bûm, ji aliyekî ve jî pê êşiyam, xemgîn bûm. Êş, kêfxweşî û xemgînî di zikhev de jiyîn belkî jî cara destpêkê dibû nesîbê min.

Di bin navê ajantiyê de hatibû qetlkirin. Hê dema em sempatîzan bûn min dizanî hevalê Dewrîm girêdayî bi Partî, şehîdan e. Partiya me ev rastî derxistibû holê û ajanên rastîn ceza kiribû. Ji ber ku hevalê Dewrîm piştî me tevlî gerîla bibû, pir kêfxweş bibûm. Lê belê ji ber ku di bin navê ajantiyê de hatibû qetlkirin, qederekê xemgîn dibûm, pê diêşiyam. Tam heşt sal em bi hev re bûn. Bawer im li heman refê heşt sal parvekirin ne tiştekî hêsan e. Me gelek tiştên zehmet, bi êş û xweşik û bedew bi hev re jiyan kir. Li ser hemam maseyê me derdên xwe ji hev re got. Û me bi hev re biryar da ku em tevlî gerîla bibin. Di derketina me ya sala 1991'ê de hevalê Dewrîm jî li cem me bû. Wê rojê çiqas kêfxweş bû, çiqas bi coş bû. Xweziya me wê rojê bi hevalên xwe re hev bidîtana. Wê demê hevalê Dewrîm nediket nav lepê Terzî Cemal û bi ajantiyê nedihate sûcdarkirin û nedihate qetlkirin.

Piştî ku em paşde zivirîn, malbata wî xwest wî ji me qut bike. zarokê mezin ê malbateke bi du zarok bû. Rewşa madî ya malbata wî qederekê baş bû. Ji bo ku neyê cem me ew û em tehdît kirin. Lê wî hevaltiya me di ser her tiştî re girt. Li beramberê van helwestên

malbata xwe têkiliyên xwe yên bi me re hê jî bi pêş xistin. Malbatê, dema dît ew ê têkiliyên xwe yên bi me re qut neke, ew şande cem apê wî yê li Entabê. Bi rêkirina wî ya Entebê, dihat maneyê ku malbata wî, ew bi destên xwe teslîmî Terzî Cemal kir. Ji ber ku dê Dewrîm bi misogerî derketa çiya. Hest û fikrên li cem wî, li ku dere bûya bila bibûya dê bibira çiya. Gihîşt negihîşt Entabê hewl da bi Partiyê re têkilî bi pêş bixe. Ji beriya ez derkevim çiya dîsa em bi telefonê axifîn. Wî hê jî têkilî daneynî bû. Min ji wî re got, eger bixwazî, bê vê derê em bi hev re biçin. Lê wî qebûl nekir. Êdî dixwest bi hewldanên xwe tevlî bibe û got ku ew ê jî di demeke herî kurt de bê. Min hizirên wî di cih de dîtin û jê re rêz girt.

Niha ez êş dikişînim. Qetlkirina hevalên weke we dirust û girêdayî bi Partiyê re neheqiya herî mezin ku li cîhanê bê kirin e. Lê tu nû tevlî bibû, hestên te pir cuda bûn, tu difikirî ku tê çawa layiqê şehîdan bibî, çawa bibî milîtanekî baş ê Partiyê. Ji bo xizmeta gelê me, Partiya me bikî te gava destpêkê avêtibû û coşa vê dijî. Lê kesên xayin ji bo ku xwe bigihînin armancên xwe li qurbanên nû digeriyan. Yek ji van qurbanên hatibû hilbijartin jî tu bûyî.

Tê bîra min ez û tu hin caran diketin nav xewn û xeyalan. Em derdiketin serê çiyan. Me bi qlêşên girtine destê xwe li cihên herî bilind ên çiyan li geliyan temaşe dikir. Paşê em hêdî hêdî dadiketin geliyên kûr û diçûn nav gelê xwe. Piştre em diçûn cem Serok Apo. Dema Serok diaxifiya me pir bi baldarî ew guhdar dikir. Û ji bo ku em bibin layiqê Serok me soz dida hev. Piştre em ji nav van xweşikbûnan hişyar dibûn. Bi te re bi nav xewn û xeyalan ketin xweşik bû. Ji ber ku xeyalên me yek bûn. Me ji hev re ‘musahîb’ digot û di dawiyê de em bûn musahîb. Pir kêfa malbata min jî ji te re dihat. Dema nedihatî mala me her kesî tu meraq dikirî. Wan jî heya bi dawiyê destek didan vê dostanî û biratiyê. Malbata we xwîngerm bûn, lê belê dema em ji çiya zivirîn, xwestin dostaniya me xerab bikin. Lê te dostaniya me raserî her tiştî girt. Ya herî xweşik jî em doh musahîb bûn û îro jî em bûn heval. Min dixwest ez ji te re heval jî bêjim lê min nikarî bêjim. Zêde firsenda jiyanê nedan te. Eger dabûna baweriya min pê hebû te pir bi pêş biketa. Ya din jî min dixwest ji te re bêjim heval lê min nekarîbû bêjim. Te dikarîbû ji bo

Partiya me, gelê me bibûya milîtanekî sûdmend lê ew carekê bûna dijmin û dixwazin li her derê derbe li Partiya me bidin. Lê diviyabû divê ew derfeta li beramberê dijmin şerkirinê bidana te. Tê wê demê weke şêrekî şer bikira, kîn û nefreta xwe ya bi hezar salan bida der. Lê xayinan li şûna vê tu qetlkirin û fersanda şerkirinê nedan te.

Bila xayin şerm bikin. Ew hemû lenetî ne. Belkî jî te nekarîbû li beramberî dijmin kîna xwe bide der, weke te dixwest qlêşa xwe nexist destê xwe û li geliyan temaşe nekir, dibe ku tu nexistin nav gelê me jî. Lê divê tu baş zanibî hevalê Dewrîm, tu û şanzde hevalên me ti car ji mirinê netirsîne, we zanibû li beramberê îxanetkaran bisekinin û we bi xwîna xwe ev îsbat kir. Ez ê layiqê te bim hevalê Dewrîm! Min sond xwar te di têkoşîna me de bidim jiyîn.

Eger ez kengî derkevim cihên herî bilind, ez ê li geliyan temaşe bikim û fikra me ya şirîk bidim jiyîn. Kengê ez biçim nav gel, ez ê wê demê li şûna te bi gel rê biaxifim. Eger rojekê Serok Apo, ez ê wê demê li şûna te wî pir baş guhdar bikim.

Ez li pêşberê têkoşîna te bi rêzdarî bejna xwe ditewînim, dikarim tenê bi têkoşîna feraset û îxanetên hindurîn ên li dijî xeta Partiyê layiqê te bim û têkoşîna me biparêzim.

Em ê te û şanzde hevalên me timî di têkoşîna me de bidin jiyîn!

**30'ê Kanûna 1993'yan**

Me kişfa qereqola Bezelê ku hema hema li aliyê me yê bakur bû, kiribû. Me encamên kişfê nirxandin. Di encamê de me biryar stend em êrîşê qereqolê bikin. Lê hêza me ya heyî têrê nedikir ku em qereqolê ji holê rabikin. Ji ber wê yekê jî me ji hevalên li Govendê taqwiye xwest. Ruxmî ku li Govendê berf jî barî bû dîsa jî, karîbû hêzeke bi qasî du taximan bê alîkariya me. Piştî ku hêza me temam bû, em derbasî çêkirina plansaziya çalakiyê bûn.

Ji ber ku sirtên bilind tije berf bûn, dijmin hêza xwe ya di qereqolê de kêm kiribû. Em difikirîn ku dê mayînên li derûdora qereqolê jî zêde nebin xwediyê bandor. Dijmin girê hema di biniya Çarçelayê de vala kiribû. Tedbîrên xwe yên parastinê kêm kiribûn. Di çalkiya em ê li darbixin de gelek awantajên me hebûn, ya din jî şert û mercên xwezayî hema bêje li aliyê me bûn. Di plansaziyê de hedefa

me ew bû, em qereqolê dijmin tevî tepeyê wê îmha bikin. Dîsa, li beramberê îhtimala hebûna yekîneya bi tevger a dijmin dê grûbeke me xwe berdaya pişta dijmin û kemîn daniya. Dê di sê çengan de êrîş bihata kirin. Çengê yekemîn dê ji Dola Gulka biçûya û ji vê derê êrîş bikira ser dijmin. Çengê me yê duyemîn jî dê ji aliyê neqebê ve êrîş bikira. Çengê sêyemîn dê êrîşê tepe bikira. Di heman demê de grûba me ya parastinê jî dê li sirtê 3 sed metro durî qereqolê mewzî bigirta. Dê parastina me ya giştî jî li neqebê bûya.

Plansazî hate nîqaşkirin û ji aliyê hevalan ve hate qebûlkirin. Em di 24'ê mehê de bi rê ketin. Morala hemû hevalan di cih de bû. Eger me ev qereqola ji holê rakiriba dê beşeke mezin a herêmê ji dijmin paqij bûya. Ji ber wê yekê li cem hemû hevalan xwestekeke mezin a êrîşê hebû. Şehîdbûna hevalê Dewrîm min nû bihîstibû. Di vê çalakiyê de bi pêkanina erka xwe, min ê ji bo bibim layiqê bîranîna hevalê Dewrîm gava destpêkê biavêta. Ji bo wê jî hêrs û kîna min zêdetir bû. Weke her hevalê/î ez jî xwediyê îdîa bûm. Em bi şevê bi rê ketin. Her ku em derdiketin cihên bilind sermayê xwe dida hîskirin.

Em hatin nuxteya xwe ya dawiyê û li bendê sekinîn. Ber bi êvarê dê her kesî cihê xwe bigirtana û dema tarî bibûna me dê dest bi çalakiyê bikirana. Dema ku em li nuxteya xwe bi şiklekî bi kelecan li benda çalakiyê bûn, grûba kişfê jî ji bo cara dawî kişfa hedefê kir. Dema kişf xelas bû û grûb hate cem me, gotin ku dijmin ber bi qampa me ve bi rê ketiye. Me bawer nekir. Em bi ser wan de diçûn, ew jî bi ser me de dihatin. Ez heya bi îro qet nebûm şahidê tiştekî wisa. Baş e, cihê qampa me çawa tesbît kiribûn? Gelo dizanîn ku em ê li ser wan çalakî li dar bixin? Ev pirs di cih de bûn sedem ku mêjiyê hevalan tevlî hev be. Me digo, îhtimal heye yan ajanên gundên wan nêzîkî dijmin cihê me ji dijmin re gotiye, yan grûbên me yên çûne kişfa dijmin ji aliyê dijmin ve hatine dîtin, yan jî yekîneya bi tevger ku sibeyan derûdorê qontrol dike, dewsa li ser berfê ya lingê hevalan dîtine. Me di cih de plana xwe guhert. Dê grûbeke me berê xwe bida tepeyê dijmin, grûba me ya parastinê jî dê ji piştê ve li dijminê di tevgerê de ye bida. Em hevalên mayîne jî dê bizivirîna qampê. Ber bi êvarê bi awayê hatiye diyarkirin her kes ber bi cihê xwe ve bi rê ket.

Em hatin qampê. Me di cih de tepeçiyên xwe derxistin. Ji ber ku me berê ji ber lidarxistina çalakiyê her tiştê xwe rakiribû. Di konekî ava de tenê me agirê xwe pêxist û îstirehet kir. Di saet pêncê sibeyê de tepeçiyên me gotin ku li ser hemû tepeyên di ser qampê re dijmin heye û divê em bi lezûbez terka qampê bidin. Ji ber vê yekê em hemû derketin tepe.

Çawa em derketin tepe şer dest pê kir. Wan ji dûr ve bi çêkên giran gule diavêtin me. Me jî bi çekên xwe bersiv da. Me hem şer kir û hem jî em bi sirtên li hemberê Ava Basya paşde kişiyan. Leşker û çeteyan bi hev re tevger dikir. Ji ber ku pişta me vekirî bû e mbi hêsanî paşde kişiyan. Dijmin jî qet xwe nedida ber ku xwe nêzîkî me bike. Tenê dikarîn ji dûr ve gule biavêjin. Hemû grûba me bêyî ku zêde zehmetî bikişîne ber bi aliyên Erdewel ve paşde kişiya. Yên ku me meraq dikirin grûba me ya ku çûbû êrîşê tepe bike û grûba me ya ku çûbû ji piştê ve li dijmin bide bûn. Ji ber ku bi awayekî xwezayî her du grûbên me diketin navbera dijmin. Heya bi êvarê her du grûbên me jî negihîştin me. Dotira rojê, sibeyê grûbên me gihaştin me. Hevalan êrîşê tepe kiribûn lê vala derketibû. Li ser vê yekê hevalan bi BKC û B-7'ên destên xwe reşandibûn ser qereqol. Du hevalên me yên di vê grûbê de cihê xwe digirtin, pêlî mayînê kiribûn û şehîd ketibûn. Grûba me ya din, ji piştê ve li ber grubek dijmin kemîn danîbûn û bi awayekî encamgir lê dayibûn û paşê bêyî ku wendahî bidin paşde kişiyan, hatin cem me. Dijmin di hindurê qampê de tenê karîbû konê vala bi dest bixe. Em jî paşde kişiyan û me dest bi çêkirina qampeke nû kir. Agahiya derheqê qampa me de ji aliyê ajanên gund ve hatibû dayîn dijmin. Dîsa, îhtimala ku dijmin dewsa lingên grûbên me yên kişfê dîtibû qederekê mezin bû. Ji ber ku aliyê başur saxlem bû, em bêyî ku zehmetî bikişînin paşde kişiyabûn aliyê Başur. Niha bi misogerî xuya bû ku eger me meqereyên PDK'ê ranekiranan wan jî ji piştê ve êrîşê me bikirana û me dê pir zehmetî bikişandana. Derdikeve holê, me bi rakirina wan ji wê derê pir baş kiribû.

Amadekariyên qampa nû didomin. Em ê li qampa aliyê Erdewelê bikevin sala nû.

**7'ê Çileyê 1994'an**

Em dikevin saleke nû. Sala 1993'yan ji aliyê şer ve weke saleke serkeftinê ya mezin derbas bû. Şerê me her mezin bû. Ji ialiyê Partiya me ve cara yekemîn e me saleke wisa ya bi plansazî û encamgir derbas kir. Li gelek cihan înisiyatîf ket destê me. Piştî vê dê şerê me hê mezintir be û dê sala 1994'an di rêya azadî û serxwebûnê de bibe saleke mezin. Sala 1993'yan ji bo min jî bû saleke girîng. Sala 1993'yan ji bo min jî ji hev aliyê xwe ve bû saleke nipûnû û pêşxîner. Û ev sala ji bo min ê bibe sala serkeftinê, xwe guherînê. Ez ê di vê salê de kêmasiyên xwe yen di şer de ji ser xwe biavêjim, bi awayekî hê bihêz derkevim pratîkê û bi vî awayî bibim layiqê Partî û şehîdên me.

Îro 7'ê Çileya 1994'an e.Min, tam salekê ji beriya vê, îro, di sir û seqama Zagros ku hestiyên mirov dicemidîne de şehîdbûna hevalê Cewahîr û hevalê Sertac bihîstibû. Îro salvegera sala duyemîn a hevalê Sertac e. Salekê ji beriya vê tê bîra min. Min pir êş kişandibû. Hem jî êşa herî giran a di jiyana xwe de... Îro, weke kêliya destpêkê, hê jî hestên min berdewam dikin. Hê jî min kîna xwe, tola xwe ji dijmin ranekiriye. Lê agirê tolhildanê yê di dilê min de hê jî gur û geştir bûye. Dema min agahiya şehadetan girt pir zêde êşiyam. Min xwe wisa bi tenê hîs kiribû, nikarim bînim ziman. Lê min ferq kir ez şaş im. Ne tenê bûm. Her hevalê/î timî alîkarî û destek da min û tinebûna wan bi min neda hîskirin. Lê rastiyek heye, min timî ew jiyan kirin. Hesreta wan di dilê min de bû agirekî pir mezin. Hê jî nikarim bawer bikim ku ew şehîd bûne.

Belê, hevale Cewahîr, ez çawa te bînim ziman? Hestên xwe çawa bînim ziman? Hesreta xwe ya ji bo we ji kê re bêjim? Ew qas tiştên ez ji te re bêjim hene, min dixwest tu hemû tiştên ez bêjim bibihîzî. Ti gumana min jê tine ye ku tê hemû gotinên min guhdar bikî, berê jî şirîkê min ê derdên min bûyî. Min ji te re her tiştê xwe digot. Destpêkê te li min guhdar dikir, piştre te bi her awayî alîkarî dida min. Dîsa jî ne bi tenê bûm. Her roja min bi we re derbas dibe. Hin caran hûn dikevin xewnên min. Ez wê rojê dibim kesê herî bextewar ê cîhanê.

Dema biçûk bûyî zarokê herî nesekînî yê gund bûyî. Jinên li gund, zilam, zarok, hemûyan ji te gilî û gazin dikirin. Te, li ser rêya di pêşiya mala me re derbas dibû kêmin datanî, kevir û kuç li ser kesên dihat û diçûn dibarand. Ji ber ku rêya her kesê tê û diçe di ber mala me re derbas dibû. Di wê rêyê re derbas bûn ji bo her kesê li gund serkeftineke mezin bû. Piştî ku te dest bi dibistanê kir, tu her roj ji dibistanê direviyayî. Dema te li dibistana şevînî dixwend, tu bi tena serê xwe direvî û dihatî malê. Dotira rojê dubare bavê min tu digirtî dibirî. Di sezonekê de ji destpêkê heya bi dawiyê reva te berdewam kir. Dema me ji gund bar kir cejna hemû gundiyan bû. Êdî dikarîn bi rehetî biçin û bên. Ma te kêm camên malan şikênandin. Tebî ev heya bi sala 1986'an bû.

Ji nişka ve tiştek bi te hat. Kenanê ku bi her kesî re şer dikir, dema ecz dibû li me dida çû, yê bi her kesî re xweş diborîne hat. Piştî wê her kesî dest pê kir ji te hez bike. Min jî timî ji te hez dikir. Dema me şer dikir jî me tam şer dikir. Te têra xwe li min dida. Lê dîsa jî min ji te pir hez dikir. Dema te serê min dişkênand, serê min tev dibû xwîn jî min ji te hez dikir. Ji ber ku ji dema ku min çavê xwe vekirî pê de bi te re bûm. Li dibistana şevînî me bi hev re xwend. Bi hev re em diçûn dibistanê. Em ti car ji hev quy nebûn. Heta bi şevê jî em li gel hev radizan. Heya roja ku em ji hev cuda bûn jî em di nav heman nivînê de di hemêza te de radizan. Dema ku te destpêkê ji min re got "em Kurd in" min bertek nîşan da. Min gotibû, em Elewî ne. Bi demê re te Kurdbûna min bi min da fêm kirin. Dema destpêkê ku tu ji malê cuda bû, bi rojan min nexwestibu li gel ti kesî biaxifim. Min nedixwest top bileyizim, biçim dukanê. Heta bi şevê dema radizam ji tirsê xew bi çavên min nediket. Timî çavê min li rêya te bû. Min digo, êdî bila birayê min, hevalê min bê. Rojekê dema ji dibistanê hatim dema min tu li pêşberî xwe dîtî, ji kêf û kelecanê hema kêm mabû bifirim. Min, tu hemêz kirî û têra xwe maç kirî. Min gotibû êdî em careke din ji hev cuda nebin. Tu çiqasî hatibû guherîn, çiqasî kamil bibûyî. Piştî ku min ev guherîna bi te re dît, hêdî hêdî min jî destp pê kir rastiyan bibînim. Li gel te êdî baweriya min bi min dihat. Min nedixwest ti carê ji te cuda bim.

Dema ku te gotibû ez ê derkevim çiya ez tirsiyabûm. Min di dilê xwe de êşek hîs kiribû û nexwestibû tu biçî. Heta ji bo neçî li ber te geriyabûm. Lê te biryar dabû. Tê bi evîna dilê xwe derketiba çiya. Ew qas fêrî te bibûm, ji bo ku ji te cuda nebim, min gotibû, wê demê min jî bibe. Lê tu kenîbû. Te gotibu ku tu Partî nas nakî, destpêkê pêwist e xwe bi pêş bixî. Dema rojekê ez hatibûm malê tu tine bûyî; tu çûyîbû. Êdî ji vê çûna te bi şûnde me dê hev nedîtana. Ji ber ku di çûyina te ya dawî de min, tu bi rê nekiribû. Min cara dawî tu hemêz nekirî, ji te re negot, ez ê xwe bi pêş bixim û bêm cem te. Lê difikirîm ku ez ê rojekê bi misogerî te bibînim. Min ê wê demê ji te re bigota, ez hevalekî te yê baş im û min îxanetê hevaltiya me nekir. Min ê ji te re bigota, hevalê min.

Dema ez tevlî gerîla bibûma, ji nişka ve derketama pêşbere te dibe ku tu bimaya heyirî. Lê ez ê bibûma kesê herî bextewar ê cîhanê. Min ê tevî te çiyayên xweşik ên welatê me bigeraya. Tê şer fêrî min bikira. Em ê bi hev re biçûna çalakiyan. Û ez ti carê nefikirîbûm ku tê şehîd bibî. Ma tu dizanî? Hevalê Sertac jî weke te şer kir û li çiyayên bedew ên Dêrsimê gihaşt şehadetê. Dema ku jê agahdar bûm xemgînî û êşa ku min bihîstiye, min niha bi bin xistiye. We ji bo rizgariya welat, xwîna xwe rêjand. Li şûna xêmgîniyê, êş kişandinê, divê ez xwe di şer de xurt bikim û bi vî awayî ji dijmin tola xwe bistînim, hêrsa xwe ji wî derxim. Tevî hevalan divê em welatê me li wî bikin jahr û wî ji welatê me derxin.

Ma hûn dizanin, min jî îsal di nava şere germ de cihê xwe wergirt. Demên destpêkê bi dudilî nêzîk dibûm. Ditirsîm ku ez ê nikaribim vî karî bikim. Lê her ku li ser we dihizirîm baweriya min bi min zêde dibû, cesareta min zêde dibû. Û gav bi gav min tirsa xwe têkbir. Dema ku cara yekemîn em bi dijmin re ketin pevçûnê êrîşa ku balafiran li Bestayê pêk anîne dihate ber çavê min. Tu jî dibezî tepe, hevalan di mewziyan de bi cih dikî, dijmin bi balafirên xwe yên lenetî bombe dibarîne ser te. Dêrsim û Qereqoçan di ber çavên min re derbas dibûn. Derûdora mala ku hevalê Sertac û pênc heval lê bûn ji aliyê dijmin ve tê dorpêçkirin. Dijmin bi top û çeka agir, wan qetl dike. Min di wê kêliye de xwest êrîşê dijmin bikim û jê tolê bistînim. Lê min dizanî ku tol bi vî awayî nayê stendin. Pêwîst bû di şer de li

dijî dijmin mirov biaqil şer bikira û her roj jê tol bistanda. Ez hêdî hêdî fêrî şer dibûm. Di vî şerî de ez xwe nas dikim. Lewaziyên xwe dibînim. Ji bo ku wan derbas bikim hê zêde hewl didim. Ez di şer de fêr bûm ku şoreş bêyî xwîn rêjandinê pêk nayên. Bêyî xwîn herikandinê welatê me yê bedew rizgar nabe. Bêyî ku xwîn bê rêjandin, nikare dijmin ji welat were derxistin û bêyî ku xwîn were rêjandin maneyeke rizgariyê nabe. We canê xwe da, welatê me bi xwîna xwe av da. Îro bi xwîna şehîdên me her der azad dibe. Gul û çîçek bi rengê sorîn vedikin. Her roja derbas dibe çiyayên me bi xwîna şehîdan sortir dibe. Xwîna diherîke dê hê jî biherike, ji ber ku welatê me hesretê xwîna me ye. Heya ku em her bihosta welat bi xwîna xwe av nedin, ev welat nikare li gel me aşitî çêbike.

Birayên min, êz ê bizanim ku bibim hevalekî layiqê we. Ez ê her roj bi ser nebesiyên xwe de biçim û bi vî awayî ji bo ku tola we bistînim bînim rewşeke amade. Bi we ser bilind im. Roj ê bê hûn ê jî bi min ser bilind bin, ala berxwedanê ku we teslîmî min û Ercan kiriye em ê ti car nexin erdê. Timî li ezmanan bihejînin. Û em ê zanibin bibin heval û birayên layiqê we. Di salvegera duyemîn a şehadeta te de li pêşiya bîranîna te bi rêzdarî bejna xwe ditewînim. Hevalê Kenan em ê sala 1994'an bikin sala azadî û serxwebûnê û bi vî awayî bersîva herî manedar bidin biranîna we.

Em ê şehîdên 7'ê Çileya Bestayê timî di têkoşîna xwe de bidin jiyîn!

**20'ê Çileya 1994'an**

Xebatên me yên pratîk û perwerdeyê di zikhev de derbas dibin. Ji aliyekî ve perwerdeya me didome, ji aliyê din ve em hem diçûn û tên gundên nêzîk, hem jî em amadekariyên biharê dikin. Ruxmî ku li hemû cihên bilind berf bariye li qampa û derûdora wê qet berf tine ye. Ji ber barana dibare, li gelek cihan zêde herî heye. Di rojên dawiyê de diranekî min pir diêşiya. Min nedikariya ji ber êşê bitebitim. Dema êş li serê min dida, dibêjî qey mêjiyê min diteqiya.

Ji ber vê yekê hevalan tevî grûbê ji bo diranê xwe bikişînim, ez şandim biryargehê. Dîsa, li biryargehê hin karên me hebûn, me dê ew

jî çareser bikirana û bizivirîna. Di navbera biryargeh û qampa me de rêyeke bi qasî rojekê hêbû.

Em di 15'ê mehê de çûn biryargehê. Bi rê de baranê her li me kir. Her derê me şilopilo bû. Dema em gihaştin qampê her der berf bû. Piştî ku me hinekê îstirehet kir, min pêdivên me ji rêveberiyê re gotin. Dema ew mijûl dibûn ku pêdiviyên me peyda bikin ez jî çûm cem doxtor. Hê jî êşa diranê min dewam dikir. Doxtor di cih de malzemeyên xwe amade kirin. Ez dirêjî erdê kirim. Pir ditirsiyam. Lê hevalan digot ku ev doxtorê me naşibe Dijwar. Diranê min tevizand. Navbera diran riziyayî bû. Dema pense li diran da û hinekê şidand. Sinirên min ser û bin bûn. Min êşeke wisa hîs kir, êşeke pir mezin bû. Dema wisa bû, doxtor pense kişand. Çend carên din jî ceriband, her carê êş zêdetir dibû. Di nav xwedanê de mabûm. Hêma bêje li êşa bêrê digeriyam. Paşê min biryara xwe da ku ez diranê xwe nedim kişandin. Piştî bi nîvro êşa diranê min wisa zêde bû, ji bo serê xwe li erdê nedim min bi zora xwe, xwe digirt. Li ber êşê xwe ragirtin zehmet bû. Li şûna vê eşê, êşek ku deh deqîqe yan berdewam bikira min qebûl kir.

Dubare çûm gel doxtor. Doxtor pitûyê aliyekî yê diranê min qetand. Tornavîda xist binê diran û hêdî hêdî diran rakir. Wisa hê rehetir bû. Herî dawî rakir. Dema diran ji cih derketibû wisa rehet bibûm, nikarim bînim ziman. Cihê diranê hatiye kişandin werimî. Lê ne xema min bû. Êşa wê xelas bibû, besê min bû!

Wê rojê em li wê derê man. Em ê sibeyê zû vegerîna qampa xwe. Wê êvarê em li cem hevalên ku perwerdeya qadro dibînin man. Me tevî hevalan sohbet dikir. Sohbeta me heya bi nîvê şevê berdewam kir.

Dema me sohbet dikir ji hevalan yekî ji min pirsî ku ez ji ku derê me. Min jî got, ez ji Varto me. Ji ber vê yekê heval xwe nêzîkî min kir. Em ketin nav sohbeteke kûr. Got, "ma tu 'Kaya'yan nas dikî?" . Min jî got, tu behsa kîjan 'Kaya'yan dikî. Wî got, "ez pirsa Elî Abas Kaya dikim". Vî hevalî behsa hevalê Sertac dikir. Min got, belê nas dikim. Baş e, wî ji ku nas dikir. Di cih de min fêm kir, ev heval birazeyê/xarzeyê Fîkret e. Min berê Fikret dîtibû. Wê demê ev heval biraze/xarzeyê Fîkret bû. Ji ber ku hevalê Sertac tevî Fikret li heman

malê diman. Li cem wan birazeyê/xarzeyê Fîkret jî dima. Min jê pirsî, ew kengî tevlî gerîla bûye. Got, “ez sala1993’yan de tevlî gerîla bûm. Û dest pê kir ji min re li ser hevalê Elî Abas û hevalê Kenan biaxife. Got, “hevalê Abas destanek bû. Eger karîbûya di nav Partiyê de hineke din bijiya dê pir bi pêş biketa”. Ji min re digot ku hevalê Elî Abas û hevalê Kenan şehîd bûne. Carekê ez peyda kiribûm. Dibe ku dilê xwe li min rehet dikir. Ma ji ku bizaniya ez birayê wan im, ji ku bizaniya her ku ew dibêje agir bi dil û mêlaka min dikeve. Got, “piştî şehadeta hevalê Elî Abas min biryara tevlîbûnê da û navê wî li xwe kir”. Belê, navê vî hevalî jî Abas bû, dema got ku wî bi xwe ev nav li xwe kiriye çiqas hestiyar bûm. Her ku wî digot, min jî guhdar dikir, piştre li ser hevalê Kenan axifî. Di sala 1988’an de bi hev re mabûn. Derbarê malbata me de her tişt dizanî. Bi taybetî şehadeta hevalê Elî Abas qebûl nedikir û digot, “diviyabû wisa zû nebûya”. Pişrte li ser axaftina xwe zêde kir; “paşê ji wê malbatê du kesên din tevlî gerîla bûn. Navên wan Ercan û Eyhan bû. Hevalê Ercan dema di 1992’an de derbasî Botanê dibû şehîd ket. Hevalê Eyhan jî nizanim li ku derê ye”. Digot ku hevalê Ercan şehîd bûye. Bawer im şaşitiyeke wî hebû. Min careke din jê pirsî, ma tu baş pê dizanî hevalê Ercan şehîd bûye? Got, “tebî baş dizanim. Dema ew şehîd bû mirovekî wan ê parêzer hebû, ji bo termê heval bistîne çû, lê dijmin nedayibû.

Min dibe ku heman pirs pênc-şeş caran dubare kir. Heman bersiv min girt. Digot, “dizanim, şehîd bûye. Partiyê agahî daye malbata wî û parêzer çûbû termê heval bistîne”. Ji nişka ve şaşomaşo bûm, min nedizanî çi bikim, çi bêjim, zimanê min nedigerî. Dest û lingê min li hev gerîn. Lê diviyabû nedim derve ku ez Eyhan im. Bêyî ku bisekine digot. Ez baş pê zanim eger zanîba ez Eyhan im dê negota. Lê ji ber ku min gotibû, wê malbatê nas dikim ji min re hindûrê xwe vedikir û bi vî awayî dilê xwe rehet dikir. Piştî şehadeta hevalê Ercan Partiyê agahî dabû malbatê. Li ser vê yekê Apê Elî pir xemgîn bibû. Hin mirovên malbatê yên ne baş jî bi ser de çûbûn. Ji ber vê yekê Apê Elî jî qrîza dil derbas kir û wefat kiribû. Yanî bavê min jî wefat kiribû, hem jî ji ber xemgîniyê.

Hevalê Abas ji min re digot û min jî ew guhdar dikir. Ez Ercan û Apê Elî dihizirim. Wê şevê cixareyê xwe li ber min nedigirt. Min

dixwest bi kişandina cixareyê xwe rehet bikim. Êdî ji ber vegotinê, min ferq kir ku hevalê Abas westiyaye. Min ji heval re got ku em ê sibeyê bimeşin, ji ber wê yekê pêwîst e ez hinekê îstirehet bikim, wî jî di cih de dît. Hema min di cihê xwe de xwe dirêj kir. Kî bi xewê difikirî. Birayê min ê ciwan Ercan hate bîra min. Ez li ser bavê xwe yê êxtiyar fikirîm. Min şehadetên nû bihîstibû. Diheman rojê de min bihîstibû ku ji min du can şehîd bûne.

Ercan hê di temenê xwe yê 16'ê de bû. Weke şidlên nû gihaştî bû. Wî, ala ji hevalê Sertac û Cewahîr girtibû nexistibû erdê. Bi serbilindî al rakir û ti car ew nexist erdê. Û wî jî weke hevalê Elî Abas û Kenan al teslîmî min kir. Niha bi awayekî herî serbilindî dora ew al hilgirtinê ya min e. Soz didim we hevalê Ercan! Bi hê zêde bilindkirina wê alê ez ê bibim bira û hevalekî layiqê we.

Em sibeyê zû rabûn û ji qampa biryargehê ya Avaşînê ber bi qampa me, bi rê ketin. Min hewl dida li cem hevalan ti tiştî nedim derve. Min hemû dema rêwitiyê bi fikirîna li ser birayên xwe, derbas kir. Vê carê ez ê weke berê xwe nekişînim qilêfê xwe û xwe nedim aliyekî. Şehîdên me ji me çi dixwazin, ez ê wê rast tê bigihîjim û bi awayekî herî rast bersivê bidim daxwazên wan. Kîna min zêdetir bû. Bi misogerî ez ê tola xwe bistînim. Ji ber wê yekê divê ez xwe baş perwerde bikim, kêliyekê ji beriya kêliyekê ji bo şer xwe bînim rewşeke amade. Divê ez bersîva herî watedar bidim şehîdan. Serbilind im, bi wan serê min bilind e. Bi wan, bi Kenan, bi Ercan, bi şoreşgeran hê xurtir im, hê biryardar im, hê zêde xwediyê bawerî me.

Dizanim; bi qasî ku serbilind bibûm, bar û erkên diket li ser milê min jî zêde bibû. Divê her tim, li her derê bi berpirsiyariya van erkan tevbigerim. Dema ku wexta wê hat divê bizanim weke wan şehîd bibim, welatê me bi xwîna xwe av bidim, bi canê xwe berdêla welat bidim. Divê di jiyanê de her gava diavêjim saxlem û layiqê wan be. Divê temsîla jiyana wan bikim. Ez ê her tim di zanebûna vê de bibim û bi wê berpirsiyariyê tevbigerim. Encax dikarim li ser vê bingehê bibim layiqê hevalan.

Hevalê Ercan mehekê ji beriya min tevlî gerîla bibû. Di 1'ê Gulanê de dest ji dibistana xwe berdan û bi grûbeke hevalên xwe re tevlî gerîla bû. Di 1'ê Gulanê ku roja hevkarî û yekîtiyê ya proletaran

e de têkoşîn û şerê xwe heya bi çiyan gihand û bû şervanekî proletaran.

Belê, te jî xwîna xwe rêjand. Hevalê Ercan te li pêşberê gel û dîrokê bi layiqê wê erka xwe bi cih anî! Ji ber wefata bavê min pir xemgîn bûm. Bi rastî jî bavekî baş û mirovekî welatparêz bû. Lê derûdora malbata me timî bi ser wî de çû. Digotin, “zarokên te bûn terorîst, ew li cem Kurdan cih digirin”. Ruxmî hemû van tiştan timî pişta me digirt. Wî jî digot, “zarokên min bi tiştên xerab û şaş rê mijûl nabin, heya bi dawî baweriya min bi wan heye”. Bi baweriya xwe ya ji bo me heya bi dawî mafdar bû. Ji ber ku me hewl dida em erka xwe ya ji bo gel û welatê xwe bînin cih. Bavê Elî bi misogerî ez dikarim bêjim, ez ê weke birayên din zanibim bibim layiqê te. Ez ê te timî bidim jiyîn. Ez pê nehesîm çawa gihîştim qampê. Bi rê de timî fikirîm. Her ku ez fikirîm min li ser xwe, ya herî rast ferz kir.

Bijî şehîdên me yên bi mirinê re destgirtî û temînata azadiyê ne!

**30’ê Çileya 1994’an**

“Eger gelek kole be, encax dikare bi şêhîdên xwe ji koltiyê rizgar bibe.”

Yek ji gotinên Rêbertiya Partiyê ku herî zêde jê hez dikim. Gelê me îro bi şehîdên xwe ve hat ber serkeftinê. Şehîdên me sembolên me yên serxwebûnê ne. Ruhê berxwedanê yê li cem wan, biryardarî û fedakariya li cem wan baweriya me hê zêdetir dike. Em weke gel pir zêde hatin dagirkirin, hatin çewisandin. Weke mirov em nehatin hesibandin. Lê em îro ji hemûyan hesab dipirsin. Em ji lanetbûna dîrokê tola xwe radikin. Em bi şehîdên xwe, xwînê didin welatê xwe. Her derê bi xwînê şîn dikin. Em serkeftinê bi xwînê tacîdar dikin. Ji bo min bûn birayê şehîdan serbilindiyeke mezin e. Ruhê berxwedanê yê li cem wan, wêrekiya wan, fedakarî û biryardariya wan ji bo min dibe çavkaniya hêzê.

Êdî hemû dema min bi wan re derbas dibe, bi wan radizêm, bi wan radibim û bi wan dimeşim. Giraniya erka dikeve li ser milê min dizanim. Ji bo ku vê erkê , bi layiqî pêk bînim pêwîst e pir zêde hewl bidim. Şert e ku ez xwe veguherim, bi pêş bixim. Hin caran difikirim, gelo ez ê bikaribim bi layiqî erka xwe pêk bînim, karibim bibim

birayekî layiqê wan. Lê yek tiştê dizanim heye, eger ez şehîd ketibama, eger yek ji wan li şûna min bûya, bi misogerî dê erkên xwe bi layiqî pêk anîba. Divê ez baweriyê bi xwe bînim, xwe xurt bikim. Bi layiqî têkoşîna Abas, Kenan, Ercan bi cih bînim.

Divê ez xwe bidim perwerde, jiyan û erkan. Neçar im bi awayekî bi hêzbûyî ji perwerdeyê derkevim. Ji ber ku li pêşiya me saleke şer a mezin heye. Ji bo ku mirov di nav vî şerî de cihê xwe bigire û têra pirsgirêkên şer bike, teqez divê mirov veguherîneke mezin bike. Ji bo ku ez vê veguherînê pêk bînim her tişt amade ye. Bi hêz ku min ji şehîdan wergirtiye ez ê veguherîneke mezin pêk bînim û bi awayekî xurt berê xwe bidim pratîkê. Tenê dikare wisa tol were stendin. Ya min jî ji stendina tolê cudatir ti şensên min ên din tine ye. Ez ê bi rêya pêşxistina xwe tola xwe bistînim, bi rêya bi her awayî alîkarî dana hevalan, bi alîkarî dayîna pêşketina wan jî tola xwe bistînim; bi tevlîbûna jiyanê bi awayekî aktîf, bi hakimbûn li ser çeka xwe û bi şerê dijî min tola xwe bistînim. Ti kes ê nikaribe agir û pêtê tola min a mezin dibe bitemirîne. Bêyî ku ez heyfa hevalên xwe rakim xew ê bi çavê min nekeve.

Bi hemû leza xwe, bi hemû xweşikî û bedewiyên xwe jiyan didome. em hin caran diçin û tên gundan. Yek-du caran berf barî derûdora qampa me. Hê zêdetir jî baran dibare. Bi hemû zindîbûna xwe perwerdeya me didome. Di rojên dawiyê de em li ser pratîka xwe ya borî disekinin. Her heval li ser kêmasî û nebesiyên xwe difikire. Ez li ser pratîka xwe dihizirim. Hin encaman dikarim derbixim. Eger em karibin ji pratîka xwe ya borî çendî encam derxin, em ê bi gavên hê xurt û ji xwe piştrast berê xwe bidin pêşerojê. Em di qampa xwe ya îsal de qederekê bi liv û tevger in. Em diçin û tên gundên derûdorê, diçin tepe. Em diçin dewriye. Timî tevger kirin tiştekî ku em hemû pê kêfxweş in.

Ji niha de diyar e bihar dê zû bê vê herêmê. Em ê bi hatina biharê re pêngavên xurt li dar bixin. Eger em di biharê de înisiyatîfê bixin destê xwe, heya bi dawiya salê înisiyatîf dibe ya me. Ji bo pêngava biharê bi awayekî xurt xwe amade dikim. Ez ê bi coş, bi xwestekeke mezin û daxwaza stendina tolê, tevlî pêngavê bibim û bibim layiqê bira û hevalên xwe. Êdî her roja derbas dibe, baweriya min a bi min zêde dibe. Û baweriya min a bi min heye.

**5’ê Sibata 1994’an**

Doh mangaya me derket tepeyê qampê. Cihê em derketinê tepeyekî li ser herêmê hakim e. Her manga bi dorê derdikeve û sê rojan li tepeyê dimîne. Di saetên diyar ên rojê de bi rêya cîhazê em bi biryargehê re têkilî datînin, derbarê xebatê de em agahî didin. Biryargeh jî perspektîf û talîmatên nû dide me. Her tim têkiliya me heye. Ber bi sibeyê em dewriyeyên xwe derdixin. Cihên bilind qontrol dikin. Dewriyeyên me ji bo kişfa qadê derdikevin, dema tav derdikeve dubare vedigerin konê tepeyê. Li qampê îştimaya me li saet çar û nîvê tê kirin. Ji bo tedbîrê, divê tepeçiyên me sibeyê di rewşa şiyar de bibin. Ji beriya îştimayê em hevalên li tepeyê şiyar dikin. Saet çarê, em hemû şiyar dibin.

Îro ji dilê min hat ji bo malbatê nameyekê binivîsim. Ew ew ji demeke dirêj e pê de ji min agahî nastînin. Ya din, ez difikirim ji her aliyê ve pêwîstiya wan bi alîkarî, moralê heye. Ji ber wê yekê min biryar da ez nameyekê binivîsim. Dibe ku nameya min nekeve destê wan. Lê ez ê weke ku nameya min ê bikeve destê wan nameya xwe binivîsim û hestên xwe wisa bînim ziman, hinekê moral û hêz bidim wan.

**Ji bo malbata min a welatparêz!**

Ji demeke dirêj e pê de ji we cuda bûme. Lê ev cudabûneke fîzîkî ye. Bi rastî ruxmî ku min bi we re jiyanek borand, ti car weke min xwestiye bi we re nebûm yek, bi we re jiyan parve nekir. Lê ji roja ku ez derketim çiyayên me pê de, min timî hûn jiyan kirin. Min hewl da xwe weke şervanekî nebez ê doza me lê bikim. Bi vî awayî bibim layiqê we. Berê min dikarî bi awayekî pir rehet ji mirovan re name binivîsim. Niha, dema ez vê nameyê ji bo we dinivîsim qet jî wisa ne rehet im. Ji ber ku ne weke malbata xwe, weke malbateke şehîdan e li we mêze dikim, ji bo nivîsandinê qederekê zehmetî dikişînim. Lê ez ê dîsa jî binivîsim. Dîsa jî, ez ê hestên xwe ji bo we bêjim.

Dema ku ez destpêkê gihaştim hevalan bibûm yek ji mirovê herî bextewar ê cîhanê. Êdî min jî ji bo bibim şervanekî azadiyê gav avêtibû, ji bo azadiya gelê me, rizgariya welatê me, ji dijmin tola bi hezaran sal bistenda û hesabê êşa bi me daye kişandin bipirsiya. Hûn kesên welatparez bûn. Ji ber ku ji beriya min ji malbatê hevalê Elî Abas, Kenan û Ercan tevlî gerîla bibû, we nedixwest ez tevlî bibim.

Li gorî we diviya bû ez li mal bimînim û tenê alîkarî û destek bidim. Lê min ev rast nedît. Diviyabû her kesî deynê xwe bida dîrokê. Erkek ku dîrokê dabû ser milê her kesî hebû. Erkek ku dîrokê dabû min jî hebû. Dema ku ew ji bo erka xwe bi cih bînin tevlî şer bibûn, min jî nedikarîbû erka xwe paşguh bikim. Diviyabû min jî şer bikira.

Min bi îradeya xwe biryar da şer bikim. Îro hê baştir dibînim ku min biryareke bi tendirustî, rast û di cih de daye. Hewl didim têkoşîn û ala wan a têkoşînê ya teslîmî me kirine bêyî ku bixim erdê, bi hemû hêza xwe bi pêş de bibim. Hem jî bi serbilindiyeke mezin û şerefeke mezin hewl didim vê pêk bînim.

We agahî girtiye ku hevalê Elî Abas, Kenan û Ercan şehîd bûne. We çawa pêşwazî kir, nizanim. Lê eger tiştekî dizanim hebe, yekane rêya layiqê wan bûnê bi xwedî derketina li doza wan mimkûn e. Ez dizanim hûn xemgîn bûne. Dibe ku we nexwestibe hûn bawer bikin. Vê rewşê bi xwezayî pêşwazî dikim. Lê xemgînî, kirin ax û wax li me ti kesî nayê; ya ku li me tê, bûn layiqê wan, ji dijmin re kîn girtin, bi temamî xwe dayîne têkoşîna wan, ji cihê ku wan ji me re hiştine têkoşina wan bi coş, biryardarî û îradeyike mezin domandin e. Min jî, dema nû fêr bibûm nexwestibû bawer bikim, min xwe kişandibû qilifê xwe, nedixwest bi ti kesî re biaxifim, min xwe bi tenê hîs dikir. Lê min fêm kir helwesta min şaş e. Wisa nêzîkî bîranîna wan bûyin li min nedihat. Min derxist zanebûnê ku ez dikarim bersiva herî baş ji bo bîranîna wan, bi rêya xwe pêşxistin, xwe veguherandin, li xeta Partiyê xwedî derketin û ji her aliyî ve ji bo şer xwe amadekirinê bidim. Bûn dayika şehîdan, bûn xwîşka şehîdan, bûn birayê şehîdan bi qasî serbilindî dide, erkên ev dide ser milê mirov jî ew çend giran e. Divê hûn li her derê bi vê zanebûnê tevbigerin. Bi wan, di nava dost û dijmin de serê we bilind e, eniya we vekiriye. Weke malbateke welatparêz timî li şehîdan xwedî derketin, nirxên wan parastin erka we ya herî mezin e. Baweriya min a bi we temam e ku hûn ê bi layiqî vê erka xwe bibin. Dema hê ez li wê derê bûm jî, dijmin pêsîra we bernedida. Timî li ser we şerê psîkolojîk dimeşand. Timî gef li we dixwar. Bi taybetî li derûdorê hin xayin hebûn timî hewl didan çavên we bişkînin. Timî hanekên xwe bi welatparêziya we dikirin. Misoger e ku ev nokerên dijmin in û bi hev re tevdigerin. Ev çend xayinên ku

erka xwe ya li pêşberê welat û gelê xwe pêk naynin û di çala îxanetê de genîbûyî ne. Dibe ku helwestên van ên neyînî li pêşberê we zêde bibin. Lê divê ti car ne hûn û ne li pêşberê van û ne jî li pêşberê dijmin serî daneynin; ji ber ku şehîdên me heya bi dawî şer kirin û heya bi dilopa dawî ya xwîna xwe jî serî netewandin. Ya ku layiqê we be jî, berdêla wê mirin be jî li beramberê van li ber xwe dan û şehîdên me parasatin e.

Min wefatkirina bavê xwe jî bihîst. Dizanim. Xayinên li derûdorê û dijmin pir êrîşê ser wî dikirin. Herî dawî nekarîbû rake û wefat kir. Wefatkirina bavê min jî, ji bo min pir girîng e. Ji ber ku wî ti carê li beramberê dijmin bejna xwe netewand. Û zanîbû ku timî bi serbilindî bijî. Her carê bi çavên xwe bûm şahidê zilma polîsan a li ser bavê min. Min di sala 1991'ê de xwestibû tevlî gerîla bibim. Lê dubare zivirîbûm. Li ser vê yekê dijmin hatibû dukanê, bavê min tehdît kiribû û li beramberê vê jî bavê min em parastibûn û gotibû "ez zarokên xwe baş nas dikim, ew ti tiştê şaş nakin, min timî hewl da ya rast nîşanî wan bidim. Baweriya min bi wan heye". Dema ku dijmin vê gotinê dibihîze gef li bavê min dixwe, dide xeberan û ji dukanê derdikeve. Teslîmê dijmin nebûyin tiştê herî bi serbilindî ye. Wî jî ev kir. Ez ê bizanibim bibim ewladekî layiqê wî. Divê bi heman awayî hûn jî bibin layiqê wî.

Şoreşa me di mercên herî zehmet de tê meşandin. Tije bi êş e. Îro zêdetirê sê hezarî şehîdên me hene. Ewqas jî şehîdên ji gel hene. Li welatê me cara destpêkê ye, gelê me evqas li ber xwe dide û weke leyistokekê bileyize diçe mirinê. Her bihost axa welatê me hesretî xwînê ye. Tenê dema em her bihosta vê axê bi xwînê av bidin em dikarin dubare ji dijmin bistînin. Êdî vê xwînê gelê me dide. Her aliyê welatê me bi xwînê tê avdan. Û ev xwîn welatê me azad dike, xweşik dike. Serok Apo dibêje, "eger gelek kole be, tenê dikare bi şehîdan ji vê koletiyê rizgar bibe". Ji bo ku em gelê xwe ji zincîrên koletiyê rizgar bikin ne canekî me, hezar canê me jî hebe em ê feda bikin. Û kesên di vê oxirê de canê xwe feda kirine jî mirovên herî leheng û herî mezin in.

Tiştên ji we re bêjim ewqas zêde ne, tiştên ez ê ji we re bêjim di van rûpelan de bi cih nabîn. Dîsa rûpelên heyî jî têra wê nakin.

Mezinahiya çiyayên me, bayê hênik û xwezaya me ya xweşik, çem û kaniyên me yên weke qeşayê, çawa ji we re vebêjim? Bi taybetî jî ez hevalên xwe ji we re çawa vebêjim?

Bi qasî ku karibim vebêjim ez ê bêjim. Ji çiyayên me dest pê dikim. Belê, gotina 'çiya' tenê têrê dike ku mirov bikeve tevgerê. Çiyayên me çendî bilind in! Çiyayên li qada Şemzînanê ku ez niha lê me, çiyayên herî bilind ên herêmê ne. Dema mirov derdikeve çiyayê Şehîdan, mirov naxwaze dakeve; ji aliyekî ve erda me ya li aliyê Îranê, ji aliyê din Şemzînan, tam li nîvenga van mirovek ku serê wî li azamanan dikeve... Bi taybetî jî dibe ku ji bo min çiyayê Çarçela, cihê herî bedew û balkêş ê cîhanê be. Ji bo bi ser bikevim pêwîst e hewldaneke mezin nîşan bidim. Dema derdikevî ser wî weke ku te hemû cîhan feth kiribe. Ti kes nikare li Çarçelayê pişta mirov bide erdê. Li zîrveyên wê, kaniyên ava wan weke qeşayê... Her ku mirov vedixwe mirov jê têr nabe. Ma hûn dizanin, avên zelal ên li Çarçelayê, pir dişibe avên li zozanên me. Weke wan avan, lêvên mirov diterikînin. Dema li her derê giya şîn dibe, gul û çîçek vedikin, Çarçela tije berf e; dema li her derê pelên daran zer dibin, keskahî hişk dibin li Çarçelayê giya nû nû şîn tê, gul û çîçekên rengîn vedibin. Dema li her derê baran dibarê , li Çarçelayê berf dibare. Barana Nîsanê nêzîkî mehê Tebaxê dibarê. Bayê tê yê hênik dema hem jî li Çarçelayê, li Şehîdan û li serê Gostê xweş.xweş tê û li mirov dide, mirov diçe cihekî din. Mirov di carekê de bêhna xwe dikişîne û dibe cejna mirov, hemû qirêja xwe diavêje derve. Kurdistana me pir xweş e.

Bi rastî jî zêde pêwîstî pê tine ye ez van xweşikî û bedewiyan ji we re bêjim. Ji ber ku hûn jî xweşikiyên welat dizanin. We jî li çiyê jiyan kir. Hûn timî diçûn zozanan, timî li çiyayan digerîn. Ji bo vî welatê me yê bedew şer kirin û şehîd bûn, li cîhanê tiştê herî bi rûmet e. Û her kes nikare vê mezinbûnê nîşan bide.

Pêwîst e we hemûyan bihîstibe, hûn hinekê jî dizanin, bawer im tiştê ku hûn herî zêde meraq dikin jiyana me ye. Bi taybetî dayika Kezban pir meraqa jiyana gerîla dikir. Û her dixwest jiyana wan gerîlayên jê re digot 'zarokên min' bibîne û hin rojên xwe li cem wan derbas bike. Dema ku dibû behsa gerîla nedikarî di cihê xwe te

bitebite. Her çendî jiyana me ji we re vegotin û li ser axifîn ne ewqas hêsan be jî, ez ê dîsa jî biceribînim.

Jiyana me jiyaneke tije zor û zehmetî ye. Her zehmetiyên di jiyanê de dibin sedem ku mirov hê zêde bi jiyanê ve bê girêdan. Her zehmetiya em dijîn hê jî jiyanê xweşiktir dike. Bi her aliyê xwe ve jiyana me xweşik û bi qîmet e. Piştî meşeke dirêj îstirehet kirin û cixare kişandin, li zîrveyên çiyan li derûdora xwe temaşe kirin, dema bi şiklê grûbên biçûk digere rastî grûbên hêvalan ên qerebelix hatin, bi gelê xwe re bi hev re bûn, bextewariya ji bo wan şer kirinê, piştî her meşê xwe gihandina lûtkeya çiyê û kêfxweşiya vê, li lûtkeyên çiyan bi gelê me re bûn yek, li wê derê li geliyan temaşekirin û tehma azadiyê kirin... Dîsa, westabûn, bêxewî, têhnbûn, tehma jiyana rasteqînî ne. Tiştê tehma hesretê didinê ev in. Dema êrîşê dijmin dikin, heval coşa herî mezin dijîn. Di sir û seqama Zagrosê de kenê germ ê hevalekî/ê yan jî di rojeke ba û bager a Zagrosê de dema mirov xwarinpêj be şûstina lalîkan, yan jî dema mirov diçe ser mewziyekê ji kesekî ne diyar e ku kî ye rakirina tola sedan sal, ji bo jiyaneke serbilind û bişeref bûn şervanê têkoşînek ku gav bi gav ber bi serkeftinê ve diçe, di zanebûna hemû van tiştên min jiyan kiriye de bûn û li gorî wê şer kirin... Belê, şer kirin. Ji bo me jiyan bi xwe ye.

Ez naxwazim yek bi yek xîtabê we hemûyan bikim. Ji ber ku hest, hizir û hesretên me hemûyan weke hev in. Ji ber wê yekê bi carekê xîtabê we hemûyan dikim. Dema ku di rêya ronahî ya Serok Apo diyar kiriye de gav bi gav têkoşîna me nêzîkî serkeftinê dibe, dijmin bi êşa ji binkeftina stendiye gelê me qetl dike. Welatê me dişewitîne. Çiyayên me tê bombebarankirin. Ev nîşan dide ku ew çiqas lewaz û rebenokî bûne. Li berambere vê roj bi roj têkoşîna me mezin dibe û serkeftinê digire bin ewlehiyê. Her dilop xwîna ku şehîdên me didin, tê wateya avdana azadiyê û li her derê belavbûna azadiyê. Partiya me partiya şehîdan e. Ji ber wê yekê erka herî bingehîn a her mirovê/a Kurd e ku li şehîdan û Partiya Şehîdan xwedî derkeve. Her roj bi lêdana derbeyên mirinê li dijmin, tola şehîdên me û koletiya bi sedan sal tê stendin.

Malbata min a birêz!

Birastî jî ez dizanim her yek ji we di zanebûna erk û berpirsiyariyên xwe de ye. Dubare dibêjim: hûn li ku dibin bila bibin, doza şehîdan li

erdê nehêlin. Eger pêwîst bike em ê hemû ji bo welatê xwe canê xwe bidin. Lê em ê ti car, doz, al û çeka şehîdan li erdê nehêlin. Em ê ti car li hemberê dijmin bejna xwe netewînin, heya bi dawiyê şer bikin û bizanin bibin dayik, bira, xwîşk û hevalek layiqê şehîdan. Di vê mijarê de baweriya min bi we heye. Ji we hemûyan pir hez dikim û hêviya min ew e hûn ê bibin layiqê şehîdan.

Her Bijî Serokê Neteweyî Serok Apo!
Bijî Partiya Şehîdan PKK
Silav û Rêzên Şoreşgerî
Kurê we, birayê we û hevalê wê Mordem Sîpan Çiya!

**11'ê Sibata 1994'an**

Hatin û çûna me ya gundan didome. Dijmin ji bo ku dubare çek bistînin li ser hemû gundan zilmê dike. Li gorî agahiyên em ji gundan distînin dijmin li gundên em nikarin xwe bigihîninê hê zêde zilmê dike. Her roj gundiyan li meydana gundan kom dike, ji bo çekan bistînin êşkence û zilmeke mezin li wan dike. Hemû gundên em diçinê ji me alîkarî dixwazin. Bi rastî dê çek wernegirin. Eger karibin hinekê li beramberê dijmin li ber xwe bidin, dijmin jî nexwazibe çek bide wan. Lê hê çavê wan li girtina çekan e. Ne ku van çekan li dijî me bi kar bînin lê ji bo ku mûçeya çetetiyê bigirin, distînin. Piştî ku çetetiyê dest pê kiriye hemûyan karê di dema borî de kirine dane aliyekî. Li gundên derûdorê gelek kêm kesên bi lawirvanî û zîraetê re mijûl dibin mayîne. Wisa tiral bûne, ti kes naxwaze kar bike. Li ser xwîna me jiyan kirin li xweşiya wan diçe. Helbet em ê destûrê nedin vê. Ti kes li Kurdistanê ji birçînan nemiriye. Erda Kurdistanê pir dewlemend e eger mirov bixwaze dikare bi her aweyî berhem bi dest bixe.

Du roj ji beriya vê em bi grûbeke heval re çûn gundê Bedow. Me berê, dest danîbû ser pezê vî gundî. Piştî vê çalakiyê gundiyên çekên xwe danenîne ji gund derketibûn. Yên çekên xwe danîbûn jî li gund mabûn. Hema bêje em ketibûn hemû gundan lê tenê em neketibûn vî gundî. Li ser vê yekê hevalan ji me re gotin ku biçin vî gundî. Dema em hatibûn heya bi biniya gundê Herkî hê berf di dolan de tine bû.

Gava em ji Herkî derketin û ketin li ser Bedow jî berf heya bi çongan bû. Sir û seqama Çarçela di cih de xwe dida hîskirin.

Diviyabû em bi awayekî bi dîqet û bêdeng biketana gund. Min heval hişyar kirin, ji ber ku li hemberê me rika gund hebû. Dibe ku çek bi kar bianiyana û ev rika xwe bi vî awayî bidana der. Gundiyekî ku em berê çûbûn mala wan jî, ronahiya mala wî pêketibû. Me li derî da û kebaniya malê derket derî. Destpêkê tirsiya, lê dîsa jî em girtin hindûr. Têhna sobaya ku li hindur pêketibû baş bû. Di berfê de her derê me şilopilo bibû. Min ji zilamê malê re got, biçe, banî hemû gudiyan bike em dixwazin li cem hemûyan biaxifin. Li ser vê yekê zilam çû. Piştî bi nîv saetê, hindurê odeyê tije zilam bû. Her cara em dihatin gundiyên berê ji me direviyan jî vê carê hatin cem me. Bi rastî bixwestana jî nedikarîn birevin. Her der berf bû dê bireviyana ku derê? Ji silavên didan me rikberiya li hemberî me xuya dibû. Bêyî ku em firsendê peyda bikin dest bi gilî û gazindan kirin. Gundî dema carekê dest bi axaftinê dikin sekin çi ye nizanin. Hem jî gava hemû bi hev re diaxifin weke sûkê lê tê. Ne wan dikarî tiştê dixwezin bi me bidin fêmkirn û ne jî me dikarî ji wan fêm bikin. Ji ber vê yekê min hemû bêdeng kirin, ji wan re got, dema yek diaxife bila yên din guhdar bikin û herkes li benda dora xwe bimîne û dema dor tê bila biaxife. Piştî vê dest pê kirin yek bi yek biaxifin. Lê ruxmî vê jî hin kêsan bêquralî dikirin, dîsa jî axaftinên wan hê baştir dihate fêmkirin.

Hemû gundiyan digotin ku me li wan neheqî kiriye û ew tije kîn û hêr in. Me jî diyar kir, tenê yek sedema vê heye, ew bi xwe ne, li gel leşkeran derdikevin operasyonan, di çek nedanînê de israr dikin. Pêwîst e êdî ew çekên dijmin daynin û tenê eger wisa bibe têkiliyên di navbera me de dikarin rast bibin. Wan jî ev dixwest. Êdî nedixwestin bi me re werin beramberê hev du. Diyar kirin ku ew naxwazin careke din çekên dijmin bistînin lê dijmin zilmê dike, ji bo vê yekê pêwîst e em alîkariya wan bikin. Me jî got, em ê heya bi dawiyê alîkariyê bikin. Ya din jî gundiyan di navbera xwe de heyetek derxistin û gotin ku ew dixwazin li gel hevalên biryargehê hev bibînin. Heman daxwaz ji beriya vê ji gundiyên Herkî jî hatibû. Me jî diyar ku em ê vê daxwaza wan ragihînin hevalan û madem dixwazin dikarin bên li gel hevalan hevdîtin çêbikin.

Heya bi derengiya şevê em li gund man. Gavên destpêkê yên ji holê rakirina pirsgirêkên di navbera me û gundiyan de erênî bûn. Yanî dihate fêmkirin ku dema mirov bi ser pirsgirêkan de biçe gelek tişt çareser dibin. Dema em ji gund derdiketin, me got em ê dubare bên, gundiyan jî ev bi erênî pêşwazîkirin. Li ser vê yekê em bi awayekî kêfxweş ji gund derketin û vegerîn qampa xwe. Me rewş ji hevalan re got, wan jî bi erênî pêşwazî kir.

Dema pratîk û perwerde bi hev re bê meşandin hê baştir dibe. Em ji pratîkê û ji gel dûr naminin, timî germahiya pratîkê dijîn. Dema wisa dibe perwerde hê jî balkêştir dibe û tê fêmkirin.

**22'ê Sibata 1994'an**

Rojeke din ku maneya wê ji bo min pir mezin e dijîm. Îro salvegera duyemîn a şehadeta hevalê Sertac e. Bi temamî ji beriya vê du sal hevalê Sertac li çiyayên Dêrsimê tevlî karwana şehîdan bû. Bîranîna wî meşaleyek ku timî rêya me ronahî dike!

Di qonaxek ku welatê me ber bi rizgariyê ve diçe de, em bi we her roja derbasa dibe hê jî nêzîkî serkeftinê dibin. Bersiva herî watedar ku em ê bidin hemû şehîdên me, bi mezinkirina şerê serxwebûnê parçeyekî azad ê welêt bi destxistin e. Ji bo ku em di sala şer a 1994'an de vê pêk bînin em ê bi awayekî bêeman bi ser dijmin de biçin.

Ez nizanim ne weke birayekî, weke hevalekî, hevalê Elî Abas vebêjim çi bikim, wî çawa vebêjim? Wî ji ber fikrên xwe, îdeolojiya xwe, ji ber hezkirina ji gelê xwe û hesreta xwe ya ji bo welatê xwe gelek zehmetî kişand. Li pêşberê zehmetiyan ti car çavên xwe neşkênandin. Piştî hewldanên mezin di encamê de karîbû xwe bigihîne lûtkeyên çiyan. Min ti kesî ku bi qasî wî ji welatê xwe, ji çiyayên xwe hez dike nedît. Bi girêdan û hezkirineke mezin girêdayî bi çiya û gel bû. Naskirina wî ji têkoşîna rizgariya neteweyî re heya destpêka bi salên 1980'î diçe. Wan deman hê em biçûk bûn. Wî, li bajêr dixwend. Dema dihate gund her carê pirtûkên cuda dianî. Kêfa wî jê re dihat ku li mêrg û çiyan pirtûk bixwîne. Hemû gundiyan, ji zarokan bigire heya bi kal û pîran, ji hevalê Elî Abas hez dikirin. Wî

jî qîmeteke mezin dida hemûyan. Dema gundiyan tiştek digot bi misogerî pêk dianî.

Dema dibistana amadeyî xelas kir, ji bo bikeve ezmûnên zanko çû Mersînê. Me hemûyan dihizirî ku ew ê di ezmûnê de bi ser bikeve. Sal,1985 bû. Lê hevalê Elî Abas neketibû ezmûnê, ji bo tevlî gerîla bûnê bi rê ketibû. Ji grûba wan yek revîbû, agahî dabû dijmin û ji ber vê yekê ew hatibû girtin. Dema em hemû li bendê bûn ew vegerê malê, rojekê di telewziyonê de me nûçeyên "grûbek terorîst hatiye girtin" temaşe kir. Hevalê Elî Abas jî nîşan dan. Lê di lêpirsînê de dijmin nekarîbû pê tiştekî bide îtirafkirin. Timî li ber xwe dayibû. Dijmin dema fêm kiribû dê nikaribe tiştekî jê bigire jî, piştî sê mehan serbest berdan. Dema hate malê, pir lewaz bibû. Ne di xema ti tiştî de bû. Tenê tiştek hebû pê êş dikişand û nikaribû qebûl bike ku kesekî ji nav wan îxanet kiribû. Lê paşde gav neavêt, biryara wî temam bû ku ji cihê maye têkoşîna xwe bidomîne, hêrs û kîna wî ya li beramberê dijmin niha zêdetir bû.

Li Enqereyê dest bi jiyana zankoyê kir. Êdî li wê derê xebata xwe dimeşand. Dema dibû tatîl dihat malê; wê demê hewl dida me jî perwerde bike. Gava dihate malê, hemû derûdora heval û hogirên wî timî li cem wî bûn. Jixwe wî bi xwe jî hemû dema xwe dida hevalên xwe. Hin caran dayika Kezban û bavê Elî berteka xwe dianîn ziman û digotin; "ma tu hatiyî cem me, yan hatiyî cem hevalên xwe? Hinekê, dema xwe li cem me jî biborîne. Me jî pir bêrîya te kiriye. Eger hevalên te ji te naqetin, bila hemû bên cem me". Dibe ku hevalên wî ji me zêdetir bêriya wî dikirin. Her kesî pir jê hez dikir. Dizanin ku ew bi têkoşînê re eleqedar jî dibe. Di demeke kurt de hemû hevalên xwe bi rêxistinkiribû. Min qet nedixwest hevalê Elî Abas ji malê veqete. Min digo bila her li cem min bimîne. Ew ti car nebû birayê min, timî bû hevalê min. Ji ber rêza ku min jê re digirt min nedikarî li pêşberê wî rehet biaxifim. Lê wî ewqas qîmet dida min, ez hin caran difikirîm û min digo, min evqas nirx heq nekiriye. Ne tenê qîmet dida min, dida her kesî.

Ji beriya tevlî gerîla bibe, dema cara dawî hatibû, êdî ji serçavê wî xuya dibû ku ew ê biçe gerîla. Ewqas bi hesreta çiyan bû, dixwest kêliyekê zûtir biçe çiyan û agirê dilê xwe bitemirîne. Timî hin kesên

din şandibû ew çiyayên billind. Êdî dizanî dora çûna çiyan a wî ye. Evîna wî li serçavên wî xuya bû. Êdî ji bo gel û welatê xwe yê ji hez dike, dê li serê çiyan şer bikira. Û di sala 1991'ê de evîna wî ew gihand serê çiyayên asê.

Ma tu dizanî hevalê Sertac, ji ber ku bira û hevalê te me çiqas serbilind im... Hezkirina ku min li cem ti kesî nedît, min li cem te dît. Qîmeta ti kesî nedaye, te da min. Rêza ji bo mirov, hezkirina ji welêt û gel te nîşanî min da. Cara destpêkê te navê Partî fêrî min kir, min navê Partî ji te bihîst. Û kêm jî be te jiyan bi min da naskirin. Ez timî dihizirîm ku tu û hevalê Cewahîr em ê li çiyayên me hev bibînin. Dema ez dihizirîm ku ez ê bi we re li lûtkeyên çiyan bên gel hev, fêr bûm ku hûn şehîd ketine. Çiqas jî zehmet bû. Lê êdî fêr bûm. Min fêm kir ku pêwîst e layiqê te û hevalê Cewahîr bim, ev jî bi girînê, bi kirin mizemiz û bi xemgîn bûnê nabe, bi weke we şêr şer kirinê mumkun dibe.

Ma tu dizanî birayê me Ercan jî şehîd bû. Wî jî bi wê ciwaniya xwe şer kir û hûn şopandin. Û zanî ku bibe hevalekî layiqê we. Wî jî weke te bi xwîna xwe welatê me av da. Niha çûkan agahî dane te. Ji ber ku roja tu şehîd ketî li gel wan axifîm. Wan ê her agahiyên we anîbana. Te ji çûkan çiqas jî hez dikir, her roj sibeyê zû şiyar dibûyî û te nan dida wan. Wan jî pir ji te hez dikir. Timî li pêşiya odeya te sibeyê zû dixwendin. Ji beriya vê bi demekê min ji malê re nameyek nivîsand. Dihizirim ku pêdiviya wan bi alîkarî, destek û moralê heye. Dibe ku kêm be jî hinekê bi vê nameyê morala wan baş be.

Belê hevalê Sertac! Hin caran hûn tên xewna min. Di xewnên min de jî hûn alîkarî û destekê didin min. Wê rojê dema şiyar dibim, dibim mirovê herî bextewar ê cîhanê. Timî dihizirim çawa layiqê we bibim. Timî bi we re dijim. Bi we re jiyankirin, jiyana herî xweş e. Eger ez ji her aliyê ve bi awayekî bi hêz bikevim sala 1994'an, ala ku min ji we wergirtiye, bêyî ku bixim xarê, heya heya bilind ragirim, li ber xwe bidim, ji bo min tê maneya ku bersiveke herî baş daye bîranîna te. Dikarim tenê bi vî awayî layiqê we bibim. Ez soz didim layiqê we bibim. Û ez ê tiştên ji bo vê pêwîst bike jî bînim cih. Li pêşberê bîranîna te bejna xwe ditewînim!

Çend rojan ji beriya vê dîsa hatibûyî xewna min. Piştî ku şiyar bûm di bin bandora xewnê de mam. Xewna xwe weke bûyî li jêr tînim ziman:

Di bexçeyê me di nava çîçekên zer de digeriyî. Te spîndarên pelzêrîn av didan. Te êm dida çûkên ku awazên Rodrîgo, Bethoven dixwendin. Li gel Hêlîn û Memo dileyizî. Navê Evîndar û Sîdar tînî ziman û paşê banî min dikî, di cih de ez têm. Te destê xwe avêt ser milê min, weke her tim destên te nerm bûn. Bi dengekî lerzok û gur û geş dibêjî "li ber xwe bide, li ber xwe bide" û alakê didî min dibêjî, "ala berxwedanê ye" û hêdî hêdî ji min dûr dikevî. Dibêjî "li dijî îxanetê şer bike". . Didim pey te, dixwazim li gel te bêm. Tu dibêjî "neyê", berê şer bike, tola me bistîne, ala berxwedanê hê jî bilind bike û dema dibe wexta wê bê gel me". Hêdî hêdî dûr dikevî.
Piştre dîsa em tên gel hev. Tu dibêjî "min xwe gihand Kurdistanê, tê jî li Kurdistanê şer bikî û her roj bi min re bibî". Ez dixwazim te hemêz bikim. Eger ne ji te be çîçekên me yên zer diçilmisin, darên me yên spîndaran ên pelzêrîn reş dibin. Çûkên ku awazên Rodrîgo û Bêthoven dixwînin, li ber pencereya me danaynin, direvin. Memo û Hêlîn bi ti kesî re neaxifin. Êdî Evîndar û Sîdar nayên. Lê tu dibêjî, "bêhêvî nebe, bi hêviyê bijî, wê demê çîçekên me yên zer naçilmisin. Hê jî xweşiktir dibin. Ji vê bi şûnde darên me yên pelzêrîn reş nabin. Dê hê bileztir mezin bibin. Çûkên ku li ber pencereya me awazên Rodrîgo û Bethoven dixwînin, her roj dê agahiyên min bigihînin we. Hêlîn û Memo dê li gel her kesî bikenin û bileyizin serê wan bi me bilind bibe. Evîndar û Sîdar dê bên û bêjin, Kurdistana me" û paşê wenda dibî. Tenê rêya tu li ser dimeşî xuya dibe. Rê tije bi hêvî ye, rê ronahî ye, rê berxwedêr e û rê bi hêrsa tolstendinê dirêj dibû û her dirêj dibû, dawiya wê ne xuya bû. Û min ala berxwedanê ku te dabû min hemêz kir, hêdî hêdî di rêya bihêvî, ronahî, biînad, berxwedêr de li pey we meşiyam, hevalê Sertac!

**1'ê Adara 1994'an**

Êdî em hêdî hêdî dikevin biharê. Jixwe li cihê me, vê zivistanê qet berf nebarî. Gundiyên gundên em diçinê ji me re gotin ku em pir bişens in. Li gelek cihan dest pê kir keskahî, çîçekên rangareng

vebike, baranên biharê bibare. Hema piştî baranê keskesor derdikeve. Rengên zer, sor, kesk, xemrî, pembe yên li ezman, mirov digirin û dibin cîhanên cuda. Bi hemû leza xwe amadekariyên bihare didomin. Li gorî îstiqbarata me stendiye, ji bo ku çek bistînin bi taybetî dijmin zêde zêde bi ser gundên li geliyê Bembo û Basya de diçe. Heta çend gundan çek stendine. Dijmin jî li qadê amadekariyên xwe zêde dike. Ji bo ku pêngava me ya biharê vala derxe tê gotin amadekariya operasyonên mezin dike. Em jî xebatên xwe yên kişfê didomînin. Ez qet tevlî xebatên kişfê nabim. Ev rewş min qederekê tengav dike. Ruxmî ku min ji hevalan re gotiye, dixwazim tevlî xebatên bi vî awayî bibim, ew hevalên cuda bi rê dikin. Min jî dişînin gundan. Çûna gundan pir xweş e, lê ez dixwazim tevlî xebatên weke kişf û yên din bibim.

Ez ê hewl bidim hin çavdêriyen xwe yên li gundên ser sînor bînim ziman. Hema bêje hemû gundên li ser sînor, heman tişt bi ber çavên mirov dikevin, jiyana wan pir dişibe hev. Awayên pir balkêş ên jiyan, têkilî û kesayetiyên wan heye. Ji van gundan gelekan li beramberê me çek stendine. Dema em destpêkê ketin vê qadê, qederekê em tengav kirin, di nedanîna çekan de qederekê israr kirin. Lê me yan bi darê zorê, çekên wan jê stendin yan jî me bi darê zorê çekên wan da danîn. Dîsa, li gorî em fêr bûne di vê dawiyê de çend gundan ji van çek stendine. Her çendî tê gotin dijmin li ser wan ferz dike, baweriya min bi vê tine ye. Ew bi xwe dixwazin çek bistînin. Ne ku van çekan ji bo dijî me bi kar bînin , ji bo pereyan, distînin. Her tiştê xwe li mûçeya dijmin girêdane. Ev gund xwediyê jiyaneke pir balkêş, pir seretayî û pir paşde mayî ye. Gelek jê zêdetirî bi du hevseran in, hin kes heya bi çar, pênc hevser in. Zewacê wan yan di nav gunde ye û yan jî ji gundên derûdorê ne. Pîremêrên heftê salî, bi keçên panzde salî re dizewicin. Bi rastî jî dilê mirov bi van keçan diçewite. Ma gelo qeder e ku ev keçên ciwan bi van zilamên heftê salî yên mirî re bi darê zorê bên zewicandin? Ti car ne qeder e. Bi taybetî ev jinên ciwan, dema em dikevin gundan hevalên me yên jin dibînin ji nişka ve bi ser xwe ve tên û zindî dibin, dixwazin bibin gerîla. Dibêjin ku ew dixwazin li cem me bên. Li her malê herî kêm

deh zarok hene. Hemû jî bihostekê ji hev biçûktir yan jî mezintir in. Hemû malbat di maleke bi yek yan jî du ode de jiyana xwe didomîne.

Qerebelixiya li malê, mirovan gej dike. Dema em dikevin malan zarok yan ji malê diçin, yan jî derbasî odaya din dibin. Qederekê jiyana wan a civakî lewaz e. Heya ku ne ji neçarî be di navbera gundiyan de zêde têkilî bi pêş nakevin. Hema bêje hemû gund ji eşîrekê pêk tê. Li gundên bi vî awayî mezinekî gund heye û li gund soza wî derbas dibe. Eger ew çi bêje gundiyên din qebûl dikin. Ti qîmeta jinên li gund tine ye, ti jin nikare li beramberê zilam biaxifin. Di van gundan de alîkariya ji bo rêxistinê pir kêm ê. Dixwazin her tiştî bi pereyan bikin. Eger îro em li van gundiyan mûçe girêbidin li dijî dijmin weke şêran şer dikin.

Ji sala 1984'an virde heval çûne van hemû gundan, dîsa pêşmergeyên PDK'ê timî di nav van de ne. Ji ber wê yekê li dijî gerîla ti çalakiyên wan tineye. Jiyana gerîla jî, gerîla jî weke jiyana xwe ya asayî lê dinêrin. Li qadê eger kî otorîte be ew jî li cem wan cihê xwe distînin. Heya bi sala 1992'yan gelekan jê li dijî me şer dikirin. Piştî şerê Başur dema me dest pê kir em bibin otorîte, bandora me ya li herêmê zêde bû, di cih de xwe ber bi me ve dan. Ya rast ew e ku dixwazin çeka dijmin bistînin, lê ji ber ku dizanin em bûne otorîte naxwazin bêyî agahiya me çek bistînin. Dixwazin bi destûra me çek bistînin.

Taybetmendiyeke din a van a balkêş heye. Qebiliyeta wan a manewrayê pir xurt e. Qebiliyeta manewrayê ya li cem van, kumê kesên dibêjin "em siyasetmedar in" berewajî didin serê wan. Bi me re, bi PDK'ê re û bi KT'ê re diborînin. Li beramberê her yekî, ji xwe re xetek girtine. Li gorî dem û cihê wê alîkariya pêwîst didin hemû aliyan yan jî li beramberê hemû aliyan helwest distînin û hewl didin xwe bidin jiyîn. Xwediyê qebiliyeteke wisa ya manewrayê ne, bi sê hêzan re jî pir baş diborînin. Rojekê dê ev manewra bi serê wan de biteqe û lêdaneke pir xerab bixwun. Ev gundî zêde zêde qurnaz in. Wisa xuya ye ti rê û rêbaz tine ye ku ji bo berjewendiyên xwe serî lê nedin. Bi qasî ku berjewediyên xwe dihizirin eger feydeya şoreşê jî bihizirin... Dîsa, ev ji bo qedemeya fermandariyê jî zêde zêde rûn diqijilînin. Fermandarê/a her grûba me ya ku dikevin gund, nas dikin

yan jî dixwazin nas bikin. Dixwazin bi ber dilê wî/ê de biçin û xwe bidin jiyîn. Hema bêje navê hemû qedemeya me ya fermandariyê jiber kirine. Dema em dikevin gund dibêjin “ez vî/ê fermandarî nas dikim hate gundê me, li mala me xwarin xwar, kesekî/e çiqas bihêz e û hwd.”, ji bo ku xwe fermandaran bidin hezkirin, bi her awayî tevdigerin. Bi vî awayî derfeta li gorî xwe hin daxwazên xwe pêk anînê xistine destê xwe.

Piraniya gundên ku em vê dawiyê diçinê dibêjin ku dijmin li wan zilmê dike û li ser wan ferz dike ku çek bigirin, dixwazin Partî çareseriyekê peyda bike. Belê, her hal ji ber ku wan çek danîne dijmin dê wan pîroz neke, helbet zilmê bike û ji bo ku dubare çekê bistînin wan bitirsîne. Ji me çareserî dixwazin. Dizanin em li herêmê bihêz bûne. Ji ber wê yekê jî naxwazin bêyî destûra me çek bistînin, ji bo ku çek bistînin li hêviya erênî kirina me ne. Lê eger li beramberê dijmin bi awayekî cidî bisekinin, dijmin ê çek nede wan. Ji ber ku dijmin naxwaze ew derbasî aliyê me bibin. Ji ber wê yekê nikare li ser hemûyan zêde zilmê bike. Eger zilmê bike gelek jê dê bên nav refên me, ev jî tê maneya ku dijmin xwe tasfiye bike. Bi destpêkirina çeteçîtiyê, gundiyan dest pê kirin debara xwe bi çetetiyê bikin. Eger ji çeteçîtiyê dest berdin dê erdê bikêlin, biçînin, heywanan bi xwedî bikin û ev ê rehetiya wan têk bibe. Weke memûran mûçe wergirtin rehetir e. Bi taybetî jî eger ji me destûrê bistînin jiyana wan pir rehet dibe.

Hemû gundî aşkere me vedixwînin lihevkirinê. Begaltê, Bafkan, Gulka, Herkî, Bêdaw hemû dixwazin bi me re li hev bikin. Dibêjin “bihêlin em çekan bistînin, beşeke pereyên distînin em ê bidin we. Dema em derdikevin operasyonan jî em ê ji berê de agahî bidin we, jixwe em ê li dijî we çek bi kar neynin”. Bi rastî jî ti mirovên weke van fêlbaz min nedîtin. Çavê wan timî li xayintiyê ye. Çima nabêjin “em li dijî dijmin bi hev re şer bikin, welatê xwe rizgar bikin”. Nabêjin, ji ber ku em pere nadin. Dîsa, hemû ev gundiyên çek berdane, mînetdarê me ne. Dibêjin “Kurdên herî mezin em in. Em Partiyî ne, me ji bo Kurdistanê çek danî”. Tu dibêjî qey bi xêra xwe çek danîne. Eger nedîtibana em bihêz in, eger me zora xwe nedayibana ser wan qet dest ji çekan bernedidan. Rojekê dê bêjin

“eger ne ji me bana, eger me alîkariya hevalan nedabana Kurdistan ava nedibû”. Bi rastî jî pêwîst e timî ev di bin qontrolê de bên girtin û firsend neyê dayîn. Ji bo şoreşê ev pir xeter in.

Li gorî min pêwîst e piştî şoreşê yên li ser sînor bên belavkirin. Ji ber ku bi navê welatparêzî, mirovahî, Kurdinî tiştek nemaye. Piştî şoreşê eger ev li van deran bimînin xetere pêk tînin. Ev herêm ji bo zîraet û lawirvaniyê pir destdayî ye. Ji bo ku aborî bê bihêzkirin divê ji herêma sînor sûd bê wergirtin. Bêyî ku ev gundî li cihên cuda yên Kurdistanê bên belavkirin ji herêmê sûd wergirtin pir zehmet e. Dîsa, pêwist e ev di nava gelê welatparêz ê Kurdistanê de bên belav kirin. Ji bo vê yekê jî ev belavkirin şert e. Bi bî awayî hem pêşî li xetereyê tê stendin, hem jî em ê van qezenc bikin.

**11’ê Adara 1994’an**

Doh em dewriyeyê giştî yê qampê bûn. Em çar heval bûn. BKC’yeke me û sê çekên me yên şexsî hebûn. Em her roj ji qampê dewriyeyên giştî derdixin. Dîsa, li tepeyê jî dewriye derdikeve. Dewriyeyê derdikeve di saet sisêyan de ji qampê derdikeve, yan diçin neqeba Herkî ya li Erdewelê yan jî diçin Kaniya Hejîrê. Em hem qadê qontrol dikin, hem jî ji van nuxteyên li yekê disekinin û bi vî şiklî, eger hebe hin kesên bên destpêke em wan pêşwazî dikin. Dîsa, li beramberê dijimin jî di kemînê de em bi awayekî amade disekinin. Em weke dewriye doh çûn Kaniya Hêjîrê.

Ev sê roj in piştî baran dibare, doh cara yekemîn tav derket. Dema ku tîrêjên destpêkê li qadê dan tu dibêjî qey ruh bi cihên dest pê kirine şîn bên hat. Sekna ji xwe bawer a Govendê ku hema li pêşberê me disekinî, dengê mirov dîn dike yê Ava Basya, balkêşiya wê belavî her derê dibû, xweşikiya her derê zêdetir dikir. Hin caran mijê hemû qad dida berxwe, her der spî dibû. Ji ber ku em li cihên bilind bûn me xwe li ser ewran hîs dikir. Me di nav xweşikiyan de xwe dida ber tavê û dema tam jî me dixwest em tehma van xweşikiyan bikin ku gundiyên Herkî û Bêdow hatin. Dixwestin biçin biryargeha Avaşîn. Ji bo vê yekê jî ji me destûr dixwestin. Ew ê li gorî xwe biçûna navendê pirsgêka xwe ya girtina çekan çareser bikirana. Bi rastî jî ev gundî, pir balkêş, pir qurnaz in. Mirovek dikeve, rezîl dibe, berjewendîperest

dibe lê evqas na. Ez her ku vê rewşa van dibînim dilê min pê naşewite. Bi rastî heq nakin mirov ji bo wan xem bikişîne. Dema ku cara destpêkê dest pê bikin biaxifin dibêjin “rewşa me dê çawa be, Partî ji bo me çi dihizire”. Doh jî çawa ku me silav lê kir di cih de pirsa vê kirin. Hevalên nû yan jî yên kevin êdî hemû van pir baş nas dikin. Pêwîst e em tawîzê nedin van. Tawîzê weke lewazî be fêm dikin. Bi rastî jî hemû li pêşberê Partiyê di asteke diyar de sûcdar in jî. Lê mirov van guhdar bike hemû bêsûc in, bê guneh in, Parî jî di asta yekemîn de sûcdar e. Dibêjin “em ê we bidin mehkemeya Partiyê”. Sedem ew e ku em nahêlin çekên dijmin bigirin. Evqas jî saxtekarî nabe. Eger ji me re bêjin “pratîka we ne baş e, we nekariye şer bi pêş bixin, ji bo wê em ê we bidin mehkemeya Partiyê”, ji ber ku gelekî me yê wisa heye em ê kêfxweş bibin. Lê ev ê ji ber ku me nehiştiye ew bibin xayin, dê me bidin meykemeya Partiyê. Dixwazin Partiyê li gorî berjewendiya xwe bi kar bînin. Dibêjin “em Partiyê pir baş nas dikin, em Partiyî ne. Em leşkerên Serok in. Em Kurdên herî durust in”. Ev durûtî jî zêde ye. Dane pey hesabên pir zirav. Dibêjin “me di vê dîrokê de evqas ard daye hevalan, me wisa alikarî daye hevalan, hevalan di vê dîrokê de li mala me civîn li dar xistine”. Yanî pêşberê her alîkariya dane me dixwazin. Niha, ji bo ku li qadê em otorîte ne li pey me digerin. Nexwe evqas nadin pey me û bêyî ku qet bipirsin çeka dijmin distînin.

Di her operasyonê de hemû dikevin pêşiya dijmin, dijmin heya bi nuxteyên me tînin. Bêyî şerm bikin tên û dibêjin “em neçar bûn”. Gelek ji wan fotoxrafên Serok û hevalên fermandar li mala xwe radigirin. Dema heval diçin malên wan di cih de van nîşanî hevalan didin. Dibêjin “em Kurdên herî durust in, em Partiyî ne, ti alîkariyên me ji bo hevalan nekirine nemaye. Bi vî awayî hewl didin hevalên nû bi xwe ve girêbidin, bi xwe bidin bawer kirin. Girtina çekan, sedema bingehîn ku ev gundî çûbûn biryargeha navendî bû. Em dişibandin pêşmergeyên PDK’ê. Nedizanîn, biryara li cem me derdikeve ji cihehî derdikeve û em vê biryarê pêk tînin. Li gel PDK’ê her kes biryarên cuda distîne û li gorî xwe distîne. Di encamê de me destûr neda gundî biçin Avaşîn. Di rojên dawî de ji ber ku baran pir barî û av pir rabibû û teleferîk xerab bibû. Ji ber wê yekê me ji wan re got,

demeke bisekinin. Her çendî bi kêfxweşî pêşwazî nekirin jî dê bipana, ji ber ku nedikarîn li avê bidin. Dema hatibûn li cem xwe gelek tişt anîbûn. Nanê bi rûn, hekên kelandî, titûna taybet, guzên taybet, jajiya taybet. Qaşo ev malzeme dê bibirina navendê. Dema zivirîn hemu xwarin bi xwe re birin. Li ser ve yekê Ferhan Qirêj û Ferhad Soro gotin "heval bertekê van li hemberê me heye. Dixwazin ji fermandarên mezin re rûn biqijilînin. Me destûr neda ku ew biçin, ji ber wê yekê ev xwarin nedan me. Ji ber ku me pirsgirêka wan çaraser nekir, ev xwarin bişunde birin". Mafê wan hebû em dişibandin hinekên din, li gorî xwe dê bi xwarina dilê hevalan xweş bigirtana.

## 21'ê Adara 1994'an

Îro Newroz e!

Agirê azadiyê yê li çiyayên me, her derê dide ber xwe û mirovahiyê ber bi azadiyê ve dibe. Gelê me bi awayekî hê hêvîdar û hê nêzîkî serkeftinê dikeve Newrozeke nû. Li serê çiyan, agirê Newrozê cuda ye. Dema ku li ser vî agirî guleyên azadiyê yên şervanên azadiyê, roketên bîsîwîngê jî zêde dibin em Newroza herî xweşik û herî azad pîroz dikin.

Me doh bi coşeke mezin Newroz pîroz kir. Bi saetan me li derûdora agirê gur û geş govend gerand, stran gotin. Em hê bi coş û moral dikevin biharê. Em weke hê bihêz bûyî xwe hîs dikin. Êdî em ji aliyê ruh û moralê ve ji bo şer amade ne. Agirê me yê Newrozê dê ti car netemire, şerê me hê jî gur û geş bike. Bi Newrozê re çîçekên rengîn ên li derûdora me vedidin çiyayên me dixemilînin û jiyanê didin wan. Newrozên ji vê bi şûnde dê ji bo min bibin rojên hevdîtina bi şehîdên me re. Di her Newrozê de em ê bi wan re li lûtkeyên çiyan, li derûdora agirên gur û geş dest bidin hev, ji hev têr bibin û azadiyê bi hev re pîroz bikin. Ez bi vê Newrozê dest pê dikim. Xwe hê nêzîkî azadiyê hîs dikim. Ji bo vê roja hevdîtina me ji dilê min hat helbestekê binivîsim. Her çendî ne xweşik be jî roja hevdîtinê îfade dike.

Em hev bibînin hevalê Elî Abas!
Di qonexek ku
Nikare ew hêza afirîner bê astengkirin de
Agirê azadiyê
Nayê astengkirin, nayê astengkirin
Em hev bibînin
Di sibeya 21'ê Adarê de
Di roja me ya azadiye de
Tevî hevalê Kenan û Ercan
Di kolanên Newrozê de
Em pîroz bikin cejna gelê me
Dema agirê Newrozê xweş dibe
Jiyanê diafirîne, xweşiktir dike.
Gerîlayên li çiya û gelê me!
Bila Newroz ji bo me bibe roja hevdîtinê
Wê demê hevalê Elî Abas
Wê demê
Em hev bibînin hevalê Kenan
Û bi hevalê Ercan re
Li Kolanên Newrozê
Bila lê bidin dahol û zirne
Bila govend bên gerandin,
Heval bablekanê bileyizin
Bila dayik bi rengên kesk û sor û zer, xwe bixemilînin
Bila bav rika xwe bidin der
Tu li Dêrsimê,
Hevalê Kenan li Bestayê,
Hevalê Ercan li Botanê,
Ez jî li Çarçelaya mezin
Em hev bibînin, roja me ya hevdîtinê
Li Nerwrozê
Em hev bibînin canên min
Di wê rojê ku
Êş kêm bûne
Weke hezkirinê lê hatin
Di wê roja ku Roja me derketiye de

**6’ê Nîsana 1994’an**

Li qada em lê bi cih bûne bihar hat. Hin caran baranên biharê bi rojan dibarin. Bişgokên daran hêdî hêdî vedibin, rengê kesk her derê dorpêç dike. Ya din ji dema li ser van xweşikî û bedewiyan piştî demeke kurt derketina me ya pratîkê zêde dibe em hê jî kelecan digirin.

Me dîsa dest pê kir ji nîmetên xwezayê sûd wergirin. Di van demên dawiyê de em li qampa xwe xwarin çênakin. Em ji giyayên weke kereng, tuzik, tirşik û hwd. xwarin çêdikin û dixwun. Bi taybetî jî mirov ji tehma kerengên tevî salçayê tên sorkirin têr nabe. Me bi Newrozê re bi germahiyekê bihar pêşwazî kir. Û em ê bi derbeyên di pêşerojê de lê bidin hê jî xweşiktir bikin.

Qampa me, îro, rojeke ji rojên din cuda jiyan kir. Em îro ji qampa xwe derketin, me xwe berda dola hema nîv saet li biniya me û li wê derê me qampake demî ava kir. Konferansa Botan-Behdînan demekê berê xelas bûyîbû. Niha li her derê konferansên herêman tên lidarxistin. Em ê jî weke herêma nehemîn konferansa xwe li dar bixin. Ji bo cihê konferansê dola li biniya me guncawtir bû. Ji ber wê, em îro cihê qampa xwe diguherin. Me konên xwe piştî taştê hilweşandin.

Gerîla ne girêdayî bi ti derê ve ye. Hem em ava dikin, hem jî hildiweşînin. Hemû xweza di bin xizmeta me de ye. Em ku derê di cih de bibînin li wê derê bi cih dibin. Îro me li qampa xwe gelek tişt jiyan kirin û ji gelek tiştan hez kir. Jibîrkirina wan ne gengaz e. Dema ku me konê xwe hildiweşand eger bêjim xemgîn nebûm ne rast e. Lê me kon hilweşandin. Me jiyana xwe ya di konan de, bîranên xwe ti car hilneweşandin. Berewajî em ê heya bi dawiyê girêdayî wan bimînin û bîranîn xwe bidin jiyîn. Heya ku em ecz dikirin bêdeng nebûna Ferhan Qirêj, sohbetên şêrîn ên Rustem Menal, bişirînên Soro Ferhad, bîranînên hevalê Ferîd, bi taybetî jî nîqaşên siyasî yên Şêroyê portatîf ez ê ti car ji bîr nekim. Ez ê hemû xweşikî û bedewiyan bijîm û bidim jiyîn.

Ji bo konferansê piştî nîvro em hatin qampa demî. Delegeyên tevlî konferansê bibin diyar bûn. Delege ji nav hevalên li herêmê hatin hilbijartin. Hê bêhtir ji bolîka me û ji bolîka Govendê hatin

hilbijartin. Dîsa, me ji bo ewlekariya konferansê jî li girên stratejîk ên qadê, hevalên tevlî konferansê nebûne bi cih kirin. Armanca konferansa li herêma me bê çêkirin ev e; biryarên di konferansa eyaletê de hatine girtin di asta rastiya herêmê de bên liberçavan girtin, ji bo ku ev biryar bên pratîzekirin rê û rêbazên di cih de bên tesbîtkirin... Weke her hevalî/ê, min jî dixwest tevlî konferansê bibim, dîtinên xwe yên derbarê herêmê de bînimim ziman û têkariya xwe nîşan bidim. Hevalan got, “bi îhtimaleke mezin tê ji herêmê biçî, ji ber wê yekê baştir e ku hevalên li vê qadê dimînin tevlî bibin, ev ji bo wan hevalan jî baştir dibe”. Sedem çi dibe bila bibe, tevlînebûna min a konferansê ji bo min bû sedema dilşikestîbûnekê. Weke ku hatime paşguhkirin xwe hîs dikim. Min ji bo ku nehatime tevlî xebata kişfê ya ku vê dawiyê tê kirin jî, heman hest jiyan kirin. Lê min dixwest bi pêş bikevim û hin tiştan bikim. Ev jî mafê min ê herî xwazayî ye. Lê eger heval min telvî xebat û erk nekin, ez ê çawa bi pêş bikevim?

**9’ê Nîsana 1994’an**

Me ji bo konferansê qampa xwe ya demî ava kir. Piştî ku konferans xelas be dê vesazî çêbin û liv û tevger ê dest pê bike. Ez li qampê dimînim. Û li gel hevalên ji bo ewlekariyê çûne tepeyê timî têkiliyên cîhazê çêdikim. Piştî ku heval navber didin konferansê, bi giştî rewşê ji wan re radigihînim. Îro roja sêyemîn a konferansê ye, heval pêvajoyeke pir tije jiyan dikin. Ji bo herêma me dê biryarên girîng derbixin. Kelecana vesaziyên ku dê piştî bi konferansê bên kirin ji niha de heval xistine bin bandora xwe. Bi rastî jî neketina bin bandora kelecanê, ne gengaz e. Vesaziyên qadan, vesaziyên tabûr, bolîk, taxim û heta yên mangayan jî kelecanê didin mirov. Ji bo her hevalî/ê îradeya Partiyê esas e. Eger Partî kê ji bo ku dere guncaw bibîne dişîne wê derê. Heval ji bo vê îtiraz nakin. Lê heqê pêşniyarê yê di nav Partiyê de her heval di dem û cihê wê de bi kar tîne. Eger ji bo vê şert û merc guncaw bên dîtin ev pêşniyar tên qebûlkirin. Hin heval dibêjin ku ew ê ji bo vesaziyen giştî pêşniyar bi pêş bixin. Dema mirov rewşa hêza me li ber çavan digire tenê dikare beşeke pêşniyaran bê qebûlkirin. Pêkhateya me ya li qadê ji hevalên bihêz û xwediyê tecrube pêk hatiye. Dîsa, hema bêje hemû jî qade nas dikin. Partî îsal bi girîngî li

ser qadê disekine. Ji ber wê yekê li vê qade pêwîstiyeke mezin bi vê hêzê heye. Bi îhtimaleke mezin beşeke mezin a hevalan dê li şûna xwe bimîne. Ji ber ku heval jî vê dizanin zêde pêwîstî pê nabînin ku pêşniyaran bikin.

Hevalên li vê qadê ev salek e bi hev re li dijî dijmin şer dikin, bi hev re jiyan dikin. Ji ber wê yekê di navbera hevalên me yên vê derê de têkiliyên pir cuda hatine pêşxistin. Di maneyekê de weke têkiliyên malbatekê... Heval jî naxwazin ji hev cuda bin. Ji beriya konferansê du-sê heval ji qadê çûn. Hem yên çûne, hem yên mane pir xemgîn bûn. Bi rastî jî heval qederekê bi hev ve hatine girêdan. Heta dema heval çûn min bi hanekî got, malbata Herkî hin zarokên xwe wenda kirin, malbata Herkî hêdî hêdî belav dibe. Li ser vê yekê heval keniyan û tevlî min bûn.

Malbatperestî tiştekî pir xeter e. Di navbera hevalên ku li ser vî esasî nêzîkî hev dibin de lihevkirin bi pêş dikeve. Di pêvajoyê vê zivistanê de li cem me bi awayekî diyar lihevkirin hate jiyîn. Rexne nekirina hev, çav neqandina ji kêmasiyên hev re li cem me hemûyan dihate jiyankirin. Dîsa, di rewşên ji hev cudabûnê de kişandina zehmetiyê, adepte nebûna cihê ku nû heval diçinê û kişandina zehmetiyê xwe dida der. Ji ber vê yekê jî malbatperestî dibe ku encamên pir xeter bi xwe re bîne. Ji ber wê yekê divê pêşketina malbatperestiyê bê astengkirin. Û divê malbatperestiya di pêkhateya me ya Herkiyê de çêbûye bê mehkumkirin û bê astengkirin.

**17'ê Nîsana 1994'an**

Min timî li ser girekî, di hindurê dolekê de ji dûr ve li Govendê temaşe kiribû. Her cuda bû û xweşikî û bedewiyeke cuda xuya dikir. Em ji beriya du rojan derketin Govendê ku ji dûr ve dişibe kelheyekê. Dema mirov derdikeve Govendê hestên cuda bi mirov re bi pêş dikevin. Govendê bi hemû xweşikbûna xwe li mirov dinêre. Weke ku yek ji mirov re bêje "azadî li ser tehtên mezin ên li ser Govendê ye". Mirov di nav Govendê de weke ku li kelheya herî saxlem a cîhane be xwe hîs dike. Dema dikevî hindur destpêkê ji mirov re weke labîrentekê tê. Dibe ku her kêliyê di nav de rêya xwe wenda bikî.

Ji xelasbûna konferansê re sê roj mabûn. Dijmin hêdî hêdî diket liv û tevgere û di dawiyê de operasyoneke mezin da destpêkirin. Em jî neçar man navber bidin konferansê. Me hêzên xwe yên li qadê di nuxteyên stratejîk de bi cih kir, kemîn danîn rêyên dijmin tê re bê. Operasyon li ser hemû sînor rabibû. Amadekariyên wê ji berê de dest pê kiribûn. Herî dawî di Newrozê de bi 150 hezar leşker taqwiye kiribû, bi vî awayî dixwest pêngava me ya biharê asteng bike û me îmha bike. Operasyon li hemû welat dest pê kiribûn. Îro roja şeşemîn a operasyonê ye. Hevalan di du rojên destpêkê de 1 F-4 û helîqoptereke dijmin xistibûn xarê. Bi dehan leşker jî hatibûn kuştin. Li aliyê Avaşîn nêzîkî pênceyê leşker hatibûn kuştin, li Zapê jî helîqopterek hatibû derbkirin. Ji bo dijmin girîngiyeke leşkeran nemaye, bi hezaran leşkerên xwe ji çavên xwe derxistiye. Jixwe niha bi arteşeke 400 sed hezar leşker jî operasyon rakiriye. Ev hewldana dawî ya dijmin e. Dibe ku li ber hin planên me bibe asteng. Lê dema operasyon xelas bû piştî wê dê careke din rêya xwe bi vê derê nexe.

Em ji bo ku hêza xwe ya taximê biparêzin derketin Govendê. Dema ku heval tengav bibin dê pişta xwe bidin Govendê û em ê jî parastina wan bikin. Me dikarî tenê di deriyên heyî re derkevin Govendê. Li aliyên bakur û başur 14 deriyên tên zanîn hebûn. Ji van deriyan tenê pênc şeş tên bikaranîn. Deriyên din jî berê bi kar anîne. Em ji aliyê başur, di deriyê Mawata re derketin. Me karîbû hin caran di kendalan re hilkişin û hin caran jî fetl û qews bidin rêya xwe, xwe bigihînin derî. Dema mirov derkeve ser derî, hemû Başur xuya ye. Li quntareyên Govendê hê jî berf hebû. Gava mirov nêzîkî derî bibe, neçar dimîne li ser berfê bimeşe. Hem jî neçar e pir bidîqet bimeşe, eger na, carekê mirov bişemite, encax dikare parçeyên mirov li gundê jêr bên komkirin. Ji bo mirov karibe ji rêyên vê derê re bêje rê, hezar şahid pêwîst e. Em her li ser keviran dimeşin. Her kevirek weke kêrekê ye û ji van şikêran her yek weke kelheyekê ye. Gelek kelheyên biçûk ên wisa hene.

Eger deriyên Govendê saxlem bên girtin dijmin pir zehmet dikeve Govendê û derbeyên mezin distîne. Tê fêmkirin ku li Govendê lastik zêde li ber xwe nade. Ji beriya derkevim Govendê min pêlaveke nû xistibû lingê xwe. Dema ez îro lê mêze dikim her derê wê qetiyaye.

Pêlav û cil li ber Govendê xwe nagirin. Li Govendê rêyeke qîr jî heye. Doh di wê rêyê re meşiyam û çûm. Ev, rêya ku diçe deriyê Keletê ye. Li cîhanê rêyeke din a wisa tine ye. Ji ber ku di seranserê rêyê kevir kêm in û dem bi dem mirov li ser axê dimeşe, heval ji vê rêyê re dibêjin rêya qîr.

Min doh çûna ava ya Rojê li Govendê temaşe kir. Pir romantîk û pir xweşik bû. Dema ku min li ser kevirên wê şikêrê, Roja diçû ava temaşe dikir, min hîs kir ku li wê şikêrê çendî azad im. Bi rastî jî çiyayekî ku vegotina wî zehmet e.

**27'ê Nîsana 1994'an**

Di sibeyeke dinya vekirî û pîr û paqij de em ji Govendê daketin. Her der bûye bihar, pelên daran wisa xweşik vebûne, hemû qad bi rengê kesk xemiliye. Dema mirov ji Govendê dadikeve ji deriyê Mawata li qadê mêze dike, dîmeneke pir xweş xuya dibe. Min dixwest ji deriyê Mawatayê yê pir arwaz ku hema bêje weke dîwar e bibezim û kêliyekê ji beriya kêliyekê dakevim û di nav çîçek û giyayê şîn de xwe dirêj bikim, tehma azadiyê bikim.

Di rojên ku em li Govendê mane de hema bêje her roj baran dibarî. Ji aliyê başûr ve ewrên reş û tarî derdiketin û timî ber bi bakur ve diçûn. Van ewran timî li gel xwe baran dianîn. Her çendî me konên demî vedidan jî me nedikariya ji baranê xwe biparêzin. Heval ji ber barana timî dibariya ecz bûyibûn û her ku ji başur ewrên reş û tarî dihatin berteka xwe ya li beramberê wan didan der. Hemû hevalan digot "ev ewrên ji Başur tên bêhna îxanetê bi xwe re tînin".

Dijmin hemû tiştê xwe bi vê operasyonê ve girêdayîbû. Lê derbeyên mezin girtin û paşde kişiyan. Digotin, "em ê li seranserê hemû sînor bi cih bibin". Lê dema ku li her derê ji hevalan derbe girtin ev operasyona wan ji deh rojan zêdetir berdewam nekir. Ji beriya vê dema dijmin operasyon radikir me hemû hêza xwe dikişand kûrahiyên Başur. Dijmin jî hinekê li araziyê digeriya, qontrol dikir û diçû. Lê me vê carê wisa nekir. Me li dijî operasyonê, operasyona şoreşgerî pêk anî. Li Zapê, li Bircela, li Avaşîn û li ser hemû sînorê Botanê, li beramberê operasyonê operasyon dihate lidarxistin. Di dawiya vê de cara yekemîn dijmin di operasyonekê de derbeyên

mezin yên wisa wergirtin. Li sînorê ku difikirî heya bi payîzê bimîne deh rojan jî nekariya bimîne. Hêzên me pir baş li ber xwe dan. Me hemû rê û girên li qada Herkî girt. Hevalan hefteyekê li ser van tepe û rêyan kemîn danîn û li benda dijmin man. Lê dema ku dijmin dît me li vê qade pir baş mewzî girtine, bêyî ku bikeve qada me neçar ma ji sînorê hatiye paşde bikişe. Leşkerên paşde dikişiyan bi temamî rewşa têkçûnê jiyan dikirin. Ew direvîn û hevalan dida pey wan. Me li Govendê bi cîhazê li dijmin guhdar dikir. Hevalan li Avaşîn û Zapê grûbeke wan xistin dorpêçê û îmha kirin; wê demê leşkerên di dorpêçê de bûn digirîn û dixwestin ku qobre bê. Di dawiya operasyonê de bi giştî çar heval şehîd bûn. Ji van du heval di encama bomberdimanê de û her du hevalên din jî di encama sekvaniyê de şehîd bûn.

Piştî vê operasyone morala hevalan qederekê bilind bû. Terknekirina qadê, bi teqtîkên gerîla dijmin li qadê îmhakirin û li beramberê operasyonê operasyona dijber lidarxistin, ji bo hemû hevalan bû mopraleke mezin. Bi vî awayî cara yekemîn li eyaleta me li beramberê operasyona dijmin bi operasyona gerîla bersiv hate dayîn.

Dema dijmin paşde kişiya hêza me ya heyî bi awayê tabûrekê, sê bolîkan bi rêxistin bû. Bolîka Herkî, bolîka Gerdî û bolîka bitevger û li rex vê ya din jî ji bo herêmê taximeke lojîstîkê hate pêkanîn. Li vê qadê cara destpêkê ev qas heval dihatin cem hev. Hêza dê piştî pêngava biharê hê jî bê zêdekirin. Bi evqas heval mirov dikare gelek tiştan bike, eger hêz baş şer bike, baş bê qoordîne kirin em bi rehetî dikarin vê qadê biexin.

Di encama vesaziyan de cihê her kesî diyar bû. Tenê, cihê min diyar nebû, di nav ewqas heval de tenê ez ji derveyê vesaziyê mam, ji min re gotin ku ez ê ji herêmê biçim. Lê ez dixwazim li vê herêmê bimînim û şer bikim. Ruxmî ku min ev ji hevalan re diyar kir, qebûl nekirin. Dema vesazî hatin çêkirin kêf kêfa hevalan bû. Tenê min bi awayekî bêdeng xwe kişandibû goşeyekî. Bi rastî jî ez dixwazim li vê qadê bimînim. Êdî qadê nas dikim. Gel dizanim. Fêrî hevalan bûme. Li ser esasê ku ez ê karibim li vê qadê şer bikim bawariya min jî bi min heye. Lê Partî di cih de nabîne. Ez nizanim ez ê biçim ku derê,

kîjan qadê. Her heval dibêje ku ez ê biçim cihekî cuda. Kî li gorî xwe min ji bo ku derê guncaw dibîne, min bi rê dike wê derê. Tebî ev gotin ne fermî ne. Me ji axaftinên li mutfaqê tên kirin re digot, 'agahiyên cîhaza mezin'. Di çend rojan de rewşa min bû mijara cîhaza mezin. Her kes li gorî xwe cihekî peyda dike. Û agahiyên ji cîhazê digirtin ji min re dibêjin. Ez niha tenê bi guhdar kirina wan qîma xwe tînim.

Hevalê ji Govendê dakevin û berê xwe bidin erk û qadên xwe. Ji dûr ve li govendê temaşekirin xweşikbûneke cuda ye, lê gerîn jî, derketin ser jî, xweşikiyên cuda ne. Dema li ser Govendê bûm, min li ser deriyê Mawata hemû herêm temaşe dikir, bi nav xewn û xeyalan de çûyîn çi xweş bû.

Em îro ji Govendê daketin, ewrên bêhna îxanetê jê dihat jî nehatin Govendê.Terka Govendê dan. Tava ku pîr û paqij hilat jî hê zêdetir Govendê mezintir dikir. Ji aliyekî ve tava biharê, ji aliyê din ve çîçekên rengîn, giya û keskahî... Govendêyê ku hema li pey me ye û Ava Basya ku bi qîrînî û nalînî diherike ruhekî cuda dide mirov. Ev bedewî û xweşikiyên li Kurdistanê ji bo mirov dibin çavkaniyên jiyanê. Bi jiyînê, bi gerîna di nav de xwezaya Kurdistanê dîtin karê herî bi kêf ê cîhanê ye.

**10'ê Gulana 1994'an**

Piştî ku em ji Govendê daketin, em dubare çûn dola ku me lê konferans li dar xistibû. Tabûra bi tevger a eyaletê jî hatibû wê derê. Ya din jî dema hêza me ya herêmê jî çûbû wê derê, ji nişka ve li wê derê hêzeke bi qasî du tabûr çêbû. Bi rastî jî dema ku mirov ev qas hêz li cem hev dibîne, mirov fêm dike ku rizgariya Kurdistanê çiqas nêzîk e. Bi hêzeke bi qasî du tabûr mirov dikare her tiştî bike. Hevalan amadekarî dikirin. Tabûra bi tevger kişfa gundên çete yên Dêsatê kiribûn. Çalakiyên destpêkê yên demsalê dê li ser van gundan bihata lidarxistin. Li qadê li dijî dijmin tektîkên şerê bi tevger dê bihatana pêkanîn. Ev her du gundên çeteyên harbûyî li cem dijmin hemû tepeyên stratejîk ên li herêmê digirin. Di derbasbûna me ya di navbera Oramar û Herkî de ji me re dibin asteng. Dîsa, ev gundên çeteyan li cem dijmin li beramberê me aşkere şer dikin û destê wan jî

ketibû xwîna gelek hevalan. Ji bo hemû bangawaziyên Partî bi çekan bersiv didan. Eger ev her du gund ji holê bihatana rakirin dê beşeke mezin a vê herêmê bikeve bin qontrola me. Ji ber ku dijmin jî vê dizane tevî çeteyan pir girîngî dide parastina vê derê. Çalakiyek ku bi vî awayî bi teqtîka şerê bi tevger tê lidarxistin dê dijmin pir bixista panîkê û tengav bikira. Ji ber vê yekê bi coşeke mezin amadekariyên çalakiyê didomandin. Fermandarê me yê eyaleta Behdînan jî hatibû dê rasterast çalakî bi xwe qoordîne bikira. Ji beriya ku çalakî dest pê bike, bolîkên Gerdî û Herkî ji bo ku li herêmên xwe amadekarî bikin çûn aliyê Erdewel.

Dema ku bolîk çûn cîhê xwe, fermandarê biryargehê banî min kir û axaftineke pir kurt kir, "tê demeke kurt li cem min bimînî û paşê em ê te bişînin cihekî din". Bi vî awayî min ê ji bo demeke kurt li gel biryargehê tevger bikira. Bi destpêkirina baranê re amadekariyên çalakiyê hatin temamkirin û tabûra bi tevger ji bo ku berê xwe bide hedefa xwe ber bi qada çalakiyê ve ket tevgerê. Dotira roje, sibeyê zû em jî li gel fermandarê xwe yê biryargehê ji bo qoordîneya çalakiyê derketin tepeyê herî stratejîk ê li vê qadê. Hêzên me her du gund jî dorpêç kiribûn. Gav bi gav nêzîkî gundan dibûn. Çete û leşker dê bihatana kişandin araziyê li araziyê bihatana îmhakirin. Ya din jî di çalakiyê de çêkên giran ên weke doçqa, hewan û hwd. jî bihatana bikaranîn. Sibeyê, çeteyên li gund liv û tevgera hevalan dîtin. Li ser vê yekê bi çekên giran dest bi gulebaranê kirin. Hemû hêzên me cihê xwe girtibûn. Hewanên me dest pê kirin bixebitin. Wan digo em tacîz dikin. Me heya bi nîvro bi çekên giran li gund û tepe da. Li ser vê yekê grûbên çeteyan derketin araziyê. Armanca me jî ev bû. Me li araziyê kemîn danîbû. Çete û leşkerên di sê qolan de derketibûn araziyê ketin kemîna hevalan. Dema ku derb girtin ên sax mane jî neçar man dubare birevin gund. Di vê navbera de hevalan jî hêdî hêdî çember teng dikirin. Dema bû şev me dîsa dest pê kir bi çekên giran li gund bidin.

Bi şevê cihên bilind pir sar bû. Hema li pêşberê me sermaya Çarçela xwe dida hîskirin. Ruxmî hemû sermayê, germahiya çalakiyê têra germbûna mirov dikir. Lêdana bi hewan û doçqeyê heya bi sibeyê berdewam kir. Çete di rewşeke zehmet de bûn. Reîsê çeteyên

li gund bi hevalan re bi cîhazê axifî. Ji me re digot ku em lêdana gund rawestînin û ew ê teslîm bibin. Tenê ji me dixwest em ewlekariya canê wan pêk bînin. Hevalan ji wan re got ku eger ew teslîm bibin em ê tiştekî bi wan nekin. Li ser vê yekê hevalan saetek dem da çeteyan. Fermandarê dijmin di cih de bi reîsê çeteyan re têkilî danî. Gef li wî xwar. Kêliya ku dema me daye wan xelas bû lêdana gund berdewam kir.

Di vê navberê de hêzên dijmin ên li gund ji gelek cihan derketin araziyê. Tam firsanda wê bû, em dijmin tine bikin. Hêzên dijmin ketin kemîna me û beşeke mezin ji wan hatin îmhakirin û çembera dora wan hate tengkirin.

Êdî gund bi temamî ket qontrola me, girên stratejîk ketin destê me. Dijmin bi temamî tepe vala kirin û bi gund de revî. Bîst hestirên li araziyê yên çeteyan ketin destê me. Grûbên me yên yedek ev heywan derxistin derveyê qada çalakiyê. Fermandarê biryargehê ku êvarî çalakî qoordîne dikir talîmata êrîşa li ser gund da. Dema dinya bû tarî, hevalên ku gund xistibûn dorpêçê, ji du çengan ketin gund. Çete û leşkerên mabûn mewziyên xwe û gund hiştin û revîn. Hevalan piştî ku malên li gund yek bi yek qontrol kirin paşde kişiyan. Gelek çek û miqtarekî zêde cebilxane hatibû bidestxistin. Piştî demeke kurt heval dubare ketin mewziyên xwe. Helîqopteran sibeyê zû dest pê kir li ser gund bigerin. Di pey re dest bi bombebaranê kirin. Lê doçqeyan di cih de dest pê kirin bersivê bidinê. Ji ber we yekê dijmin tam nedikariya berê xwe bida hedefên xwe. Bi awayekî serasera li ser qadê bombe dibarand. Piştî ku aliyê Herkî bombebaran kirin, li biniyê qada ku heval lê bûn leşker danîn. Leşkerên hatibûn danîn di navbera du hêzên me de di bin gulebarana zêde ya hevalan de bûn. Fermandarê me yê biryargehê grûbeke ji pênc hevalan pêk dihat ku ez jî di nav de bûm bi rê kir. Em pênc hevalan di nava giya re çûn şikêra li biniya leşkeran. Ji ber gulebarana hevalanên li jor nedikariyan tevger bikin. Me bi awayekî bê deng sizmeyê şikêrê li biniya wan kir û me mewziyên xwe girtin. Piraniya leşkerên ku hatibûn danîn nava dola pênce metro li pêş me bû, tiştek diaxifîn. Di wê kêliyê de me hemûyan bi hev re gule reşandin ser leşkeran. Bi reşandina guleyan re dengê qîr û hewar û ketina erdê ya leşkeran bû

yek. Hema bêje hemû ketibûn erdê. Yên sax mabûn jî di dolê de tengav bibûn, nedikarîn derkevin. Di cîhazên xwe de timî alîkarî û qobre dixwestin. Dîsa, diyar dikirin ku gelek jî kuştiyên wan hene. Me heya bi êvarê li wan da.

Bi destpêkirina tariyê re dengê çek û hewanên ku sê roj in didomiya sekinîbû. Me ji fermandarê biryargehê re got ku em ê biçin ser dijmin û çekan rakin. Fermandarê biryargehê qebûl nekir. Û fermana paşde kişanê da. Hemû hêzên me bi gundê Dirrê ve paşde kişiyan. Êvarê hemû heval kom bûn. Morala her kesî pir bilind bû. Di çalakiyê de ji me du heval şehîd bibûn. Hevalê Silêman di roja dawî de şehîd bû. Dema dibîne dijmin derbe xwariye, ji nişka ve xwe wenda dike û ji mewziya xwe derdikeve, gule dibarîne ser leşkerên direvin. Di wê navberê de bi sekvaniye tê şehîd xistin. Hevalê/a din jî bi heman awayî ji ber ku di mewziya xwe de vekirî tevdigere bi sekvaniyê şehîd tê xistin.

Çalakî bi serkeftî derbas bû. Çete û leşkeran, gund berdan û revîn. Miriyên wan pir zêde bûn. Çend caran derketin araziyê jî her carê derbe xwarin. Wendahiyên me jî ji kêmasiyên me çavkaniya xwe distend. Eger hineke din bi baldarî bihata tevgerîn ew wendahî jî dê bi pêş neketana.

Em ê bi şerê bi tevger ku tektîka qonaxê ye gelek hedefan bixin. Hêzên dijmin ên li qadê zêde zêde biyaniyê vê tektîka me ya nû ne. Em ê hewl bidin vê tektîka xwe bi awayekî hê serkeftî pratîze bikin.

**19'ê Gulana 1994'an**

Doh salvegera şehadeta hevalê Heqî Karer û Ferhad Kurtay û hevalên din bû. Enternasyonalîstê mezin hevalê Heqî Karer di encama qomloyekê de şehîd bû. Girêdana herî baş bi bîranîna wî re ev e; em têkoşîna entarnasyonalîst bilind bikin, nokerên li Kudistanê tine bikin û têkoşîna me ya rizgariya neteweyî bibin serkeftinê. Em careke din hevalê Ferhad Kurtay û hevalên wî yên din ku meşaleyê ji Mezlum dewr girtine netemirandin, bi bîr tînîn, girêdana herî mezin bi wan û bîranîna şehîdên şoreşê re bi qewitandina dijmin ji Kurdistanê û bi xwe gihandina azadiyê dibe. Em ê hevalê Heqî û

hevalê Ferhad û hevalên wî yên din tî di têkoşîna xwe de bidin jiyîn, têkoşîna wan weke ronahî ji xwe re esas bigirin.

Belê di van rojên ku em ber bi dawiya meha Gulanê ku meheke pîroz e tên li her derê şerekî giran dimeşe. Dikarim bibînim ku ji bo min jî qonaxeke nû dest pê dike.

Vê gavê bi biryargehê re tever dikim. Lê dixwazim kêliyekê ji beriya kêliyekê biçim yekîneyên şer. Ji ber vê yekê ez bi hevalê Hemze re axifîm. Min got, ez dixwazim biçim yekîneyên şer. Wan jî got ku di cih de nabînin. Ji beriya vê derbarê min de biryar hatibû derxistin, ez ê neketama çalakiyan. Ya din jî hevalê Hemze ji min re got ku ez ê neyêm vesazkirin, bi biryargehê re tevger bikim. Her çendî min bi israr jî got, ez dixwazim biçim yekîneyên şer jî qebûl nekir. Min ferq dikir ku êdî hêdî hêdî ji qada şer dûr têm xistin. Gav bi gav ez ê rê bikirama cebyê paş. Lê baweriya min bi min heye ku ez ê karibim şer bikim. Dîsa, di hindurê min de kîneke wisa heye, wisa dixwazim tolê bistînim, eger ez vê kîna xwe li dijimin nedim der, vê tola xwe ji dijmin nestînim ez ê biteqim û biçim. Ez naxwazim di hindurê xwe de biteqim, dixwazim li beramberê dijmin biteqim. Weke bi tena serê xwe mayîbim, vê psîkolojiyê zêde zêde jiyan dikim. Bêriya hevalên em bi hev re mane dikim. Pêwîstî bi hevalan dibînim ku ez bi wan re biaxifim, bidim û bistînim. Fermandarê me yê biryargehê qet bi min re neaxifî. Hem dema wî ya vala tine, hem jî hemû dema wî bi axaftina cîhazê, bi talîmat û perspektîf dayîna yekîneyên şer derbas dibe. Fermandarê me yê biryargehê timî di tevgerê de ye. Ji ber wê yekê em jî timî digerin. Hin caran xwe bi xwe difikirim ku ti kes naxwaze alîkariya min bide. Dibe ku şaş bim. Lê eger ti kes alîkarî nede jî, divê ez bi xwe alîkarî bidim xwe, timî şehîdan û Serok Apo dihizirim. Dikarim ji wan alîkarî û desteka herî mezin bistînim. Dikarim baweriya xwe bi xwe bînim. Bi vî şiklî dikarim bi awayekî xwediyê îdîa bimeşim û tiştê ez dixwazim bikim demekê ji beriya demekê bînim cih. Divê ez baweriya xwe ya bi xwe wenda nekim. Li ser esasê ku ez ê bi ser bixim bi xwe bawer bikim. Ji bilî vê jî şensa min tine ye. Ji ber ku rêya biserxistinê ji bawerî anîna xwe bi xwe derbas dibe.

**30’ê Gulana 1994’an**

Bi awayekî bê deng min dest bi rojeke nû ya din kir. Di van demên dawî de pir ecz dibim. Pêwîstî pê dibînim bi hin kesan re biaxifim. Naxwazim ji nû ve xwe bi cîhana xwe sînordar bikim. Dorhêl û jiyana heyî weke ku min dehfî nav wê dike, ez di cîhana xwe de bijîm. Bêriya pratîkê dikim. Di demek ku min xwe ji bo pratîkê amade kiriye de, ji pratîkê dûr têm xistin. Heval bi rojan dikevin şer û pevçûnan, bi ser mewziyên dijmin de dimeşin lê ez çalakiyên wan, şer û pevçûnên wan, şehadetên wan li vê derê di cîhazê de guhdar dikim. Çiqas zor û zehmet e. Hin caran ji xwe dikevim gumanê; gelo ez kêrî şer nayêm? Gelo min xwe avêtiye erdê? Ma gelo ji şer ditirsim? Dema ez hin caran li cem fermandarê me yê biryargehê diçim ku li gel yekîneyên şer civîn li dar bixin, dihizirim ku hevalên li wê derê jî şaş li min mêze dikin, ji bo min difikirin ku ez tirsonek, oportonîstek im û ji ber ku ji şer direvim li biryargehê dimînim. Ji ber wê yekê hewl didim nekevim nav wan. Hin caran jî ev fikir dikevin xewnên min jî. Her kes ji min re dibêje “tirsonek, oportonîst” û bi ken bi ser min de dimeşin. Ji dengê wî kenî jî ditirsim. Lê dema şiyar dibim û dibînim xewnek e hinekê bêhna min fireh dibe û xwedana eniya xwe paqij dikim.

Êdî naxwazim li bîryargehê bimînim. Ev nêzîkî mehekê ye ji aliyê ruhî ve, ji aliyê moralê ve xwe pir xerab hîs dikim. Lê demên ku ez li gel hevalên pratîkê dimam timî min hewl dida li ser xwe û zindî bim û moralê bidim hevalan, li cem wan êş, zehmetî, xweşikiyên jiyanê parve bikim. Biharê her der wisa xweşik kiribû, ji ber mijûlbûn û fikirîna li ser xwe bi xwe, weke ku bi qasî van xweşikiyan nabîne kor bûyî xwe hîs dikim. Berevajî divê ev xweşikbûn ji bo mirov bibin çavkaniya îlhamê. Ji bo ji biryargehê derkevim ez ê careke dawî biceribînim ku li gel hevalan biaxifim. Dibe ku min bişînin pratîkê û ji van fikran, ji vê psîkolojiyê xelas bibim. Wê demê ji bo ku van çavdêriyan ji holê rabikim ez ê jî hemû hewldana xwe raber bikim û erkên xwe bînim cih. Tenê bila şensekê bidin bes e.

**27'ê Gulana 1994'an**

Nêzîkî bîst roj in li buroya çapemeniya eyaleta Behdînanê me, cihê xwe di vê saziyê de digirim. Ji ber ku min wêrekiya axifîna li cem fermandarê biryargehê nîşan nedaye, dubare li gel hevalê Hemze axifîm. Min got, ez dixwazim biçim pratîkê. Hinekê jî ez bi bertek axifîm. Lê dîsa di cih de nedîtin. Wan jî ferq kiribûn ku ez psîkolojiya paşdamayînê dijîm. Dixwestin dubare min bixin nav hevalan. Ji ber wê yekê di cih de dîtin ku vesaziya min li çapemeniyê çêbikin. Dema min fêm kir ku dê min neşînin pratîkê min qebûl kir ku biçim çapemeniyê. Hevalê Hemze ji min re got ku ez li wê derê bi taybetî timî analîzên Rêbertiyê bixwînim û li gorî derfetan ji hevalan re alîkarî bikim. Ji min re gotin ku ez xwe ji bo pêşerojê amade bikim û ez şandim çapemeniyê. Hewl tê dan li eyaletê sazîbûn bê pêşxistin. Çapemenî jî yek ji van saziyan e. Ji ber wê yekê pêwîst e giranî bê dan xebatê. Saziya çapemeniyê cihê xwe negirtiye, hê gelek kêmasiyên wê hene. Bi taybetî ji aliyê derfetên teknîkî ve dengasî tên kişandin û hewl tê dan ev jî bên pêşwazîkirin. Eger ev derfet bên afirandin dikare xebateke sîstematîze bê meşandin. Bi qasî ku ez ê li çapemeniyê bimînim ez ê hewl bidim alîkariya hevalan bidim. Dîsa, ez jî difikirim hin xebatan bimeşînim. Ji vê bi şûnde ez ê hewl bidim jiyana xwe plan bikim. Eger ji bo niha naçim qade şer, divê ji aliyekî ve her xwe ji bo şer amade bikim lê ji aliyê din ve xebatên cuda bimeşînim.

Di vê pêvajoya dawiyê de xebatên me ne zêde ne, bi taybetî pirsgirêkên teknîkî xebatê asteng dikin. Bi rastî dikare ev pirsgirêk bên çareserkirin, lê di vê mijarê de hewldaneke zêde ya jor tine ye. Ji aliyekî ve hewl tê dan sazîbûn bê rûnişkandin, ji aliyê din ve pêdivî nayên pêşwazîkirin, derfetên pêwîst nayên afirandin.

Hema bêje hemû heval şaş li sazîbûnê dinêrin. Mêzekirineke wisa ji bo çapemeniyê jî heye. Wey "civata rewşenbîran, cihê ku kesên lewaz û revokên şer diçinê". Ji ber ku wisa tên dîtin hevalên li vê derê jî naxwazin di xebatê de cihê xwe bistînin. Min jî berê bi vê ferasetê li sazîbûnê mêzê dikir, ji ber wê yekê ti car min nedixwest tê de cih bigirim. Lê niha ferq dikim şaş bûme. Ne ku ez ji şer revîme, ti caran jî min xwe neavêt erdê. Di mijara ku ez karibim şer bikim de

baweriya min jî bi min heye. Ji ber ku Partiyê wisa di cih de dîtiyê ji qada şerê germ hatim dûr xistin. Roj ê bê ez ê dîsa cihê xwe bistînim. Wê demê ez ê xwe îsbat bikim. Êdî ez di vê mijarê de rehet im. Bi taybetî axaftinên dawî yên hevalê Hemze bêhna min fireh kir. Bi taybetî berpirsiyarê me yê çapemeniyê ji bo ku vê feraseta li gel hevalan ji holê rabike zêde zêde hewl dida. Xebatên me yên heyî, hemû dane ser milê xwe. Zêde sûda me nagihîje wî. Em hin caran nivîsan ji reşnivîsê derbasî paqijiyê dikin. Dema talîmat hebe em talîmatê çareser dikin. Hemû karên din hevalê Mehmûd dike. Birastî jî li pêşberê vê hewldana hevalê Mehmûd rêz digirim.

Ji ber ku em li çapemeniyê ne em dikarin pêşketinên şer rojane bişopînin. Tektîka şerê bi tevger ku hewl hatiye dayîn îsal
bê meşandin cih bi cih didome. Pratîk bi lez dest pê bû. Hin encamên girîng hatin bidestxistin. Wendahiyên me yên ne di cih de û nehatana dayîn jî bi pêş ket. Gerîla dîsa zagonên şer bin pê kir. Ev jî bi me dide wendakirin. Herî dawî li Gerdiya ji ber binpêkirina quralên gerîla şeş heval şehîd ketin. Heval diçin çalakiyê, tacîz tê lidarxistin, di pey re jî paşde kişan li ser sînor pêk tê. Li nuxteyê nobedar nobedê nagire. Dijmin heya bi hindûrê hevalan diçe. Û heval ferq nakin. Di encamê de şeş wendahî tên dayîn. Ruxmî ewqas hişyarî û talîmatên Rêbertiya Partiyê hê jî ev nêzîkbûna ji derveyê quralan xwe dide jiyîn. Her ku şer mezin dibe dê wendahiyên me zêde bibin. Lê ne rast e ku em wendahiyên di encama şaşitiyên me de bi pêş dikevin jî, li mezinahî û şîdeta şer girêbidin. Teqez divê em şer kirinê û jiyînê bizanin. Nexwe em ê bi destên xwe li ber serkeftinê bibin asteng û derbe lê bidin.

### 16'ê Tîrmeha 1994'an

Dem zû derbas dibe û diçe. Di vê navberê de xebatên me yên çapemeniyê jî hinekê bilez bûn. Dîsa jî em neçar dimînin hin xebatên sînordar bimeşînin.

Hê jî pêwîstiyên teknîkî nehatine pêşwazîkirin. Hevalê Mehmûd her roj planên nû datîne pêşiya me. Lê ji ber pirsgirêkên têknîkî em nikarin van planan pratîze bikin. Dema me ya vala pir e. Em demên xwe yên vala bi piranî yan bi xwendinê û yan jî bi sohbterê derbas dikin. Em hevalên li çapemeniyê hewl didin hinekê hev fêm bikin û

alîkarî bidin hev. Hê fêrî çapemeniyê nebûm. Ji min re biyanî tê. Em bi hevalan re timî li ser şer û hevalên şer dikin diaxifin. Qampa biryargehê jî bi tevger e. Em timî cihê xwe diguherin. Ji ber vê yekê em tiştên çapemeniyê jî bi xwe re dibin. Ji ber ku hêjmara me kêm e em du caran tên û diçin, tiştan wisa dibin.

Ji beriya demeke kurt ji du hevalên li çapemeniyê cihê xwe digirt hevalê Omer derbasî aliyê Botanê bû û hevalê Xêyrî jî çû yekîneya Bircela. Li ser navê wan pir şabûm. Dema ew diçûn pir kêfxweş bûn. Lê pir fêrî wan bibûm û ji aliyê pêşketina wan ve cihê herî dest dayî pratîk e. Dema diçû hevalê Xêyrî got, “êdî rêya te vebû”. Pir li kêfa min hat. Dibe ku min jî bişînin pratîkê. Ji ber wê yekê divê ez timî amade bim.

Îro hevalên ji Bircela hatine, ji hevalê Xêyrî ji bo min notek anîn. Dema min xwend bi rastî jî pir kêfxweş bûm. Wê gavê mirovê herî bextewar ê cîhanê ez bûm. Ti tişt bi qasî tiştê ku hevalek ji hevalekî/ê re dinivsîne ne xweş û bi qîmet e. Ev helwesta ku maneya wê ji bo min pir mezin bû bi gotina ‘heval’ dest pê dikir:

“Heval
Serê sibeyekê
Hevalê min, ez û tu
Em bi hev re qedehek çay, yek jî cixare
Ez bi wê evîna xwe
Ne di mucîzeyan de, ne jî di mirinê de
Ne li bihuştê, ne jî li cenemê
Lê di wê rojê de
Ew kêliya
Ku dawî li xeyalan tê
Lê xeyalên herî baş pêk tên
Dilên egîd yek jê tu
Hey hevalo yê din jî ez li cem te
Wê rojê di wê hevdîtina bihuştî de
Dixwaze bila li ber dijunên neyar be
Dixwaze bila li ber tufana çepikan be
Heval hevalên xwe naynin şermê

Bi egîdiya me ku em pê soz didin
Bi dirustiya bihevrebûna me û wê hevdîtina me
Ku baweriya me pê heyî
Dewran dizivire, dema wê tê
Wê demê kêfxweş dibim, heval!
Kêliya ku em ji govenda me re dubare dibêjin merhaba!
*
*

Li eyaleta me ji aliyê pêngavên tektîkî ve xetimînek te jiyankirin. Dijmin hemû girên stratejîk bi hêzeke mezin girtiye. Wî jî li beranberê tabûrên me yên bi tevger tabûrên bi tevger çêkirine. Timî bi tevger e. Hevalan tengav dikin. Dijmin di perpitîna xwe ya dawî de giranî dide hejmarê dixwaze tevgera me ya li herêmê sînordar bike. Me hê jî nekariye derbeyên tên xwestin li dijmin bidin. Şert e ku xetimîna di pratîkê de tê jiyîn bê derbaskirin. Û pêwîst e mirov bi pêngaveke mezin dest bi hemleya payîzê bike.

Ez ê ji vê bi şûn de hê cidî xwe bidim kar û xebatê; bi rêgez, bi disîplîn, kamil û bi sebir tevbigerim. Ji ber wê yekê jî ez ê bi kêmasiyên xwe re şer bikim û guherîna pêwîst li cem xwe pêk bînim. Eger ez bixwazim û xwe bidimê dikarim gelek tiştan bi ser bixim. Di vê mijarê de baweriya min bi min heye. Pêwîst e ji bo hin tiştan destpêkeke nû bikim û xwe ji bo nûbûnan vekim û tiştên nû nû bi ser bixim.

**21'ê Tîrmehê 1994'an**

Xetîmina tektîkî ku di giştiyê eyaletê de tê jiyankirin bandorên xwe li ser giştiyê şerê me jî dide der. Di hindure welêt de dijmin operasyonên bihêz li dar dixe. Ji bo ku hêza me ya şer nexe hindur, giraniya xwe didê. Bi taybetî operasyonên dawî yên Oramar û Çarçela heval pir hincirandin û westandin. Xetimîna ji aliyê tektîkî ve tê jiyankirin, divê kêliyekê ji beriya kêliyekê bê derbaskirin nexwe ber bi tasfiyeyê ve diçe. Ev jî rewşek ku hemû planên me têk biçine.

Dema mirov ne di nav şer de be, ji şer dûr be, pir serasera nêzîkî şer dibe. Bi taybetî li cem gelek hevalên biryargehê ev xwe dide der. Hevalên li qampê ji şer dûr in. Ji ber neyiniyên şer di cih de dikevin

panîkê. Heta hin jê tirsê jî jiyan dikin. Dema hate gotin ku li ser sînor dê operasyon bi pêş bikeve, piraniya qampê tevlîhevaiyeke mezin jiyan kir, di cih de terka nuxteya biryargehê hate dayîn. Lê ev panîk, ji aliyê psîkolijîk ve li ser hevalan pir bandor dike. Hin caran di ser me re balafirên şer derbas dibin. Jixwe timî qadê kişf dikin. Hin kes weke ku bixwazibin bi zanebûn panîk û tirsê bixin nav hevalan. Tiştên ne rast ên weke "dê bi misogerî sibê li me bidin" dibêjin. Ev di aliyê neyînî de li ser psîkolojiya hevalan bandor dike. Lê eger em tedbîrên xwe bistînin çiqas lê dide bila lê bide em ê ti zererê nebînin. Mînak, qampa me ya niha li berambere êrîşên balafiran ne xwediyê ti tedbîreke parastinê ye. Ne sixinaqeke me û ne jî mewziyeke me ya hatiye diyarkirin heye. Bi sererastî hevalên tepeçî jî tine ne. Ruxmî ku ev ji vê rewşê rêveberî jî hatiye agahdarkirin, rêveberî ti tedbîr bi pêş naxe.

Lê di qada şer de, li qada pratîkê li beramberê dijmin mirov hê rehetir e. Bi qasî bê gotin tine dudilî û fikar kêm in. Mirov timî li ser şer kûr dibe, difikire; hewl dide lewaziyên dijmin peyda bike, dijmin li cihê wî dişopînî û li gorî wê terza tevgera xwe diyar dike. Timî moral, coş û kelecan heye. Bi taybetî jî dema çalakî jî li dar bixî, xweşikiyên jiyana pratîkî pir cuda ye.

Hemû sedema tiştên neyînî xetimîna ji aliyê tektîkî ve ye. Bi rastî jî divê em bi derketineke bihêz vê xetimînê derbas bikin. KT'ya ku ji aliyê dîplomatîk û leşkerî ve nederekê [çılmaz] jiyan dike, eger ji aliyê leşkerî vê derbeyên mezin bigire li beramberê têkoşîna me nikare zêde xwe ragire. Divê em li beramberê vê perpitîna wî ya dawî bi hemleyeke bihêz bersivê bidin, xetimînê derbas bikin û şer hê jî bi pêş bixin.

### 30'ê Tîrmeha 1994'an

Bîst û şeşê mehê bû, pêkhateya me ya ku ji yekeyên çapamenî, lojîstîk û ewlekariyê pêk dihatin li qampê bûn. Ji beriya vê li qampê perwerdeya qadro jî hebû. Lê ji beriya hefteyekê hevalên perwerdeya qadro, bi vesaziya hatiye çêkirin li ser qadan belav bûn. Li cem hemû hevalên li qampê mabûn sistbûneke mezin hebû. Fermandarê me yê biryargehê jî çûbû cihê vesaziyê. Em êdî ranedibûn îştimayê jî, me

xwarina xwe jî di dema wê de nedixwar. Li qampê sîstem nemayîbû. Tenê yê ku hewl dida û dixwest sîstemê bide rûnişkandin hevalê Mehmûd bû. Lê ew jî bi tena serê xwe têrê nedikir. Dîsa, hin heval bi hezar zehmetiyê rabûn îştimayê, piştî îştimayê piraniya hevalan dubare razan. Min lîsta nobedê derxist û piştî ku bi hevalê Mehmûd da qontrolkirin û nobedar şand cihê nobedê, derbasî cihê çapemeniyê bûm û min xwe dirêj kir.

Qampa me li gundekî kevn ê Başur bû. Li berambere me qereqolên PDK'ê hebûn. Hema li biniya me Avaşîn derbas dibû. Saet nêzîkî 7'ê danê sibeyê dibû, ji nişka ve dest pê kir dengê balafiran bê. Destpêkê min texmîn nedikir ku tiştek biqewime. Em ji cihê xwe neleqîn. Bi dengê duyemîn re balafiran dest pê kir nizm bifirin. Rewş vê carê cidî bû.

Em li cihê çapemeniyê sê kes bûn. Ez, Avareş û Delîl... Tam em ê birevîna ber bi cihê ewlekariyê, balafirê bombeya xwe ya destpêkê berda nîvenga qampê. Ji ber vê yekê min û Avareş, me xwe xiste bin berê li cem mangaya çapemeniyê. Êdî balafiran her xwe nizim dikir û di ser me re difiriyan. Wisa nizm difiriyan te digo qey, dengê wan perikê guhe me dê biteqanda. Bombeyên wan tenê li qadeke 100 metro çargoşe diket. Jixwe qampa me hema hema ewqas hebû. Bîst deqîqe bêyî ku bisekinin li cihên mangayên me dan. Bombeyên qazan di ser me re derbas dibûn. Berê ku em di bin de bûn ruxmî ne mezin bû dikariya me biparêze.

Piştî ku her bombe tê berdan, li Avareş dinêrim, reng lê çûye; zer dibû. Min jî heman rewş jiyan dikir. Bi rastî jî pir zehmet e û mirov nikare qebûl bike. Tu di bin beran de yî, dijmin bi balafiran, bi bobeyan li te dide, hem jî pir bi rehetî. Bombeyên balafiran xelas bûn, tiştek bi me nehatibû. Ya herî zehmet niha dest pê dikir. Vê carê balafiran dest pê kir gule li me bireşînin. Guleyên A-4 û A-6'ê weke ax û xaliyê di ser me re derbas dibûn. Hin guleyan berê me dişermixandin û derbas dibûn.

Êdî balafirê cara dawî xwe nizm kir, di wê kêliyê de di hindurê xwe de min tiştên pir cuda hîs kirin. Fikra min çû ser Bestayê. Heman balafiran li Bestayê Cewahîrê min şehîd xistibûn. Bi Cewahîr hizirîm. Êşekê xwe berda dilê min. Di wê kêliyê de ji nişka ve kamaxa min û zendê min ê rastê wisa germ bûn, weke şewitîbim. Min destê xwe yê

çepê li destê xwe yê rastê û kamaxa xwe da, pê nehesîm. Ji nişka ve min xwe bê zênd û bê kemax hîs kir. Min li destê xwe mêze kir xwin hebû. Min dubare destê xwe li kemax û zendê xwe da, bi rastî jî xwîn hebû. Xwîn, sora tam sor bû. Avareş got ku tiştekî min tine ye. Hebûya me dê çi bikirana, em hema wisa man sekinîn. Balafirê reşandina guleyan xelas kiribû. Balafir jî çûn. Me dizanî dê dubare bihatana. Ji bo bombe û gule bigirin çûbûn. Em ji cihê xwe derketin. Qampa me di nav toz û dumanê de mabû. Ji nişka ve hevalê Delîl got, "heval ez jî birîndar bûme. Ew jî birîndar bibû. Hevalê Loqman hate cem me. Di qampa me de bêdengiyek ku tirs dixist dilê mirov hebû.

Behna barûde ketibû her derê. Agir û pêtê giyayên di nava qampê de xwe li azmanan dida. Ji beriya ku balafir bihatana diviyabû me xwe berdana dola jêr. Di cih de em ber bi dolê ve beziyan. Di vê navberê de êşa kamax û zendê min xwe da der jî. Em hatin cihêkî guncaw û di cih de me li birîna Delîl mêze kir. Parçeyekî, guzeka destê wî şermixandibû û birîneke kûr vekiribû. Me di cih de bi şûtikê baş pêçand. Piştre min gomlekê xwe derxist. Di zendê min ê rastê de parçeyekî biçûk di nava goş de venîştibû. Sê parçeyên biçûk jî li kamaxa min ketibûn. Ne cidî bû. Tenê hinekê diêşiya. Paşê dema me dît balafir nayên, em dubare çûn qampê. Li cihê hemû mangayan dayibûn. Cihê hevalên jin, cihê mitfaq û ewlekariyê rast kiribûn. Li holê ti kes xuya nedikir.

Di cih de me berê xwe da şikêra li cem ewlekariyê û meşiyan. Hema li ber keviran du cenazeyên di nav xwînê de mabûn hebûn. Hema min xwest bataniyeyên li ser cenazeyan rabikim, hevalê Avareş ji zendê min girt. Destûr neda ku ez vebikim. Yek jê hevaleke jin bû, ji pora wê xuya bû. Baş e, yê din kî bû? paşê Ernestoyê êxtiyar ê berpirsiyarê ewlekariyê hat. Got ku yek hevalê Mehmûd e û ya din jî hevala Dîcle ye. Dîsa li aliyê din hê jî pênc hevalên birîndar hebûn. Rewşa hemûyan pir cidî bû. Lingê hinekan qut bibû. Me çend hevalan dest pê kir em ji bo du hevalên şehîd gor bikolin. Ji bo ku hevalên birîndar ên din bibin cihekî din me dest bi amadekariyê kir. Dema min gor dikola min bi hemû hêza xwe li erdê dida, dibe ku min dixwest êşa xwe, tola xwe ji axê bistînim. Me dest pê kir em hinekê

bikolin, balafiran dest pê kir dubare dubare bifirin. Di cih de me xwe avêt bin berên şikêra cem ewlekariyê. Teht qederekê bi ewle bûn.

Balafirên hatine piştî ku bombe barandin hemû qampê û hemû qamp dan ber gulebaranê bi şûnde çûn. Vê carê ji ber ku me cihekî saxlem girtibû, tiştek bi me nehat. Tenê guhe min wisa lê hatibûn ku ji ber dengê bombeyan weke ker bîbûm lê hatibûn. Destpêkê me bataniyeya ser hevalê Mehmûd rakir. Laşê wî ji aliyê parçeyê bombeyan ve hatibû parçe kirin. Dema tava li rihên wî yên spî ji nişka ve rihên wî biriqîn. Di nava gola xwîna sor de dirêjkirî bû. Me di cih de girte nav baraniyê, wisa bi xweşikî li bariyê aland û piştre me spart axê. Di pey re me hevala jin ku di nav xwînê de dirêj kirî bû rakir, bi xweşikî baranî lê pêçand û piştî wê ew jî me spart axê. Weke bûyî di cihê xwe de rûniştim û di nava bêhna barûdê de min cixareyek pêxist. Weke ku hişê min çûbûn. Hevalên min ên ku kêliyekê ji beriya vê li cem min bûn, parçe parçe bibûn.

Gelo hevalê Cewahîr jî wisa parçe parçe bibû? Ma zend û lingên wî jî qut bibûn? Xwaziya min nedîtiba. Piştî wê rojê qet ji ber çavê min naçin.

Piştî ku me hevalên şehîd veşartin ji hevalên birîndar du hevalên din jî şehîd bûn. Heya bi êvarê me hemû tiştê xwe yên li qampê kom kirin. Me ji bo hevalên birîndar darbest çêkir. Hevalên li naxweşxaneyê jî hatin cem me. Hevalên birîndar heya bi nexweşxaneyê rakirin. Êvarê em û hevalên mayîne jî me barî qampa nexweşxaneyê kir.

Ez vê êrîşê weke serkeftineke dijmin be nafikirim. Me ji ber bêtedbîriyê û di encama xwe razandina mirinê de evqas wendahî dan. Balafiran ji berê de kişf kirin, ji tepeyê hemberê PDK timî me dişopîne. Gundiyên ji Başur bi bahaneya anîna erzaq dikevin nav qampê. Û agahiyên ji vê derê wergirtine didan dijmin. Eger ne wisa bûya dijmin nedikariya mangayan ewqas bi îsabet bike hedef û lê bide. Li beramberê vê jî tedbîreke me ya herî biçûk jî tine bû. Jixwe çi hatiye serê me ji ber bê quraliya me, kêfiyeta me û pir hezkirina me ya ji rehetî dihat. Dijmin diyar kir ku wendahiyên me yên li qampê heftê û heşt in. Eger hevalên perwerdeyê ji ber vesaziyê ji qampê derneketana dibe ku ev encam rast bûna. Cara destpêkê dijmin

di êrîşên xwe yên balafiran de wisa bi îsabet lêdida. Ez cara destpêkê dibûm şahidê tiştekî wisa. Dihate maneyê ku îstihbareteke pir xurt stendibû.

Rêbertiya me ya Partiyê her roj rê û perspektîfên rast pêşkeşî me dike, talîmat li ser talîmatê dide me. Lê em hê jî paşverûtî û fêrbûnên xwe yên berê didomînin. Û di encamê de yên wenda dikin dibin em. Wendahiyên me bi me jî sînordar namînin, zererê didin Partî, gel û mirovahiyê jî. Bi misogerî divê em hemû, li ser van kêmasiyên xwe bisekinin. Divê em kêtîbûnê, quralsiziyê û bêtedbîriyê di demeke herî kurt de derbas bikin.

Hevalê Mehmûd ku di êrîşa dijmin de şehîd bibû, berpirsiyarê çapemeniyê bû, di heman demê de di rêveberiya biryargehê de jî cihê xwe distend. Hevalekî pir kevn bû. Ji dema îdeolojîk ve li gel Partiyê di têkiliyê de bû. Di sala 1985'an de dîl ketibû destê dijmin, di sala 1987'an de ji zindanê derketibû û bi awayekî aktîf tevlî têkoşînê bibû. Bi rastî jî hevalekî kedkar bû. Bêyî ku ji Partiyê tiştekî hêvî bike, diçû ser her karî. Min ti kesê weke wî kedkar û xwediyê sebr nedît. Karê xwe bi awayekî herî baş dikir. Hin caran heya bi sibeyê nediraza. Timî dixebitî. Hin caran bi tena serê xwe derûdora hemû qampê qontrol dikir, dixwest jê piştrast be ku tiştek heye yan na. Ruxmî ku temenê wî zêde bû pir ciwan û dînamîk bû, tije bi enerjî bû. Hevalê Mehmûd şehadeteke wisa heq nekiribû, diviyabû ne bi vî şiklî şehîd bibûya. Ji ber ku wî, ji bo ku şaşitî neke pir hewl dida.

Divê em ji kêmasiyên xwe ders derxin û bên ser rêya rast, bi vî awayî bîranînên şehîdan bidin jiyîn.

**10'ê Tebaxa 1994'an**

Piştî ku qampa me hate bombebaran kirin me qampa xwe bir Şikefta Birîndara ku di navbera Bircela û Zapê de bû. Hemû hevalên li qampê ji bombebaranê pir bandor bibûn. Ez jî pir bandor bibûm. Berê jî qampên me hatin bombebaran kirin. Di pratîkê de gelek caran balafiran ji sibeyê heya bi êvarê bombe dibarandin ser me. Lê nekarîbûn ti zererê bidine me. Ji ber wê yekê ez li beramberê êrîşên balafiran pir rehet bûm. Lê ve carê zerereke mezin dan me. Bi taybetî

zend û lingên qutbûyî yên hevalê Mehmûd û Dîcle qet ji ber çavên min nediçûn.

Wisa li min hatibû, êdî bi şevê jî dihate xewna min. Bi taybetî jî bi êrîşa balafiran şehîdbûna hevalê Cewahîr jî ez hê jî dîn dikirim. Laşê wî jî dihate ber çavê min, gelo zendên wî yên wisa zirav, qut bibûn? Kîna min wisa zêde bibû, eger ji dijmin tiştek bi deste min biketa min ê parçe parçe bikira. Bi hêrsekî wisa ya tolhildanê ve nikarim di cihê xwe de bitebitim. Eger firsendek bikeve destê min wê demê ji bo ku tola xwe bistînim ez dixwazim bi dijimin ve wisa biteqim, dema biteqim bila parçeyên min bi dijmin ve biteqin. Divê sebir bikim, rojekê de ev firsend bikeve destê min. Wê demê, ez ê ji wan hesabê wan bombeyan bipirsim. Ez ê ji wan berdêlê xwîna ku me daye bistînim.

Piştî şehadeta hevalê Mehmûd ji bo bibin layiqê wî, me di navbera xwe de biryara sazîbûna çapemeniyê da û dest bi xebatên xwe kir. Me tiştên çapemeniyê yên belav bûne dubare komî ser hev kir û hemû anîn Bircela. Ji beriya du rojan ji bo em tiştê xwe bînin em bi hevalan re çûn Bircelayê. Yekîneya di navberê de, malzemeyên me girtibûn saxlemiyê. Ji ber wê yekê me jî ji cihê hatiye veşartin dernexist. Dema ku pêwîstiya me pê hebûya em ê bihatana û bigirtana. Li şûna tiştên çapemeniyê me ji qampê cebilxane anî. Li ber tava sincirî me xwe gihand qampê. Barê me hinekê giran bû. Ya din jî dema li ser vê têhna tava sincirî jî zêde dibû, ji her derê me xuhdan diherikiya.

Piştî ku me barê xwe danî em çûn ser kaniya qampa me ya ku ava wê weke qeşayê bû. Ji beriya her tiştî me ew ava sar li serê xwe kir û piştre jî me têra xwe jê vexwar. Lê nekarîbû westabûna me bibe. Encax dikarîbû cixareyeke stûr û çayeke tarî westabûna me bibe. Me di cih de çaydanê xwe li cem xwe tije av kir. Dema em bi rêketibûn me çaydanê xwe bi xwe re biribû. Me agirekî bêdûman pêxist û çaydanê xwe danî ser agir. Dema çaya me dest bi germbûnê dikir, bi hevalê Tayhan re me dest bi sohbeteke kûr kir. Mirov ji sohbeta wî jî têr nedibû. Hin caran giliyên xwe dikirin. Di van rojên dawî de bi me hemûyan re helwesteke wisa bi pêş ketiye. Hesreta xwe ya derketina pratîkê dianî ziman: “hevalê Mordem, eger rojekê şehîd bikevim,

heyfa min bi ti tiştî nayê, eger di binê van beran de şehîd bim heyfa min bi wê tê”. Heqê wî hebû mirov naxwaze di binê beran de şehîd bibe. Dema ku aliyekî di dest de çek di şerê li dijî dijmin de şehîd ketin heye, ev awayê din bi taybetî ji bo şervanekî/ê azadiyê pir zehmet e.

Di vê navbera de hevalê Azad ji me re çaya tarî çêkiribû jî. Li cem vê sohbeta kûr, çayeke tarî pir baş bû; heval qedehên me yên laylon bi çaya tarî tije kir. Di ber sohbetê re çay pir baş bû. Bi her qurta ku min ji çayê vedixwar hineke din westabûna min kêm dibû.

Gava ku sohbeta me tam kûr bû, ji hevalên arşîvê hevala Dîcle hate cem me. Me qedehek tije çay kir da wê jî. Ji me pirsî ku em westiyane yan na, me jî diyar kir ku em westiyane. Hevala Dîcle jî hêdî hêdî tevlî sohbeta me bû. Piştî kêliyekê got, “heval, hûn kengî diçin?”. Diçim ku derê ez jî nizanim. Ji ber wê yekê hinekê hizirîm. Piştre min got, kengî diçim, diçim ku derê? Li ser vê yekê hem kenî û hem jî got, “weke agahiya te jê tine tevnegere, tu dizanî tê biçe ku derê”. Misoger bû ku vê hevalê hin tişt bihistibûn. Lê bi rastî jî hê min fêm nekiribû heval dixwaze bêje çi. Min got, heval em westîne dev ji van pirsan berde û em weke berê çaya xwe vexwun û sohbeta xwe bidomînin. Li ser vê yekê hevala jin fêm kir, agahiya min ji ti tiştî tine ye û dest bi axaftinê kir; “temam, min fêm kir agahiya te tine ye, eger wisa be ez ji te re bêjim, diçî Başur”. Min got, kîjan Başur, kê got. Wê jî got, “hûn diçin Başurê Biçûk [Rojava], qada Rêbertiyê. Hem jî grûb amade ne”. Bawer im vê hevalê hanek dikir. Yanî ez ê biçim qada Rêbertiyê! Ka ew şensa ku li min bide, hem jî ez bawer nakim heval niha biçin vê qadê jî. Min bawer nekir, dema ku wê bi israr axaftina xwe didomand hewl dida min bide bawer kirin. Li ser vê yekê min go, dibe ku ev dîsa agahiya ‘cîhaza mezin be’, ji ber ku vê biharê ji ‘cîhaza mezin’ hevalan agahî didan min. Ji ber wê yekê min bawer nekir.

Li cihê em mane, me sohbeta xwe domand. Lê ev heval wisa ji xwe bawer diaxifiya, gava me sohbet dikir timî hişê min diçû ser gotinên wê. Paşê min ji xwe re go, lê eger rast be. Wê şevê xew bi çavê min neket. Di singa azmanan de Rêya Kadizê weke ewrekê spî dikir. min hêyva nû derketî temaşe kir. Çûm cîhana stêrkan. Li wê

derê hizirîm. Di nav stêrkan de weke ku min Serok Apo didît. Heya bi sibeyê ez li ber dîmena stêrkan bi nav xeyalan ketim. Çûm qade Rêbertiyê. Rêbertî wisa li pêşberê me sekinîbû. Ew diaxifî min guhdar dikir. Heya bi sibeyê di nav stêrkan de Serok axifî û min jî guhdar kir. Dema di nav re hin caran wisa dikeniya jî hê jî kêfxweştir dibûm.

Dibe ku li cîhanê, herî zêde ken li Serok dihat. Bi tîrêjên destpêkê yên tavê re, ji cîhana stêrkan veqetîm. Bi rastî jî rêwitiya bi nav cîhana xeyalan de pir xweş bû. Cara yekemîn bû derdiketim vê rêwitiya xeyalan. Dema bû sibe, hê nerazayîbûm. Piştî îştimayê me taşteya xwe xwar. Eger gotina hevalan nerast bûya jî, min îşev hemû li qada Rêbertiyê di nava stêrkan de derbas kiribû. Tenê ev jî, ji bo min bes bû.

Dema me xebata xwe bi rêve dibir hevalê Hemze hate cem me. Piştî ku hinêkê axifî rabû. Li min mêze kir û got, “ka bi min re bê em hinekê biaxifin”. Bi kelecan ji cihê xwe rabûm. Min heya bi rêveberiyê ew şopand. Em rûniştin. Piştî ku li min nêrî,keniya û ot, “bawer im te bihîstiye, piştî demeke pir kurt tevî grûbeke biçûk hûn ê biçin qada Rêbertiyê”. Her çendî min tiştek negot jî wisa kêfxweş bûm, nikarim bînim ziman.

Hevalê Hemze paşê li ser Serok axifî. Di mijara ku ez ê çi tiştan dîqet bikim de ez hişyar kirim û got, “di demeke pir nêzîk de qurye dê werin û hûn ê biçin”. Piştî ku hinekê axifî, got ku eger bixwazim dikarim paşê jî biaxifim yan jî hin tiştên meraq dikim hebin dikarim bipirsim. Li ser vê yekê hema ez ji rêveberiyê derketim. Ji kêfxweşiyan min nedizanî ku ez diçim ku derê û çi dikim. Pir bextewar bûm. Paşê çûm sixinaqa me û hinekê hizirîm. Ev ji bo min firsendeke mezin bû. Diviyabû min ev firsenda dîrokî bi awayekî herî baş binirxanda. Û ji her aliyê ve xwe bihêz bikira. Di kêliya destpêkê de min ev fikirîn. Bawer im, ez ê ji aliyê xwe ve vê firsendê binirxînim. Ez ê ji her aliyê ve xwe bînim asta milîtanekî baş ê Partiyê û bi vî awayî bibim layiqê Rêbertî û şehîdan.

## Beşa Duyemîn

# Û Li Ber Ronahiya Tavaheyvê Ber Bi Qada Rêbertiyê...

**26'ê Tebaxa 1994'an**

Em vê gavê li Heftenînê ne. Piştî rêwitiyeke dûr û dirêj me karîbû xwe bigihînin biryargeha Heftenînê. Bi rastî jî ez li aliyê Botanê me. Em di 18'ê mehê de ji qampa Şkefta Birîndara bi rê ketin. Ji beriya ku em bi rê bikevin hemû hevalan nêrîn û perspektîfên xwe pêşkeşî min kirin. Min jî hemû bi baldarî guhdar dikir. Bi taybetî hevalên berê çûbûn qada Rêbertiyê, li ser mijara ku em ê li wê derê hişyariya çi tiştî bikin agahî didan me. Hema hemû hevalan digot ku divê ez ji vê firsendê sûd wergirim û xwe bi pêş bixim. Hin hevalan jî digot, "pir bi şens î". Gelo bi rasatî jî ez wisa bûm? Ma ez pir bi şens im? Berevajî, timî ji bêşensbûnê bêzar bûm û min gilî û gazincên xwe dikir. Dihate fêmkirin ku ez şaş bûme. Eger wisa be ez ê vê şensa xwe baş bi kar bînim. Ez ê li wê qadê ji aliyê îdeolojîk-polîtîk ve xwe bi pêş bixim û ji aliyê Partîbûnê ve gavên mezin biavêjim.

Em ji qadê heft heval ji bo qada Rêbertiyê hatin. Pênc hevalên jin û hevalê Xelit ku salên dûr û dirêj ked dayibû. Dîsa, hevalê Şahîn heya bi Botanê bi me re hat. Hevalê Şahîn di sala 1980'an de pêlî mayînê kiribû û çavên wî texrîb bibûn. Çavên wî pir kêm didîtin.

Roja ku em ê bi rê biketana hemû heval ketin rêza îştimayê. Me yek bi yek ji hemû hevalan xatir xwest. Piştî ku me soz da hevalan em ê xwe bihêz bikin, em bi rê ketin. Grûba quryeyan dê em heya bi Metînayê bibirana.

Hemû meşa me bi şevê û li ber tava hêyvê bû. Tava hêyvê herî zêde bi kêrî hevalê Şahîn dihat. Dikarîbû hê rehet bimeşe.

Meşa me heya bi Metînayê bi moral û coşeke mezin derbas bû. Tava hêyvê ji bo hevalê Şahîn dibû çav û ji bo me jî rêwîtiya me romantîktir dikir. Ruxmî ku em bi şevê bi rê ketin dîsa jî pir xweş bû. Heya em çûn Metînayê bi daran ve me fêkî nehîştin. Ji kelecan û kêfxweşiyê me nedizanî em çawa dimeşin. Hemû heval pir kêfxweş bûn.

Piştî ku em li Metînayê du rojan man bi grûbeke sê kesî ya quryeyan em ber bi Heftenînê bi rê ketin. Rêwîtiya me bi kêfxweşî û kelecan derbas bû. Em beriya du rojan hatin vê derê. Bi rê de herî zêde bala min araziya vê derê kişandibû. Her ku mirov ji Behedînanê ber be Botanê dihat asêbûna araziyê nedima. Lê şerê ku li Botanê hatiye rûnîşkandin hê nekariye li vê derê bê rûnişkandin. Bi rastî jî eger araziya Behdînanê bê nirxandin dikare li wê derê artêş bên bi cihkirin. Derbeyên herî mezin li dijmin bên dayîn. Li gelek girên Heftanînê doçqe hatine danîn. Dijmin nikare li van deran bi rehetî êrîşan pêk bîne. Lê ji şerê îxanetê şûnde li gelek tepeyan jî ji nû ve doçqe nehatine danîn. Ruxmî ku doçqeyên me jî hene... Eger li wan çiyayên bilind doçqe bên danîn ma wisa hêsan e dijmin bê bombe bibarîne ser qampa me û çar hevalên me şehîd bixe!

Niha, em li bendê ne ku qurye bên. Dema qurye hatin em sînor qut bikin û biçin qada Rêbertî. Em bi kelecan li benda quryeyan in. Di kêliya dawî de jî ditirsim astengiyek derkeve. Bi taybetî dema li cem hevalê Xalîd diaxifim ew dibêje “heya ku ez negihîjim qada Rêbertiyê, astengiyên her keliyê derkevin dihesibînim. Ji ber wê yekê ji bo her îhtimalê xwe amade dikim”. Belê, divê mirov hesabê wê bike, dibe ku her tişt bi pêş bikeve. Lê piştî ku mirov heya bi vê derê hat eger astengiyek derkeve ji mirinê xerabtir li mirov tê.

Ji bo derketina ti astengiyan ji me ti kes ne amade ye. Lê hevalê Xalid ezmûn û ceribandinê xwe yên dema derbas bûyî jî li ber çav

digire û diyar dike ku bi her awayî astengiyê li ber çav digire û li gorî wê xwe amade dike.

Mimkun e her tişt biqewime, di şer de dibe ku her tişt biqewime. Lê dîsa jî di hindurê min de hîseke wisa heye dê ti tişt bi pêş nekeve. Ev jî kêm be jî min bêhna min fireh dike. Ji bo min qada Rêbertiyê xwediyê maneyeke cuda ye.

Tam ji beriya vê çar sal beriya Kongreya 4. hevalê Cewahîr jî ji Behdînanê derbasî Heftanînê bibû û hatibû qada Rêbertiyê. Niha jî piştî çar salan ez ji Behdînanê derbasî Heftanînê dibim û têm qada Rêbertiyê. Tesadufeke mezin e. Helbet ji vî aliyî ve ji bo min maneya wê pir mezin e. Dîtina Serok Apo pir tiştekî cuda ye. Heval timî li ser diaxifîn, çavdêriyên xwe vedigotin. Mirov ji vegotinan jî pir bi bandor dibe. Lê ez ê piştî çend rojan bi çavên xwe Rêbertiyê bibînim, biçim cem wî. Gelo ez ê karibim li pêşberê wî mirovê mezin weke şervanekî bisekim? Ya din jî eger Serok ji min re bêje, “we çi bi ser xist”, ez ê çi bersivê bidimê? Me çi tişt bi ser xistiye, em ê bi kîjan serkeftinên xwe derkevin pêşberî Serok? Lê di vê rewşê de em ê nikaribin weke xwediyê serketinekê, derkevin pêşberê Serokatiyê.

Pir bi kelecan im. Em bi bêsebirbûneke mezin li benda Serokatiyê ne.

**8’ê Îlona 1994’an**

Em 5’ê Îlonê ji Heftanînê bi rê ketin. Bi erebeyê hatin Derkarê. Em li wê derê bi grûba Dêrisimê re gihan hev. Ev grûb de biçûna qada Rêbertiyê. Ji Dêrsimê heya bi Heftenînê meşeke dirêj li dar xistibûn. Bi rê de hin caran li operasyonan eliqîbûn, hin caran jî ketibûn şer û di du mehan de karîbûn ji Dêrsimê bên Heftanînê. Donzde heval bûn. Bi rastî destpêkê sênzde heval bûne lê belê dema ku xwe gihandine Çiyayê Pîro bi êrîşa helîqopterê re rû bi rû mane. Di encamê de hevalek şehîd dibe. Bi rastî mirov pir bi ber wê/î hevalê dikeve. Piştî ewqas hewldaneke mezin, ya din jî dema mirov digihîje dawiya rê şehîd bûn bêşensiyeke mezin e.

Ber bi êvarê ve me ji Derkarê bi erebeyan tevger kir. Em derbasî Zaxo bûn û hatin ber Ava Dîcle. Em hemû ji erebeyan peya bûn. Me dê Dîcle qut bikirana. Du motor hebûn. Grûb bi grûb em li motoran

siwar bûn. Pir bi kelecan bûm û dilê min dikere tirpetirp. Ji avê pir ditirsîm. Min melevanî nedizanî. Bi tirs li motorê siwar bûm. Motorê dest pê kir bixebite, bi lez ber bi aliyê din ve bi rê ket.

Tam em hatibûn nîvenga Ava Dîcle motora me sekinî. Benzina motorê xelas bibû. Ma dema wê bû?

Ketim nav fikar û panîkeke mezin. Di nîvenga Dîcleyê de wisa sekinîn ne tiştekî baş bû. Paşê motora din gihaşt hewara me. Me karîbû bi awayekî saxlem bigihîjin wî milî avê.

Êdî dinya bibû tarî. Çav çavan nedidît. Jixwe sedem jî ew bû ku em li Heftenînê hinekê sekinîbûn, tava hêyvê bû. Em li bendê sekinîn da ku tava hêyvê xelas bibe. Ji ber ku diviyabû me sînor di tariyê de qut bikira. Em hêdî hêdî bi rê ketin; li deşta rip û rast dimeşin. Quryeyên me pir hişyar in. Dibe ku kemîn hebe. Ji ber wê yekê divê mirov pir hişyar be.

Her der bêdeng e û şev ting û tarî ye.

Ji nişka ve quryeyên me xwe avêtin erdê. Dema wan xwe avêt erdê me jî xwe avêt erdê. Bêşensiyeke çi mezin e. Ne cihekî ku mirov weke mewzî bigire û ne jî cihekî xwe lê biparêze heye, her der rip û rast e. Dema em li bendê bûn ku çek biteqin, quryeyên me dubare rabûn ser lingan. Tu nabêjî em ketine kemîna gurekî. Gurekî karîbû bîst û pênc şervanan bixe kemînê. Piştre gur ji kemîna xwe dest berda, tirsiya, revî û çû. Em jî bi awayekî hê hişyar bi rêya xwe de çûn. Bawer im li deştên wisa ketin kemînê ji mirinê xerabtir e.

Meşa li araziya rast qederekê mirov diwestîne. Hêdî hêdî em nêzîkî sînor dibin. Em ê di navbera du qereqolan re derbas bin. Ronahiyên qereqol her aliyî ronahî dike. Qurye li pêş û em jî li pey wan bi awayekî bêdeng dimeşin. Dema em gavên xwe diavêjin dîqet dikin da ku deng dernekeve. Em di biniya qereqolê û di mewziyên vala yên dijmin re derbas bûn û bi lez ji wê derê bi dûr ketin, hatin gundekî li ser sînor. Hevalan ji wê derê bi erebeyê em birin gundekî welatparêz. Em pir westîbûn.

Welatparêzan qederekê baş em pêşwazî kirin. Nirxeke mezin didan gerîla. Piştî ku me hinekê bêhna xwe veda me rext û şûtike pişta xwe vekir. Me sibê jî şal û gomlekê xwe derxist û cilên sivîl li xwe kirin. Dema ku min piştî sê salan rextê xwe yê ji canê min

nêzîktirê min e û şûtika xwe ya ku li beramberê her sir û seqamê pişta min diparast, ji min re dibû pişt, derxistin min xwe weke rût û tazî mayîme hîs kir. Gava ku min cara yekemîn cilên gerîla li xwe kiribûn, şûtik li pişta xwe alandibû ji ber kelecan û kêfxweşiyê, hema bêje kêm mabû dilê min bisekiniya. Ji ber ku qirêj negirin li erdê jî rûnediniştim. Niha jî piştî min ew derxistibûn min nedixwest ji cihê rûniştime rabim ser xwe.

Hemû hevalan cilên sivîl li xwe kirin. Cilê gerîla hê zêdetir li me hemûyan dihatin. Dema ew li ser me bûn, em hê rehetir bûn.

Di vê navberê de em çûn sê-çar malbatan. Hemû jî welatparêz in, mirovên girêdayî Partî û Rêbertiyê ne. Timî ji me pirsa şer dikin.

Min texmîn nedikir ku careke din welatparêzên me yên wisa bibînim. Gundên li ser sînor ên çete hema bêje dilê min ji gel reş kiribûn. Dûbare dîtina mirovên welatparêz pir tiştekî baş e. Dîtina van mirovan ku li gel Partiyê çendî bûne yek ez bextewar kirim.

**10'ê Îlona 1994'an**

Doh em hatin dibistana navendî ya Partiyê. Dema hatin dibistanê heval hemû di dersê de bûn. Ji ber wê yekê hevalê Abas em pêşwazî kirin. Piştî ku yek bi yek bi me hemûyan re hev nas kir, rewşa giştî ya li welêt pirsî. Piştî ku me li ser rewşa giştî ya welêt agahî danê, me bi hevalên ji perwerdeyê derdikevin re hev nas kir. Piraniya wan hevalên nû ji Ewrûpayê hatibûn, hevalên ji welat hatibûn jî hebûn. Hemûyan meraqa welêt û şerê li welêt dikir. Her roj ji welêt agahî distendin lê hevalên nû ji şer hatibûn ji bo wan maneyeke cuda hildigirtin. Me hewl da her hevalê pirs dipirse agahdar bikin. Vegotina germahiya şer, xweşikî, bedewî û têkoşîna li welêt, pir girîng bû.

Diyar bû hevalan ji perwerdeyê hêz stendibûn. Pêwîstiya me jî bi alîkariya wan hebû. Baweriya min heye em ê hêzê bidin hev.

Destpêkê me soz da ku em ê rast tevlî perwerdeyê bibin.

Ez ê girêdayî soza xwe bibim.

Hevalan îro gotin ku îhtimal heye Serok bê. Ji ber wê yekê sebra min nema, ji ber kelecanê min nedikarî di cihê xwe de bitebitim. Çavê min her li derî bû. Lê îro Serok nehat. Dibe ku sibeyê bê.

**11’ê Îlona 1994’an**

Piştî taşte û îştimayê em ketin dersê. Destpêkê agahiyên cîhazê hatin xwendin. Di pey re dest bi dersê bû. Ber bi nîvinga dersê hevalê/a li cem min got ku Rêbertî tê. Ji dengê taksiya ku hatiye, fêm kiribû. Kelecana min pir zêde bû. Me navber da dersê, piştî kêliyekê dê Rêbertiya Partiyê bihata hindur. Min nedikarî di cihê xwe de bitebitim. Çûm û li bexçeyê dibistanê çend voltayên kurt dan xwe.

Em dubare ketin îştimayê û bi yek rêzê ketin hindur. Bi taybetî hevalan di mijara kuxînê de em hişyar kiribûn. Hevalan digotin ku dengê kuxikê yan jî dengekî din bala Rêbertiyê belav dike. Ji ber wê yekê diviyabû em hinekê hişyar tevbigerîna.

Dema em bi awayekî bêdeng li benda Rêbertiyê bûn dengekî got “şiyar bin”. Em hemû rabûn ser piyan. Di salonê de dengekî herî biçûk jî tine ye. Dema Serok kete hindûr dengê lingên wî di nava avahiya çîmento de olan didan. Min ferq kir ku ez ji ber kelecanê direcifim. Min li çavên xwe bawer nedikir. Ew mirovê mezin li pêşberê min bû.

Eger di wê kêliyê de yekî ji min hestên min bipirsiya, ji kêfxweşiyê min ê nekariya hestên xwe bêjim. Hewl didim bi hemû dîqeta xwe Serok bişopînim. Serok ji bo me hevalên nû hatine, axaftina “bi xêrhatinê” kir. Paşê bi welatparêzên hatine re hev nas kir û diyalog bi pêş xistin. Neketina bin bandorên axaftinên wî ne mimkun bû. Dema li ser dersê diaxife, çendî hesas e. Dengekî herî biçûk bala Serok dikişîne. Tevgerên wî pir xwezayî û rehet e. Bi ewirên xwe li ser her kesî qontrola xwe çêdike. Texmîn nakim ku ti kesê ji ewirên wî bandor nebe derkeve.

Piştî ku ders xelas bû em çûn cem Serok. Yek bi yek bi me re hev nas kir. Bi taybetî gelek cihên Dêrsimê ji hevalan pirsîn. Bîra wî çendî jî bihêz bû!

Di sala 1977-78’an de yek-du caran çûye Dêrsimê, hê jî bi kê re, di kîjan rêyan re çûye ew der weke niha tê bîrê. Hemû jî yek bi yek ji hevalan pirsî. Piştre me û Serok bi hev re xwarin xwar. Mirov li gel Serok xwe rehet hîs dike. Serok her dibêje “bila heval xwarina xwe xelas bikin”. Hin caran li me dinêrî û dikeniya. Weke ku min hin

caran xeyala wê dikir qet jî ez ne şaş bûme; ken herî zêde li Serok dihat.

Pir bextewar bûm. Dîtina mirovê herî mezin, herî serbilind ê cîhanê, ji bo min kêfxweşiya herî mezin e. Îro bûyerek dîrokî ku min ti car bawer nedikir pêk were qewimî. Me beşeke mezin a rojê bi Serok re derbas kir. Coşa li cem Serok, hêvî û kelecanê dide mirov. Lê min bawer nedikir ku careke din wê kelecanê bijîm. Piştî ku min Serok dît baweriya min a bi min hezar qatî zêde bû. Bi misogerî ez ê vê qade pir baş binirxînim, xwe bi hêz bikim. Û vê carê ez ê bi awayekî bi hêz vegerim qada şer. Ez ê vê carê pêwîstiyên girêdana bi Rêbertî, Partî û şehîdan rast bi cih bînim.

**12'ê Îlona 1994'an**

Serok li ser 14. Sla 12'ê Îlonê analîzek bi pêş xist. Axaftinên Serok wisa balkêş in, mirov neçar dimîne hemû bala xwe bide ders. Jixwe yên bala xwe nadin ders di cih de Serok wan ferq dike. Di wê kêliyê de lê mêze dike. Awirekî tuj diavêjê. Bi misogerî bala her kesî dikişîne.

Serok bi coş e, enerjîk û dînamîk e. Ji me re dibêje ku hemû ev li cem tine ne. Rast dibêje Serok. Eger enerjî, coş û hêrsa li cem wî hinekê bi me re hebûna, bi misogerî îro me mesafeyên mezin distend. Axaftin û tevgerên Serok wisa bûne yek, tenê tevgerên wî têrê dikin ku mirov gelek tiştî fêm bike. Helbet tevger-helwestên Rêbertiyê divê ji bo me bibin çavkaniyeke pir mezin a perwerdeyê. Her gava wî, her ewira wî hin tiştan îfade dike. Rêbertiya Partiyê îro bi hevalan re woleybol û fûtbol leyist. Ji bo ku di leyistokê de bi ser bikeve hewldaneke mezin raber dike. Leyistok şaşitiyê qebûl nake. Dema top jî dileyize heya asta dawiyê bi coş û enerjîk e. Madem evqas nêzîkî Serokatî bûme, jê hêz negirtin, xwe bi pêş nexistin, dibe şaşiya herî mezin ku ez ê di jiyana xwe de bikim.

**4'ê Îlona 1994'an**

Dengê kuxukekê yan jî dengê pênûsek ku dikeve erdê, di cih de hemû bala Serok dikişîne. Bi hêrs li wê derê mêze dike. Bi ewirên xwe dixwaze bêje, "bila careke din nebe, tu bala min belav dikî".

Qada Rêbertiyê ji bo min nuxteyeke werçerxanê ye. Baweriya min a bi min hê jî zêde dibe. Piştî dahûrandinên Rêbertiyê kêmasî û nebesiyên xwe, ferasetên xwe hê baştir dibînim.

Dema dostên dihatin bi rê dikir, hezkirin û eleqeya ku Serok nîşanî wan dida hezkirineke pir cuda bû. Rêbertî ji bo ku têkiliyeke herî biçûk bixe xizmeta şoreşê hewldaneke mezin nîşan dide. Û nirxeka mezin dide her têkiliya ku tê afirandin.

Di kesayetiya Serok Apo de ji nû ve mirovahî tê afirandin. Gotinek ku Serok Apo di dahûrandina xwe ya îro de aniye ziman ez pir dam fikirandin. Piştî dersê her li ser vê gotinê kûr bûm. Got, “ji bo ku yek ji min re bibe alîkar divê pir hakim be. Ti hevalên xwediyê vê qebiliyetê ne tine ye”. Serok hemû barê şoreşê bi tena serê xwe rakiriye. Ewqas heval hene, ti ji van wê hakimiyeta ku bikaribe ji Serok re bibe alîkar nîşan nade. Dema wisa dibe jî hemû bar ji Serokatî re dimîne. Çendek jî bin, eger di wê astê de heval hebûna bêhna Rêbertiyê çiqas fireh dibû. Hinekê fikirîm, gelo ez nikarim xwe bigihînim wê asta hakimiyetê, nikarim bibim alîkarê Rêbertiyê? Pêwîstî bi hewldaneke mezin heye,

Ez ê ji bo vê, ji bo ku guherîneke mezin pêk bînim û hakim bibim hewldaneke mezin xerc bikim. Dibe ku rojekê xwe bînim wê astê û alîkariyê bidim Serok.

Serok vê carê bi me re yanî em hevalên nû hatine re top leyist. Bi Serok re leyistina topê qet ne hêsan e. Ji ber ku eger bi Serok re bileyizî tê şaşitî nekî, tê leyistoka herî baş bileyizî, bi misogerî bikî hedef ku bi ser bikevî. Ji ber ku Serok timî bi serketinê esas digire. Dema mirov bi Serok re top dileyize her di dilê mirov de dudiliya bi awayê, dibe ku şaşitî bikim heye.

Serok bi pêkhateyê re wisa eleqedar dibe, moral didê, wisa perwerde dide û amade dike, li cîhanê ti rêberên din nekariye vê bikin.

**18’ê Îlona 1994’an**

Serok di analîza xwe ya îro de rexne kirin û gelek kêmasiyên me yên di şer de daxist holê. Li ser Dijmin, kesayetiyên lewaz, fersetên şaş ku xwe li ser Partî ferz dikin axifî. Careke din rê û rêbazên rast

danî holê. Bi daxistina holê ya rastiya Rêbertiyê dubare daxist holê ku em ê çawa serkeftinê bi dest xwe ve bînin.

Li cem dostên hatine diyalog pêş xistin. Li ser erkên wan sekinî. Wan jî soza girêdana bi Rêbertiyê re dan û ji vê qadê çûn. Dîsa, Serok ji bo festîvala Helim Döner ku li Awrûpayê bê lidarxistin mesajek şand. Weke ku li pêşberê sed hezar kesî be diaxifiya. Dema Serok mesaja xwe radigihand. Min di jiyana xwe de cara yekemîn axaftineke wisa bi bandor guhdar kir. Bi rêya mesajê germahiya xwe digihand hemû gelê me.

Dema mirov li gel Serokatiyê hewldan ûlêhûrbûneke evqas kûr û kedeke evqas zêde dibîne, difikire ku ew ê çawa bibe layiqê Serok. Bi rastî jî em ji Serok fêm nakin. Eger heya bi îro ji me yek kesî Serok fêm kiriba, Serok nedigot "hûn ji min fêm nakin". Çi tiştekî bi êş e!

Em timî bi Rêbertiyê re najîn, ji ber wê yekê jî em ji wî fêm nakin. Ruxmî ku bi tena serê xwe ye, çavê xwe naşkîne, pes nake û dikare li ser lingan bimîne. Hem jî her roj bi destxistina serkeftinên nû. Ti kesê din di nav ewqas zor û zehmetiyê de nikare mezinahiyeke di vê astê de nîşan bide.

Xwaziya min ji Serok fêm bikira. Min karîba li gel wî hin tiştan parve bikim, jê re bibim alîkar. Lê ez vê dizanim. Helbet rojek tê yên ji Serok jî fêm bikin derdikevin.

Wendahiyên ne di cih de yên dawî êş û nerehetî didan Serok. Dema diaxifî nerehetiya xwe bi awayekî aşkere dianî ziman. Ji dijmin re kîn û hêrsa wî ewqas zêde ye. Bi qasî ku li beramberê dijmin kîndar e, li beramberê yên şaşitî dikin, dibin sedema wendahiyên ne di cih de jî ewqas xwediyê kîn û hêrs e!

Piştî ku min kîn û tola li cem Rêbertiyê dît, ez fikirîm ku li cem min li beramberê dijmin ti kîn û hestên tolstendinê tine ye. Lê min digo, yê ku li beramberê dijmin herî zêde xwediyê kîn û hesta tolstendinê ye ez im. Lê piştî ku min kîn û azweriya tolstendinê ya li cem Rêbertiyê dît, ez dibêjim a min hêrsekî bêmane ye. Û Serok bi her roj lêdana derbeyên mezin li dijmin, tola xwe jê vedike.

Di pratîkê de gelek heval dibêjin "ez carekê Rêbertiyê bibînim. Piştî wê bimirim jî ne xem e". Demekê min jî wisa digot. Min digo, piştî ku Rêbertiyê dibînim bimirim jî ne xem e. Lê piştî ku min

azwerî û girêdana bi jiyanê re ya Serokatî dît min fêm kir ku ez şaşitiyeke mezin dijîm.

Jiyîn biserxistin, bi azwerî xwe bi jiyanê ve girtin û karîn di oxira jiyanên nû de têkoşîn meşandin divê bibe armanca esasî. Ya girîng ew e ku mirov weke Rêbertiyê pir şidayî xwe bi jiyanê ve bigire û têkoşîna jiyanê bi ser bixe. Ez ê vê carê bi azwerî xwe bidim jiyanê, bi awayekî serkeftî di têkoşîna jiyanê de cihê xwe bigirim.

**

*

Ev sê meh in li qada Rêbertiyê me.

Temam sê meh! Çawa derbas bûn ez jî nizanim. Dema destpêkê ji min re gotin ku ez ê biçim qada Rêbertiyê min bawer nekiribû. Min wê şevê bi stêrkan re Serok Apo xeyal kir. Ji şabûnê min nekarîbû heya bi sibeyê razêm.

Tê bîra min, dema ku min Rêbertî di xewna xwe de dîtibû, bi rojan ji hevalan re xewna xwe gotibû. Lê min vê carê ne li ser wêneyan, ne jî di xewna xwe de didît.

Em di pêvajoyeke pir girîng re derbas dibin. Amadekariyên kongreya pêncemîn tên kirin. Bûm şahidê rapora polîtîk ku Rêbertiyê pêşkeşî Kongreya 5. kiriye.

Ewqas tiştên ez bêjim hene! Pêvajo çawa derbasa bûye, min kîjan encam jê derxistine ez ê hemû van bînim ziman. Yê ku pêwîst e di herî destpêkê de mirov bîne ziman Serok e. Di vê pêvajoyê de min hemû bala xwe da, hewl da ku ez wî bişopînim û encam derxim.

Dixwazim binivîsim. Bi rastî jî pir dixwazim binivîsim. Ez di pratîkê de jî vala nesekinîm, min hewl da hin tiştan binivîsim. Lê ji ber ku zêde qebiliyeta min tine bû min nekarî weke dixwazim binivîsim. Her çendî xweşik nenivîsim jî nivîsandin bêhna min fireh dike. Tiştên dinivîsim dibe ku ji kesên din re xweşik neyên, lê ez ê girêdayî tiştên min nivîsandine bibim û her roja derbas dibe hê xweşiktir bikim.

Di vê pêvajoya dagirtî de hewldan, tempo, coş û xebatên Rêbertiyê neasayî bûn. Ti mirovên din nikarin bi vê tempoyê, bi vê giraniyê, bi coşeke wisa, bi azwêriyeke wisa nêzîkî erkan bibin, ne jî dikarin xwe bigihînin terzeke wisa ya xebatê. Dema ku Serok xebatê

bi coşeke mezin dimeşîne, em ên ku dibêjin em ji bo heman dozê şer dikin, çima nikarin xwe bigihînin terza Rêbertiyê, yan jî fêm nakin? Taybetmendiyên me bi şûnde digirin çi ne? Divê ev bên derxistin holê û careke din jî pêwîst e ev kirêtî neyên jiyîn.

Ez ê kesayetiya xwe ji zarokatî bînim û bidim pêşberê kesayetiya Rêbertiyê. Dikarim lewaziyên xwe wisa bibînim û piştî ku bibînim jî derbas bikim. Baweriya min heye dema ez pêşberê hevkirineke wisa dikim ez ê karibim Serok hê baştir fêm bikim. Û dikarim bi wî re hevaltiya rê, hevaltiya şer bikim, cara yekemîn bi awayekî rast ji wî hez bikim.

Ev qad ji bo her kesî nabe nesîb. Bi taybetî pêvajoya kongreya 5. ku em dijîn şenseke mezin e. Di jiyana min de cara yekemîn pêvajoya Kongreya 5. wisa manedar e û bi qasî ku manedar e jî, ji bo xwe nas bikim, ji nû ve biafirînim firsendeke dîrokî ye. Ez vê pêvajoyê weke pêvajoya ji nû ve tevlîbûna Partiyê dinirxînim.

Di 1992'yan de tevlî gerîla bibûm. Di tevlîbûna her kes ya nav refên şoreşê de hin faktor rol digirin. Ez jî dema tevlî bûm ji hevalê Cewahîr û Sertac bandor bûm, tevlîbûneke hestewarî bû. Gava nû hatibûm nav refên gerîla min zêde Partî nas nedikir. Tenê bi bandora hin tiştên hevalê Sertac û Cewahîr vegotibûn û ji ber hewesa çekan tevlî gerîla bûm. Dema min filmên qowboyan û macera temaşe dikir pir jê bandor dibûm. Ji ber wê yekê timî xeyala min ew bû ku çekeke min jî hebe. Min dikarî bi vê çekê gelek daxwazên xwe pêk bînim. Jixwe çeka gerîla jî hebû. Hem jî dihate gotin ku gerîla sîlahşorên herî serwer û hakim in. Bawer im di tevlîbûna min de faktoreke girîng jî qariyerîzm bû.

Dema em ber bi salên 1990'î ve dihatin roj bi roj têkoşin mezin dibû. Serhildan û çalakiyên gerîla dijmin tengav kiribûn. Li metropolan û li cihên cudatir tevlîbûneke zêde ji bo gerîla hebû. Min jî ji xwe re digo, Kurdistan ava bû, eger gerîla çendek derbeyên mezin lê bide KT'ê dê bi bin bikeve, ez jî tevlî bibim, bila di vî karî de keda min jî hebe. Heta wê demê li gel hevalê Dewrîm em bi nava xeyalan diketin. Em di xeyalên xwe derdiketin çiya, me qilêş dixist destê xwe, derbe lêdixist. Ji ber vê yekê navê me diçû her derê. Gava ku me derbeya dawî lê dijmin dida, dijmin direviya. Gelê me radibû

ser piyan, tam em wê demê di destê me de çek ji çiya dadiketin. Gel bi coşeke mezin bi qerenfîlên sor em pêşwazî dikirin. Tiştê ez dixwazim li vê derê bînim ziman ew e ku tevlîbûna min tevlîbûneke şaş e. Di tevlîbûneke wisa de destpêkê min zehmetî kişand. Lê niha dem hat bi awayekî rast tevlî Partiyê bibim. Firsendeke dîrokî bi destê min ketiye û divê ez vê firsendê baş bi kar bînim.

**Serhildana destpêkê**

Bi gotina "ez dixwazim rast tevlî Partiyê bibim", tevlîbûneke rast nabe. Ev tenê gaveke erênî ye. Ji bo rast tevlîbûnê, pêwîst e rast bersiv were dayîn pirsa " divê mirov çi bike?". Bersiva ku ez ê bidim vê pirsê, bi awayekî herî baş xwe naskirin e. Divê aliyên xwe yên kêm û taybetmendiyên xwe yên xurt baş bibînim da ku karibim xwe bigihînim rastiyan.

Rêbertî ji biçûkaniya xwe dest pê dike û xwe analîz dike. Tê fêmkirin ku taybetmendiyên zarokatiya Rêbertiyê bingehên kesayetiya Serok pêk tînin. Madem wisa ye, divê ez jî wisa biçim kurahiyên zarokatiya xwe û wisa kesatiya xwe bigirim dest, ji vî aliyî ve xwe analîz bikim û tevlîbûna rast pêk bînim.

Heya ku hatim qada Rêbertiyê, qet li zarokatiya xwe venegerîbûm. Eger çend caran min zarokatiya xwe anîbe ber çavên xwe jî, min nedizanî min çima pêwîstî bi vê dîtiye. Piştî hatim qada Rêbertiyê û bi taybetî jî ji Rêbertiyê bi xwe serhildana wî ya destpêkê guhdar kir qederekê jê bandor bûm.

Serok hê jî girêdayî bi zarokatiya xwe ve ye. Çawa ku vê yekê li ser min bandor kiriye, bû sedem ku ez biçim nav zarokatiya xwe. Dûr û dirêj li ser zarokatiya xwe kûr bûm. Her ku hizirîm min go, min li hestên xwe yên zarokatiyê îxanet kiriye, dirustiya xwe ji dest daye. Lê Serok Apo bi hemû zindîbûna xwe zarokatiya xwe jiyan dike, têkoşîna vê dimeşîne, bi azwerî têkoşîna vê dimeşîne.

Dema çûm nav zarokatiya xwe ji aliyekî ve min kesayetiya xwe ya pêk hatiye, ji aliyekî ve jî min kelecaneke kûr jiyan kir. Ez qet pê nefikirîbûm ku cîhana zarokatiyê wisa kelecan bide mirov. Ji ber ku qet min pêwîstî pê nedîtibû ku li zarokatiya xwe bigerim. Lê serhildana destpêkê ya Serok kelecaneke zêde da min.

Di temenê xwe yê heft-heştan de dest bi serhildana xwe ya destpêkê dike. Cesareteke mezin e! Bi serê xwe bûyereke mezin e ku zarokekî di wan temenan de serî li serhildaneke wisa bide û bi serkeftî bi encam bike! Di wî temenî de zarokek serhildaneke wisa bike, bûyerek ku rastiya me ya civakî qebûl nake. Dihizirim ku li dijî bavê xwe çawa wêriya, ala serhildana destpêkê rabike? Bila em bêjin ev kir, baş e çawa wêriya bêyî agahiya wî pereyên wî bigire? Em van tiştan jî li aliyekî daynin, rabûna li pêşberê hemû gundekî çawa dibe? Niha, mirovekî/e mezin vê bike mirov dikare maneyekê bidê. Lê hemû van tiştan zarokekî di wî temenî de bike cuda ye. Hem jî li gundekî biçûk ê Kurdistanê. Hem jî li dijî bav, hem jî li dijî gund, hem jî li dijî xwîşk û bira. Ya herî girîng jî hemû dema çalakiyê xwînsariya xwe ji dest nade, bêyî ku bê biryar bikeve, çalakiya xwe bi serkeftinê encam dide.

Dema mirov serhildana destpêkê ji Serok guhdar dike, ne gengaz e mirov nebîne bi hemû germahiya xwe wê kêliyê jiyan dike. Hestên xwe wisa ji dil ve dibeje, bandor nebûyin ne gengaz e. Bi rastî ji bo me hemûyan şenseke mezin e ku Rêbertî bi vî awayî jiyana xwe ji me re vedike. Bi vî awayî em wê derfetê bi dest dixin ku em xwe hê baştir nas bikin û çareser bikin. Ji bo ku mirov bi awayekî kûrahî analîz bike cesaret distîne. Ji beriya vê çawa ku min pêwîstî nedidît kesayetiya xwe analîz bikim, min ji bo vê yekê nediwêriya, lê ji vî aliyî ve jî Rêbertiyê hêz û cesareteke mezin da me û di serî de da min.

Ez ji xwe re dibêjim, ma Rêbertî ji bo me hê çi bike! Bi zêdehî kir. Niha dor a me ye ku em bersiveke herî watedar bidin ked û lêhûrbûna Rêbertiyê. Serok Apo di heft saliya xwe de kêlî bi kêlî hemû jiyana xwe dijî lê ez heft saliya xwe nikarim bînim bîra xwe jî. Min hinekê zora xwe da ser xwe tenê çend meh hatin bîra min. Çûna min a ber berxan, çêrandina berxan, dîsa zarokatiya min a di nava malbatê de hatiye kedîkirin.

Weke hema bêje di hemû malbatên Kurdistanê de wisa bû, wan deman rewşa ekonomîk a malbata me jî nebaş bû. Bi hezar zehmetî debara xwe dikir. Malbateke bi neh endam û debara wê jî li ser milê bav e. Ji roja ku tê bira min pê de hem dayika min û hem jî bavê min ji xwe dixwest em bibin zarokên baş. Digotin ku bi ti kesî re şer

nekin. Dema min li cem yekî şer dikir dayika min pir ecz dibû. Hin caran jî li me dida. Nedixwestin ji rûyê me de navbera wan bi hinekên din re xera be.

Bi qasî tê bîra min dema tevlî gerîla bûm jî min şerên wisa kiribûn lê dîqet dikir ku malbat nebihîze. Pir balkêş e, min ji derve şer nedikir lê bi xwîşk û birayên xwe re ecêb şer dikir. Em diketin qirika hev û me bi kulman li hev dida. Bi taybetî me timî bi hevalê Cewahîr û Ercan re şer dikir. Heta di encama van şerên me de hevalê Cewahîr du caran serê min şikênand. Ne dayika min û ne jî bavê min dikarîn pêşî li van şerên me bigirin. Dema şerê me giran dibû, kîjan alî heq bûya dayika min ew alî digirt û yê din diavêt ji derve. Çend caran ez jî hatim qewitandin. Dema dihatim qewitandin li ber derî disekinîm, min hin caran kevir diavêtin derî yan jî ser xanî. Piştre aram dibûm. Piştî ku aram dibûm dubare digirtim hindur. Wê demê diçûm goşeyekî malê û bi awayekî bêdeng rûdiniştim, lê ev pir demkurt bû. Piştre me hewl dida bi berdilê hev de biçin. Beşeke mezin a jiyana min a malbatê wisa derbas bû. Bi rastî dema kesayetiya destpêkê şikil digire di şikilgirtina vê kesayetiye de roleke mezin a malbatê heye. Min di nav malbatê de timî ji bo bibim zarokekî baş ê biaqil, hişyarî girtin. Van ferzkirin û hişyariyan li cem min ji zarokatî pê de tîpekî ‘zarokê biaqil û aram’ afirand.

Arambûneke çawa? Biaqilbûneke çawa? Zaroktiyek ku di nava malbatê de bi her kesî re baş e, li cem ti kesî ti pirsigêkên wî tine, lê di nava xwe de jî, herî enter, ku bi ti kesî ve li hev nake yê şerker e. Tê fêmkirin ku ev avabûn li ser jiyana wî ya paşê hakim dibe. Di nav Partiyê de bi awayekî zindî û li ber çav ev kesayetî xwe dide jiyîn. Lê dema ku cara yekemîn Rêbertiya Partiyê lêdana destpêkê dixwe, hewl dide xwe biavêje ber bextê dayika xwe. Dayika Rêbertiyê vê helwesta wî bi bertekeke mezin pêşwazî dike, jê dixwaze întiqama xwe bistîne û wî dehfî çalakiyê dide. Di encama ferzkirinên dayikê de, Rêbertî tola xwe distîne. Û şerê întiqamê ku li wê derê dest pê dike, di roja me ya îro de li dijî KT’ê bi awayekî herî giran didome.

Bi rastî dixwazim bi mînakan vê hê baştir vekim. Di qade pratîkî de pîvana ku min li beramberê hevalên li mangaya xwe digirt, di dema borî de bi pîvanên min ên jiyana nav malbatê re hema bêje

heman tişt bûn. Ji ber ku di nav Partiyê de bi hev re şer kirin tine bû min jî bi hevalan re şer nekir. Lê belê rêbazên min esas digirtin di nava mangayê de rêbazeke hê cuda ya şer bû. Hevalên mangeyê tîmî ji ber uslûba min gilî û gazinc dikirin; digotin ku ez derûdorê xwe didim bêdengkirin, hişk û bertekperest im. Têkiliyên nava malbatê yên di dema zarokatiya min de, vayê bi vê terzê, bi awayê van têkiliyên di jiyanê de xwe didin der. Ruxmî ku min di mangeyê de têkilî û jiyaneke bi vî awayî daye rûnişkandin, min li cem hevalên ji derveyê mangaya min qederekê baş diborand, li hev dikir yanî şiklê tîpekî wisa dida der û jiyan dikir. Heta min dikir ku kêfa wan ji min re bê û ji min hez bikin. Bawer nedikirin di mangaya min de pirsgirêkên wisa hene yan jî gengaz e hebin. Yanî di zarokatiya min de refdariya min a wê demê niha bi vî awayî di nav refa têkoşînê de xwe didin der. Di qada pratîkê de ev rewş li beramberê dijmin bi awayekî hê aşkere dide der. Hewl didim di nav pêkhateya hevalan de xwe hê radîqaltir bidim xuyakirin. Lê di pêvçûnekê de yan jî dema li ser dijmin çalakî nayê pêkanîn, dema ku lîberalîzm pêş dikeve, dûrketina ji tektîkê çêdibe, qet dengê xwe dernaxim, radîqalîzma di nav hevalan de nîşan didim nikarim li vê derê nîşan bidim.

Her ku zarokatiya xwe tînim bîra xwe, dibînim ku girêdayî bi hestên zarokatiya xwe nemayîme, min di asteke bilind de dirustiya zarokatiya xwe ji dest daye û ji ber wê yekê qederekê xemgîn dibim. Divê her mirov bi awayekî herî aktîf zarokatiya xwe bijî û girêdayî bi hestên xwe yên zarokatiyê bimîne. Wê demê di asteke bilind de mirovahî paqij dibe û civak ji bo hev rêz digire. Ji ber ku cîhana herî paqij, herî saf û herî dirust ya zarokan e.

Serok Apo hê jî bi hemû zindîbûna wê zarokatiya xwe jiyan dike, girêdayî bi hêstên xwe yên zarokatiye. Ev dibe sedem ku ew îro ji bo mirovahiyê şerekî mezin bimeşîne. Ji bo ku têkoşîna Serok Apo bê fêmkirin û di vî şerî de em xwe bibînin, pêwîst e em biçin nav salên wî yên zaroktî û van salan bi zarokatiya xwe ve bidin ber hev.

Rêbertiya Partiyê dema ku zarok bûye keçên li gund jî tevlî hemû leyistokên xwe kiriye; ev bûyereke girîng e. Qîmeta dide jinê hê di wan salan de xwe nîşan dide. Ev dibe ku di wî temenî de ne tiştekî bizanebûn tê kirine, lê ew retnekirin, tevlî leyistokan kirin, îfadeya

ber bi çav a qîmeta ku îro dide hevalên jin e. Ji aliyê din ve min jî, bi xwe hesîme, nehesîme, dema ku zarok bûm, ji bo keçan tevlî leyistokan nekim çi ji destê min dihat min dikir. Ruxmî ku gelek caran keçan dixwest tevlî leyistokên me bibin, min ew red dikirin û her ku min firsenda wê peyda dikir, li wan dida. Ev di jiyana tax yan jî malbatê de berdewam kir. Li malê çar xwîşkên min hebûn. Yek çar salan ji min mezintir bû. Her cara ku me şer dikir, min jê lêdan dixwar. Dema ji keçên li malê dihate hezkirin li cem min bertek, heta hesûdiyek peyda dibû. Heya bi salên amadeyî vê rewşê berdewam kir.

Di salên amadeyî de nêzîkbûna min a ji bo jinan di cewher de nehatibe guherîn jî, di çarçoveya hestên zilamekî wan serdeman de pêk dihat. Min di wî temenî de digo, evîna min a ji bo vê keçê bêhempa ye û ez difikirîm ku hezkirin û evîna rastîn ev e. Hestên di wan salan de ne hestên hezkirin û evînê bûn. Li gel kesa ku ez jê re dibêjim ez jê hez dikim ji aliyê fikrî ve ti aliyên me yên şirîk tine ne. Ez zarokê cîhaneke cuda me, ew cuda ye. Bi awayekî hestiyarî be jî ez bi awayekî germ li têkoşînê dinêrim, ew red dike; ez qîmet didimê, ew naziyan dike. Lê ez dîsa jî dibêjim jê hez dikim. Niha, fêm dikim tenê min ji aliyê fîzîkî ve ew ecibandiye. Ji vê re jî min gotiye, evin. Baweriya min ew e, eger wê demê şert û mercên îro hebûna min jê hez nedikir.

Ez di nav gerîla de fêr bûm ku hezkirin û evîna ji welêt ji beriya her tiştî ye. Bi rastî jî weke Serok Apo gotiye; “Êdî li Kurdistanê ji bo zilam bi hêsanî keç peyda nabe, ji bo jinê jî bi hêsanî zilam peyda nabe”. Baweriya min heye, yên ku berê pê bawer dikirin ji hev hez dikin, her ku PKK’ê nas dikin, her ku zagonên rastîn ên evîn-hezkirinê fêr dibin dê fêm bikin ku ya wan ne evînek e û bi azweriyeke mezin bibezin evîna rastîn. Weke ku min kiriye. Niha li evîna rast digerim.

Ji bo ku mirov xwe bigihîne hezkirina ji welêt û gel divê şerên mezin bên meşandin. Hezkirina rast tenê di encama şerên mezin de tê bidestxistin. Şerê evînê yê herî mezin îro Partiya me dimeşîne. Rêbertiya qanûnên vî şerî diyar dike serfermandarê şerê evînê ye.

Niha, ez dihizirim gelo ma bi rastî jî min ji wê keçê hez dikir? Yan jî ma min çawa pê wêriya ku hez bikim? Ma evîna rastîn weke ku ez pê difikiribûm? Belê, niha ez dikarim pir bi rehetî bersiva van pirsan bidim. Jixwe dema min pê bawer kir ku ev ne evîneke rast e, min biryar da tevlî gerîla bibim. Û piştî bi demeke kurt tevlî gerîla bûm.

Piştî tevlî gerîla bibûm dema min gerîlayên jin dîtibûn, min rêzeke mezin dabû wan. Min ev rêza timî nîşan da. Lê hema bêje heman nêzîkatiya ku min di zarokatiya xwe de nîşanî zarokên keç dayibû, yan jî versiyoneke wê min di nav Partiyê de jî nîşan da. Min ti car pê bawer nekir ku dê jinek karibe şer bike. Li gorî min jinên di nav Partiyê de bermahiyên şoreşê yên ku li ser keda hevalên xort jiyan dikin ên bêyî wan nikarin ti tiştî bikine bûn. Min ev fikra xwe aşkere nedianî ziman, lê di pratîkê de min ev fikr pêk dianî, heta ji hevalên baweriya min bi wan hebû û weke min dihizirin re jî min got, hizirên min ên wisa hene.

Min ti car nexwest di taximê de jin hebin; weke vê min nedixwest jin tevlî çalakiyan jî bibin. Min nedixwest li cem jinan biçin ti erk û wezîfeyê. Heya hatim vê derê nêzîkbûna min a ji bo hevalên jin ji wan revîn û bi wan bawer nekirin bû. Ji çi direvîm? Min çima bawer nedikir? Bi rastî jî bêbaweriya ji bo jinê, jê rev, rewşek ku ne tenê li cem min heyî ye. Hema bêje hemû hevalên xurt bi vî awayî ne. Heya hin hevalan bertek û bêbaweriya xwe ya ji bo hevalên jin aşkere dianîn ziman.

Ez di zarokatiya xwe de ji keçan dûr disekinîm, me ew tevlî leyistokên xwe nedikirin, heta min li wan dida, vê gavê jî ez wan biçûk dibînim û naxwazim bi wan re biçim erk û wezîfeyê. Bi rastî jî ji bo ku mirov bi pirsgirêka jinê û bi hevalên jin re mijûl be, bi wan re têkiliyên hevaltî bi pêş bixe, pêwîst e mirov xwediyê kesayetiyek xurt be û herî destpêkê jî mirov ji xeta Partiyê fêm bike. Yek ji sedemên herî bingehîn ku ji hevalên jin dûr disekinîm jî bi xwe bawer nekirin e. Dixwazim di vê mijarê de pir heses bim. Tiştê ji hesesbûnê fêm dikim jî, nêzîkî wan nebûyin, ji wan revîn, bi wan re neçûyin erk û wezîfeyê ye. Bi rastî jî dizanim ev lewaziyeke mezin e. Ji ber ku vê lêwaziyê dizanim jî zêde nêzîk nabim. Her kes dizane ku Rêbertiya

Partiyê çawa nêzîkî pirsgirêka jinê dibe. Ji beriya bêm qada Rêbertiyê jî min dizanî Rêbertî çawa qîmetê dide vê mijarê, çawa li ser disekine jî. Lê piştî ku ez hatim qada Rêbertiyê, piştî ku ez bûm şahid Rêbertî çawa nêzîkî vê mijarê dibe, min fêm kir ku ev mijar çendî jiyanî û ji bo şoreşa me çendî pir girîng e.

Rêbertiyê di zarokatiya xwe de zarokên keç tevlî leyistokên xwe kirine; ev bûye sedem ku îro di tevlîbûna jinê ya şoreşê de û di azadbûna wê de bibe xwediyê hewldanên pir mezin. Ya ku di cewher de pêwîst e girêdayî bi Rêbertiyê be û her di nava têkoşînê de be jina Kurd e.

Difikirim, eger ne ji hewldanên Rêbertiyê bûya, ma jina Kurd dikarîbû van rojan bibîne? Ma dikarîbû ji koletiyê rizgar bibe? Ji ber wê yekê ji me hemûyan zêdetir divê jina Kurd ji bo hewldanên Rêbertiyê bersiva herî watedar bi azadbûna xwe bide. Eger wisa nebe yên weke min dihizirin pir in. Kesên baweriya wan bi jinê tine, wan qebûl nakin, biçûk dibînin, heta eger di nava Partiyê de bin jî; nikarin jinan azad bikin, dest berde ji azadkirinê, eger firsend bikeve destê me em ê dîsa wan bikin kole û weke meta lê bikin. Ji ber wê yekê divê jina Kurd bi têkoşîna xwe alîkarî bide hewldanên Rêbertiyê û doza azadiyê hê jî bilind bike.

Ruxmî hemû zehmetî û astengiyan, Rêbertî fermandariya şerê hezkirinê û şerê evînê bi serkeftinên mezin bi cih tîne. Di bin serfermandariya wî de jin ber bi artêşbûnê ve diçin.

Dema ku me cara destpêke bihîst me qet nekarîbû bawer bikin, me digot, ma ji jinan artêş dibe, ka bila bi serê xwe bikevin gunde çeteyan em wan bibînin, û hwd. de bêbaweriya xwe dianî ziman. Lê Rêbertî bi azwêriyeke mezin bi her awayî alîkariyê dide jinan. Ne gengaz e ku mirov nebîne ev xebat çiqas encam didin. Ji bo ku mirov wisa bixebite û kedê bide, pêwîst e mirov evîndarê erka xwe bibe. Misoger e ku Rêbertî hemû xebatên xwe bi evîn û kêfxweşiyeke mezin dike.

Têkiliyên Rêbertiyê çawa ne? Xwe dispêrin kîjan bingehan? Bi kê re têkilî datîne? Eger ev pirs bên lêkolînkirin û ji wan re bersiv bên peydakirin, di heman demê de derdikeve holê ku ew Rêberê

pêşxistina têkiliyên rast ê çawa ye. Helbet, ji bo fêmkirina vê pêwîst e mirov biçe salên destpê yên serhildanê.

Mînak, malbata Rêbertî û hevalê Hesen Bîndal du malbatên dijminê hev in. Ji ber vê yekê Rêbertî û Hemze zarokên du malbatên dijminê hev in. Dê qaşo ji hev nefret bikin, hev bikujin. Ji ber ku malbat vê dixwazin. Kevneşopî û malbat vê dixwazin. Lê her du jî hevtemen bûn. Bûn du hevalên baş, ne ji aliyê malbatê ve û ne jî ji aliyê civakê ve tê qebûlkirin. Ya di cih de tê dîtin dijmintî ye. Lê weke ku di serhildana destpêkê de jî diyar e, Rêbertî pîvanên malbat û civakê red dike. Her çendî reda di wî temenî de, ne bizanebûn be jî ev red dê di salên pêş de xwe bide der. Serok, bi rêxistinkirina hevalê Hesen têkiliya ku ti kes di cih de nabîne bi awayekî veşartî dide destpêkirin. Ev têkiliya di wan salan de dibe têkiliya destpêkê ku Rêbertî birêxistin dike û paşê vê weke têkiliyeke şoreşê lê dike.

Ev terza têkiliyên Rêbertiyê heya bi roja me ya îro didome. Rêbertî têkiliyên wisa yên azad bi pêş dixe. Dibêjim têkiliyên azad, ji ber ku di wî temenî de têkiliyeke bi vî awayî bi pêş dixe, tiştên malbat û civak li ser ferz dike qebûl nake; têkiliya herî azad e. Ev têkilî her çendî têkiliyeke îlegal e jî, ji ber ku li ser bingehê azadiyê tê pêşxistin azad e. Lê dema li terza têkiliyên xwe mêze dikim, têkiliyên di wî temenî de Rêbertiyê bi pêş xistine bi vê rewşa xwe nikarim niha jî bi pêş bixim.

Tê bîra min, dema zarok bûm nediçûm cem zarokên dayika min nedixwest neçim cem wan û min tevî wan nedileyist. Di vê mijarê de qet ji derveyê gotinên malbatê dernediketim. Min ti carî nekarî têkiliyên serbixwe, ruxmî malbat û derûdorê bi pêş bixim. Vê rewşê di nav refan de jî bandora xwe da derve, zehmetî dikişînim ku bi hemû hevalan re têkilî daynim. Û ji ber vê yekê nikarim bibim çareserî. Hevalên ez li cem wan têkilî datînim hê bêhtir hevalên nêzîkî xwe dibînim in. Dibêjim nêzîkî xwe, ji ber ku hemû hevalan nêzîkî xwe nabînim, ji ber ku nêzîk nabînim jî nikarim bi hemûyan re di çarçoveya pîvanên rêxstinê de têkilî bi pêş bixim.

**
*

Rêbertî çawa nirxan diparêze? Çawa xwedî li kedê derdikeve? Ev fêmkirin Partî fêmkirin e. Fêmkirina Partî, biryara meşa şoreşê dayîn e. Ji bo ku mirov nêzîkbûna Rêbertiyê ya ji bo ked û nirxan fêm bike, pêwîst e dîsa mirov vegere serhildana destpêkê.

'Serhildana destpêkê' ked û xebateke mezin e. Rêbertî îfadeya herî cewherî ya kedê ye. Taybetmendiyên wî yên kedkar xwe dispêre salên zarokatiyê. Çawa ku ti car îxanet li keda xwe nekiriye, timî bûye xwediyê jiyaneke girêdayî kedê. Ji bo keda kesên cuda jî rêz û hurmeteke pir mezin raber dike. Rêbertî ji yên li keda xwe xwedî dernakevin, keda xwe berhewa dikin nefret dike. Bi rastî şerê Rêbertî şerekî kedê ye. Li dijî dizên kedê şerekî bêeman dimeşîne.

Yek ji sedemên herî girîng ên serhildana destpêkê, belkî jî sedema herî girîng, şerê ku li dîjî birayê xwe yê nîvingê ku dixwaze keda wî desteser bike daye destpêkirin e. Ev şer heya bi roja me ya îro bi awayekî bêeman didome. Ji xwe re esas digire ku karê dike, bi awayekî herî baş bike. Kirina xebata baş û xebat birin encamê, ji bo hemû van xwedî li keda xerc kiriye derketin, ji bo Rêbertiyê rêgezeke bingehîn e. Ti car ji vê rêgezê tawîz nade. Ji ber ku jiyan li ser vê rêgezê tê avakirin. Yên ku heya bi îro êrîşê vê rêgezê dikin, yên xwestine vê rêgezê dejenere bikin hebûne, lê Serok ji bo ku li dijî van hemûyan rêgeza jiyanê biparêze şer meşandiye û di şerê parastina vê rêgezê de bi ser ketiye.

Ez berê dihizirîm ku tenê dijmin û tasfiyekar êrîşê vê rêgezê dikin. Lê niha ferq dikim ku ez şaş bûme. Dijmin, tasfiyekar û provokator bi awayekî aşkere êrîş dikin û Serok li dijî van êrîşan bi şiklekî herî baş tedbîr bi pêş xistine. Lê em ên ku ji xwe re dibêjin endamên Partî, şervanên azadiyê û pesna xwe didin jî bi rastî jî, me li dijî vê rêgeza Rêbertiyê şer îlan kiriye. Ya me ne şerekî bi zanebûn jî bibe herî kêm bi qasî yê dijmin Rêbertiyê dixe zehmetiyê. Çawa ku em ne layiqê ked û hewldana Rêbertiyê ne, parastina wan nakin; her wisa jî weke birayê wî yê nîvengê ku dixwest li ser keda Rêbertiyê jiyana xwe bidomîne, em dixwazin jiyana xwe bidomînin. Lê Rêbertiya ku di heft saliya xwe de li keda xwe xwedî derketiye, îro jî dê li dijî me şerekî bê eman îlan bike. Jixwe di navbera me de şerekî wisa mijara axaftinê ye jî.

Li aliyekî em hene, li aliyê din Rêbertiya ku ‘şervanê kedê’ ye.

Li aliyekî em ên wenda dikin hene, li aliyê din Rêbertiya bi ser dikeve ku ‘şervanê kedê’ ye

Baş e, ma qet em nekarin kedê biafirînin? Ma ji bo parastina keda em diafirînin şer nakin? Hema bêje hemû heval kedkar in. Lê pirsgirêka me herî bingehîn, neparastina kedê, xwedî lê derneketina keda em diafirînin e.

Ked û nirx du diyardeyên bi hev ve girêdayîne. Di encama kedê de nirx tê afirandin. Yên girêdayî bi keda xwe ne, ew çend jî girêdayî nirxan in. Pêwîst e di mijarên weke girêdayî bûna bi nirxan û parastina nirxan de em di darizandinên mezin re derbas bin. Helbet divê ev nirxandin di hindurê mirov bi xwe de be. Jixwe darizandina herî rasteqînî ew e, mirov wijdanê xwe darêzîne.

Ji xwe şerm dikim.

Min ferq kir ku pêwîst e ez di vê mijarê de xwe darêzim û vê gavê darêzandineke wisa dijîm. Divê her kes vê darizandinê bike. Ji bo me qîmetên herî mezin Rêbertî û şehîdên me ne. Ji ber ku bi layiqî li van qîmetan xwedî derneketime weke tewanbarekî xwe hîs dikim. Fêmnekirina Rêbertiyê ku qîmeta me ya herî mezin e, talîmatên wî bi cih neanîn... Nebûna temsîlkarê hizir û berhemên wî, dîsa di her wateyê de li berambê êrîşên hindur û derve ew neparastin, xerabiya herî mezin ku karibe bi Rêbertiyê bê kirin e. Yekane tiştê ku min û hevalên min heya bi îro kirine, tevgerîna li berevajiya Rêbertiyê bûye.

Ji ber girêdana min a bi Rêbertiyê ya mirûdwarî, min ti car nekarî Rêbertiyê fêm bikim. Hê nû jî fêr bûm ku ev girêdana min bi terzeke mirûdwarî ye. Berê min dixwest ku her kes weke min girêdayî bi Rêbertiyê be. Belê, me ji ber vê girêdana xwe ya bi Rêbertiyê re di navbera xwe û Rêbertiyê de dîwarekî weke dîwarê berlînê lê kiriye. Bi rastî jî girêdana me ya bi korane ya bi Rêbertiyê re her roja derbas dibe hineke dîtir me ji Rêbertiyê dûr dike.

Eger em bi vî awayî şaş nêzikî Rêbertiyê dibin gelo em çawa nêzîkî nirxên din dibin?

Rêbertî, Rêbertiya ku ji tinebûnê qîmetên pir mezin diafirîne û nirxên afirandine ji her awayê xetereyê diparêze yê ‘nirxên şoreşgerî’

diafirîne ye. Weke ku ‘bi derziyê çal bikole’ bi sebir, ked û hewldaneke mezin nirx û qîmet hatine afirandin.

Min nekarîbû Rêbertiyê di jiyanê de bi awayekî rast temsîl bikim. Nêzîkatiyeke min a wisa ji bo Rêbertiyê hebû, min digo, ti kes nikare xwe bigihîne jiyana wî. Dîsa, min qet fêm nekiribû ku erka me ew e em xwe bigihînin jiyana Rêbertiyê. Ji ber ku li ber çavên min Rêbertî li ber çavê min Xwedayek bû. Tenê dikare talîmat û fermanên Xwedê bê pêkanîn. Tebî piştî ku hatim qada Rêbertî, piştî ku Rêbertiyê bi xwe ev xeflet û şaşitiya me ya mezin anî ziman min ev xefleta me fêm kiribû. Ya girîng ew e, mirov di jiyanê de Rêbertiyê rast temsîl bike û fêm bike. Ji bo wê yekê jî divê mirov ji nêzîkbûnên şaş û mirudwarî xwe xelas bike.

Her çendî di jiyanê de Rêbertî rast temsîlkirin zehmet be jî, milîtanê/a ku rast ji Rêbertiyê fêm dike û di jiyanê de bi awayekî rast temsîla wî dike, ji bo vê yekê hewl dide; milîtanê/a ku ber bi azadiyê dibeze û xwe digihîne azadiyê ye. Serok Apo, ji bo ku em ji wî rast fêm bikin û temsîla wî bi awayekî rast bikin, dahûrandina kesayetiya xwe ji zarokatiya xwe pê de heya bi roja me ya îro dike.

Dîsa, Rêbertî ji me dixwaze em erzan nemirin. Berevajî, Rêbertî, mirinên wisa yên di bin navê girêdanê de red dike. Ji me dixwaze ku em bi awayekî rast temsîla wî bikin. Kesên ji Rêbertiyê fêm nakin, nikarin temsîla wî bikin, nizanin ku di cih û dema xwe de bimirin jî. Nêzîkatiyên şaş ên ji Rêbertiyê re yên ku li cem min hene, hema bêje di beşeke mezin a hevalan de jî heye.

Dîsa, girêdana me ya şêhîdên me ku nirxên me yên herî mezin in jî dişibe girêdana me ya Rêbertiyê. Li şûna ku em bi gavên dîrokî bersivê bidin şehîdan, ya ku em dikin bi bertekekek erzan a li beramberê dijmin çûna mirina erzan e.

Gelek heval li cem min şehîd ketin. Hin li ser milê min şehîd bûn. Hin piştî ku şehîd ketin, me ew bi saetan li ser milê xwe hilgirtin û piştre veşartin. Dîsa, birayên min şehîd bûn. Hemû ev helbet êşê didin û mirov nefretê ji dijmin dike, li beramberê wî kîneke pir mezin jiyan dike. Belê, pêwîst e mirov timî li dijî dijmin kîndar be. Bi taybetî divê şehîdên me qat bi qat kîna me zêde bikin.

Piştî ku min şehadeta birayên xwe bihîst, min li dijî dijmin kîneke mezin jiyan kir. Heta bêyî ku heval bibînin bi rojan giriyam, li ser bingeha ku tola wan bistînim min soz da xwe. Min digo, hema biçim tola wan bistînim. Hin caran min digo, bila heval bombe bidin min ez biçim qereqolê tevî xwe îmha bikim. Dîsa, dema li cem me heval şehîd dibûn teng dibûm, min dixwest di cih de biçim ser dijmin û tola wan bistînim. Lê ez dihizirim, nêzîkbûneke wisa nabe ku nêzîkbûna kesekî/ê dixwaze heyfa şehîdan rabike be. Li aliyê din jî nêzîkbûnên Rêbertiyê ne wisa ye. Rêbertiyê, bi gavên dîrokî bersiva şehîdan dida, lê ez ti carê nehizirîm ku bi gavên dîrokî, li ser esasê pêşxistina şer bersivê bidim; her wisa jî min digo, demekê ji beriya demekê 'bimirim da ku xelas bibim'. Bi rastî jî hê baştir dibînim ku ez bi vê nêzîkbûna xwe, ne layiqê şehîdan im.

Dîsa, nirxeke me ya din jî hevalên me ne û pêwîst e em li nêzîkatiyên hevaltiyê jî mêze bikin. Di PKK'ê de hevaltî çi ye, pêwîst e têkiliyên hevaltiyê çawa bin?

Rêbertiyê di jiyan û şer de bi kurtasî li her derê di kesayetiya xwe de têkiliyên herî bi hêz ên hevaltiyê dane rûnişkandin. Ew di nêzîkatiya xwe de terzeke wisa bingeh digire ku her hevalê/î bi pêş bixe, perwerde bike û veguherîne. Eger ji roja destpêkê heya bi roja me ya îro hemû heval li derûdora Serok Apo hev girtibin, ev nîşan dide ku ew ji aliyê têkiliyên hevaltî ve çendî xwediyê nêzîkbûnêke bi hêz e û qîmeteke çendî mezin daye hevaltiyê. Bi taybetî her ku ew têkiliyên hevaltiyê yên qonaxa grûbê de tîne ziman, bi rastî jî mirov dixwaze têkiliyên wê demê bijî. Dîsa, hevalên ku ew qonax jiyan kirine dema ew bi xwe têkiliyên wê demê îfade dikin, dixwaze naxwaze mirov diçe nav wan salan. Niha, hejmara me pir zêde bûye, dibe ku li benda heman têkiliyan bûyîn ne rast be, lê aşkere ye di têkiliyên me yên heyî de jî şaşî hene.

Tiştê ku PKK'ê li ser lingan digire, têkilî û girêdanên bi hêz ên di navbera qadro, sempatîzan û şervanên PKK'ê de ye, baweriya wan a bi hev a pir mezin e. Ev jî têkiliyên herî bi hêz ên hevaltiyê ne. Têkiliyên bi hêz ên di nav Partiya me de dinyayê matmayî dihêle. Gelek kes bawer nakin ku têkiliyên hevaltiyê yên wisa hebin. Bi

sedan hevalên me ji bo hevalên xwe canê xwe li ber guleyên dijmin kirine mertal.

Yê ku hemû hevalan bi hev ve girê dide, ji bo ku di oxira hev de biçin mirinê dike evîndarê hev, wan dixe liv û tevgerê Serok Apo ye.

Min ji beriya vê behsa girêdana mirudwarî kiribu. Me ti car (destpêkê jî min) bawer nekiribû ku mirov dê karibe ewqas hêzê di destê xwe de bigire, ji ber wê yekê min weke Xwedayek be li Rêbertiya Partiyê mêze kir. Ji ber ku tenê Xweda yan jî pêxemberek dikare mirovan evqas li gel hev ragire û bixe liv û tevgerê. Ferq dikim ku ev nêzîkatiyên min şaş in. Min derxist zanebûnê ku bi hestên wisa girêdayî bi Rêbertiyê bûyîn, bi vî awayî Rêbertî fikirîn, ne girêdan û fikreke rast e. Rêbertî jî hevalê me ye. Hem jî hevalekî ku hêz û alîkariya herî mezin dide me ye. Em heya bi vê rojê şaş nêzîkî wî bûn û me nekarîbû pêdiviyên hevaltiyê neanîn cih. Me ew tenê hişt. Mezlûm, Xêyrî, Heqî û hevalên din bi wî re hevaltiya rast kirin û qet ew bi tenê nehiştin. Lê me dest berde ji alîkar bûnê, nekarîbû hevaltî jî bikin. Me timî ji Rêbertiyê girt. Dema em teng bûn me go, bi misogerî dê Rêbertî ji me re bibe alîkar. Mînakên wê bi rêzkirinê xelas nabin, me hemû pirsgirêkên xwe hewaleyî wî kirin. Bi rastî jî em wisa fêr bûne, weke ku pirsgirêkên xwe bi wî dane çareserkirinê, ew bi pirsgirêkên xwe ji rêzê dane mijûlkirinê em kêf xweş dibin.

Çawa ku me nekariye em bibin hevalekî/ê baş Serok Apo, her wisa jî em şervan û qadro me nekarî em bibin hêvalên bihêz jî. Me di têkiliyên xwe de hev pêşxistin, veguherandin, perwerde kirin esas negirt. Eger me esas girtibe jî me di asteke pir talî de esas girtiye. Dema wisa bûye jî me nekariye alîkarî bidin hevalê/a xwe, ne jî me karîbû bi şiklekî rast hevalên xwe bixin xizmeta Partiyê. Me bi pirsgirêkên jiyana rojane mijûl kir.

Baweriya min heye, her heval timî dikare xwe ji bo hevalên din feda bike. Ev bûyereke pir mezin e, lê dema dor dibe dora hev pêşxistin, hev veguherandin hema bêje her heval ji vê direve.

Dîsa, nirxên madî ji bo me qederekê girîng in. Nirxên weke cebilxane, lojîstîk û hwd parastin, ew bi destê dijmin ve bernedayîn, serasera bikarneanîn, nehiştin ku birizin, ji bo me pir girîng e. Ji ber

ku ev qîmet bi xwîna çendîn egîdan hatine qezenckirin, di encama zor û zehmetiyan de hatine bidestxistin.

Dema hevalê Fûad dersa dîroka Partî dida, mînakeke pir baş dida. Heval ji bo ku ji cihê xwe biçin dibistanê, pêwîstî pê dibînin du erebeyan biguherin. Wê demê rewşa wan a aborî pir xerab e. Rêbertiyê Partiyê jî di nav de difikirin ku tenê li erebeyekê siwar bin, pereyên bidin erebaya din jî bidin hev û ji bo pêşwazî kirina pêdiviyên xwe yên cuda bi kar bînin. Ji ber vê yekê demeke dirêj bi lingan çûn û hatine dibistanê. Dîsa, di vê demê de hemû heval bi azweriyeke mezin nirx û derfetên heyî bi kar tînin û diparêzin. Nirxên heyî bi destê dijmin ve berdayîn ti car tine ye. Berevajî, timî ji dijmin stendin heye. Dîsa, gava ku çeka destpêkê hatiye bidestxistin zehmetiyên hatine jiyîn, nêzîkatiya hevalan ji bo ku vê çekê biparêzin, hemû ev pir girîng in. Rêbertiya Partiyê dizane, her nirxa hatiye afirandin di encama kîjan fedekarî, zor û zehmetiyan de hatiye afirandin. Ji ber wê yekê ji bo ku wan biparêze jî, heya bi dawiyê hewl daye û gelek nirx ji dijmin parastiye hê jî diparêze.

Nêzîkbûna me ya ji nirxan re berhewa kirin, li gorî dilê xwe bi kar anîn û herî dawî jî bi destê dijmin ve berdayîn e. Me di qada pratîkî de gelek nirx bi destê dijmin ve berdan. Gelo me nedikariya van biparêzin? Helbet me dikarîbû biparêzin. Eger me ev nirxên xwe baş di depoyan de bi cih bikira û belavela li meydanê nehişta, ti car nediketin destê dijmin. Li qada pratîkê ku ez lê dimînim, heya bi îro dijmin çendî operasyon li dar xistiye kariye gelek tiştên me bi dest bixe. Ji aliyekî ve Partiya me dest datîne derfetên dijmin û jê distîne, heta ev ji bo Rêbertiyê weke rêgezekê lê hatiye û ji aliyên din ve em bi destê dijmin ve berdidin. Ji ber ku dijmin bi hêz e dest datîne ser van nirxên me, û em nikarin van biparêzin.

Hema bêje em weke dijmin bin nirxên xwe yên heyî bi kar tînin. Serasera gule avêtin, erzaq û cebilxane xistin bin her berî, ruxmî ku dikare hê bê bikaranîn cil û pêlavên tên avêtin.

Dema li ser van tiştan dihizirim, xemgîn nebûyin ne mimkun e.

**Di PKK'ê de rêveberiya rast bi rast fêmkirina Serok Apo dibe.**

Li dibistana navendî ya Partiyê bi hemû gur û geşiya xwe perwerde didome. Di encama pêşketinên derketine holê de hema bêje her heval bi xwe re ketiye hesab pirsîn û şerekî. Her ku perwerde bi pêş dikeve di hemû hevalan de jî zelalbûnek pêk tê, heval nakokiyên xwe çareser dikin û ji bo pratîkê xwe digihînin rewşeke amade. Piştî her dahûrandinê kesayetî tên analîzkirin û ji aliyê hevalan ve bi berfirehî dahûrandin tên bidestgirtin û nîqas li ser tê kirin. Bi rastî jî dahûrandinên tên pêşxistin, pir li ser mirov bandor dikin û ji kûr ve dihêjînin. Neçar dihêle mirov ji nû ve ji nû ve di ber çavan re xwe derbas bike. Hin heval wisa dikevin bin bandora dahûrandinan, heta demeke diyar xwe bi xwe sînordar dikin.

Navê dewreya me 'Dewreya Îqtîdarbûnê Ya Salvegera 16. A Avabûna PKK'ê' ye. Her dewre rêveberiya xwe ji nav xwe hildibijêre. Pêwîst bû em jî rêveberiya xwe ji nav xwe derxin. Dema dewre dest pê kir rêveberî hate diyarkirin, min jî di nav rêveberiyê de cih girt.

Em di roja destpêkê ya dewreyê de weke rêveberî derketin pêşberê Rêbertiyê. Rêbertiya Partiyê derbarê rêveberiyê de hin daxuyaniyên kurt diyar kirin.

Wê rojê hevalê Abas bi grûbekê re dê biçûya welat. Ew jî li cem me bû. Rêbertiyê Partiyê got, "hevalê Abas diçe welêt, dibe ku ji azmanan berek bê xarê û wî tine bike, dîsa eger hemû hêza me ya li welêt tasviye bibe jî min tedbîra xwe berê girtiye, em ê hevalên li vê derê baş amade bikin, li çar aliyên welêt bi ci bikin û welat feth bikin". Bi rastî jî bi van gotinên xwe erkên rêveberiyê pir bi zelalî datanî holê. Hêza heyî perwerde kirin, ji bo welêt feth bikin anîn rewşa amade erkeke me ya herî esasî bû. Heval jî li gorî vê destdayî bûn. Piraniya hevalan ji şer hatibûn û hema bêje hemû hevalên di asta qadro de bûn. Dîsa, hevalên ji Ewrûpayê, ji cebhe hatine û hevalên nû tevlîbûne hebûn.

Qonaxek ku ji bo min qederekê girîng û nû ye. Min heya bi îro di mijara ku pêşiya min nayê vekirin, ji bo pêşketinê alikariya min nayê dayîn de gilî û gazincên xwe dikirin. Lê vê carê Partî li qada Rêbertiyê firsendeke wisa dida min û bi vî awayî alîkariya herî mezin

dida min. Di PKK’ê de erk çi ye, mirov çawa nêzîkî erkan dibê min ev zêde nedizanîn. Bi tenê çendek rastî dihatin zanîn. Min di pratîkê de erka fermandariya mangayê kiribû. Ji bo vê jî bêjim, min erk û wezîfe kiriye ne rast e. Miroveke/î ku nikare ji ti pirsgirêkan re bibe çareserî, nikare pirsgirêkên xwe jî derbas bike, çawa dikare fermandariyeke rast bike. Piştî ku min li dibistana navendî di rêveberiyê de cihê xwe wergirt, ji bûyerên hatine jiyîn hê baştir xwe nas kir ji ber ku li qada pratîkî erkên hê mezintir ji min re nehatine diyarkirin pir kêfxweş bûm. Ji ber ku eger min erk û wezîfeyên mezintir girtibûya, bi wê rewşa xwe dibe ku min zererên mezin bida Partiyê, bibûma sedema texrîbatên mezin.

Dema min di rêveberiyê de cihê xwe girt, min pir baş dizanî ev firsendeke mezin e. Ji ber vê yekê ez dixwazim vê firsendê, baş bi kar bînim. Ez dixwazim dirust, bi coş û bi fedakarî nêzîkî erk û wezîfeyê bibim.

Ez wisa dihizirîm; hemû heval ji bo perwerdeyê hatine vê derê, gelek jê di asta qadroyan de ne. Jixwe Rêbertiya Partiyê jî tê û diçe dibistanê. Ji ber wê yekê ti pirsgirêk dernakevin, her kes pir dirust e, her kes dixwaze gelek tiştan bide Partiyê. Zêde şaşitî li vê derê dernakevin, ji bo vê jî tenê ya ku pêwîst e bikim, eger karibim ji bo perwerdeyê alîkarî bidim wan, di îştimayê de hevalan bixim rêzê û tekmîla hevalan bigirim û bidim. Di bûyerên piştre hatine jiyîn de, min dît ku zêde rewş ne wisa ye, mirov nikare bi hest û niyetê nêzîkî vê qadê bibe.

Ya ku min jiyan kiriye bi temamî xefletek e!

Eger mirov bi pîvanên xwe yên teng nêzîkî rêveberiya PKK’ê bibe, bi hest û niyetê bikeve nav kar, tê di destpêkê de wenda bikî. Ya ku di kesayetiya me û min de hatiye jiyîn jî bi temamî bû ev.

Me qederekê bi coş dest bi perwerdeyê kiribû, nîqaş jî zêde dibûn. Roja dehemîn a perwerdeyê bû, grûbek heval ji Behdînanê wê rojê hatibûn dibistana me. Min hemû nas dikirin, hewl da bi wan re eleqedar bibim û wan bi cih bikim. Dema bû sibe hemû heval ketin îştimayê, her taximê hejmara xwe girt. Min jî hejmara taxima me girt. Di encam de yek kêm derket. Min zêde girîngî nedayê. Min go, eger kî be yan şiyar nebûye yan jî dereng maye. Piştî ku bi vî awayî

tekmîla xwe ya giştî da em çûn spora sibeyê. Gava ku paşê ji bo dersê hejmar hate girtin dubare di hejmara me de yek kêm bû. Min pirsî ku kesê nehatiye, li ku derê ye, bi rastî ti kesî nedizanî li ku derê ye. Hevalekî/ê got ku li nîzamiyê ye. Min jî hevalên din di cih de girtin hindur. Lê ji taxima min kesek diçe nîzamiyeyê, agahiya min jê tine ye yan jî ti kes ji min re nabêje. Ez qet bi vê yekê jî nefikirîm. Paşê Rêbertî hate dibistanê û kete dersê. Me, piştî dersê xwarina nîvro xwar. Piştî xwarinê ez fêr bûm ku hevalê çûyî nîzamiye ji taxima din e. Di wê kêliyê de hin pirsên nû hatin bîra min, lê carekê ya bûyibû bibû. Weke rêveberiya jor, me karîbû encax piştî 15 saetan, Rêbertiya Partiyê agahdar bikin.

Piştî ku fêr bûm ev rev rastiyek e min bawer nedikir, nedikarî bawer bikim. Çawa dibe ji qada Rêbertiyê mirov direvin. Tiştekî ne mimkun e! Zilam reviyaye, hem jî li qadeke weke sed metro çargoşe, lê encax em dikarin piştî 15 saetan pê bizanin. Ez hê jî ji hevalan dipirsim ku ev rast e yan na, mirov çawa dikarin ji vê qadê birevin! Bi temamî mayîme heyirî.

Dema ku bi sedan hezar, bi milyonan mirovî pir zêde dixwest Serok Apo bibînin, pê re saetekê biaxifin kesekî ku firsendeke wisa xistiye destê xwe ma çima bireve! Hezar pirs hate bîra min. Bawer im heman pirs mêjiyê hemû hevalan mijûl dike. Encax dijmin dikare hewl bide ji vê qadê bireve, wê demê derdiket holê kesê reviyaye dijmin e.

Baş e me dê rewş çawa ji Rêbertiyê re vegotana? Ma me dê wisa bigota, me encax kariye piştî 15 saetan bi reva wî bihesin. Me çi bigotana bigotana, çi bikirana bikirana divê me bi Rêbertiyê re xefleta me jiyan kiriye bigotana. Paşê hevalê qoordîne rewş ji Rêbertiyê re got. Ji ber ku Rêbertî wê rojê nekete derst tişt negot. Me hemûyan meraq dikir ku Rêbertî dê helwesteke çawa nîşan bide. Tebî her yekî/ê ji me tiştek digot. Hin hevalan digot, “tu şewitî, tê çawa bersiva Serok bidî” û hin hevalan jî digotin, “misoger tê ji erk bê girtin”. Her çendî hevalan bi hanekî ev tişt digotin jî rastiyên di bin hanekan de jî hebûn.

Di kêliyekê de rojeva me hate guherîn. Perwerdeyê, naveroka xwe ji kesê reviyayî re berda. Her kes li ser wî diaxifî. Me, weke

rêveberî her çendî hewl da hin tedbîran bi pêş bixin jî me nekarîbû pêşî li nîqaşan bigirin. Ji nişka ve wisa li min hatibû, min nedizanî ez çi dijîm, pêwîst e çawa tevbigerim. Min jî digo, bila kêliyekê ji beriya kêliyekê Rêbertî were û ew çi difikire em bizanin, em li gorî wê tevbigerin. Rêbertiya Partiyê piştî du rojan dubare hate dibistanê.

Dema em ketin dersê, me hemûyan dihizirî ku dê li ser kesê revî dahûrandinan bi pêş bixe û ji berpirsiyarên bûyerê hesab bipirse. Jixwe min nedixwest bikevim dersê jî. Min ji hevalan re got, dixwazim bibim nobedar. Lê hevalan got ku pêwîst ez bikevim ders, dibe ku Rêbertî bi min re diyalog bi pêş bixe û hin pirsan bi pêş bixe. Jixwe ez jî ji wê ditirsiyam ku Rêbertî di dersê de pirsan bipirse.

Xeflet, safitî û bêtedbîriya min jiyan kiriye min ê çawa ji Rêbertiyê re vegota û bi kîjan rûyî bersiv bida? Di seranserayê dersê de bi zehmetî di cihê xwe de ditebitîm, min ew hêz bi xwe re peyda nedikir ku li Rêbertiyê binêrim. Bi rastî Rebertiya Partiyê jî rewşa me pir baş dizanî. Jixwe dahûrandinên bi pêş xistine jî xwediyê vê naverokê bûn. Di dahûrandinan de li ser mijarên erkên milîtaneke/î PKK'ê, terz û tempoya milîtan sekinî. Anî ziman ku ne rast e em rojeva xwe tenê bi bûyerên weke vê bûyera revê yên talî tije bikin û pêwîst e em ji vê bi şûn de li ser tiştên em bikin kûr bin.

Piştî bi dahûrandina Rêbertiyê wisa bêhna min vebû, te digo weke barekî pir mezin ji ser milê min rabûye. Li ser dahûrandinê fikirîm. Min hewl da kêmasiyên xwe yên bûyerê bibînim, li ser mijara ku ez ê ji vê bi şûnde çawa li berpirsiyariyên xwe xwedî derkevim hizirîm û her wiha min xwe gihand hin encaman. Me piştî vê bûyerê dît, herî destpêkê ez, hemû heval me nekariye Rêbertiya Partiyê nas bikin, em ji fêmkirina wî dûr in. Piştî vê bûyerê dema ku em dihizirîn dê Serok bi şiklekî dijwar bê ser me, hesab ji berpirsiyarên bûyerê bipirse, wî li şûna ku vê bike em hemû rexne kiribûn ku em bi tiştên wisa re xwe mijûl dikin, xwe ji perwerdeya xwe dûr dixin.

Ez xemgîn im ku min ji Rêbertiyê fêm nekiriye, hê ji naskirina wî pir dûr im. Eger min hinekê ew nas kiribûya, min ê bizaniya ew ê çawa helwest bistine. Bi taybetî jî min nexwestibû bikevim dersa Rêbertiyê, vê aşkere nîşan dida ku ez şaş bûme. Bi rastî jî ev helwesta min rewşeke sûc e. Eger min hinekê ji Rêbertiyê fêm kiriba, li cihê

ku ji Rêbertiyê birevim, ez ê derketama pêşberê wî û weke milîtanekî PKK'ê ji bo hesabdanê amade bûma. Piştî vê bûyerê min fêm kir ku pêwîst e ez li ser xwe hê zêde kûr bibim-bifikirim, hê baştir xwe nas bikim û ji bo vê yekê hê zêde hewldan û kedê bidim.

Li pêşberê vê helwesta Rêbertiyê hemû hevalên dibistanê, grûb bi grûb li ser jiyan û taybetmendiyên Rêbertiyê, nîqaşeke kûr dan destpêkirin. Her kesî dixwest bi hemû aliyên wî ve Rêbertiyê nas bikin. Herî destpêkê jî min, me dixwest heya bi detaya herî biçûk Rêbertiyê nas bikin û her ku nas kir û fêm kir, wî pêk bînin.

Bi vê bûyerê, min hê baştir fêm kir ku ji rastiya rêveberiya PKK'ê çendî dûr im, rêveberiya di PKK'ê de ji rêveberiyên li cihên din pir cuda ye.

Her ku pêvajo bi pêş diket hevalan hewl didan xwe zelal bikin. Di jiyanê de diyar dibû ku hin pêşketin hene. Sarbûna ku di rojên destpêkê de hatiye jiyîn cihê xwe ji têkiliyên germtir re berdide.

Civîna asayî ya yekemîn a dibistana me hate lidarxistin. Ev civîn ji sê hefteyan carekê tên lidarxistin. Di civinê de kar û xebata me ya di wê pêvajoyê de û jiyan tê nirxandin, heval ji bo pêvajoya pêş pêşniyaran bi pêş dixin. Di civînê de perwerde û jiyan hate nirxandin. Ji bo ku jiyan û perwerde hê berhamdar derbas be, hevalan pêşniyarên xwe kirin. Piştî civînê kesek kete ber lêpirsînê. Ev kes ji beriya vê li cem kesê revî bû, ji Ewrûpayê hatibû dibistana me. Piştî revîna wî kesî ji jiyanê xwe da aliyekî, xwe bi xwe sînordar kir. Ji rêveberiyê re raporek nivîsandibû û tê de gotibû ku ew nikare şoreşgerî bike, dixwaze dubare li Ewrûpayê vegere û ji Partiyê cuda be. Rêveberiya dibistanê ev rewş ji hevalan re aşkere kir. Hevalên ku vî li Ewrûpayê nas dikin, li gel vî pratîk meşandine jî hebûn. Li Ewrûpayê li ser qîmetên Partiyê du salan xwe daye jiyîn, gel biçûk dîtiye, li şûna ku Partiyê bide naskirin, xwe daye jiyankirin. Hevalan bi berfirehî ev rewş daxistin holê. Dema ku li qada Rêbertiyê fêm kiriyê, dê êdî nikaribe xwe bide jiyîn bi awayekî pir rehet dibêje ku ew ê ji Partiyê cuda be.

Hevalan pêşniyar kir, ev kes bikeve ber lêpirsînê. Pêşniyarên hevalan hatin qebûlkirin û derbarê de lêpirsîn hate vekirin. Baweriya

min heye, hem weke giştiyê hevalan û hem weke rêveberî me biryareke rast daye.

Weke rêveberekî ji bo xwe bêjim piştî ku ev kes hate binçavkirin (güvenlik) min ew ji bîr kir. Qet li ser nefikirîm ku pêwîst e em ji vê bi şûnde çi bikin. Fikra min ew bû ku hevalên din dê bikin. Weke rêveberî mantiqa me ew bû ku 'me kire bin çavan û her tişt temam e'. Tedbîrên pêwîst in em bigirin, komisyona lêpirsînê ku em pêwîst bû di cih de derbixin, me ji civîna rêveberiyê ku dê piştî du rojan bihata lidarxistin re hişt.

Piştî civînê, roja duyemîn bû. Me perwerdeya xwe ya danê sibeyê xelas kiribû, xwarina xwe ya nîvro xwaribû û dest bi perwerdeya xwe kiribû. Hê em di nîvenga dersê destpêkê de bûn hevalekî/ê ji derve mayî li derî xist û kete hindur. Ji hevalên komisyonê re got ku ew navber bidin. Navber hate dayîn. Misoger bû dîsa hin tişt qewimî ne. Dilê min kire tirpetirp, kelecana min dest pê kir zêde bibe. Ez jî weke hemû hevalan derketim ji derve. Belê, ne şaş bûm, dîsa hin tişt qewimîbûn.. Vê carê kesê ku me ji beriya du rojan girtibû revîbû. Hem jî dema di lêpirsînê de bû. Kêliya destpêkê mam şaş ku ez ê çibikim. Hemû hevalên rêveberiyê mabûn şaş. Em ji wê derê dibezîn vê derê. Li gel her kesî panîkek hebû, ti kesî nedizanî çi bike, kesê ji destê me revîbû wisa em dixistin panîkê. Hin hevalan dest pê kirin li derûdorê li wî bigerin, ti kes nizane ka çibike. Me di cih de du hevalên Erebî dizanin şandin ber balyozxaneyê. Diviyabû hemû balyozxane biketana bin qontrolê. Ji ber ku bi misogerî dê biçûna pêşiya balyozxaneyekê. Ji mêjde hevalan grûb bi grub dest pê kiribûn li ser kesê revî bû biaxifin: "Çawa revî?" "Çima tedbîr nayê girtin?" Ma hinekan daye revandin?" Çima rêveberiyê tedbîr nestend?" Çima qomisyona lêpirsînê nehate derxistin?"... Û gelek pirsên dawî lê nayê...

Weke rêveberî dîsa em bêçareserî man. Me, her çendî di tekmîlên êvarê de anî ziman ku pêwîst e heval bi vê bûyerê dema xwe derbas nekin, li ser perwerdeyê kûr bibin jî, hevalan ji mêjve bûyer xistibûn rojeva xwe. Digotin, "êdî ji vê bûyerê duyemîn bi şûnde eger rêveberî ji bin vê bûyerê dernekeve pêwîst e bi awayekî cidî hesab bide. Piştî vê bûyera duyemîn bi misoerî rêveberî ji erkê tê girtin". Weke

rêveberî jî me rewşa xwe pir baş didît û em ji hevalan pir cuda nedifikirîn.

Êdî min nedixwest xwe nîşanî ti hevalan bidim. Dema derdiketim pêşberî hevalan rûyên min sor dibûn, neçar dimam serê xwe bixim ber xwe. Min nedikarî bersivê jî bidim pirsên hevalan. Ji ber ku ji beriya demeke kurt bûyereke bi vî awayî hatibû jiyîn, yek ji berpirsên vê bûyerê jî bûm. Min ji ber wê yekê li pêşberê hevalan rexnedana xwe dabû. Hevalan bi rexneyên xwe yên pêş xistine ji min re bibûn alîkar. Di heman demê de anîbûn ziman ku pêwîst e ez li ser rêveberiya PKK'ê kûr bibim. Min jî diyar kiribû, van rexneyên hevalan ji bo xwe weke alîkarî û hêzeke mezin dibînim û ez ê bi vê zanebûnê berê xwe bidim pratîka xwe ya ji vê bi şûnde. Piştî vê bûyerê weke kesekî li ser soza nesekiniye min li xwe mêze dikir û ji derketina pêşberê hevalan min şerm dikir. Dema em bi hin hevalên rêveberiyê ve dihatin cem hev, me kêmasiyên xwe ji hev re digotin û dianî ziman em tevanbar in. Heta me hin caran ji hev re digot, em xwe bêerk bikin û pêşniyareke bi vî awayî ji Rêbertiya Partiyê bibin. Belê em li beramberê vê bûyera ku li benda me bû da ku em çareser bikin, rojeva me mijûl dikir, em bêçareserî mabûn û li pêşberê vê bêçareseriyê, em hewl didin bi xwe feshkirinê pirsgirêkê çareser bikin. Vaye rastiya me ya rêveberiyê. Dema ku tengav dibe ji kar û xebatê destberdayîn û revîn! Me ew hêz bi xwe re nedidît ku em ji hevalên pêkhateyê re civînekê li dar bixin. Me nediwêriya ku em bêjin, me, kesekî di lêpirsînê de ye ji ber bê berpirsiyariya xwe, daye revandin. Heya ku Rêbertiya Partiyê hat me civîn li dar nexist. Piştî ku ji rewşê Rêbertî hate agahdarkirin, Rêbertiyê nêzîkatiyek ku em dane şaşkirin nîşan da. Li vê derê bi rastî, yên şaş bibûn em bûn. Weke ku di bûyera destpêkê de jî bûye ji ber ku me rastiya Rêbertiyê fêm nekiriye, me li gorî fikra xwe ya teng Rêbertî şîrove kiriye û em dihizirin ku dê Rêbertî nêzîkatiya em li hêviyê bûn nîşan bide.

Eger me Rêbertî fêm kiriba, bi nêzîkbûna Rêbertiyê biçûna ser pirsgirêkê em wê demê matmayî nediman, me rast biryar dida û pirsgirêk çareser dikirin. Lê me newêra em biçin ser bûyerê û bi vî awayî em bûn sedema bûne rojev a bûyerê û astengbûna xebatên me yên perwerdeyê. Li şûna ku em pirsgrêka xwe bi xwe çareser bikin

dîsa, weke her tim bûyî me ji Rêbertiyê re hişt. Em jixwe li her derê û her tim vê dikin. Bi taybetî jî li welêt jî ez bi rewşên bi vî awayî re zêde rû bi rû mam. Asta fermandariya jor hemû pirsgirêkên dijiya hewaleyê Rêbertiyê dikir û dixwest ku bi Rêbertiyê pirsgirêkan bide çareserkirin. Nêzîkbûna me ya li pêşberî vê bûyerê jî berhema vê kevneşopiyê bû. Hem jî belkî jî encama kevneşopiyek ku em hemû jê kêfxweş in. Belê, bi rastî jî em pê kêfxweş in ku bi Rêbertiyê pirsgirêkên xwe bidin çareserkirin. Mirov tiştên jê kêfxweş dibe dixwaze timî pêk bîne.

Di vê bûyerê de jî Rêbertiyê pirsgirêka me çareser kir. Lê çawa çareser kir? Bi rastî jî piştî bûyerê dahûrandinek ku di serî de rêveberiyê û rastiya me ya rêvebiriyê esas digire bi pêş xist. Li pey hev li ser mijara di PKK'ê de rastiya rêveberiyê sê dahûrandin bi pêş xistin. Di kêsayetiya me de rêveberiyên nebes ên heya bi îro hatine jiyîn çareser kirin û rêveberiya rast çi ye, pêwîst e çawa be nîşan da. Em weke rêveberî li ser sê dahûrandinên hatine bi pêşxistin zêde zêde nîqaş kir, hevalên din jî careke din şaşitiyên jiyan kirine dîtin. Derxist zanebûne ku mijarê talî kirin rojev, ji xebata me ya bingehîn dûr ketin çawa kêrî dijmin tê û em ji armancê dûr xistine.

Min hewl da li ser dahûrandinan kûr bibim, min xwe gihand hin encamên li gorî xwe. Berê di mijara rêveberiyê de zêde tecrubeyên min tine bû. Bi rastî jî ev erka ku min li qada Rêbertiyê stendibû ji bo min şensek bû. Min ev şens zêde bi kar neanî. Li pêşberê rastiyan min xwe veşart. Eger di nav pêvajoyê de min Rêbertiya Partiyê baş bişopanda min ê bikariya xwe bigihînim gelek encaman û di mijara rêveberiyê de bibim pispor.

Pêwîst e mirov rast bersiva van pirsan bide; rêbertî çawa diçe ser bûyeran, çawa pirsgirêkan çareser dike, çawa nêzîkî erk û wezîfeyê dibe? Li ser vî esasî rêveberiya PKK'ê di maneya xwe ya rastîn de di kesayetiya Serok Apo de ber bi çav bûye. Kesekî ku kesekî/ê ku terza wî, tempoya wî û nêzîkatiyên wî ji xwe re esas digire ji destpêkê ve qezenc kiriye. Aşkere ye ku rêvebertiyeke ji derveyê vê di nava PKK'ê de nikare zêde bijî.

Min cara destpêkê di kesayetiya qademeya fermandariya Behdînanê de, fermandarî, yanî rêveberî nas kir; hevalê/a fermandar

ê/a berpirsiyar, weke fermandarê/a xwezayî yê/a Partiyê didît û min hewl dida li gorî vê fermandariyê şiklekî bidim xwe. Jixwe li qadê şikilgirtina hemû qedemeya fermandariyê weke hev e. Ev fermandarî, fermandariyek ku pesna pratîka xwe dide, evîndarê xwe bûyî, bi awayekî çors, weke Rêbertî aniye ziman bi awayekî donkîşotwarî nêzîkî şer dibe, timî rehetiya xwe dihizire, ji bo berjewendiya xwe fermandariyê bi kar tîne, xwediyê terzeke serhildêriya gundîtiyê ye.

Ez jî ji fermandariyeke wisa bandor bûm û min di mangaya xwe de fermandariyeke wisa meşand. Min di pirtûkan de xwendibû, di PKK'ê de fermandarî tê maneya hê zêde xizmet, hê zêde alîkarî dayîn gel û hevalan, erkên xwe yên li pêşberê wan pêk anînê. Lê belê dema min li cem qedemeya fermandariyê berevajiya vê dît ez ji xwe re wisa hizirîm; li qada şer li gorî pirtûkan tevgerîn nabe. Jixwe gelek hevalên fermandar jî wisa digot; "li pirtûkan wisa dinivîse lê fermandarî ne wisa ye, eger fermandar hê zêdetir xizmet bike, yê/a herî fedakar ew be, fermandariya wî/ê li ku derê dimîne. Ez jî hin caran wisa dihizirîm û min jî heq dida wan. Û piştî bûm fermandarê mangeyê, wisa nêzîkî erk û wezîfeyan bûm. Zêde alîkarî dayîn hevalên mangeyê, dema em diçûn nav gelê me xizmeta gelê me kirin, li gorî feraseta min karê dawî bû. Ez û fermandariya min girîngtir bû.

Niha difikirim û jixwe re dibêjim, baş e di pratîkê de erkên hê mezintir min negirtiye. Eger erkên hê mezintir girtibûya bi îhtimaleke mezin min ê nekaribûya ji wan hê baştir bikim. Heta dibû ku bibûma sedema zererên mezintir jî. Ez ê bi dehan heval tenê ji bo kîna xwe ya şexsî bibim mirin û întiharê, ji bo kêfa xwe hevalên xwe bixim nav aloziyê û bidim revandin. Ewqas nirxên rêxistinê bi dest dijmin ve berdim, paşê jî ji Partiyê bixwazim ku min xelat bike. Ez ê hevalan bê perwerde bihêlim, jixwe ez bi xwe jî ji perwerdeyê hez nakim, ez ê bêjim pêwîstiya hevalan jî bi perwerdeyê tine ye, hevalan timî bi tiştên vala mijûl bikim, di dawiya salê de jî ez ê hemû kêmasiyan biavêjim ser milê hevalên pêkhateyê, bêjim yên kar nekirine nexebitîne, têkoşîn nemaşandine ew in. Eger erk û berpirsiyariyên hineke din mezintir dabûna min, bawer im ez ê jî bibûma kesekî wisa.

Rêbertiyê di dahûrandineke xwe de ji me re digot, “ji we PKK’ê veşartine”. Belê, fermandar û hevalên me yên ku dibêjin, “em milîtanên PKK’ê ne”, PKK û Rêbertî ji me veşartine. Ji ber ku Rêbertî ji me veşartine me ne karîbû wî nas bikin û ne jî karîbûye rastiya PKK’ê fêm bikin. Bi zanebûn yan jî ne bi zanebûn, ji bo min ewqas ne girîng e; ya girîng ew e, yên Rêbertî ji me veşartine wan bi xwe qet Rêbertî nas nekirine. Wan qet Rêbertî nas nekirine, lêkolîn nekirine heya ku bi me bidin naskirin. Eger fermandarên me heya bi îro nebûna xwediyê serkeftinekê, sedem dûrbûna wan ji terz û tempoya Rêbertiyê ye.

Niha hê baştir fêm dikim ku qedemeya fermandariyê çima wenda kiriye, çima nekariye serkeftinên mezin bi dest ve bîne. Fermandariya ku min dîtiye, fêm kiriye, bi ti şiklî li gel fermandariya PKK’ê bi terza rêvebriya Rêbertiyê re ne têkildar e. Jixwe me li vê qadê jî weke rêveberî xwe bi tiştên vala re mijûl kir.

Ez niha hê baştir fêm dikim ku qedemeya fermandariyê çima wenda kiriye, çima serkeftinên mezin bi dest nexistiye. Ti eleqeya Fermandariya min dîtiye, min jê fêm kiriye bi fermandariya PKK’ê re bi terza rêveberiya Rêbertiyê re tine ye. Ti eleqeya wê bi terza rêveberiya Rêbertiyê re tine ye. Jixwe me li vê qadê jî weke rêveberî xwe bi tiştên vala re mijûl kir; me bi paşguhkirina pirsgirêkên esasî, bi mijûlbûna tiştên talî re me got, em vî karî dikin û me rêvebertiyek ku evîndarê xwe dibe esas girt.

Di dîrokê de gelek fermandarên mezin ku gelê xwe ji koletî û bindestiyê rizgar kirî hene. Serok Apo ji van fermandaran ku di dîrokê de derketî holê yê herî dawî ye. Fermandariya wî fermandariya Spartakûs, fermandariya Hz. Elî, fermandariya Sezar e. Ya herî girîng jî fermandariya wî fermandariya gelekî bê ziman, bê hêz, bê nav, dike xwediyê ziman, dike xwediyê navekî, ji nû ve li jiyanê vedigerîne, şer dide kirin û dubare bi mirovahiyê dide qezenckirin e. Ji vî aliyî ve ji hemû fermandarên mezin ên di dîrokê de derketine holê cuda ye. Bi dehan hezar gerîla kiriye yek dil. Û li dijî dijmin xistiye şer, ber bi serkeftinê ve diçe. Kariye li ser ruhê hemû gerîlayên li Kurdistanê şer dikin hikm bike, bibe fermandarê mezin ê ruhên gerîlayan.

Di şer de qebiliyeta herî mezin a fermandarekî ew e ku li ser ruhê leşkerên şer dikin hikm bike, hemû ruhan bi rê ve bibe û bixe liv u tevgerê. Fermandarek tenê dikare bi vî şiklî xwe bigihîne serkeftinê, yekitiya leşkerên xwe biparêze. Serok Apo dizane li ser ruhê gerîlayekî/e li Dêrsimê êrîşê dibe ser girekî, gerîlayekî/e li Behdînanê şer dike, gerîlayekî/e li Serhedê diçe mewziya xwe hikm bike.

Min li ser şer hin pirtûk xwend. Dema behsa taybetmendiyên fermandarekî/e di şer de dibû, min timî bi Serok Apo ve daye ber hev. Fermandariya serkeftî ku di fikrên gelek pisporên şer de tê ziman, ji aliyê fermandariya Serok Apo ve tê temsîlkirin. Tê gotin ji bo fermandarekî/ê erka herî mezin, fikirîn û tenê fikirîn e. Li gorî vê di destpêka kar û xebatên herî mezin ên Serok Apo pêk tîne de fikirîn û lêhûrbûn tê. Ew dema xwarinê dixwe, bi rê ve dimeşe, top dileyize, rûdinî, bi kurtasî her kêliya rojê bi hizirîna li ser şer, li ser pirsgirêkên leşkerên xwe, li ser pirsgirêkên gelê xwe derbas dike. Û îsbat kiriye fermandarê herî mezin ku şopdarê hemû fikrên xwe ye, di encama fikrandinên xwe de xwe digihîne destkeftên mezin. Rêbertî fikrandinê tenê bi xwe ve sînordar nake, berê hemû kesên di bin bandorê de ne dide hizirînê, her kesî dixe liv û tevgerê.

Di nav Partiyê de rêveberiya rast, fermandariya bi ser dikeve bi rast fêmkirina Serok Apo dibe.

**

*

Her kes pir baş dizane mirov bi perwerdyê diguherin û vediguherin, dest bi jiyana şaristaniyê dikin. Gelek di asta ku xwe perwerde dike de pêş dikeve û cihê xwe yê de di nav gelên hemdem de digire. Gelekî bêperwerde tê hiştin, ji perwerdeyê dûr tê xistin yan jî nikare xwe perwerde bike, nikare ku ji koletiyê xwe jî xelas bike û di encamê de bi tinebûnê re rû bi rû dimîne. Gelê Kurd mînaka vê ya ber bi çav e. Îro li cîhanê gelê ku herî zêde ji perwerdeyê dûr tê xistin gelê Kurd e. Helbet, dijmin ji bo ku hê rehet dagir bike, bike kole, gelê me bêperwerde hiştiye.

Gelekî di vê astê de ji perwerdeyê dûr hatiye xistin dubare perwerde kirin û anîn asta mirovahiya şareza [uygar], helbet yek ji karên herî zehmet ên cîhanê ye. Ji bo ku ev gel were perwerdekirin

pêwîst e mirov pir xwediyê sebir, xwediyê coş, înad, xwediyê biryar û fedakar be. Herî destpêkê pêwîst e mirov mamosteyekî/ê mezin be ku gelekî wisa perwerde bike û bi ser xwe ve bîne. Lê ev jî rastiyek e, îro karê herî zor û zehmet ê cîhanê di kesayetiya gelê me de hatiye biserxistin. Lê çawa hatiye biserxistin, di encama kîjan ked û hewldanê de, bi kîjan fedakarî û zor û zehmetiyê bi ser xwe ve hatiye anîn?

Ez berê dihizirîm ku pir girîngî didim perwerdeya xwe. Di hemû jiyana xwe ya perwerdeyê de timî min xwest xwe perwerde bikim. Gelek hevalên min ên ku min wan deman nas dikirin jî wisa dihizirîn. Difikirîm ku xweşik bi Tirkî xwendin, bi Tirkî axifîn û fêrbûna pêşketinên di dîroka Tirkan de perwerdeyeke baş e. Dihizirîm ku di asta ku min xwe gihandiye van de min xwe perwerde kiriye, bûme kesekî hemdem û xwe gihandiye fikra azad. Ji bo kesên hinekê zêde dibistan xwendine, dihate gotin ‘kesên xwe perwerde kirî’. Hema bêje her kesê amadeyî yan jî zanko xwendiye dihesiband ku xwe gihandiye fikra azad. Dema ku min amadeyî dixwend difikirîm ku hema bêje min xwe gihandiye hizira herî azad a li cîhanê, xwe baş perwerde kiriye. Heya bi kêliya tevlî Partiyê bûm jî wisa dihizirîm, ji ber wê yekê min digo, ez ê zêde zehmetî nekişînim.

Lê belê piştî tevlî Partiyê bûm min dît ketime şaşitiyeke çiqas mezin. Tebî dema min dît şaş im jî hejiyam. Dema min dît çiqas paşde mayî û xwediyê ruhekî kole me, cîhana min ser û bin bû. Ya rast ew e, perwerdeya em li sazî û dezgehên dagirker de dibînin, me ji mirovbûnê dûr dixe. Di nava Partiyê de jî dema hevalan gotin ku hemû jiyan perwerde ye û pêwîst e wisa nêzîkatî li perwerdeyê bê kirin, min dît ku min ji rastiya jiyanê, bi maneya xwe ya rast ji rastiya perwerdeyê ti tişt fêm nekiriye.

Di her talîmata Rêbertiya Partiyê ku hatiye de di mijara girîngiya pêwîst e em bidin perwerdeya xwe de, diyar dikir pêwîst e em ji vî aliyî ve jiyana xwe bi rêxistin bikin û rêk û pêk bikin. Lê belê em di qada pratîkê de rast û dirust nêzîkî perwerdeya Partiyê nebûn, em dest berdin ji dirust nêzîkbûnê, em timî ji perwerdeyê revîn, me timî taybetmendiyên xwe yên paşde mayî li ser Partiyê ferz kirin. Hema bêjê ji bo em xwe perwerde nekin, çi pêwîst be me di wê de israr kir.

Di vê wateyê de bi israra xwe ya di neveguherînê de me li dijî Rêbertiyê şer da destpêkirin. Helbet, ev ne şerekî aşkere tê meşandin e. Ev, şerekî wisa ye; bi terzeke herî zirav tê meşandin û ji şerê dijmin hê zêdetir Rêbertiyê dixe zehmetiyê û şerekî xeter e. Helbet, ji ber pratîka me tê fêmkirin ku me ev şer wenda kiriye.

Hevalên li Behdînanê bi piranî hevalên gundî ne. Dîsa, hevalên ji metropolan, ji Ewrûpayê hatine jî hene. Dixwazim pir jidil vê bêjim, xebata em herî jê bêzar bûn û me jê hez nedikir perwerde bû. Ji bo ji perwerdeyê birevim ti rêbaz nemabûn min serî lênedabû. Em pê razî bûn ku em erzaq bikişînin, bibin xwarinpêj, dar bikişînin lê ji bo perwerdeyê na! Ev rewş hema bêje li cem hemû hevalan wisa bû. Kêfa me jê re dihat ku em vala vala sohbet bikin, dema xwe bi tiştên vala derbas bikin. Ji ber ku dema wisa dibû ne me zêde zehmetî dikişand û em ne jî pê nerehet dibûn. Li cem hevalên xwendevan jî gundîbûneke mezin dest pê kiribû. Tebî ev rêbazek bû ku wan ji bo xwe bi derûdorê bidin qebûlkirin serî lê dida.

Ji bo gundîtiyê heweseke mezin hebû. Gelek hevalên ji dibistanan hatîbûn digotin, "xweziya me dibistan nexwenda, em jî li gund mezin bûna". Min jî gelek caran ev gotin anîn ziman. Ji bo bi xwe re gundîtiyê bi pêş bixim ti tiştê min neceriband nemayîbû. Ji bo mirov bibûya gundî pêwîst bû mirov li cem hevalên gundî bûya, pê re têkilî bi pêş bixista, dîsa, biçûya erkên giran ên bi her şiklî û di perwerdeyê de zêde neaxifiya. Min digo, eger wisa bikim hem kêfa hevalan ji min re tê, hem jî pêşketinên mezin pêk tînim, di demeke kurt de dibim fermandar. Li qada Rêbertiya Partiyê jî ev nêzîkbûnên min berdewam kirin.

Di dibistana me de hevalên qet Tirkî nizanin jî hene. Lê di nîqaşên me de derdikeve holê, ev heval tenê ji liv û tevgerên Rêbertiya Partiyê gelek encaman derdixin. Di dewreya me de hevalekî me yê bi navê Mam Ezîz hebû. Ji Başûr bû, demeke dirêj şer kiribû, di nava gelek rêxistinan de cih girtibû herî dawî weke her kesî xelasî di Partiya me de dîtibû û tevlî Partiyê bibû. Demeke diyar li dibistanê ma. Di vê pêvajoyê de tevlî hemû dersên Rêbertiyê bû. Lê belê qet bi Tirkî nedizanî. Di her dahûrandinê de not digirt. Ji me bala gelek hevalan dikişand. Hin hevalan xwe ranegirtin û ji Mam Ezîz

pirsîn, “Rêbertiya Partiyê dersên xwe bi Tirkî vedibêje, tu jî qet bi Tirkî nizanî, ruxmî vê yekê çawa not digirî?” Mam Ezîz bi xwe jî pişt rast dikir ku ew qet bi Tirkî nizane. Lê digot, “her liv û tevgera Rêbertiyê pir xweş bişopînin û ji xwe re encaman derbixin, ev perwerdeyeke mezin e”. Heya bi dawiyê heqê Mam Ezîz hebû.

Serok Apo di demên dawiyê de jiyana xwe bi şiklekî romanwarî ji me re dibêje. Tenê yek heval tine ye ji van gotinan bandor nebe. Ev uslûba romanwarî wisa bala min dikişîne, ez dixwazim timî Serok her tiştî weke romanek be vebêje. Ji ber ku ez bi vî şiklî hê baştir fêm dikim.

Ji kêliya despêkê ku ez hatime dibistana navendî ya Partiyê pê de di dilê min de li beramberê fêrbûnê daxwazek heye. Ez dixwazim gelek tiştan fêr bim. Lê ne xwendevanekî baş im. Eger xwendavenekî baş bûma, min dikarî di vê pêvajoyê de ji gelek zehmetî û astengiyên dijîm xwe xelas bikim, di gelek mijaran de xwe bi pêş bixim. Lê ji ber ku min nekariye ji bo fêrbûnê xwe tam amade bikim, min nekarî bibim xwendevanekî Rêbertî dixwaze. Lê ez ê bibim xwendevanekî baş ê bi azwêrî û xwe bidim xwendinê. Ji bo vê yekê herî destpêkê ez ê jiyana mamosteyê mezin Serok Apo baş fêr bibim û ji bo ku di jiyanê de temsîla wê bikim bikevim nav hewldaneke mezin, hewl bidim bibim xwendevanekî baş.

Serok her cara ku tê dibistanê ders dide, her dersê wî herî kêm çar-pênc saetan berdewam dike. Hemû dersên xwe li ser lingan dide. Bihizirin, çar saetan li ser lingan e û timî diaxife û hemû jî axaftinên dîrokî ne. Kêliya ders xelas dibe yan diçe ser cîhazê, yan jî ji gel re civîn li dar dixe, yan jî bi hevalên li malên din re eleqedar dibe. Bihizirin, ev mirovê mezin van hemûyan di rojekê de dike. Serok Apo tam ev şanzde sal in bêyî ku navber bikevê û her roja derbas dibe hê jî bi zêdekirinê van pêk tîne.

**
*

Li dibistana me bûm şahidê nîqaşên asta bilind ên Rêbertiya Partiyê. Ji bo ku mirov li gel Serok Apo nîqaşên di asta bilind de bi pêş bixe, pêwîst e mirov xwediyê zanebûneke kûr a dîrokî be. Dîsa, pêwîst e ew kes bi xwe jî karibe nîqaşên di asteke bilind de bimeşîne.

Eger ne wisa be nikare li gel Serok Apo nîqaşên asta bilind bên meşandin. Rêbertî, dema ku her dahûrandinê bi pêş dixe dixwaze bi me re nîqaş bike, ji bo ku me bikişîne nav nîqaşê zêde hewl dide. Lê ji ber ku asta me pir paşde ye, ji ber ku me heya bi îro nîqaş nekiriye, em nikarin bersiva pêwîst a van hewldanên Rêbertiyê bidin. Rêbertiya Partiyê dixwaze bi me re li ser pirsgirêkên şer, rastiya me ya gel, li ser pirsgirêkên weke dîrok, civak, hezkirin û azadiyê nîqaş bike. Ji ber vê yekê timî hewl dide, lê bêzanebûn bûna me ya kûr, dibe asteng ku em li gel Rêbertiyê nîqaş bikin. Eger me bizanîba nîqaş bikirana, derbarê van hemû mijaran de em xwediyê agahî bûna, Serok Apo dê dahûrandinên hê kûrtir û berfireh bi pêş bixista. Vaye em ji ber vê yekê em nahêlin ku Rêbertî dahûrandinên hê kûrtir û hê berfireh bi pêş bixe.

Yalçın Küçük û grûbek rewşenbîr hatin dibistana me. Rêbertiyê li pêşberê hemû hevalan sê-çar rojan bi wan re zêde zêde nîqaş kir. Bi taybetî nîqaşên bi Yalçın Küçük re meşandibûn pir kûr û berfireh bûn.

Rêbertiyê dizanî Yalçın Küçük wî pir baş dişopîne û Yalçın Küçük jî dizanî ku ew di asteke çiqas bilind de nîqaş dike. Ji ber wê yekê Yalçın Küçük ji berê de xwe amade kiribû. Mirov dikare bibîne ku Serok Apo ji van nîqaşan kêfeke mezin distîne. Yalçın Küçük diyar dikir ku Rêbertî çiqas mezin nîqaş dike û her cihê diçê, weke cihekî nîqaşê lê dike û ev rastî jî bi nîşandana dibistana me îsbat dikir, “du kevir dan ser hev, bû dibistanek û ev dibistan weke cihekî nîqaşên di asta bilind de lê kir”.

***
*

Ji gelek qadan kesên cuda tên dibistana me. Herî dawî ji Botanê grûbek welatparêz hatin seradana Serok. Yek bi yek bi hemû welatparêzên ji Botanê hatine eleqedar bû, pirs ji wan pirsî, diyalog bi pêş xist. Bi her yekî/ê re bi saetan axifî. Ji bo wan dewreyeke kurt a perwerdeyê da destpêkirin. Ew bi xwe bi perwerdeya wan re eleqedar bû. Dema civîn hatin lidarxistin anîn ziman ku wan ji Rêbertiyê hêz û destekeke mezin wergirtine. Hema bêje temenê hemûyan di ser çilî re bû. Piraniya welatparêzan şest-heftê salî bûn.

Li pêşberê qîmeta ku Serok Apo dida, baweriya wan a bi xwe qat bi qat zêde bû. Bi taybetî gotineke pir manedar a meleyekî heftê salî hebû, “Serokê min em weke dareke zuwa bûn. Piştî ku min hûn dîtin, şîn hatim”.

Bi rastî hemû gelê Kurd weke dareke zuwa bûyî bû. Serok Apo ev gelê zuwa bûyî dubare şîn kir. Çawa ku meleyê êxtiyar gotiye ku ew şîn hatiye û dixwaze weke şêran şer bike, hemû gelê me bi coşa ku ji vê şînhatinê wergirtiye, dixwaze li dijî dijmin şer bike. Wan welatparêzan hemûyan ji bo ku xizmeta şoreşê bikin ji Rêbertiyê daxwaza erkê kirin. Belê, îro hemû gelê me ji Partiyê erk û wezîfe dixwaze. Ji ber ku em nikarin ji gelê me re bibin bersiv, em nikarin van daxwazên wan bi awayekî rast binirxînin. Lê Rêbertiyê hemû erkdar kirin. Van erkan hê jî coşa wan zêde kir.

Êdî her kes pir baş vê dibîne, Serok Apo bûye gel. Ew, êdî di kesayetiya xwe de yekparebûna gelekî, yekitiya gelekî temsîl dike. Wî, timî berjewendiyên gel esas girtiye. Soza ku daye gel bi cih aniye û bi vî awayî di dîrokê de ji gelê me re xizmeta herî mezin kiriye. Ji ber vê yekê di dîrokê de rêberê herî gelparêz ew e. Ji ber ku di her gava ku diavêje de berjewendiyên mezin ên gel esas digire. Êdî gelê me jî di dîrokê de cara yekîm dîtiye rêberekî wan ku dikare temsîla wan bike, heye. Ji ber vê yekê jî li derûdora Serok Apo kom dibin û ber bi serkeftinê ve dibezin. Ev her du hêz her roja derbas dibe zêdetir yek dibin, dibin yekpare û ber bi serkeftinê ve dimeşin; xwe digihînin serkeftinê. Ev hêzên yek dibin, hêzeke din ku bikeve navbera wan nas nake. Rastiyek e ku dê di encama vê yekbûna mezin de hemû astengên heyî biperçiqînin jî.

Me dem bi dem bi nêzîkbûnên xwe yên şaş zerer da gel; ked û hewldana Serok Apo vala derxist. Hema bêje em li serê gelê xwe bûn bela, weke dîwarekî em ketin navbera gelê xwe û Rêbertiyê. Divê em pir baş bibînin ku ev bi me û bi gelê me dide wendakirin.

**
*

Rêbertiyê di vê pêvajoyê de dahûrandinên pir kûr bi pêş xistin. Bi gelek hevalan re diyalog kirin. Lê min tenê di yek dahûrandinê de jî bi Rêbertiyê re diyalog bi pêş nexist. Bi rastî min dixwest diyolog bi pêş bixim. Min dixwest hest û hizirên xwe bînim ziman. Heta hin

caran dema mafê axaftinê dida hevalan gelek caran xwest mafê axaftinê bigirim, lê belê piştre poşman dibûm. Min ew hêz bi xwe re nedidît ku li pêşberê Rêbertiyê biaxifim. Bi taybetî jî min qet bawer nedikir pê re nîqaş bikim. Ji ber vê yekê her tim poşman dibûm. Hê jî ruxmî dixwazim biaxifim, hestên xwe bînim ziman nikarim biaxifim. Her hevalê/a pê re diaxife, pir rehet diaxifiya û pir rehet tevdigerî. Serok Apo vê rehetbûn û baweriyê dide. Gelek heval ruxmî ku di perwerdeyeke asayî de tenê yek gotinê jî nake, li gel wî, li pêşberê wî bi awayekî pir rehet fikrên xwe tînin ziman. Ev, çavkaniya xwe ji uslûb û rêbaza Serok Apo digire. Uslûb û rêbazên wî dikare her kesî bixe nav liv û tevgerê. Dibe sedem ku her kes baweriyê bi xwe bîne. Eger ez jî karibim carekê vê neaxifînê û vê kelecanê bişkînim dikarim timî li gel wî diyalog bi pêş bixim. Baweriya min bi vê heye.

Bi taybetî dema li ser ‘serhildana destpêkê’ dahûrandin dihatin pêşxistin min xwest li gel Rêbertiyê diyalog bi pêş bixim. Piştî ku ji ders derdikevim timî vê giraniya psîkolojîk hîs dikim. Ji aliyekî ve Serok ji bo ku me bide axaftin, gotinekê bi me bide kirin, ewqas hewl dide, em, bi taybet jî ez ruxmî ku pir dixwazim nikarim biaxifim, nikarim hizrên xwe bînim ziman û diyalog bi pêş bixim. Ez di ferqê de me ev şaş e. Ez wê jî dizanim pêwîst e di demeke herî kurt de ez vê ji ser xwe biavêjim. Dizanim karibim carekê destpêkekê bikim, karibim carekê vê kelecana xwe bişkînim dikarim ji vê bi şûnde diyalog bi pêş bixim û tevlî dahûrandinan bim.

Ji ber sedema kelecan û hêza nîqaşê bi xwe re peyda nekirinê, nikarim li pêşberê Rêbertiyê biaxifim. Lê hema bêje her şevê dema ji bo razanê dikevim nav nivînê, di xeyalên xwe de bi Rêbertiyê re diaxifim. Dibe ku ji vê axaftina min ti kes fêm neke yan jî nikaribe mane bidê, ez ji van axaftinan jî encam derdixim. Ji Rêbertiyê pirsan dikim, ew vedibêje.

Bi vî şiklî li gel Rêbertiyê diaxifim, hem bandora psîkolijiya giran ji holê radikim û hem jî hewl didim ji bo dahûrandina piştî vê xwe amade bikim. Belê, bi misogerî ez ê di nav dema mayî de bi Rêbertiyê re diyalog bi pêş bixim, heta dizanim ez ê tevlî nîqaşa hin mijaran bibim, wê demê dê qat bi qat baweriya min a bi min zêde

bibe û ji ber ku ji aliyê xwe ve tevlî dahûrandinên Rêbertiyê bûme bextewar bim.

**
*

Yek ji rojên herî girîng ku me li Dibistana Navendî Ya Partiyê derbas kiriye jî şeva sala nû bû. Bi rastî ji bo me her roj pir girîng û watedar e. Bi taybetî her kêliya em li dibistana me derbas dikin xwediyê girîngiyeke dîrokî ye. Lê ji bo min şeva sersala 1995'an xwediyê girîngiyeke cuda ye. Wê rojê dibe ku cara destpêkê bû ku ji Rêbertiyê fêr bûm, pêwîst e saleke nû çawa bê pîroz kirin. Amadekariyeke pir xweşik û manedar hatibû kirin. Hevalan tiyatro amade kiribûn, grûbên muzîkê ava kiribûn. Dîsa, grûbên çandê ku ji cihên cuda tevlî prorama serê salê hebûn. Ji dostêm me yên bi rêz Yalçın Küçük, Bilgesu Erenus, Abdulkadir Konuk û dedeyê Elewiyan Elî Heyder Celasûn jî tevlî pîrozbahiya me ya serê salê bibûn. Tebî ya herî girîng jî ew bû ku Serok Apo di sala nû de bi me re bû, tevlî programa me bibû.

Ev şeva sersala nû ku tevlî rewşenbîran dihate pîrozkirin, qederekê coşa min zêde kir. Bi taybetî jî ji ber ku Serok Apo di atmosfereke tev bi huner de diket sala nû, min fêm kir ku ew çiqas rumetê dide hunerê, hunermendekî çawa ye. Di bernameya sersalê de dihate gotin ku Bilgesu Erenus dê tiyatroyekê çêbike. Gotin ku pêwîst e di vê tiyatroyê de hevalek rola Rêbertiyê bileyize. Leyistina vê tiyatroyê dê baş bûya. Lê dê kîjan heval bi rola Serok Apo rabûya? Ji bo ku mirov vê rolê bileyize diviyabû mirov hunermendekî/e mezin baya. Ji bo ku rola Rêbertî bê leyistin diviyabû mirov hunermendekî/e mezin be. Ji bo ku rola Rêbertiyê bileyize diviyabû mirov wî fêm bike.

Ti hevalan nexwest vê rolê bileyize. Bi misogerî pêwîst dikir ev rol bê leyistin jî. Bilgesu Erenusê dê rola Çîler bileyista. Lê yek hevalê/a ku rola Serok Apo bileyista jî nehate peydakirin. Kêlîyekê min go, dê tiyatro neyê çêkirin. Ber bi êvarê dema me sohbet dikir, hevalekî/ê got ku dê Serok Apo li gel Bilgesu Erenus tiyatro çêbike. Tebî min bawer nekir. Çawa ku min bawer nekir, min bi ser heval de xwe ecz kir û min got; Ewqas kar û xebata Serok Apo heye ma dê di

nav ewqas kar û xebatê de bi ser de jî di tiyatroyê de bileyize? Min ji heval re got, ev ne mimkun e û ew jî îqna kir.

Êvarê bername dest pê kir. Em xwendevanên Dibistana Navendî Ya Partiyê, tevî Rêbertî û grûbek dost, me bi şiklekî bi coş dest bi bernameya xwe ya sala nû kir. Piştî ku hevalan xebatên xwe yên weke xwepêşandanên folklorê, muzîkê kir Elî Heyder Celasun jî ji Pîr Sultan leyistokek pêşkeş kir. Peyre suprîza mezin a şevê pêk hat.

Ev suprîzeke wisa ye ku ti kesî nedikarî texmîn bike! Elî Heyder Celasun got ku ew ê tiyatroyekê bileyizin û dest pê kir navên kesên di vê tiyatroyê de cihê xwe distînin bixwîne. Rola Tansu Çîler dê Bilgesu Erenus bileyista, rola dîrokê Elî Heyder Celasûn û rola Rêbertiyê jî dê Serok Apo ku kariba bi awayekî herî baş heqê wê bidayê bileyista. Jixwe kêliya ku min bihîst dê Rêbertî bileyize, ji ber kelecanê min nedikarî di cihê xwe de bitebitim. Çawa dibe ku Serok dê di tiyatroyekê de bileyize? Min nedikarî hezar salî vê bihizirim û ti car min bawer nedikir. Jixwe ferqa Serok Apo ji me ev e. Serok rola xwe baş û wisa bi awayekî rasteqînî leyist, dema min li wî temaşe dikir dişibiya hunermendekî ku hemû temenê xwe bi tiyatroyê derbas kiriye. Yên din jî hewl dan bi rola xwe rabin.

Me hemûyan bi baldarî û kêfxweşiyeke mezin Rêbertî dişopand. Min di vê tiyatroyê de hê baştir fêm kir, ew çiqas girîngî dide hunerê û jiyîna tevî hunerê ji xwe re kiriye rêgezekê. Wê şevê dema Serok di tiyatroyê de dileyist heyraniya min a ji bo wî ewqas zêde bû, ev heyranbûyîn ji bo ti mirovan nayê hîskirin. Nebûn heyranê Rêbertiyê, mezinahiya wê nedîtin, jê heznekirin ne mimkun e...

Piştî ku tiyatro xelas bû hozanekî welatparêz, dest pê kir stranên qlasîk ên Kurdî bixwîne. Ji beriya ku stranên xwe bêje, saza xwe akord kir. Tam nêzîkî çil deqîqeyê bi akorda sazê re mijûl bû û bi zora xwe karîbû sererast bike. Di vê navberê de Serok Apo li maseyê xwe rûniştibû hem ew dişopand û hem jî li bendê bû ku ew saza xwe akord bike. Ewqas dirêj kişandina akordê, ez dîn kirim. Dema wisa difikirîm, Serok bi sebireke mezin ew dişopand. Di pey re hozanê welatparêz bi Kurdî stranên klasîk ên xweşik xwendin. Paşê tam di 12’ê şevê de yanî di deqîqeya destpêkê ya sala 1995’an de hemû

lampeyên li dibistanê temirîn. Ji nişka ve her kesî şiyara ‘Bijî Serok Apo’ qêriya û em bi Serokê xwe yê neteweyî re ketin sala 1995’an.

Di pey re rewşenbîr ji dibistanê cuda bûn. Rêbertî yek bi yek bi hemûyan re axifî. Wisa qîmet dida wan, dostaniya wan, wê şevê tiştê ku ti dost ji bo dostên xwe nekin Rêber Apo ji bo dostên xwe kir. Bawer im wan jî heya bi îro sersaleke wisa nedîtibûn. Di jiyanên xwe de cara yekemîn sersaleke wisa xweşik, azad û watedar jiyan kirin. Jixwe dema ew jî ji bo cara dawî diaxifiyan, bi awayekî aşkere ev dianîn ziman. Û kêfxweşiya wan li ser çavên wan xuya bû.

Piştî ku mêvan çûn û Serok mesaja sala nû pêşkeşî gel kir, me xwendevanên Dibistana Navendî ya Partiyê li şûna ku bernameya me mayîbû, bi Serokatiyê re derbas kir. Min qet nedixwest ew şev xelas bibe.

Piştî bernameya sersalê, me hemû hevalan di navbera xwe de nîqaş kir. Her kes ji pîrozbahiyê pir bandor bibû. Hemû hevalan digotin ku ji ber ku Rêbertiyê di tiyatroyê de leyistiye ew matmayî mayîne, lê pir jê bandor bûne.

**

*

Dewreya me ya ku di 27’ê Mijdara ku salvegera avabûnê ya 16. ya partiya me ye de dest pê kiribû, li gorî hatiye hedefkirin ber bi destpêka meha Adarê bi awayekî bi hêz ji bo têkoşînê hate gihandin asteke amade. Qonaxa ku têkoşîna me xwe gihandibûyê, qonaxa îqtîdarbûnê bû. Wê demê pêwîst bû, dewreya ku di vê demê de li Dibistana Navendî Ya Partiyê dest pê bikira, diviyabû bibûya dewreya îqtîdarbûnê. Û wisa jî bû. Dewreya Îqtîdarbûnê ya Salvegera Avabûna 16. A Partiya me, di 27’ê Mijdarê de bi axaftina Rêberê Neteweyî Serok Apo ku destnîşanî girîngiya dewreyê dike bi şiklekî fermî dest bi perwerdeya xwe kir. Armanc û hedefa perwerde yê ew bû; di dawiya dewreyê de her hevalê/a di dewreyê de perwerde dibîne, di vê dema ku em ber bi îqtîdarbûnê ve diçin de bi şiklekî xurt xwe perwerde bike, di dema pêş de di hemleya îqtîdarbûnê de bi roleke çalak rabe û xwe bigihîne îqtîdarbûnê. Û dewreya me di demeke wisa ya dîrokî de bi roleke dîrokî re rû bi rû bû. Her hevala/ê tevlî dewreyê bûye, hema bêje bi şiklekî çalak tevlî xebatên

amadekariya Kongreya 5. bibû û ji ber vê yekê jî qederekê di zanebûna vê dema dîrokî û vê rola dîrokî de bû. Ji ber vê yekê dewreya îqtîdarbûnê bi coş, bi xwestek, bi moralû bi hêzeke mezin dest bi xebatên xwe yên perwerdeyê kir.

Dewreya me ji destpêkê pê de xwediyê yekbûneke qederekê bihêz bû. Hemû heval ji ber ku di vê zanebûnê de bûn hem bi coş dest bi dewreyê kirin, hem jî ji xwe re weke hedefeke mezin diyar kirin ku di dawiya dewreyê de perwerdeya xwe bi awayekî bihêzbûyî xelas bikin, bi hevalên di vê dewreyê de wisa bihêz bûyî biçin her qada têkoşînê û xwe bigihînin îqtîdarbûyînê.

Di dewreyê de yek ji bûyerên ku herî zêde hatibû jiyîn jî qederekê bûyina mehkemeyan bû. Ji destpêka dewreyê heya bi dawiya dewreyê, hin kes hatin darizandin. Dîsa, mehkemeya hin ajanên ji aliyê dijmin ve hatibû şandin nav me, hate li darxistin. Hin kes ji ber şaş nêzîkbûna gel hatin darizandin. Di hemû mehmemeyên hatin lidarxistin de, ji bo hemû bersûcan nêzîkatiyeke li ser esasê qezenckirinê hate pêşxistin û hema bêje hemû dubare hate qezenckirin.

Dîsa, yek taybetmendiya vê dewreyê jî ew bû; hevalê Fûad dersê dîroka Partiyê da me. Yanî di maneyekê de li xwe mukur hat. Rastiya hevalê Fûad awayekî rastiya me ye. Jiyana wî ya di nav Partiyê de, pratîka wî ji bo me hemûyan pir girîng bû û ji bo me weke eynikekê bû. Her hevalê/î karibû di vê eynikê de xwe bibîne. Hevalê Fûad çîroka xwe ya di nava Partiyê de vegot. Bi rastî jî çîroka me hemûyan dianî ziman.

Di dawiya dewreyê de platformên rexnedanê hatin lidarxistin. Platforma rexne û rexnedanê di wateyekê de xebata dawiyî ya dewreya me bû. Ji destpêkê heya bi dawiyê di dewreyê de hemû hevalan ji xwe re esas girtin ku bi şiklekî rexnedanê nêzîkî xwe bibin. Platforma rexne û rexnedanê di wateyekê de jî gava herî dawî û grîng a bi awayekî serkeftî bi dawîkirina dewreyê bû. Weke ku di axaftina destpêkirina dewreyê de bûye, me bi axaftineke Rêbertiyê ku balê dikişîne li ser wate û girîngiya rexne û rexnedanê dest bi vê beşa perwerdeyê jî kir.

Hemû heval ji bo platforma rexne û rexnedanê rabûn. Her heval zêde zêde hate rexnekirin. Helbet, aliyên li ber pêşketina kes asteng, nebesî û aliyên pêwîst e ne yên me bin, nuxteyên bingehîn ên hatine rexnekirin bûn. Hevalan li ser esasê rexneyên hatine ser wan, nêzîkî rexnedanê bûn û bi vî awayî helwesteke rast nîşan dan. Hema bêje hemû heval cara destpêkê di platgormeke wisa de tevlî rexne û rexnedanê bibûn.

Ev jî dibû sedem ku ew cara yekemîn wisa xwe bibînin, xwe nas bikin. Me di seranserê dewreyê de û di dawiya dewreyê de dît ku platforma rexne û rexnedanê nêzîkatiya rexnedanê, ji bo pêşketina kes çiqas girîng e. Helbet hin heval zêde hatin rexnekirin, hin heval jî kêm hatin rexnekirin. Lê di encamê de her heval ji encama platforman bi awayekî bihêzbûyî derket.

Piştî platforma rexne û rexnedanê hemû hevalan dixwest kêliyekê ji beriya kêliyekê derkevin pratîkê. Bi vê coş û xwestekê heval li benda vesaziyan bûn. Dewreya me grûba xwe ya destpêkê şand Eyaleta Güneybatı [Başûrê Rojava]. Ev grûba me ji beriya platformên rexne û rexnedanê derket. Grûbeke qederekê bihêz bû. Erk û wezîfeya wan ew bû ku piştî ewqas tasfiyeyê, li Eyaletê ji nû ve gerîla bi cih bikin. Grûbê, ji beriya ku derkeve di asteke diyar de li ser qadê lêhûrbûn û ponijandinek meşand. Hevalên berê li qadê mabûn di nava grûbê de hebûn, ev ji bo grûbê awantajeke mezin bû. Grûba destpêkê ya Dewreya Îqtîdarbûnê piştî ku pêvajoya xwe ya ponijînê temam kir, ji bo ku li çiyayên Güneybatı zemîna îqtîdarbûnê pêk bîne, bi coş û baweriyeke mezin çû.

Piştî platforman me hemû hevalên dewreyê li ser çek, al, pirtûk û wêneyê Rêbertiyê merasîma sond xwarinê li dar xist. Mersîma sondxwarinê ya pêk hatiye coşek da me hemûyan. Her kes weke ku ji ser xwe ve çûbû. Coş û daxwazeke wisa hebû, di wê kêliyê de çi asteng derketana jî, nedikariya li ber me xwe bigire. Ji merasîma sond xwerinê pe de em hemû ji bo her qada têkoşînê hatibûn rewşa amade. Em amade bûn biçin her derê. Rêbertiyê jî dizanî em amade ne. Dibe ku me nekarîbû xwe bigihînin pîvanên wî dixwest, bibin milîtanên wisa. Lê dizanî ku em ê bi hêz, alîkarî, coş û baweriya ku me ji

Dewreya Îqtîdarbûnê wergirtiye em ê îqtîdarê bixin destê xwe. Ji ber vê yekê jî vesaziya dewreyê kir.

Hevalên di astên cuda de hatin şandin Dêrsim, Amed, Botan, Behdînan yanî bi kurtasî hatin şandin her derê. Serok, bi vî awayî Dewreyê Îqtîdarbûnê li her derê welêt bi cih kir, tovên îqtîdarbûnê çand û gaveke pir mezin avêt. Ji her grûba ku diçû soza dawî stend. Yek bi yek ji her hevalê/î re vegot ku girêdayî mayîna bi sozê, egîdiya herî mezin e. Wî bi xwe heya bi ber derî her grûba ku diçe oxir kir. Her grûb di nava dilê xwe de veşart. Û ya di dilê xwe de reşand her derê welatê me yê bedew. Grûba Dêrsimê weke grûba destpêkê derket. Di peyre grûba Amedê, herî dawî grûba Botan-Behdînan çû. Ji hevalên mayîne hin şandin xebata Ewrûpayê. Hin jî xiste nav grûba ponijînê û kir armanc ku wan jî ji bo pêvajoya pêş amade bike. Dewreya Îqtîdarbûnê Ya Salvegera Avabûna 16. A PKK'ê ku pir bi liv û tevger û çalak dest pê kiribû, bi heman zindîbûnê û bi hemam lezê, xwe li çar aliyên welêt bi cih kir û bi vî awayî gav bi gav ber bi îqtîdarbûnê ve meşiya. Her hevalê/a ku di vê meşê de cih girtiye weke milîtanekî/e bi coş û bawerî, berê xwe da hedefa xwe.

Belê, dewreya me, Dewreya Îqtîdarbûnê ya Salvegera Avabûna 16. A PKK'ê di demeke pir kurt de bi encam bû.

Dewreya me, ne dewreya destpêkê bû û ne jî dê bibûya dewreya dawiyê. Lê ji bo dewreya me, tiştê herî girîng ew bû, rastî pêvajoya Kongreya 5. a Partiya me hatibû û îqtîdar bûn ji xwe re weke hedef diyar kiribû. Ji ber vê yekê yek ji dewreyên herî bişens bû.

**
*

Min xwest fêr bibim, Serok Apo çawa jiyan dike, heya bi roja me ya îro çawa hatiye; bi kurtasî min hewl da wî nas bikim. Ji bo ku wî nas bikim min zêde hûr û kûr lêkolînek nemeşand. Tenê bi vegotinên wî û bi çavdêriyên min ên di pêvajoya ku li qada Rêbertiyê mayîme min hewl da Rêbertiyê nas bikim. Lê ev jî rastiyek e, kesekî/e ku tenê karibe baş şahidiya jiyana rojeke Serok Apo bike, ji bo ku hemû jiyana wî, ji bo ku taybetmendiyên wî nas bike, dikare çavdêriyên pir girîng bike, encamên pir girîng bi dest bixe.

Ji beriya ku bêm qada Rêbertiyê min meraqa jiyana wî, meraqa taybetmendiyên wî dikir. Timî difikirîm ku ti kes nikare xwe bigihîne jiyana wî. Lê piştî ku hatim qada Rêbertiyê min dît, ez çiqas şaş im û şaşitiya min, min pir ji rastiya Rêbertiyê dûr dixe, dikeve navbera min û Rêbertiyê. Jiyana Rêbertiyê jî, jiyana mirovekî ye. Rêbertî jî mirovek e, em jî mirov in, lê jiyana Rêbertiyê bi ser dikeve, lê timî jiyana me wenda dike.

Ma çima timî jiyana mirovekî bi ser dikeve, serkeftinê tîne, lê jiyana mirovê/a din her tim tije binkeftin e? Destpêkê, vî tiştî qederekê ez mijûl kirim. Lê di encamê de min ev ferq kir; hin sedem hene, Serok Apo di jiyana xwe de her bi ser dikeve; berevajiya vê em jî timî wenda dikin, têkdiçin. Eger min bixwesta ji van pirsên ku min bi xwe re mijûl dikin xwe rizgar bikim, diviyabû bersiva van pirsan bidim.

Ji vê bi şûnde ji bo her bi ser bikevim ez ê ez ji xwe re jiyana Serok Apo esas bigirim. Ji ber ku li Kurdistanê ji derveyê vê jiyanê ti jiyan nikarin bi ser bikevin! Yekane jiyana ku li Kurdistanê bi ser dikeve jiyana Serok Apo ye.

Jiyana Rêbertiyê jiyana nû ye. Jiyana mirovahiyê ye. Jiyaneke bi temamî berevajî dijmin e. Û ev jiyan, jiyana rastîn a gelê me ye. Ji ber vê yekê divê gelê me pir baş li jiyana xwe xwedî derkeve. Jiyana ku herî zêde dijmin jê ditirse ev jiyan e. Ji bo ku vê jiyanê nede jiyîn, dijmin serî li her awayê fêlbaziyê û qurnaztiyê dide. Ji ber ku ev jiyan tê wateya dawî lêhatina dijmin. Ev jiyan tê wateya azadiya Kurdistanê. Ji ber wê yekê divê em hemû pir baş li vê jiyanê xwedî derkevin û vê jiyanê bidin jiyîn. Ji ber ku li welatê me yekane rêya qezenckirina jiyanê, li gorî vê jiyanê jiyan kirin û ev jiyan dan jiyankirin e. Yekane rêya jiyanê ku îro li Kurdistanê her xwe digihîne serkeftinê, ji heft saliya xwe heya bi îro her bi ser keftiye, jiyana Serok Apo ye.